# *Dîroka kelepora mîrnişîniya Botan*

Komkirin û amadekirin:
**Mele Xelefê Bafî**

Veguhestina tîpan:
**Dilawerê Zengî**

PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

**Komkirin û amadekirin: Mele Xelefê Bafê.**
**Veguhestina tîpan: Dilawerê ZENGÎ.**
**Navê pertûkê: Dîroka kelepora mîrnişîniya Botan.**
**Derhêner û kombiyûter: Royar Zengî.**
**Çapxaneya Emîral.**
**Beyrûd - Libnan.**
**2004\12/1000**

*Mafê çapê parastî ye.*

**Têbînî:**

**Ev destnivîs ji hêla seydayê gewre Ebdilreqîb Yûsif gihaye destê min. Komkirin û amadekirina Mele Xelefê Bafî ye, bi tîpên Erebî hatibû nivîsandin. Li ser daxwaza seydayê gewre Ebdilreqîb Yûsif, min ji tîpên Erebî veguhestin tîpên Latînî û wek hatiye nivîsandin û rêzkirin min da çapkirin û belavkirin.**

**Dilawerê ZENGÎ**



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

*Diyarî ji bo:*

Seydayê hêja û xoşewîst ‘**Ebdilreqîb Yûsif** r e
Digel ciwantirîn rêz û silavên kurdayetiyê.

Bi hêvî me ko bi dilê wî be.

*Dilawerê ZENGÎ*



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Dîroka kelepora mîrnişîniya Botan.

**Dîroka kelepora mîrnişîniya Botan** --------------------------------------------------------- 4

PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Pêşgotin

Mezinahiya her gelekî ji dewlemendiya kelepora wî gelî têye diyarkirin. Bêso Kurd miletekî xwedî keleporeke dewlemend û bêhempa ye. Ne tenê xwedî şaristaniyeke kevin û dewlemend e, belê roleke mezin di avakirina gelek şaristaniyan de, rabûye.

Ji her neteweyî û gelî bêtir, Kurdan bawerî bi gotina devkî anine û bi toreya devkî û keleporê girêdayî mane. Em dikarin bibêjin, pêmaya wêjeya Kurdî ji kelepor û wêjeya devkî û gelêrî hevedûdaniye. Toreya devkî şêwe û awayê vegotina çandeyî ya gel e... Bêguman afrandêrê keleporê gel e, bi alîkariya gotina devkî, bûyerên dîrokê, serpêhatî, stran û govend, pend û gotinên pêşiyan, lîstik û gerdiş, pîşe, serhawer û berhaweyên kurdî vediguhezin nifşên nû û têne parastin, bûyer û tevgerên nû û nûjen jî tên vegotin û li hev têne pirkirin û mîna çavkaniyan dizên û diherikin û dem bi dem li hev têne gerandin.

Kelepor, toreya devkî û zargotin çavkaniya şîrê dê ye. Lawên vê diyê, çi torevan û dîrokvan, û çi ronakbîr û zimanzanên ko hene, tevan ji vê çavkaniyê vexwarine, û hiş û raman, bîr û baweriyên xwe di yek zimanî de, meyandine. Meyandina kelepor û toreya devkî, avakirina berhemên nûjen e.

Di dema berê de, di dîwanxanên mîr, beg û axan de, dengbêj û stranbêj hebûn. Ewan mirovan, roleke mezin di parastina kelepora Kurdî de lîstine. Lê di roja îro de, tu dîwanxane nemane. Ew dengbêj û stranbêjên me jî, roj bi roj, destê cansitîn mîna dasê, wan ji jiyanê hiltîne. Mexabin şûna wan vala dimîne. Bi mirina her kalemêrekî re, gencîneyek ji kelepora Kurdî winda dibe. Windabûna kelepor û toreya devkî, windabûna hîm û bingehê rewşenbîriya kurdî ye. Vêca, binema parstin û çareserkirina vê rewşê; komkirin û danheva kelepor, toreya devkî û zargotina me ye. Nivîskar bi rola xwe rabin û bibin pasevan û keleporperestên toreya devkî û zargotina xwe.

Bêso, ev kar û xebat wê ji her kesî neyê û ne her kes dikare bi vî karî rabe. `karê serketî, ji danheva folklor, lehengî ye`.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Berî du-sê salan, seydayê mezin dîrokzanê navdar Ebdilreqîb Yûsif ev destnivîsa mele Xelefê Bafî ji başûrî Kurdistanê ji min re rêkiri bû û ji min xwesti bû ko vê destnivîsê çapbikim.

Birastî pir kêfa min hat. Ji hêlekê, ji bextê min î spî ye, ko destnivîseke weha dewlemend û hêja ji destê seydayê E.Yûsif rê bibe, û bi keda welatparêzekî mîna mele Xelef amade bûbe, bi destê min bête çapkirin û belavkirin. Ji hêlekê din ve, ko ev destnivîs kelepora herêma Botan be.Gelek bûyer û nûçeyên dîrokî, navên hoz û êlan, serhawe û berhawe, efsane û çîrok, navên gund û herêman û navên mîr, axa û begên herêma Botan tîne ziman. Bêguman, kelepor û toreya devkî di bûyerên dîrokî de dîdarek bêhêl e, bûyeran wek heyî vediguhêze û diyarî nifşê îro dike.

Mele Xelef karekî pir mezin û hêja ji gelê xwe re kir.Cihê pesin û şanaziyê ye. Ez bawerim wê navê wî di ezmanê toreya Kurdî de bi tîpên zêrîn bêye nivîsandin. Bêguman ev berhemê wî gencîneyeke bêhempa ye. Di baweriya min de, ev destnivîs hêjayî lêkolîneke dîrokî û zanistî ye. Lê mexabin di roja îro de ji ber gelek sedeman em nikarin pêk bînin. Bêguman emê di rojên bê de bidin ser milên xwe û bi zelalî şirove bikin. Lê ji bo tekûzkirina vî berhemî, min hin gotar û danhevên Mîr Celadet yên ku di kovara Hawarê de hatibûn belavkirin, li vir dane weşandin. Belgeyek dîrokî bi navê Şîna Mîr Sêvdîn û sitirana Bedir-Xan begê ji hêla E.Yûsif gihane min. Bedir-Xan beg ji pertûka (zargotina Kurdên Sûriyê), danheva Celîlê Celîl hatiye wergirtin.Şerê Bestê Beleka û Şerê Kehnîqîrê ji kovara Ronahî hatiye wergirtin. Ez Xelef im, min ji kasêta dengbêjekî wergirtiye.Mêşhingivî danheva M.E.Botî ji kovara Hawarê hatiye wergirtin. Hêjayî gotinê ye, ko ev destnivîs bi tîpên Erebî û bi xêza Mele Xelefê Bafî hatibû nivîsandin. Min jî ev destnivîs ji tîpên Erebî veguhest tîpên Latînî.

Di dawiyê da ez spasiya seydayê Ebdilreqîb Yûsif dikim û sed mehder li giyanê Mele Xelefê Bafî bibare û cihê wî buhişt be.

Dilawerê ZENGÎ
13-6-2003



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# حياة الملا خلف البافي*

## المؤرخ عبدالرقيب يوسف الزفنكي

هو خلف بن رمضان من أهالي قرية (بافي) الكبيرة الواقع على الجانب الغربي الصخري المرتفع لنهر دجلة البعيدة عن مدينة الجزيرة بمسافة حوالي 35كم وهي قرية من قرى عشيرة هارونان.

درس العلوم الدينية في الجزيرة وأطرافها وفي بوتان. من أساتذته والدي الملا يوسف ابن الحاج حسن الزفنكي المنسوب الى زفنكا حاجي عليان في بوتان الذي له عدد التآليف منها الفقه الاسلامي في جزءين وطبع الجزء الأول في بغداد سنة 1994، ودرس أيضاً عند العالم الفاضل الملا عبدالرحمن بن الملا عبدالكريم الخندكي كما درس قليلاً عند عبدالرقيب يوسف نفسه.

بعد أن نجح في الامتحان الذي كانت تجريه وزارة أو دائرة الأوقاف في تركية، أصبح إماماً رسمياً في قرية (سته ورك) الواقعة في الطرف المال الغربي من مدينة الجزيرة حتى 1977، ثم نقله اماماً لاحد مساجد الجزيرة العالم البارع المرحوم السيد عبدالرحمن مفتي الجزيرة ابن العالم الشهير السيد علي الفندكي وذلك تقديراً لنشاط الملا خلف في ميدان التراث والوطنية أيضاً، واتصافه بالأخلاق الفاضلة، فكان المرحوم يتمتع بمكانة اجتماعية مرموقة بين سكان الجزيرة وأطرافها خاصة وأنه كان يعمل سياسياً ضد الظلم والاضطهاد في تركية وكان في منتهى الاخلاص لشعبه. في صيف 1977 سافرت الى كردستان الشمالية لأنها:

**بلاد بها حل الشباب تمائمي وأول أرض مس جلدي ترابها.**

وللقيام بجولة أثري وتراثية فيها وصلت الى الجزيرة في 2-7-1977 وحللت ضيفاً على تلميذي وصديقي الملا خلف بقرية (سته ورك) المطلة على دجلة. وفي اليوم التالي ذهبنا معاً الى دار المرحوم الملا سراج الدين بن الملا عبدالحكيم الخليلي، وكان عالماً وشاعراً له عدة مؤلفات مع ديوان شعر مخطوط، وتجولنا معاً بين آثار مدينة الجزيرة. وفي 6-7 سافرت مع الملا خلف الى قرية هه رزانخ، وفي 7-7 سافرنا معاً الى قلعة بافي المطلة على دجلة وهي قلعة صخرية حصينة جداً فصورت آثارها، ورافقني

* ولد في 1-1-1940 وتوفي في 31-5-1993 في الجزيرة، وخلّف من البنين: اديب وبدرالدين ومتين ومسعود ودودستك وسه كفان، ومن البنات: زبيدة وزينه ت وله عليخان وسيفه ر وبه خشان وئه فين و (نه وزه ؟).



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

الملا خلف الى العديد من آثار بوتان فكان ملؤه الحيوية والحماس لمشاهدة المواقع الأثرية كقلعة (فنك) وآثار بينات (باعيناثا) و (قه سركا كيلي)، و المنحوتات الآشورية في قرية (شاخي) (شاخ و هه بله ر) في جبل الجودي. وكانت هذه السفرات الى مواطن الآثار والحضارة أول درس عملي للملا خلف ليصبح فيما بعد التراثي الأول في كردستان الشمالية. كانت لي قبل سفرتي هذه مراسلات معه وكنت أقيم في مدينة بعقوبة القريبة من بغداد وكان يجيب على أسئلتي ويتحفني بجملة من صور آثار الجزيرة. وخلال السفرة كنت أشجعه على جمع التراث الشعبي وزيارة المواقع الأثرية وبعد رجوعي كنت أراسله باستمرار وأطلب منه أن يجمع كذا وكذا من القصص والحكايات الشعبية والأغاني الفولكلورية وتصوير الأماكن المطلوبة والسفر الى هنا وهناك لمشاهدة مواقع أثرية وتحديدها بدقة. ومقابلة المغنين وتسجيل أصواتهم عند انشاد الأغاني تسجيلاً لتلك الألحان المختلفة اشفاقاً عليها من الاندثار مع كتابة نبذة عن حياتهم وحياة من سبقهم من المغنين، وتدوين أخبارهم وتدوين مايتعلق بامراء بوتان من الأخبار الشفهية والأغاني والحكايات مع الاهتمام بجمع أخبار الصناع المهرة المعماريين والنقاشين وغيرهم، وتطوير المباني التراثية، وجمع الوثائق والمخطوطات النادرة، وقصائد الشعراء غير المنشورة. كنت أملي عليه في تلك الرسائل الكثيرة كل ما يدور في خلدي فكان مع هزاله الجسمي وملازمة المرض له يتّقد نشاطاً على نشاط وحماساً على حماس لايعرف الملل والكلل ويجمع الكثير والكثير من التراث المبعثر، وكتب لي احدى رسائله أنه تجمع لديه (814) صفح طويلة من رسائلي اليه مع فقدان العديد منها فسافر بناءاً على طلبي الى سفوح جبل جودي الأشم باحثاً عن مكان مدينة (قردا-قردو) فاكتشفها عند قرية (كرى جوليا) خلف مدينة (سلوبي) الحالية فهو اكتشاف أثري مهم جداً لانها لم تكتشف من قبل الرحالين ودائرة آثار تركية، واكتشف قلعة (برخو) في (جبل ديرا) شمال الجزيرة ، وكتشف نفقين صخريين ينزلان من القلعة العالية الى دجلة للتزود بالماء اثناء الحصار وللهروب منها عند الضرورة ولمآرب أخرى، وهما على اغلب الاحتمالات من العهد الأشكاني (الفرثي) في كردستان (127ق.م-227ب.م).

ثم اكتشف رسوماً ومشاهد في حوض ماء في قلعة باقي منها مشهد لقصة النبي يوسف على ماكتبه لي، واكتشف آثاراً أخرى منها رسوم بدائية في قرية (بابلا) الواقعة في غرب مدينة الجزيرة.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

اكتشف الملا خلف العظيم منحوتة ثالثة في (فنك) المدينة القديمة الواقعة على الضفة الشرقية لدجلة فوق الجزيرة في بوتان.

اكتشف قبر (له عليخانا كوفه لي) في قرية أروه القديمة (ئه روها كه فن) بالقرب من بلدة أروه (دهي) في أعالي بوتان وجمع روايات قصة الحب العذري بين هه سام ئاغا وله عليخان، وكان هذا من أعماله الطريفة، وطلبت منه أيضاً السفر الى منطقة مكس في جنوب (بحري وان) الى قرية (بيدار) لاستنساخ نسخة ديوان (ئاغاووكي بيداري) فسافر في وقت كانت الثلوج موجودة والبرد ديداً فمرض في الطريق واضطر الى الرجوع من بلدة (خه سخير) بين منطقة بوتان ومكس.

كان الملا خلف فقيراً من الناحية المالية مثلي، ولكن ايمانه بتاريخ وتراث شعبه وبانقاذ التراث أصلد من صخور بوتان. و لم أتمكن من شد أزره بمساعدات مالية حتى اذا كانت قليلة ولو كانت له امكانية مادية لقام بما هو أعظم وكان أحد أبناء المشاريخ ذوي الثروة القارونية يطري لي المديح في رسائله ولما أقترحت عليه مساعدة الملا خلف مالياً لجمع التراث قطع عني الرسائل.

جمع الملا خلف خلال عشر سنوات من الجهد الجهيد مقداراً كثيراً من التراث ما يربو على اربع آلاف صفحة، ولكن مما يذرف عيني هو أن المنون ضم قبره الى قبر والدته (به ری طاهر بافه لي) وزوجته (وه تحه محمد أمين سيرتي) في مقبرة الجزيرة شرقي قبر (مه م و زين) بدون ان يترك خلفاً في كردستان الشمالية يقتفى أثره في جمع التراث ويحمل رسالته فلو أمده الله بعقدين آخرين من العمر أوسخا بعقود لقام بالأمر العجاب.

**واذا المنيّة أنشبت أظفارها      أَلْفَيتَ كل تميمة لا تنفع**

لا اظن انه يوجد الآن في كردستان الكبرى له مثيل يقوم بتلك المهمة بذلك الاندفاع والاخلاص. كان المرحوم يرسل الي معلومات كثيرة في رسائله وأرسل الي ثلاثة عشر دفتراً مملؤة بجواهر التراث لكن رقابة الحكومة في دائرة بريد السليمانية أخفت عني خمسة منها فأعلمته أن يحتفظ بباقي الدفاتر عنده ولا يرسلها الي، وكان هدفه أن يرسل كلها وكل ما جمعه الي، فكأنه جمعها لي شخصياً كما كتب ذلك على كل دفاتره ولكني أكدت له مراراً أنها له وليست لي لأن عمله العظيم تجاوز حد المساعدة وأنه أصبح مؤلفاً وجامعاً للتراث مستقلاً، وإني لن أعتبرها لي حتى إني نشرت بعض ما كتبه الي في رسائله باسمه في بعض الجرائد وعندما اشتد عليه مرض الوفاة اوصى بارسال دفاتره الي فوصل الى يدي اكثر من أربعين دفتراً بينما وجدت الرقم



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

(81) و (110) على بعض دفاتره، وفي سفرتي الى كردستان الشمالية واستنبول بين عامي 1995-1996، زرت داره وأبناءه وسألتهم عن مجموعة دفاتره كاملة فقالوا لم يبق منها سوى ماوصلت الى يدك و لم نجد بين مخلفاته دفتراً آخر، ولا أعلم هل أنها وضعها في مكان آخر خوفاً من السلطات الحكومية أو انه كتب بعض الأرقام خطأً.

ملأ الملا خلف خمسيناً من اشرطة كاسيت من مقابلاته مع المغـــنين (ســـترانبيزان) بصورة عامة لتسجيل الألحان.

إن كل كلمة أرسلها الي أن هي إلا أمانة في رقبتي من الواجب علي الحفاظ عليها وإني أصبح سعيداً كلما نشر ما جمعه سطر واحد.

طلب مني صديقي الكاتب والشاعر النزيه صبري بوتاني ارسال مجموع مما جمعه الملا خلف وكان مقيماً في نرويج لنشرها فأرسلتها اليه مع صديقي السيد فيصل ســـواري الكاتب والشاعر، فأوصله الى يده ولكن توفي صبري في (25-10-1998)، هناك قبل أن ينشرها وتركت وفاته أثراً عميقاً في قلبي أيضاً.

**أخي دلاور زنكي**

لقد جمع خلف الباقي مقداراً جيداً من التاريخ الروائي (الـــشفهي) والفولكلـــوري لامارة بوتان كقصص واغان تعود الى عهد محمد بك بن شرف بـــك المتـــوفى ســـنة 1207هـــ ، ومير محه ما، ومير شرف، وبدرخان بك، ومير سيف ديـــن (ســـيف الدين)، و عزالدين شير....الخ.

منها حكاية خزيموك* (خه زيموك)، ومحمد به كى ميرى بوتان، ونيري عـــه فنـــو، ومحمد شاهى ميرى بوتان وعه يشا بيزار به كى المتكونة من النثر والـــنظم الكـــردي الشعبي وغيرها وهي جديرة بنشرها في كتاب مستقل باسم (التـــاريخ الفولكلـــوري لامارة بوتان)، وهي تقع في (963) صفحة مكتوبة بخط اليد.

* خه زيموك: يحتمل ان يكون خه زيموك من مقام خزام (هزام) من فروع سيكاه. في ص98 من كتاب نظرية الموسيقى العربية- حبيب ظاهر العباس 1986، وفي ص90 سلطاني خزام، وهو من فصيل السيكاه ومن الجنس الأول (سيكاه على سيكاه).



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Serpêhatiya Mele Xelef

Mele xelef li ser rûpelên defterên xwe nivîsiye (Ji bo seydayê min 'Ebdilreqîb), yanî linik xwe ev me'lûmatane bo min dinivîsîn, lê min kaxez jê ra nivîsî û got: (Ew tiştên te xirve-kirine ez razî nabim bo min bin, çunke ji wê derket û bûn gelek, û hemî yên te ne û ez razî nabim yek kelîma te ji bo xwe bibim). Çunke min ew êxiste îş û min tewcîha wî dikir, û min gelek kaxez jê ra rêdikir. Heta carek mele Xelef di kaxezeka xwe da bo min nivîsî û got:" Niho (814) rûper ji kaxezên te bo min linik min hene, û gelek jî windabûne". Her digot: "Ez çewa defterên xwe bo te rêkim"?. Min digot: Heta hemiyan fotokopî nekî yek kelîme bo min rêneke. Ne ku winda bibin yan bêne girtin. Çiku pênc defterên tijî ji babetên keleporê bo min rêkirin û gihiştibûne berîda Silêmaniyê. Lê Be'siyan teslîmî min nekirin, û çûn û çûn. Lê heşt defterên dîtir gehiştine destê min.

Di nexweşiya mirina xwe de wesyet kiribû; hemû defterên wî bo min rêkin û hemî gehiştine destê min û linik min emanetekî giran in, di destê min de. Mele Xelef (50) şerîtên tescîlê jî tijî kirine ji awazan, ji dengê stranbêjan û çavpêketin. Digel wan, ev e jî berhemeka pir biha ya şehsiwarê keleporê mele Xelef e.

Xelef xelkê gundê Bafê ye. Di bilindahiya hindava Dicle ji qeza Hezex linik bavê min mele Yûsif û linik mele 'Ebdilrehman ê Xendekî feqiyatî kiriye û kemek jî linik min xwendiye.

Li gundê (Stewrik) li tenişta Cizîrê bûye mele, û li imtîhana Ewqafê derbas kir û bû îmamê resmî li Cizîrê heta wefat bû. Destê wî di hûnandina şi'rê de jî hebû, û pir qesîdeyên wî hene, û nihînî jî xizmet bo



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Kurdan kiriye, û westan nedizanî. Li ser daxwaziya min çûye Xesxêrê; gundê Bêdarê di nêvbeyna Xesxêrê û Meksê da heta dîwana Axawokê Bêdarî linik neviyên wî peyda bike. Lê dunya sar bû û gehişte Xesxêrê û li wêdê nexweş ketibû û zivirî.

Mele Xelef kurê Remezanê Bafelî ji 'eşîreta Harûnan şehsiwarê kelepora me zêdetir ji çarhezar rûperan ji keleporê Xirvekiriye bi handan û rêpêşandana min ji sitran û metelok û serhatiyan, û ji hemî babetan û gelek behs û hikayetên Mîrên Bohtan jî navê gelek stranbêjan û behsa jiyana wan jî nivîsîne.

Feqehê min mele Xelef îşekî gelek mezin kir di mideha deh salan de. Lê mixabin di (31-5-1993) de li Cizîrê çûye rehmetê.

Di 18-11-1995 an de ez çûm ser qebra wî, û girîm, û tirba jina wî jî li tenişta ya wî ye. 'Umrê wî pêncî û du sal û pênc heyv bû. çend kur û kiçek paş xwe hêlane. Jina wî (Wetha) di 21-1-1992 an de wefat bû.

Bo cara yekê mele Xelef asarê bajarê (Qerd-Qerdû) dît. Di jêr çiyayê Cûdî, linik gundê (Girçûl), yanî ev gunde di nêv asarên wê de ye, û li keleha Se'îd beg*, yê li hindava Girçûl ne dûr e. Bi esil keleha vî bajarî ye (Qirda- Baqirda) wek di tarîxên 'erebî de hatibû navça rojhilata Dicle hatiye gotin. Yanî Botan û pêştir jî yanî pêş Islam jêra gotine (Kurdoyîn). Bazebida (Bazbida) bû rojavaya Dicle gotine ku merkeza wî gundî (Baziftê) bûye. Tu kes ji

---

*Se'îd Beg xalê Êzdîşêr bû. Şer digel Bedir-Xan kir û di Xabûr de hat kuştin. Ji mîrên Botan bû. Serincek linik keleha Se'îd Beg bi Qêrê hatiye siwaxdan, ev e jî girek kevnar e.

-Kurên mele Xelef ev in: Edîb, Bedridîn, Mes'ûd, Dostik, Sekvan, û Metîn.

-Kiçên wî ev in: Zibêda, Zînet, Le'lî-Xan,Sîver, pexşan, evîn û (Newze ?).

-Wîladeta mele Xelef 1-1-1940 î de bû. ('Ebdilreqîb Yûsif).



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

asariyan û gerok û mêjûvanan nezanîne (Qerd-Qerdû) yanî ev bajare li ku dê bûye, û min ji gelek kes dipirsî wek rehmetî seydayê min mele Mehmûdê Hoserî -miftiyê Cizîrê û herweha min ji mele Xelef dixwest vî cihî bidûzê. Wextê em pêkve jî çuwîn gundê Şaxê û du roj li ser asarên wê gerayîn. Di temûza 1997 an de jî min gelek ji xelkê pirsî nezanîn asarê Qerdê li ku dê ye. Lê paşî min mele Xelef ( ku ew jî wek min bû li diwîv tişta diket heta digehişte heqîqeta wê û westan nedizanî).Mele Xelef cihê Qerdê dît. Lê em jibîr nekin mele Xelef birek asarên dîtir jî iktîşaf kirine.

‘Ebdilreqîb Yûsif Zivingî
9-7-1996



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Mihemed Begê Mîrê Botan
# û
# ‘Efno û Hejale

Bo cara êkê, her ji devê hikayetbêjê delal, birader Yûsif Remezan lawê Bafê. Em dê dest bi hikayet û serhatiya Mihemed Begê Botanî bikin, û her ji bo xwendevanên delal, em dê bikin diyarî, her wekî çawa birader Yûsif Remezan her weha dest bi hikayetê dike û dibêje:

Hindêke Mihemed Begê bû, Mîrê Bota bû, û ew bixwe, kurê şah Mihemed Begê û ‘Eyşa Bêzar Begê bû.

Belê, piştî ku şah Mihemed Begê Mîrê Bota, çû rehmetê, her li dewsa wî, kurê wî, Mihemed begê, bû Mîrê Botan û ewî jî wekî babê xwe dem û dewrana hakimyeta xwe, di Cizîra Botan de bihurand.

Belê, nav û dengê Mihemed Begê li her cî û memleketan, belav bû, û her di memleketê Botan de, Mihemed Begê ji babê xwe, zêdetir ‘edalet û xweşî, li nava miletê xwe da, belav kirin. Belê her ji ber wê yekê, temamê ‘eşîr û xelkên Botan, his ji Mihemed Begê dikirin, û her di ciyê Botan de, kesek ne bû ku serê xwe, li ber Mihemed Begê Botanî, bilind bike, û her wextê, temamê xelkên Bota ri’ayeta emrê Mîrê xwe, Mihemed Begê qebûl dikirin, û daxwazên wî, bi cih, tanîn.

Her weha, dibê, piştî ku Mihemed Begê bû, Mîrê Botan, hingî, di Cizîra Botan de, du binemalên qedîm hebûn, ew herdû binemale yek jê, binemala Bêgo bû, û ya dî, binemala Zeydîn bû.

Belê, hindêke binemala Bêgo bû binemalekî xurt bû, mêrên wê binemalê pir bûn, goya, ku dibêjin,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

hemen hingî, Cizîra Botan li ser milê mêrên ewê binemalê, dihate ragirtin.. û mezinê binemala Bêgo jêre dihate gotin: Birahîmê Mendo.

Belê, hindêke binemala Zeydîn bû, bi nisbet binemala Bêgo, binemalekî ze'îf bû, ji ber ku mêrên wan, hindik bûn, û her ji ber wê yekê, her wextî, i'tîmada Mihemed Begê li ser milê binemala Zeydîn bû, yanî, wezîr û, berdevk û, xulam û xizmet-karên Mihemed Begê her jî, ji binemala Zeydîn bûn, belê, di Cizîra Bota de, her ji ber Mihemed Begê ti cara kesekî pê li perda binemala Zeydîn ne dikirin, û kesekî ne dişiyan, ku zulm û te'dayê li binemala Zeydîn bikin...

Belê, ji vir pêde em dê dest bi serhatiya Mihemed Begê bikin:

Dibê, rojekî Mihemed Begê li hespê xwe siwar bû, ew derkete nêçîrê, dibê, her li qontara çiyayê Cûdî bizineke pezkovî ji ber Mihemed Begê rabû, ew revî, belê du kehr li ber wê pezkoviyê bûn.

Dibê, Mihemed Begê her wisan bi siwarî da pê wê pezkoviyê. Belê, ew pezkovî zetim nekir. Lê, ew herdû kehrikên wê, girtin, ew her wisan sax, Mihemed Begê ew herdû Kehrik bi xwe re, ji çolê anîne malê, ew di malê de xudan kirin.

Heta sal qulipî sala dawî ew herdû kehrik mezin bûn, û Mihemed Begê gelek his ji ewan herdû kehrikan dikir, û her wextî sebra xwe, bi ewan herdû kehrikan tanî.

Dibê, piştî ku ew herdû kehrik mezin bûn, ew kedî bûn, Mihemed Begê rabû du toqên zêr xistin di ustuwê wan de, ew herdû li nava bajarê Cizîra Bota terxan kirin.

Belê, her bi fermana Mihemed Begê delêliyan bang hildêran, û gotin kesek ezyetê neghînin herdû pezkoviyên Mihemed Begê bila ew herdû pezkovî ji



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

bo rewşa bajarî, serbest bin, û eger ewan herdû pezkoviyên Mihemed Begê zerera hindek kesan, kirin, her bi serbestî û bi kêfxweşî bila ew kes werin, zerera xwe, ji Mihemed Begê bistînin.. her weha dibê, piştî ku delêliyan weha bang hildêran xeber gihişte her kesekî ji xelkê Cizîra Botan û her kes bi vê xeberê, kêfxweş û dilgeş bûn, her weha dibê, (xoyî) ewan herdû pezkoviyan her ewha bû, her sibe, herdû wê, derkevin nava bajarê Cizîra Botan û wê, li nava sikak û kolana, ew sûk û dikana, bigerihin, û xelkên Cizîrê her bi dilxweşî, wê ji bo xwe temaşeyî ewan herdû pezkoviyan bikin, û wê gelek bi rewşa ewan herdû heywanên delal, şa bibin.

Belê, ew herdû pezkoviyên delal her li ber dikana çi kesî, sekinîbane, û fîqîyî û tiştên kê bixwarana kesekî dengê xwe, li ewan ne dikirin, belê zêdetir, bi ewan kêfxweş, dibûn.

Dibê, gava ku dibû êvar, ew herdû nêriyên pezkovî wê werin malê.. yek jê, wê li ber serê Mihemed Begê mexelê, û yê dî, wê li ber piyê Mihemed Begê mexelê, û her wisan ew herdû heywanên delal, wê ji bo xwe bikayîn, heta ku dibû sibe.

Dibê, eger yek şevî bitenê jî ew herdû nêriyê Mihemed Begê ne hatibana malê, û li ber ser û piyê Mihemed Begê ne mexelî bana, ewê şevê xewa Mihemed Begê ne dihat. Hind Mihemed Begê mihla xwe dabû ewan herdû nêriyên xwe....

Weherweha, bi fermana Mihemed Begê (mîrê Bota) xulam û xizmetkaran xeber gihandine temamê ‘eşîretên Botan, ku kesek ezyetê nedin herdû nêriyên Mihemed Begê û gava ku hindek wextan herdû nêrî ji Cizîrê biderkevin çiya da ku ti nêçîrvan ewan ne kujin.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, dibê, gava ku hindek wextan ew herdû nêrî ji Cizîrê bi derketana çiyan, hêj ji dûr ve her kesî ew nas dikirin, ji ber ku her yek ji wan toqeke zêrîn di istuwên wan de bû, xiringe, xiringa, ewan herdû toqên zêran, di çû her di çû, her ji ber vê yekê, ew herdû nêrî biçana kîjan herêma Botan, xelkên Botan, gelek his ji wan herdû heywanên delal, dikirin û qedir û me'rîfetê wan dizanîn, ji ber ku, du heywanên weha rind û ciwan bûn, û kedî bûn, ji ber kesekî ne direviyan, û hêdî hêdî ji bo xwe, dimeşîn.

Belê, dibê, sitirhên yekê ji wan herdû nêriyan, hind mezin bûn, mîna hejên daran, bi ser herdû kamaxên wê de, dihatin xwarê wextê ku ew nêrî dimeşî her dibin herdû sitirhên xwe de dihejiya, her ji ber wê yekê, xelkên Cizîrê navê wê kiribûn Hejale, û ew nêriyê dîtir, sitirhên wê, ne hind mezin bûn, belkî 'adetekî wî hebû dibê, her sal, wextê ku dibû mewsimê fi'liyeta heywanê pezkovî ew nêriyê Mihemed begê, ji Cizîrê bi derdiket diçû çiyan dighişte pezkoviyan, ji bo fi'liyetê, û wextê ku mewsimê fi'liyeta pezkoviyan xilas dibû, carek dî, ew nêriyê Mihemed begê, dizivirî, ji çiyan dihate Cizîrê.

Her ji ber vê yekê, xelkên Cizîrê navê wê, kiribûn 'Efno ('efine, yanî, bi fi'le).

Belê, her weha, dibê, Mihemed Begê ma li ser keyf û dem û dewrana xwe, sal tê ve bihurîn, zeman bi ser ve hatin, heta ku Mihemed Begê yextiyar bû, û ew herdû nêriyê wî jî sere bûn, me'lûme, dibê, hindêke Mihemed Begê bû, 'umrê wî, di keyf û xweşiyê de, bihurî bû, ji ber wê yekê, ji wicûda xwe ve Mihemed Begê , betil bû, û zêde şîşman(qelew) bû.

Dibê, gava ku Mihemed Begê dimeşî, û bi hewayê Serbanê Kilyasê diket, kêlûwek pembo, dixistin diber



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

qermîçûnkê zikê wî de, heta ku bi hewayê Kilyasê biketa.

Dibê, piştî ku Mihemed Begê bi hewayê Serbanê Kilyasê diket, ew kêlûwa pembo diber qermîçûnkê zikê wî de, ji xuhdanê şil dibû.

Belê, radibû, ew kêlûwa pembo ji ber qermîçûnkê zikê wî, derdixistin û kêlûwek pembowê dî, li şûna ewê kêlûwa dî, didanîn.

Dibê, eger ne weha ba, qet'îyen Mihemed Begê idare ne dikir, hind şîşmaniya wî, zêde bû.

Dibê, Mihemed Begê di dawiya 'umrê xwe de, kopalekî hesin ji bo xwe çêkiribû, û her bi ewê kopalê hesin bi rêve diçû, ji ber ku, kopalên darî, xwe li ber Mihemed Begê ranedigirtin.

Dibê, rojekê Mihemed Begê ji Serbanê Kilyasê bi derênca de hate xwarê ew kopalê wî yê hesin, di bin de tewiya.

Belê, Mihemed Begê bi ser kopalê xwe de kete xwarê, pişta wî şikest.

Belê, gava ku Mihemed Begê kete xwarê û pişta wî şikest, hemen xelkê Cizîrê hemî bi hev re linik Mihemed Begê kom bûn, û rahiştine Mihemed Begê birin dîwanxana wî, li ser cê wî re dirêjkirin.

Belê, hindî hekîm û tebîb û textorên ku hebûn, ji bo Mihemed Begê peyda kirin. Belê ti çare li birîna pişta Mihemed Begê nekirin.

Belkî roj bi rojê, Mihemed Begê ber bi ecelê xwe meşî.

Dibê, rojekê binemala Zeydîn her bi tinê li dora Mihemed Begê rûniştin û daxwaza wesyetkê li Mihemed Begê kirin, û jê re gotin: “Mîrê min, dinya ji bo ti Mîr û hakiman ne maye, û miheqeq ji bo me jî namîne, vêce îro tu ji nav me biçî, em dê bimênin bê Mîr û serwer û em nizanin piştî te, ku em dê çawe



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

jîna xwe derbas bikin, her ji ber vê yekê, me divê ti wesyetkê û şîretkê li me bikê, da ku piştî te sebra me, bi wesyeta te, werê".

Dibê, gava xweş mêrên binemala Zeydîn, weha gotine Mihemed Begê , belê, her çendî rondik ji çavê Mihemed Begê hatine xwarê.

Belê, Mihemed Begê di bersiva wan de weha got:

"Ez dizanim ku ez ji nav we biçim hûn dê bimînin bê Mîr û serwer, û ez dizanim ku hûn jî di Cizîra Bota de binemalekî ze'îfin, ji ber ku mêrên we hindikin, û ez dizanim ku piştî min binemala Bêgo wê bibin serwerê we, û her binemala Bêgo wê, serwertiyê li 'eşîreta Botan tevî bikin, ji ber ku mêrên binemala Bêgo pirin û Birahîmê Mendo mezinê wa ye. Wellah eger ku Birahîmê Mendo zulm û te'daiyê li we nekê, xwe di cê Botan de, her ji bo xatirê me, kesek pê li perda we nakê, û qedr û me'rifetê we her wextê wê di Cizîra Botan de hebê.

Belê, eger binemala Bêgo pê li perda we bikin, xwe, zanibin ku qedr û me'rifetên we binemala Zeydîn wê di cê Botan de tunebê.

Her ji bo vê yekê wesyeta min li we binemala Zeydîn her ev e ye.

Emanet ev herdû heywanên me yên pezkovî, daxwaza min ji we binemala Zeydîn her ev e ye, ku hûn her wextê nûbedarê 'Efno û Hejale bin, da ku kesek wan nekujin. Heta ku ev herdû heywanên me yê pezkovî, yanî 'Efno û Hejale saxin xwe zanibin ku qedr û me'rifetên we binemala Zeydîn di cê Botan de, heye. Belê eger hindek kes evan herdû heywanên me bikujin, xwe hingê hûn binemala Zeydîn zanibin, ku ti hisabê we, di nav xelkê Botan de, nema ye, û kes êdî we nasnakin".



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, gava Mihemed Begê her weha wesyeta xwe li xweş mêrên binemala Zeydîn kir, di bersivê de, xweş mêrên binemala Zeydîn gotin:

”Belê Mîrê min, wesyeta te, li ser serê me. Belê me divê ku ev xeberdana te, linik xweş mêrên binemala Bêgo jî werê gotin”.

Dibê, hemen Mihemed Begê peyak rêkire pê Birahîmê Mendo. Belê, dibê, Birahîmê Mendo jî, bi xweş mêrên binemala Bêgo ve hemî bi hev re, hatine nik Mihemed Begê .

Belê, Mihemed Begê gote binemala Bêgo: “Ez hêvî dikim, ku hûn hemî, bi hev re heqê xwe li me helal bikin. Her wekî çawe, me jî, heqê xwe li we, hemiyan helal kiriye. Dinya ji tu Mîr û hakiman re nemaye û ji bo me jî namîne.

Dibê, gava Mihemed Begê weha gote xelkên binemala Bêgo, hemen di bersivê de, xelkên binemala Bêgo hemiyan bi hev re gotin: “Xweş helal bê Mîrê min”.

Dibê, hêj ji nû ve, Birahîmê Mendo gote Mihemed Begê : “Mîrê min, me divê, tu wesyetekê li me bikê, da ku piştî te, em wesyeta te, bi cih bînin”.

Di bersivê de, Mihemed Begê got:

“Wesyeta min li we, her ev e ye; emanet ev herdû heywanên me yên pezkovî, yanî emanet ‘Efno û Hejale da ku piştî me kesek wan nekujin, ji ber ku dilê me gelek bi wan ve ye, jîna me digel jîna wan derbas bûye. Vêce em dixwazin, ku ‘Efno û Hejale bi derba kesekî, newine kuştin. Hemen heta ku ew jî bi emrê Xudê mirî.

Dibê, gava Mihemed Begê weha wesyeta xwe kir, di bersivê de Birahîmê Mendo jî got:

“Belê, Mîrê min, wesyeta te li ser serê me”.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, dibê, her wusan ‘Efno li ber piyê Mihemed Begê mexeltî bû, û Hejale jî, li ber serê wî.

Belê, Mihemed Begê Mîrê Bota, ‘umr da hazir û guhdêra, û çû ber rehma Xudê. Sed hezar rehmet li Mihemed Begê Mîrê Botan bin, her weha, qey vê se’etê rehmetek divî bû.

Dibê, piştî ku Mihemed Begê (rih’) sipart, êdî çi bêjin, hemen hêstir ji çavê ‘Efno û Hejale de, hatin xwarê.

Belê, gelî xelkên Cizîra Botan li ser termê Mihemed Begê kom bûn, û şiştin û veşiştin.

Hindek hikayetbêj dibêjin termê Mihemed Begê Mîrê Botan her li Cizîrê li Mizgefta Serê Meydanê bi heq kirin, û hindek dibêjin, na, belkî termê Mihemed Begê her li Cizîrê li (Meqbera Mezin) bi heq kirin û veşartin.

Dibê, piştî ko termê Mihemed Begê bi heq kirin û veşartin. Dibê, Hejale gote ‘Efno:”Keko, bira, êdî ji îro pê de, sekena Cizîra Botan bi kêrî me nayê. Rabe em dê biçin çiyayê Botan ji vir pê de, li me heram bê ax û avên Cizîra Bota. Piştî Mihemed Begê Mîrê Bota em hew dizivirin Cizîrê. Cizîr bi kêrî me nayê’.

Dibê, ‘Efno û Hejale herdû rabûn milê xwe, dane hev, û ji bajarê Cizîrê biderketin, û li ava (şetî) derbas bûn, û çûne çiyayê Botan gehiştine heywanên pezkovî, û çûne zozana.

Dibê, her wusan ‘Efno û Hejale di nav heywanên pezkovî de ji bo xwe li çiyayê Botan digeriyan, û hindek wextan Mihemed Begê li bîra wan dihat û mihla Cizîra Botan li wan dixist. Dibê, di nav, navan re, ‘Efno û Hejale herdû wê ji heywanên pezkovî veqetiyên, û herdû wê werin çiyayê Dêra, û çiyayê Kêre, li pêşberê bajarê Cizîrê wê bikevin, û ji bo xwe li bajarê Cizîrê meyze bikin, heta ku bihna wan fereh



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

dibû, û her wusan, carek dî, ew herdû heywanên delal, wê bi şûn de bizivirin çiyayên Bota.

Dibê, wextê ku carna, û herdû heywan li hindek gundan rast dihatin, ji xelkê wî gundî ve, webû, ku Mihemed Begê ji Cizîra Bota, derketiye ref û nêçîrê, û wê se'etê, li wan, bûye mihvan. Hind kêfa wan ji 'Efno û Hejale re dihat, û bi xuya bûna ewan herdû heywanên delal şa dibûn.... Belê her weha.

Dibê, her wekî me gotî, piştî ku Mihemed Begê Mîrê Bota çû rehmetê her ji binemala Bêgo, Birahîmê Mendo bû, mezinê Cizîra Bota, û jêre hate gotin: Birahîm paşa û di Cizîra Botan de, Birahîm paşa dest bi hukumdariya xwe kir, û serwertî li temamê 'eşîreta Botan kir, û binemala Zeydîn jî, ketin di bin hukumdariya Birahîm paşa de. Belê.

Dibê, piştî ku ew sal qulipî sala dawî, dibê, rojekê Birahîm paşa mêrên binemala Bêgo û mêrên binemala Zeydîn hemî bi hev re, di koçk û dîwanxana xwe de ber hev kirin, û ji wan re gotin: "Ey gelî xelkên me, hûn dizanin ku her ji dewra bab û kalên me de heta wekî evê dewra me jî her di Cizîra Bota de, 'adetê Mîr û padişehên me ew bû ku her sal rojekî xelkên Cizîrê hemî bi hev re diçûne ref û nêçîrê. Vêce her wekî 'adetê wan em jî dixwazin, ku em hemî bi hev re sibehê, em biçin çiyayî, ref û nêçîrê.

Di bersivê de, xelkên Cizîrê hemîyan bi hev re gotin: "Belê".

Pane me'lûme ji hindikî, belkî, hezar û pênc sed mêr, ji qebîla binemala Bêgo, di Cizîrê de peyda dibûn.

Belê, binemala Zeydîn, qey çil-pêncî mêrên wan hebûn.

Dibê, çawe bû sibe, her binemala Bêgo, belkî pênc sed-şeş sed xweş mêrên binemala Bêgo xwe



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

hazirkirin ji bo ref û nêçîrê. Belê, her wusan ji bine Zeydîn şeş mêr bi tinê, ketine rex xweş mêrên binemala Bêgo. Û Birahîm paşa kete pêşiya wan û hemî bi hev re çûne Gelê 'Evdal Begê ji bo ref û nêçîrê.

Belê, hindîke xweşmêrên binemala Bêgo bûn, li hindirwê gelê 'evdal Begê belav bûn, ser û binê gelê 'Evdal Begê bi kozik û çepera xemilandin, û her çeperekê çar çar- pênc pênc xweşmêr di wan de rûniştin.

Belê, hindîke Birahîm paşa bû, digel pismamê xwe 'Evdilê Berfê bi sê-çar mêran ve, çepera xwe li binê gelî li ber rizdekê de çêkirin û têde rûniştin.

Belê, hindîke ew her şeş mêrên binemala Zeydîn bûn, xwe dane aliyê roavayî gelî.

Belê, hindêke 'Elo û Xelo bûn, herdû birayên êkûdû bûn, 'Elo birayê mezin bû, û Xelo birayê biçûk bû. Ji binemala mala Zeydîn ewan herdû bira yanî; 'Elo û Xelo, çepera xwe li raserî çepera Birahîm paşa çêkirin û têde rûniştin.

Belê, hindîke, herdû pismamên wan Reşîd û Xorşîd bûn, li alyê dî dê gelî, her li pêşberî çepera 'Elo û Xelo li serî hewalekî bilind de çepera xwe çêkirin û têde rûniştin.

Belê, hindîke herdû pismamên wan Xelo û Guro bûn, ewan herdiwan jî li alyê dî her li pêşberî çepera Xorşîd û Reşîd li serê hewalekî bilind de çepera xwe çêkirin û têde rûniştin.

Belê, hindîke Guro bû, mezin û serwerê binemala Zeydîn bû, û berdevkê Mihemed Begê bixwe bû.

Belê, dibê, mewsimê salê pêz bû, ketibû dawiya çirya paşî, wextê fe'lêta çewanên pezkovî bû, her ewan rojan 'Efno û Hejale ji zozanê jorî zivirî bûn û hatibûne herêma Herekola Mîra û her ewê rojê 'Efno



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

bizineke pezkovî ji nav pezkoviyan veqetandibû û her ji Herekola Mîra ‘Efno û Hejale li pê ewê bizina pezkovî dimeşîn heta ko ewê rojê hatine herêma gelê ‘Evdal begê.

Dibê, çawe nêzîkî li gelî kirin. Hejale gote ‘Efno: “Keko, bira em bi vê rêkê de naçin hindir wê geliyê ‘Evdal Begê Ji berko bihna barûdê li dev û pozê min dixê”.

Di bersivê de, ‘Efno got: ”Na bira, em dê serbest biçin, inşaallah xêre, tiştek wusan li pêşiya me tuneye”. Me’lûme ‘Efno li pê bizinê bû, terka bizinê nekir.

Belê, her wekî me gotî, piştî ku xweş mêran her di seranserî gelyê ‘Evdal Begê de çeperên xwe çêkirin, û her kesekê di çeperên xwe de rûniştin û her wusan bê deng her kesekê di hindava xwe de ji bo xwe guhdêrî li seyd û nêçîrê kirin.

Belê, her wusan ji nişkê ve di çepera xwe de Birahîm paşa meyze kir ku ev e ‘Efno û Hejale bi ser çepera wî de hatin. dibê Hemen Birahîm paşa pirsa xwe bi hevalê xwe ‘Evdilê Berfê kir û jê re got: ”’Efdile, ev e ‘Efno û Hejale bi ser çepera me de hatin, ku biya min bê em dê herduwan bikujin, û em dê îro goştê wan li vê derê bixwin”.

Dibê, gava Birahîm paşa weha got. Di bersivê de, ‘Efdilê Berfê got: ” Birahîm paşa çavê xwe veke ez dibêjim hindîke ‘Efno û Hejale in, herdû ziyaretin ji bo ‘eşîreta Bota, ji ber ku ‘Efno û Hejale herdû nêrîyên Mihemed Begê Mîrê Bota ne. Heger ku îro em pê li perda Mihemed Begê Mîrê Bota bikin, û em ‘Efno û Hejale bikujin, miheqeq em iflah nabin û her di Cizîra Bota de yeka biqewimê ku ti dewr û zemana kesî bi çavê xwe ne dîtî”.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, gava ‘Evdilê Berfê weha got, Birahîm paşa got: ”Wellah, bivê nevê, divê em ‘Efno û Hejale bikujin, ji ber ku heta em ewan nekujin em di ciyê Bota de xudan xeber nabin”.

Dibê, gava Birahîm paşa weha got, di bersivê de, ‘Efdilê Berfê got: ” De, nexwe tu dizanê”.

Dibê, Birahîm paşa di ser xwe re, li çepera jorî gazî ‘Elo kir. Di bersivê de, ‘Elo got: ” Çi ye Birahîm paşa”!.

Birahîm paşa got: ”Ev e ‘Efno û Hejale herdû bi ser çepera min de hatin. Em dixwazin ku em herduwan bikujin, û em îro her li vê derê goştê wan bixwin. Vêce hûn derbara vê yekê de, çi dibêjin?!”.

Di bersivê de, ‘Elo got: ” Birahîm paşa Wellahî hêj wesyeta Mihemed Begê li bîra me ye, goştê ‘Efno û Hejale ne laiqê devê me ye”.

Divê, gava ‘Elo weha bersiva Birahîm paşa da, hemen Birahîm paşa got: ” ’Elo wesyeta Mihemed Begê li bîra me jî ye, lê, ne, her ‘Efno û Hejale du heywanin ma qey ji bo çi ne?!”.

Dibê, hemen Birahîm paşa devê tifingê da singa ‘Efno û agir da tifingê vêre vêre ‘Efno di rizdê de anî xwarê û xûna ‘Efno bi tehtê de herikî.

Dibê, ewê bizina li pêşiya ‘Efno got:

” ‘Efno, ev xêr bû, çi qewimî?!”.

Di bersivê de, ‘Efno gote bizinê:

”Nêçîrvana derbek li min xistin, bi Xudê birîna min kûr e, pir xedar e”.

Dibê, gava ‘Efno weha got hemen bizinê xwe ji wê navê da alîkî.

Belê, Hejale jî li dewsa ‘Efno hat. Dibê, ‘Efno gazî Hejale kir û jêre got: ”Hejal, keko, bira Birahîm paşa ez kuştim. Vêce, ti jî, li dewsa min newe û xwe nêzîkî çepera Birahîm paşa neke, lê wê te jî bikujê”.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, gava 'Efno weha got. Di bersivê de, Hejale got:"

'Efno keko, bira, Wellahî min dît ku çawe Birahîm paşa ti kuştî û çawe xûna te bi tehtê de herikî. Vêce, ma ez dê çawe destê biratiyê ji hev biqetînim. Wellahî ez jî ê li dewsa te werim bila Birahîm paşa min jî bikujê û bela Xuda min jî tevlî xûna te bibê, û bi tehtê de biherikê".

Dibê, çawe Hejale weha bersiva 'Efno da vêre vêre, birahîm paşa tifingek berda wê jî û ew jî li serê bestê qulibande 'erdê.

Dibê, piştî ku Birahîm paşa 'Efno û Hejale herdû birîndar kirin. Dibê, carek dî Birahîm paşa gazî 'Elo kir û jê re got:

" 'Elo ev e min 'Efno û Hejale herdû birîndar kirin. Vêce, hûn jî werin wan serjêbikin".

Di bersivê de, 'Elo got:

"Birahîm paşa madem ku te herdû birîndar kirin tu bixwe here herdûwan serjêbike û ewan herdû toqên zêrîn jî bêxe sitûwê xwe de, Birahîm paşa, pane tu dizanê ku serjêkirina 'Efno û Hejale ji heddê me zêde ye".

Dibê, gava 'Elo weha bersiva Birahîm paşa da, hemen Birahîm paşa bi her çar- pênc hevalên xwe ve ji çepera xwe rabûn û çûne ser kelaşê 'Efno da ku wê serjêbikin.

Dibê, Xelo gote 'Elo: " Keko bira, tu hêj biçûkî, tu baş ne'elimî nîşangeha tifingê. Vêce ez ditirsim ku tu derba xwe li hedefê nexê. Hingî, wa bibê kul, û wa bimînê li ser dilê me. Belê, hindîke ez im, ez nêçîrvanê nikilê kewa me her li ber destê Mihemed Begê ez 'elimî me nîşangeha tifingê. Vêce ya qenc ew e ku ez berî te derbê bavêjim".

Dibê, gava 'Elo weha got, di bersivê de, Xelo got:



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

” ‘Elo keko bira, ku tu izna min bidê ez dê berî derbê deynim, da ku dilê min hênik bibê, hemen çi dibê, bila bibê û her çendî ez birayê te yê biçûkim. Belê, me’lûm e, ku lîstoka bi agirî karê biçûka ye”.

Dibê, gava Xelo weha got êdî xeberdan ji bo ‘Elo nema û ‘Elo got: ”Xelo, de nexwe bi agirî bilîze”.

Belê, her wekî me gotî, piştî ku Birahîm paşa bi her çar-pênc pismamên xwe ve çûne ser kelaşê ‘Efno .

Dibê, Birahîm paşa xencer ji ber xwe derxist û dest avête sitûwê ‘Efno û xencer da sitûwê wî.

Belê, serê wî jêkir, jênekir, vêre vêre, ji çepera jorî Xelo agir da tifingê. Belê, çi bêjin, vêre vêre, herdû lingê Birahîm paşa bi ser serê wî ketin û kelexê wî bi ser kelexê ‘Efno de qulipî.

Dibê, gava ev yeka he, qewimî hemen her çar-pênc pismamên Birahîm paşa yanî ‘Evdilê Berfê, û Şemdîn û Fendo û Xencer û Paço bi şûnde li xwe zivirîn. Belê, vêre vêre, her ji çepera jorî ‘Elo, Xelo, herdû bira bi hev re agir dane tifinga. Belê, ew her çar-pênc pismamên Birahîm paşa jî bi ser kelaxê Birahîm paşa û ‘Efno de qulbandin.

Belê, gava şerê giran dest pê kir Hejale li serê bestê ji kêr ket, qey Xudê goştê ewan herdû heywanên delal ne kiri bû nesîbê Birahîm paşa û xweşmêrên binemala Bêgo. Em nizanin ne suncê ‘Elo bû ne yê Xelo bû.

Belê, dibê, gava weha nalîn kete tifingên xweşmêrên binemala Zeydîn dengê tifinga bi seranserî gelyê ‘Evdal Begê ket. Belê her li dengê nalîna tifinga xweşmêrên binemala Bêgo hemî bi hev re ji kozik û çeperên xwe rabûn û bi ser çepera Birahîm paşa de hatin.

Belê, hê ji dûr ve gazî ‘Elo kirin û jê re gotin:

” ‘Elo, ew çi bû, dengê tifingên we hatin?!”.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Di bersivê de, ‘Elo got:

”Hindek rêwengî bûn li me qesidîn me û wan duhmekî suhbet me ji xwe re kir, û me armêncek ji bo xwe danî û me bi hev re çend tifing avêtine armêncê.

Dibê, gava ‘Elo weha got, di bersivê de, xweş mêrên binemala Bêgo gotin ‘Elo: ”Ew rêwengî bi ku ve çûn?!”.

Di bersiva wan de, ‘Elo got: ”Hemen wê li pêşiya we dimeşin pêşdetir herin hûn dê wan bibînin”.

Dibê, gava ‘Elo weha got hemen xweş mêrên binemala Bêgo pêşdetir çûn.

Belê, bi serî ve li ser koma termê kuştiyan rawestiyan. Belê meyze kirin ku ev e Birahîm paşa bi her pênc hevalên xwe ve wê li wê derê hatine kuştin.

Belê qey hêj ruh li paço wê mala Bêgo hebû. Dibê, ewan xweş mêrên binemala Bêgo gotine Paço: ”Ev kê hûn kuştine!?”.

Di bersiva wan de Paço got: ”Xuyaye ku Birahîm paşa ‘Efno û Hejale herdû kuştin. Belê, her ji çepera jorî ‘Elo û Xelo ewan herdû bira ew yeka qebûl nekirin û em hemî xistine ‘ewdîna ‘Efno û Hejal”.

Dibê, gava Paço weha got, hemen xweş mêrên binemala Bêgo di ser xwe re gazî ‘Elo kirin û jê re gotin: ” ‘Elo, xuyaye ku ew Birahîm paşa digel pênc xweşmêrên binemala Bêgo we kirine ‘ewdîna du heywanên çolê, belê, hûn jî qenc bizanin ku îro em jî ‘ewdîna xweşmêrên binemala Bêgo nehêline li ‘erdê”.

Dibê, gava xweşmêrên binemala Bêgo weha gotin, hemen ‘Elo û Xelo zend û bendên xwe kurt kirin, belê, ji çepera jorî herdu bira bi hev re agir dane tifenga xwe, ewan her sêsed xweşmêrên binemala Bêgo jî hemiyan bi hev re agir dane tifenga.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, xumîn û nalîn kete geliyê ‘Evdalê Begê ber û derbên ‘eyneliyan mîna tavê teyrokê bi ser çepera ‘Elo û Xelo de barîn.

Dibê, ji ber ku çepera ‘Elo û Xelo asê bû, xweşmêrên binemala Bêgo derb li wan nanîn û tiştek bi wan nekirin.

Belê, hindîke ‘Elo û Xelo bûn kit û matê mêran ji koma xweşmêrên binemala Bêgo dineqandin.

Her di şînga ‘ewilî de ji xweş mêrên binemala Bêgo termê çardeh mêran bi ser termê Birahîm paşa de qulibandin.

Belê, cihwar ji bo xweşmêrên binemala Bêgo ne hiştin.

Dibê, xweşmêrên binemala Bêgo li hev civiyan û ji hev re gotin: ” Hindîke çepera ‘Elo û Xelo ye, pir asê ye, em neşên derbê li wan bênin, ya qenc ew e, ku em hemî bi hev re hicûmatê bibin ser çepera Xorşîd û Reşîd û em ewan herduwan bikujin, û em dê ewan herduwan bikin ‘ewdiya Birahîm paşa.

Dibê, piştî ku xweşmêrên binemala Bêgo weha ji hev re gotin û vêre vêre hemiyan bi hev re hucûmat birin ser çepera Xorşîd û Reşîd.

Dibê, ‘Elo gote Xelo: ” Keko, bira tu li vir be çepera xwe bernede ez dê biçim xwe bi çepera Xorşîd û Reşîd ve ragehînim, daku xweşmêrên binemala Bêgo derbê li wan ne înin.

Dibê, Xelo ma di çepera xwe de û ‘Elo ji çepera xwe rabû û ber bi çepera Xorşîd û Reşîd çû.

Belê, hê ji dûr ve gazî Xorşîd û Reşîd kir û ji wan re got: ”Haya we ji we hebê, Birahîm paşa ‘Efno û Hejale kuştine, û me jî ‘ewdîna wan hilanî ye, ev e xweşmêrên binemala Bêgo bi ser çepera we de hatin da ku we bikin ‘ewdîna Birahîm paşa.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, gava 'Elo weha gote Xorşîd û Reşîd, di bersivê de, Xorşîd û Reşîd gotin de Xudê kerîm e, ji bo me û binemala Bêgo.

Dibê, her li dora çepera Xorşîd û Reşîd darên bot hebûn, yanî ew darên ku nava qurmên wan vala hebûn.

Dibê, Xorşîd û Reşîd ew darên bot ji bo xwe kirin çeper û di nava qurmên ewan daran de rûniştin û xweşmêrên binemala Bêgo bi ser wan de hatin.

Belê, Xorşîd û Reşîd bi hev re agir dane tifenga û xumîn û nalên kete gelî û şer giran bû.

Dibê, ji hindikî, bîst mêr ji koma xweş mêrên binemala Bêgo bi destê Xorşîd û Reşîd hatine kuştin.

Belê, koma xweş mêrên binemala Bêgo bi şûn de şikestin û bi ser çepera Xelef û Guro de hatin. Belê, Xelef û Guro herduwan jî bi hev re agir dane tifenga.

Dibê, hêj ji nû ve şer taze giran bû, û her ji xumîn û nalêna tifenga ser û binê gelyê 'Evdal Begê dihejiya.

Dibê, her çendî xelkên li dora herêma gelyê 'Evdal Begê li hewar û imdada şerê giran dihatin.

Belê, ji ber derbên tifengan kesekî ne dişiya ku xwe bidin hindirwê gelî.

Dibê, her weha şer dewam kir heta ku roj çû ava.

Belê, her bi destê Xelef û Guro jî bîst û pênc mêr ji koma xweşmêrên binemala Bêgo hatine kuştin.

Dibê em pir dirêj nekin her ewê rojê li gelyê 'Evdal Begê ji sed mêrî zêdetir ji koma xweşmêrên binemala Bêgo bi destê xweşmêrên binemala Zeydîn hatine kuştin.

Belê, her ji gelyê 'evdal begê, xweşmêrên binemala Bêgo şikestin û her bi şûn de bi ser Cizîrê de revîn û hatin.

Dibê, hêj ji nû ve ew her şeş xweşmêrên binemala Zeydîn yanî, 'Elo û Xelo, Xorşîd û Reşîd, Xelef û Guro



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

li serê hewalkî li hev civiyan û şêwir û mişêwiretê xwe kirin. Belê ji hev re gotin:

"Wellahî eger ku koma xweşmêrên binemala Bêgo bigehijne Cizîrê wê tofanî bi mirovê me de bînin. Divê em xwe bi wan ve ragehînin.

Dibê, her wusan xweş mêrên binemala Zeydîn şêwir û mişêwiretê xwe dikirin.

Me'lûme şev bû, tarî bû, her di wê gavê de, Guro destê xwe danî ser teraşkê bi emrê Xudê ji nişkê ve destê wî kete di devê marekî de, û marî bi destê wî veda. Belê, ji ber êşandina pêvedana marî dilê Guro bihurî û hişê wî çû.

Dibê, heta çi pir û muxdarê Guro li 'erdê ma dirêj kirî heta ku hişê wî hate serê wî.

Dibê, şikeftek li wê derê hebû. Hemen Guro gote her pênc pismamên xwe: "Min bêxine di evê şikeftê de û derê şikeftê li min dîwar bikin da ku kesek min nebînin, eger Xudê qedera min anîbê, xwe ez dê di vê şikeftê de bimirim û eger Xudê qedera min ne anîbê, xwe ez dê bi selamet bibim û rojekê ez dê werim bigehime we.

Dibê, gava Guro weha got, hemen pismamên wî rabûn Guro xistine di hindirwê ewê şikeftê de û derê şikeftê lê dîwar kirin û her pênc pismaman xwe bi rext û fîşekan pêçan û çek û silahên xwe hilanîn û mîna gurên dev bi xûn xwe di serê çiyayî de berdan û berbendî xweşmêrên binemala Bêgo hatin.

Belê, bi lez û bez pêşî li xweşmêrên binemala Bêgo sitandin, yanî xweş mêrên binemala Zeydîn berî xweşmêrên binemala Bêgo her di wextê sibehê re xwe bi nêzîkî dora Cizîrê ve ragehandin.

Belê, ewan her pênc xweşmêrên binemala Zeydîn meyze kirin ku temamên mêrên binemala Zeydîn her



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

ji bo şuxl û karê xwe hemî wê hatine nava rezên xwe û hemî wê bi şuxl û karê xwe meşxûlin.

Dibê, ‘Elo gote temamên mirovên xwe ey gelî xweşmêrên binemala Zeydîn hûn hemî bi hev re agehdar bin ku hindîke Birahîm paşa bû, li geliyê ‘Evdal begê, ‘Efno û Hejale her dem kuştin, û me jî ‘ewdîna herduwan bi destê xwe hilanî û me wesyeta Mîrê xwe Mihemed Begê bi cih anî. Vêce ev e hûn, ew, ev e xwe û mêrên binemala Bêgo....

Dibê, gava ‘Elo weha got hemen her çil-pêncî mêrên binemala Zeydîn dev ji şuxul û karê xwe berdan û hemî li hev kom bûn, û hêj ji nû ve hemîyan bi hev re şêwir û mişêwiretê xwe kirin. Dibê, rabûn çend mêr ji xwe rêkirin Cizîrê ewan her bi selametê ‘erz û ‘eyalê xwe ji bajarê Cizîrê bi derxistin, û hêj ji nû ve xweş mêrên binemala Zeydîn her di nava rezan de kozik û çeperên xwe çêkirin û mîna şêr û pilingan di kozik û çeperan de rûniştin.

Dibê, hêj ji nû ve koma xweşmêrên binemala Bêgo bi ser wan de hatin, û ji nişkê ve xweş mêrên binemala Zeydîn agir dane Mîratê şeşxana.

Belê, her di wê şînka ‘ewilî de ji binemala Bêgo, jimara termê Kuştiyan ji hisab ket. Ê ku hatine kuştin ji xwe hatin kuştin, ê ku mayîn bi ser bajarê Cizîrê de revîn, û hatin ketin, di hindirwê Cizîrê de.

Belê, xuya bû ku binemala Bêgo man di hindirwê bajarê Cizîrê de û xweşmêrên binemala Zeydîn bi ‘erz û ‘iyalê xwe ve mane bi derveyî Cizîrê û bûne mehkûm û firarê çol û çiyan.

Dibê, her çendî ji ewê rojê û pê de agirbes kete di mabeyna binemala Zeydîn û binemala Bêgo de. Belê kesek ji binemala Bêgo ne dişiyan ji hindirwê Cizîrê bi derkevin derve ji ber tirsa xweşmêrên binemala Zeydîn.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, her weha roj bi roj di herêma Bota de agirê fitn û fesadiyê di mabeyna herdû binemala de, hate dest pê kirin.

Belê, her wekî me gotî piştî ku her bi şev marî bi Guro vedayî û ew bixwe, bi tinê, mayî di hindirwê şikeftî de, bê ma ka halê wî bû çi.

Dibê, çawe ew şeva reş û tarî li Guro bû sibe.

Dibê, her ji wî gundê ku nêzîkî geliyê ‘Evdal Begê zelamek ji mala xwe bi derkete çiyayî û hate ser devê geliyê ‘Evdal Begê ji nişkê ve ew zelam diber derê wê şikefta ku Guro têde re bihurî belê dengî nal nala Guro ji hindirwê ewê şikeftê ber guhê ewî zelamî ket.

Dibê, hemen ewî zelamî rabû derê ewê şikeftê vekir. Belê mêzekir ku ev e xweş mêrên binemala Zeydîn, Guro ye. Marekî wê pêvedayî û nal nala wî ye, di hindirwê şikeftî de.

Dibê, ew zelam, zelamekî hekîm bû. Hemen bi lez û bez ew zelam ji şikeftê derkete bi derve, û li nav sera çiyayî geriya, hindek berkê têwriyan[1] berhev kirin û anîn dane Guro.

Dibê, Guro ew berkê têwriyan xwarin. Vêre vêre ishal ji bo Guro çêbû û hinavên wî çûn û vêre vêre

---

[1] - Têwrî: Têwrî hindek darikin li çiyayê Bota çêdibin. Berkên têwriyan mîna berkên belaloka ne. Wextê ku mirov ewan berkên têwrîyan dixwê, ishal bi wan çêdibê û heta ku dibêjin ew berkên têwrîyan dermanin ji bo pêvedana maran. (Xelef Remezan).

-Tevrî=tewrî=têwrî: Tevrî li zozana zor in. Darkê wê mezin nabin. Dibin qurs û belav dibin. Manga temûzê berkê wê sor dibin û nayên xwarin,. Tehl in, dermanê serêşê ne. Çend libekî mirov daqurtînê yan jî hişk bikê, gava serêş çêbe merov bixwe. Darkê tevrê Dermane bo êşa dewarê Sitewr, hêstir mehîn, hesp, gava berkê wê sor dibin çaxê şîrînbûna hingive. (Ehmed yûsif Hesen Zivingî-17-9-1994).



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

jehra marî dil û hinavê wî berda û Guro ber bi xêr bû.

Dibê, hemen sivik ew zelamê hekîm ji nik Guro zivirî û hate malê û gote diya xwe: ”Dayê sivik rabe, hindek zad û xwarin hazir bike da ku em ji bû xweşmêrên binemala Zeydîn, Guro re bibin. Ji ber ku Guro birîndar e, û wê di filan şikeftê de ye”.

Dibê, gava zelam weha gote diya xwe hemen sivik diya wî rabû hindek zad û xwarin digel cewdek av hazir kirin û ji bo Guro birin.

Belê, dibê, her weha heta çend rojan her di hindirwê ewê şikeftê de ewî zelamê hetim, hekîmtî li Guro dikir û diya wî jî zad û xwarin û av ji bû Guro dibir, û Guro di hindirwê ewê şikeftê de xudan dikir, bê ku kesek bi halê wan zanibê heta ku Guro baş bi selamet bû.

Dibê, piştî ku Guro bi selamet bû, ew jî hat gihişte pismamên xwe.

Belê hêj ji nû ve, ‘Elo digel çend xweşmêrên binemala Zeydîn çûne geliyê ‘Evdal Begê cendekên ewan herdû heywanên delal, yanî ‘Efno û Hejale bi axa welatî sitirandin.

Belê, şaxên herduwan, yanî sitirhên ‘Efno û Hejale bi xwe re anîn.

Dibê, her ji bo agahdariya bi wefata Mihemed Begê Mîrê Botan û piştî wefata wî her ji bo agahdariya, bi hal û wext û bi serhatiya ‘eşîreta Botan binemala Zeydîn rabûn şaxên Hejalî kirin diyarî ji bo xundkar û paşayê Sitenbûlê.. û şaxên ‘Efno jî kirin diyarî ji bo Mîrê Behdînan, yanî Mîrê Amêdiyê ...

Belê, her ji nû ve xundkar û paşayê Sitenbûlê, û Mîrê Behdînan zanîn ku Mihemed Begê Mîrê Botan çûye rehmetê û zanîn ku piştî wefata Mihemed Begê çi qewimîye di herêma Botan de.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, Mîrê Amêdiyê rabû sed mêrê qenc li hewar û imdada binemala Zeydîn rê kirine herêma Botan.

Dibê, çawe ew sed mêr gehiştine herêma Botan vêre vêre sulh û meslehet xistine di mabeyna binemala Zeydîn û binemala Bêgo de, û her bi fermana Mîrê Amêdiyê ji binemala Zeydîn ‘Elo xistine serwerê ‘eşîreta Bota.

Her bi vê çendê, hikayetbêjê delal birader (Yûsif Remezan) lawê Bafê dawî da hikayetê.

Rehmet li dê û babê guhdêr û cema’etê...

15-9-1982



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Agahdarî:

---

Em siyadeta xwendevanên delal agahdar dikin,ku piştî wefata Mihemed Begê Botanî, sitiranbêjê Mihemed Begê (Lavijê pîr), ev bi serhatiya Mihemed begê, her ji ewil heta bi dawî, bi sitiranî gotiye.

Belê, mixabin ku ev bi serhatî bi sitiranî her wekî (Lavijê pîr) gotî bi temamî linik ti sitiranbêjan nemaye. Belkî hindek ji serhatiyê bi sitiranî maye, ew jî bi wasîta sitiranbêjên ciyê Botan.

Belê, heta ev ro, me jî, çend kertik ji wê sitirana Lavij gotî me ji nik gelek sitiranbêjan wegirtiye, û me ji bo siyadeta (‘Ebdulreqîb Yûsif) kirine diyarî, û hê jî em dê hewil bidin da ku em hindek kertikên dî jî ji sitirana Lavijê pîr berdestê xwe bêxin, da ku ev bi serhatî her bi gotinên Lavij pir werê xemilandin. Ji ber ku li bîra me tê, ku wextê berya çend salan, Cemîlê Hafizê Cizîrî wextê ku ev bi serhatiya Mihemed Begê Botanî di nava civatan de digot û sitirana Lavijê pîr jî li nava serhatiyê dixist û hêdî hêdî ev serhatî hem bi hikayetî û hem bi sitiranî, bi dengê xwe ê melûl digot. Di nava civatê de rûndik ji çavê gelek evîndarên mîna me dihatin xwarê.

Belê, hikayetbêjê delal, di ewil hikayetê de got: ”Hindîke Mihemed Begê bû Mîrekî ‘adil bû. Belê, em jî dibêjin Mihemed Begê Mîrekî pir zalim bû, ji ber çend egeran”.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

## Agahdarî

Em siyadeta xwendevanan agahdar dikin ku ji evê bi serhatiya şerê binemala Zeydîn û binemala Bêgo hate zanîn ku serhatî li Cizîra Bota hate dest pê kirin, ew jî, li ser saxîtiya Miheme Begê Botanî.

Belê, piştî wefata Mihemed Begê şerê ewan herdû binemalan li ser kuştina 'Efno û Hejale her li geliyê 'Evdal Begê qewimî.

Belê, hikayetbêjê hikayetê birader Yûsif Remezan ji bo me got:

"Her li gora ku me bihîstî geliyê 'Evdal Begê dikevê Herêma Sindiyan. Belê, me ji gelek zana û rîsipiyên xelkên dora Cizîrê pirsyarî kir. Belê, ewan jî ji bo me gotin; ku geliyê 'Evdal Begê dikevî herêma 'eşîreta (Sindîyan).

Belê, gelek ji hikayetbêj û zana û rîsipiyên dora herêma Cizîrê dibêjin her li gora ku me bihîstî û em dizanin, şerê binemala Zeydîn û binemala Bêgo li ser kuştina 'Efno û Hejale li herêma çiyayê Cûdî û li geliyê Şaxê qewimî ye. Her çendî hikayeta ewî şerî bi navê li geliyê 'Evdal Begê tête gotin. Belê, geliyê Şaxê jî dikevê aliyê roavayî gundê Şaxê û gundê Ziyaret.. û dibê ku heyamê berê ji geliyê Şaxê re jî hatibû gotin geliyê 'Evdal begê.

Belê, em siyadeta xwendevanan agahdar dikin ku di sitiranekê de navê Conî tê gotin her wekî çawe sitiranbêj dibêjê: " Êvara xwe tavêjê pala (Conî).

Belê, Conî navê Gundekî xirabe ye, ew gundê Conî dikevê di hindirwê geliyê Şaxê de, û niha jî xelkên gundê Şaxê û xelkên gundê Ziyaret jî ewî gundê xirabe re dibêjin Conî.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, bi zimanê xelkên Goyan, Con bi me'na berek, herwekî tê gotin xwe davê Conî, yan wî Conî, yanî xwe da vê berkê, yan wê berkê.

Belê, ez dibêjim peyva Conî, ji peyva co nîvî ye. Yanî (Co) di nîvî re tê kêşan, û di navê re kişandî ye.

Derê Siyarê: Neqebekî fereh e. Dikevê dawiya çiyayê Dêra, aliyê roava, û li hindava keleha Finik, û li raserî gundê Finik bixwe. Belê, rêka 'amê, her ji gundê Finik di Derê Siyarê re, di bihurê diçê gundê Şerefîyê, navê Derê Siyarê di sitirana Heyran de tê...

Belê, di sitirana (Seydiko) de jî ku sitiranbêj dibêje: "Gelî bira, çûm gelî gelî li min cewab da, Hejalekî nêrîya(Çêlê bi Xiram) li xwe bada. Meqsûda sitiranbêj bi gotinê (geliyê Finik)e.. û (Çêlê bi Xiram) navê çiyakî mezin e. Ew jî dikevî dawiya Geliyê Finik li tenişta Derê Siyarê.

Terezin: Terezin navê wan kevanên ku dikevin serê çiyayên bilind. Yanî ji gerdena çiyayên bilind re tê gotin (Terezin).

*Ji gotinkê pêşiyan:*

"Ewê ca**ş** e, ji bo mirinê ba**ş** e".



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Sitirana ‘Efno û Hejale

Agahdariyek

Ji bo siyadeta we ya pak û hêja, hêvîdarim ku her wextê hûn hewedarê qelema me bin, da ku em bi hev re bigihine amanca xwe.

Ev çend girtêkên jêrîn ji sitirana ‘Efno û Hejale in. Hêvîdarim ku hûn evan girtêkan jî her li nava girtêkên sitirana ‘Efno û Hejale bixin. Ta em bigihin binyata sitirana ‘Efno û Hejale, û paşê hûn dê temamê girtîkên sitirana ‘Efno û Hejale her li gora binyata sitiranê, hûn dê ji aliyê xwe de tertîbatê bikin girtêkên sitiranê evê yekê jibîr nekin.

(Lavij) dibê, hey li min,
‘Efno, ban dikir Hejalo, em dê bimirin,
Me ne dê ye, me ne bab e
Me ne dê ye, me ne bab e
De, emê rabin herin, cem Mihemed begê, şêxê nêçîrvana
De, em bêjin eger hûn goştikê me biha nekin
Sitirhê me bikin cenbiyê pira ne
Wey dilo xirabo, ez pîrbûm, ti pîr nabê.

Hey li min dibê
Ezê, ti çepera nahebînim, ji xeyir çepera bi darkevot
De, min dî berkê şeşxana jê difirin
Kit bi kit e, cot bi cot e,
De, min heyfik û mixabin e, Mihemed Beg şêxê nêçîrvana
Nesax e,
Ji loma ‘Efno kuştin e, Hejale birîndar e
Maye li Hewlê Kulot e



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

De, ezê ti Mîr û hakiman nahebînim
Ji xeyir Mihemed Begê hakimê Cizîra Bota
Wey dilo xirabo, ez pîr bûm, ti pîr nebê

Her li min, dibê
Wey nêriyo, xirabo, nêriyê li wê latê
Li te devçîra te, li çirava rengîn e,
Delav û av vexwara te, li serê kelha Bikatê
De, min heyfik û mixabin e, Mihemed Beg şêxê nêçîrvana
Nesax e.
Ji loma 'Efno kuştine, Hejale birîndar e
Li hêviya vê sibatê..
Wey dilo xirabo, ez pîr bûm, tu pîr nebê

Hey li min dibê
Wey nêriyo, xirabo, li te wê deling hilmiştî,
Wey, delav û av vexwera te, li kelha Bikatê
Mexel û pişteroja te, li bin berê qelêştî
Min heyfik û sêsed mixabine, Mihemed begê, şêxê nêçîrvana
Nesax e,
Ji loma 'Efno kuştin e, Hejale birîndar e
Li Hewlê Kulot maye ne kuştî.
Wey dilo, xirabo, ez pîr bûm, ti pîr nabê

Hey li min dibê
Wey 'Efno ban dikir Hejalo !
De, ezê li çiya difikirim, çiyak û damayî,
De, ezê li Cizîra Bota difikirim
Xwe li heşiyê û reşiyê dayî,
De, min heyfik û sêsed mixabine,Mihemed Beg şêxê nêçîrvana
Nesax e
Ji loma Hejale di nav hevoriya de mayî,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

De, eger hûnê bawer nekin
Herin meqbera Mezin, li qebra Mihemed Begê meyzênin,
Bistik û dulqê nêçîrvana bi taqê kêlî hildayî
Wey dilo, xirabo, ez pîr bûm, ti pîr nabê

Hey li min dibê
Wey de minê tifengek divê ji dest xetê tifenga
Mihemed paşa yî
De minê conîkek derman divê, ne kutayî
De, belê, du ‘aşiq û du me’şûqa
Bi hev re lê dayê
De, emê biçin serê Hewalkê Bilind
Emê pêşve berdin Hejalekî ji vayê dinyayê mayî
Wey dilo xirabo, ez pîr bûm , ti pîr nabê

Her weha...



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê,

Hêvîdarim ku hûn baş agahdar bin ku ev herdû girtîkên jêrîn, ji sitirana bi serhatiya Lavijê pîr in.

Belê girtîka pêşî, her di wextê ku Lavij ji çolê ve hatî, û çûwê serbanê xanî, nik zavayî û li ser ferşî rojnê rûniştî û paşê ewan lawên li dora zevê, wextî ku teklîf li Lavij kirî, û jê re gotin: “kure Lavij ya te ye û di vê tu lavjikê ji bo me bêjî”.

Di bersiva wan lawan de Lavij destê xwe xiste dibin guhê xwe de û ev girtêke weha got:

Wey de ezê li dinyayê gerya me kesekî ez ne hebandim
De, ezê linik şêx û pîr û mela gerya me
Kesek xemê dilê min ne revandin
Darikek heye li serê Hewalê Bilind
Ne di wextê xwe de, pelê xwe diwerandin.

Ezê girtêka dî jî Lavij in her di wextê ku Mihemed Begê teklîf li Lavij kirî, û jê re gotî:

“sitiranekê ji bo me bêje”. Di bersivê de Lavij gotî: ”Şevî çiriya dirêj in”.

Û paşê jî ev girtêke jî got:

“Wey de ezê li dinyayî gerya me dinya li min betal e
Serê Hewalê Bilind girtîne mij û mûran e
Newalê Kûr, li ber xwe tînin qirş û qal e
Ez çibikim kejkola min û Mîrê min ma vale.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Agahdarî

---

Em bi siyadeta xwendevanê hêja didin zanîn ku hindîke çiyayê Dêra ye mesaheta dirêjiya wê pazde k.m heye teqrîben. Yanî dirêjiya çiyayê Dêra her ji astinga Qesirka Gelî dest pê dike, û ber bi alê rojava ve, dirêjiya wê, berdewam dikê, heta ku dighêjê hindava kelha Finik û Derê Siyarê û gundê (Şerefî)yê.

Belê, li dawiya çiyayê Dêra, yanî li hindava Derê Siyarê bi qederê Pênc k.m, nêzîkî gundê (Şerefî)yê, latekê mezin heye ji ewî latê mezin re dibêjin (Çêlê bi Xiram).

Belê, Lavijê pîr kurê xwe Seydiko her li ber ewî (Çêlê bi Xiram) kuştiye. Yanî bi serhatiya lavijê pîr ew kurê wî Seydiko her li ber (Çêlê bi Xiram) qewimî ye. Her wekî çawe ev xebera rast û durist her ji devê birader (Sofî Ehmedê Şerefî) me wergirtiye. Belê, birader (Sofî Ehmedê Şerefî) ‘umrê wî ne kêmtirîn ji heftê salî ye, û birader (Sofî Ehmed) dibêjê: “ (Çêlê bi Xiram)dikevê dawiya gelyê (Finik) li hindava (Derê Siyarê).

Gelî bira çûm gelî, gelî li min cewab da
Hejalekî nêrî ya (Çêlê bi Xiram) li xwe bada.

Ji gotinokê pêşiyan:

( Du jintî pir çetin e,
yek jê cin e, yek jê hesin e )



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

## Sitirana ‘Efno û Hejale

Bo cara diwiyê, em dê van çend kertikan ji sitirana ‘Efno û Hejale ji bo xwendevanên delal bikin diyarî, ji ber ku dibê ev çend kertik cara ‘ewilî, ber destê xwendevanan ne ketibin.

Belê, em hêvîdarin ji xwendevanên delal, ku her li gora hikayetê tertîbatê bidin evan ketikên sitiranê di nivîsandinê de..

Wey de, ezê ji hisabdara bipirsim
Niza çi (çirî) çûne, çi mane.
Hin dibêjin çiriya ‘ewilî xilas bûye
Çiriya paşî, sê şev û
Sê rojê jê mane,
De, hûn cewabikê bidin Resûlê Findikî
Bila dermanê xwe bikutê
Berê xwe bihelînî
De çawe îro heft şev û heft roj e,
Li serê hewalî bilind
Çavê ‘Efno û Hejale mane li pê wara ne,
Wey mala min , hey lavij,
Wey dilo, xirabo, ez pîr bûm,
Niza çima ti pîr nabê!.

Wey de, ezê vê sibê çiqa
Li dinya difikirim, dinya li min
Bûye segurî,
Li te qentarê kulan û xema, li ser
Dilê gul cebirî,
Ezê xizmeta tu Mîr û hakiman nakim,
Ji xeyrî xizmeta xundkarê dînê Islamê,
Şah û padşah yê me’zûl kirî



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Wey dilo, xirabo, ez pîr bûm
Niza çima ti pîr nabê!.

Wey de, ezê ti çepera nahebînim
Ji xeyr çepera bi darkevot e,
De, berkê şeşxana jê difirîn
Kit bi kit e, cot bi cot e,
De, ezê xizmeta ti Mîr û hakiman nakim
De, piştî Mihemed Begê hakimê Cizîra Bota,
Dibê, wey dilo, xirabo, ez pîr bûm
Niza çima, ti pîr nabê!.

Wey de, ezê ti çepera nahebînim,
Ji xeyr çepera sitowê şikêra,
Mihemed Begê dihat û dibûrî
Koma xulam, xizmetkara, vêre
Min hingî dizanî Mihemed Beg serekê
Nêçîrvana namînê,
Wextê Hejalê mezin kuştin,
Şaxê wî, rêkirin, ji Mîrê Amêdiyê re
Dibê, wey dilo, xirabo, ez pîr bûm
Niza çima ti pîr nabê..!

Wey de, ezê ti çepera nahebînim
Ji xeyr çepera li ber dolê,
Berkê şeşxana jê derdiketin
Kit bi kit, tol bi tol,
Nêriya xweyê xwe tavêtin
Serê zozanê jorî
Mexela xwe tavêtin serê kopê
Here kolê
De, bila xudê xerabikê mala Birahîmê Mendo,
De, çawe serê Hejalê mezin jêkirî
Şaxê wî rêkirin ji bo,
Xundkar û paşayê Sitenbolê



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Wey dilo, xirabo, ez pîr bûm,
Niza çima ti pîr nabê!.

Wey de, xudêkî, wextê ez bimirim
De, hûnê min nebin nava ti miriya,
De, hûnê tirbka min çêkin
Li ser girê (Qernaûsê),
Li gelyê ‘Evdal Begê pêşberî sê geliya,
De, qene serê sibeha li min xweş bê
Dengê şeşxana Mihemed begê,
Qerpe qerpa şaxê pezkoviya re, van nêriya,
Wey dilo, xirabo, ez pîr bûm,
Niza çima ti pîr nabê!.

Wey de, hewarek ketibû li geliya
Ez nizanim çi hewar e,
De, hin dibêjin ew dengê zirav kê bû
Hin dibêjin ew dingê tifenga
Baş huqedare
Wey li te ‘Efno kuştine,
Hejalê mezin, li ser Çêlê Serê
Bestê birîndar e,
De, nêrîyo bandikir pîrebizinê
Ez ‘Evdalê Xudê, birîndarê
Tifenga mezin im,
Welle birîna min ‘Evdalê Xudê
Kûr e pir xedar e,
Wey dilo, xirabo, ez pîr bûm,
Niza çima ti pîr nabê!.

Wey nêrîyo, xirabo,
Li te û vê rihdênê, li vê dîmaxê,
Li te, (devçêra) te, li çirava rengîn e
Av vexwera te, li gelê Şaxê,
Yeqîna dilê min ew e, Mihemed Beg,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Şêxê nêçîrvana, namînê,
Ji loma 'Efno kuştine,
Piştika wî dane kendalî axê
Wey dilo, xirabo, ez pîr bûm,
Niza çima, ti pîr nabê!.

---

*Ev gotinên Lavij her bi dengê hunermendê delal Cemîlê Şernexî, me ber destê xwe nivêsandiye.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Sitirana Lavij* derbara mirina Mihemed Begê Mîrê Botan de

Hey hey hey hey, kuro malê
Wey lê, nêçîrvano nêçîrvanê
Li min tinê, hey lo lo,
Wey babo, nêçîrvanê li min tê,
Ey lê belê, tê xwe tavêjê
Çepera Mihemed begê
Wey wey babo pêşberî vê divinê,
Wey lê, nêrî sê denga
Banîdikê pîr e bizinê,
Wey lê, Mihemed Begê şêxikê nêçîrvana,
Kete tayika vê mirinê,
De, rabe emê govendekê
Girêbidin, rast û çep bikevênê,
Hey hey, babê mino
De, ji nûka Lavij devê tifengê
Danî ser qulinca nêrî
Wey babo, pîr e vê bizinê,
Wey dilo, xirabo,
Wey lê, ez ‘Evdalê Xudê pîr bûme,
Wey babo, dilikê mala xwey şewitî pîr nabê
Hey hey hey, kuro malê
Wey lê, ez ‘Evdalê Xudê îro
Ezê bimirim, hey hey lo lo,
Wey babo, hûnê min nebine
Nav ti miriya,
Ay lê, belê, hûnê tirbika min çêkin

* Ji sitiranê tête zanîn ku Mihemed Beg di (Medresa Serê Meydanê) de hatiye veşartin. Yanî tirba wî li wê dê bûye. Lê ji sitiranek ya dîtir têye zanîn ku gora wî di nêv (qebristana Mezin) da bûye, di nîvbeyna bajarê Cizîrê û Surhê de. Mirina Mihemed Beg li salên xilasiya sedê hejdehê da bû, û tarîxa mirina wî linik me heye. (‘Ebdilreqîb Yûsif).



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Li geliyê ‘Evdal begê,
Wey babo, raserî her şeş geliya,
Wey babê mino
De qene sehera serê sibê
Li min xweş bê dengê top û
Şeşxanê Mihemed Begê Mîrê Bota,
Hey lo lo,
Na Welle pelqîna sitirhê pezkoviya
Wey dinyayê pûçikê betalê
Wey babo ji keskî re nemayê,
Wey dilo, xirabo, ez ‘Evdalê Xudê, pîr bûme
Wey dilikê mala xudî şewitî qet pîr nabê.
Hey hey hey, kuro malê
Wey lê, ez ‘Evdalê Xudê
Li van geliya difikirim,
Wey babo ezê nizanim çi hewar e,
Ay lê, belê hinekê dibêjin
Dengê zirav kê ye,
Wey lê, de, hin dibêjin
Dengê tifenga başhuqedare,
Hey babê mino,
Wey lê, xudêkî birînê min ‘Evdalê Xudê pirî pir xedar in,
Hey lo, lê ji loma ji ber birînê xwe dinalim
Wey wey dilo xirabo,
Ez ‘Evdalê Xudê pîr bûme
Wey babo, dilikê mala xwey şewitî pîr nabê.
Hey hey hey, kuro malê
Wey lê, nêrîyo hey lo lo
Nêriyê deling hilmiştî,
Ay lê belê, avmijxwera te çirav e,
Wey wey babo,
Çêrexwera te li bin berê qeliştî
Hey hey, babê mino,
Wey lê, min heyfik û sêsed mixabina me tê heyfê



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Fi'let 'Efonî bavêjê nêriya
Wey wey babo, bimênin nekuştî
Wey dinyayê, bes bike bilezîne,
Wey lê, axretê li bîra xwe bîne,
Wey lê, dinya pûçik û betal e,
Wey babo ji keskî re namîne,
Hey hey hey, kuro malê,
Wey lê, gelek nêrîyo, hey lo lo,
De were li min û vê dimaxê,
Wey lê, avmijxwera te çirav e,
Were, çêrexwera te, li gelîkê,
Şaxê*, hey hey babê mino,
Wellah min heyfik û sêsed mixabin e,
Mihemed Begê şêxikê nêçîrvana bimirê,
Îro serkê sê rojan û sê şevan e,
Li şehrê Cizîra Bota
Li mizgefta Serê Meydanê
Wey babo, li wê dê piştika xwe
Bidê Kendalî axê,
Wey gelî kekan û birano
Xudêkî dev ji axretê Bernedin
Wey babo, dinya pûç û betal e.

Ji gotinê pêşiyan:
(Ava xwestî, naçê hestî)

---

*Belê, ev her pênc kertik ji sitirana lavij, ya ku (Lavij) derbara mirina Mihemed Begê de gotî her weha hunermendê delal (Cemîlê Mihê) ji bo me kire diyarî. Zor sipas.

---

Geliyê Şaxê: Geliyekî dirêj e, ji bakur ve ji nik (Goran deştê) dest pê dike heta bajarê Şaxa Hekariyan. Rûbarek di gelî de heye, û geliyekî meşhûr e. Befir rûbarî da heta heyva temûzê li hindê cihan keviyên berfê wek piran li ser rûbarî çêdibin. Çend carek di vî geliyî da dahatim û çûme.

**(Ebdilreqîb Yûsif).**



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Şêxiko malo

Ev kertik jî, ji sitirana (Şêxiko malo) ye.

Wey wey, wey wey, wey wey,
Kelha Finikê li min ber bi ba ye,
Wey lê, ribatê dixwînê, celabê pêveda ye,
Wey lê, xudêkî hûnê Şêxiko malê min nekujin, lê,
Weyla li min nemayê, tavê minê bi wî ve ma ye,

Wey wey, wey wey, wey wey,
Kelha Finikê li min, bi sinsil e,
Wey wey, Berzanê Sitiyê miqabil e,
Wellah evînîka Sitiyê û Şêxiko malê minê ji ‘eşq û dil e,

Wey wey, wey wey, kewgîrvano,
Wey wey, kewgîrvano, kewgîrvanê Mîr e,
Bi şevê nekiriye ra û tedbîr e,
Bi rojê bûye girtî û êsîr e.

Ji gotinê pêşiyan:

Nimêj oxirî, xweyî xusirî
‘Erd milk e, xweyî hebê hilke
Dinê ji xwe re neke mal e
Da tû nebê ji ‘aqil vale



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Şêxiko Malo

Me serhatiya Şêxiko malo, û sitirana wî, her ji devê hikayetbêj û sitiranbêjê bi nav û deng ('Elî-Xan Silhan Saroxan) lawê Sihrî wergirtiye.

Her wekî çawe birader 'Elî- Xan dibêje:

Hindîke Şêxiko Malo bû, kewgîrvanê Mîrê kelha Finik bû, û kewgîrvanê wekî Şêxiko Malo çeleng û bi kêrhatî, di herêma Bota de peyda ne dibûn, û Mîrê kelha Finik gelek his ji kewgîrvanê xwe Şêxiko Malo dikir. Her weha.

Dibê, her di nava kewên Şêxiko Malo de ribatekî wî hebû, navê wî ribatî (Keçelê Şemê) bû.

Dibê, gava ku Şêxiko Malo diçû çiya (kewgêrvanî)yê ew êvara dihate mal û kewên xwe bi taqê dîwarê qesrê ve di daliqandin..

Dibê, wextê ku dibû wextê (şîvdesta) kewa, her bi taqê qesrê ve (Keçelê Şemê) dixwend, û li dengê wî Şêxiko Malo ji xew hişyar dibû, û dirahişte kewên xwe, ew diçû çiyayî, kewgîrvaniyê. 'adetê wî weha bû.

Dibê, şevekê Mîr gote Şêxiko Malo:

"Min divê sibehê, tu herê (çiyayê Çiravê) kewgîrvaniyê, û du kew ji kewên çiyayê Çiravê tu ji bo min bînê".

Di bersivê de, Şêxiko Malo got: "Bila Mîrê min".

Her weha.....

Dibê, cariyek ya Mîr hebû, qey ew cariye li bayê Şêxiko Malo bû.

Dibê, çawe bû wextî razanê, Şêxiko Malo rabû ji dîwana Mîr biderket û qista oda cariya Mîr kir.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, piştî ku Şêxiko Malo çû hindirwê oda cariyê, ewî, û cariyî têr keyf û henek ji xwe re kirin.

Belê herdû bi xew ve çûn.

Dibê, çawe bû wextê şevdesta kewa, sibe nêzîk bû. Belê Keçelê Şemê bi taqê qesrê ve, xwend û bû qeb qeba wî, û xwendina xwe zêde berdewam kir.

Belê Şêxiko malê di xewa şîrîn bû, ji xew hişyar nebû.

Belê, hindîke Mîr bû, li dengî Keçelê Şemê hişyar bû.

Belê, piştî ku Keçelê Şemê xwendina xwe bizêdayî berdewam kir, Mîr ji xwe re got: Ev çi bûye, Şêxiko Malo maye di xew de, û ji xew hişyar nabê.

Dibê, hemen Mîr her bi tinê rabû qista cihkê Şêxiko Malo kir, û çû, meyze kir ku Şêxiko Malo wê ne li ser cihkê xwe ye.

Divê, hemen zenna Mîr xirab bû.

Dibê, Mîr rabû qista oda cariya xwe kir, û çû derê odê, meyze kir, ku Şêxiko Malo wê, di berê cariyê de razaye.

Dibê, hemen Mîr dengê xwe nekir. Her wisan bê pêjin Mîr rabû, kitek sola Şêxiko Malo xiste di lingê xwe de, û kitek sola xwe, danî şûna wê kita sola Şêxiko malo, û Mîr bi şûn de zivirî oda xwe.

Dibê, piştî hinkî, Şêxiko Malo ji xew hişyar bû, meyze kir, ku Keçelê Şemê wî dixwînê.

Belê, wextê wî jî, wê bi derengî ketî. Dibê, hemen Şêxiko rabû, cilkê xwe li ber xwe kirin, û dest avête pêlava xwe, da ku bêxê lingê xwe. Belê meyze kir ku kitek sola Mîr wa li wê dê ye, û kitek sola wî ne xwiya ye.

Belê, her bi vê yekê, Şêxiko Malo zennî ku Mîr bi halê wî agahdar bûye.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê Şêxiko Malo nemerdî nekir. Hemen ew kita sola Mîr xiste di lingî xwe de û kewên xwe dane milê xwe û ji kelhê bi derket û qista çiya kir.

Dibê, çû Derê Siyarê li wê dê nesekinî, çû gundikê Remo li wê dê jî, nesekinî, çû (Şerefî)yê li wê dê jî nesekinî, çû Mila Şêxa li wê dê jî nesekinî, çû Besta Mîr a li wê dê jî nesekinî, çû derê sarinca 'Emer axa li wê dê jî nesekinî. Çiyayê Gabarê de bi şûn xwe de (hişt).

Dibê, çû Çelkê Tûwê li raserî gundê Sipîviyan her li wê dê Şêxiko Malo kewên xwe vedan.

Dibê, Şêxiko Malo negehişte çiyayê Çiravê, ji ber ku çiyayê Çiravê, dûr bû.

Dibê, piştî ku Şêxiko Malo her li Çelkê Tûwê li raserî gundê Sipîviyan kewên xwe vedan, dibê Şêxiko Malo du kew girtin û ew herdû kew her wisan sax bi xwe re anîn, û Şêxiko Malo her ji Çelkê Tûwê zivirî, ew hate mal.

Dibê, çawe bû mexrib Mîr çû dîwanê, rûnişt, û bi xem girî serê xwe xiste di ber xwe de û qet bi kesekî re xeber neda.

Dibê hindî kesê ku hatine dîwanê her wisa bê deng ji xwe re rûniştin. Heta ku dîwan tijî xelk bûn. Belê kesek xeber nadê, heta ku Mîr xeber nedê.

Belê xelkên civatê bi wezyeta Mîr dizanin ku tiştek qewimî ye. Lê kes nizanê ku çi qewimî ye.

Dibê piştî ku mexreb şikest, Şêxiko Malo ji nêçîra kewan hat, ew kewên xwe danîne ber derê dîwanxanê û silav li civata hazir kir, û ew jî ji xwe re rûnişt. Belê hêj ji nû ve Mîr digel Şêxiko Malo xeber da, û jê re got:

"Şêxiko de ka ji bo min bêje, ka îşev şevdesta te xweş bû yan ne"?.

Di bersivê de, Şêxiko got:



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

" Mîrê min, Wellahî şêvdesta min gelek xweş bû. Lê dewsa şêrekî li şêvdesta min xuya bû".

Mîr got:

"Rast bêje, ka şêvdesta te xweş bû,yan ne?".

Di bersivê de, Şêxiko Malo destê xwe xiste dibin guhê xwe de û got:

"Wey wey, wey wey,wey wey,wey wey kewgîrvano
Wey, Mîrê mino, van kewgîra kew hilgirtin
Wey wey, li dolik û mesîlê Çirava rengîn, lo xunav girtin.
Sed cara bi eniya Mîrê xwe kim,
Şêxiko Malo neseba 'ewilî du kew girtin.
Wey wey, wey wey,wey wey,wey wey kewgîrvano".

Mîr got: "Te rast negot, rast bêje".

Di bersivê de, Şêxiko Malo got:

"Wey wey, wey wey,wey wey,wey wey kewgîrvano
Wey, Mîrê mino, van kewgîra kewê xwe hilanîn
Wey wey, li dolik û mesîla Çirava rengîn neseb danîn.
Sed car bi eniya Mîrê xwe kim,
Şêxiko Malo neseba 'ewilî lo du kew anîn
Wey wey, wey wey,wey wey,wey wey kewgîrvano".

Mîr got: "ka, wan herdû kewan ji bo min bêne".

Dibê, Şêxiko Malo rahijte ewan herdû kewan û li ber Mîr danîn.

Dibê Mîr got:

"Ev ne kewên Çiravî ne! belkî kewên Çelkê Tûwê ne, rast bêje".

Şêxiko Malo got:

"Wey wey, wey wey,wey wey,wey wey kewgîrvano
Wey wey, kewgîrvano, kewgîrvanê evê demê



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Wey, li te ribat avêt ‘erdê, celab avête gulka benê,
Sed cara bi eniya Mîrê xwe kim,
Şêvdesta Şêxiko Malo xweş bû,
Li neqeba sing û bera, li paxilê, lo vê heremê.
Wey wey, wey wey,wey wey,wey wey kewgîrvano”.

Mîr got:
“Te rast got, rastir bêje”.
Şêxiko Malo got:
“Wey wey, wey wey, kewgîrvano, kewgîrvanê,
Lo, vê biharê,
Wey, li te ribat avêt ‘erdê celab,
Avête gulya darê,
Sed car bi eniya Mîrê xwe kim,
Şêvdesta Şêxiko Malo xweş bû,
Li neqeba sing û bera, li paxilê Sitî yarê,
Wey wey, wey wey,wey wey,wey wey kewgîrvano”.

Mîr got:
“Te rast got, were ser rêka rast”.
Şêxiko got:
“Wey, van kewgîra, kew hilgirtin
Çûne kewvedanê,
Wey wey, du kew girtîne, anîne derê
Dîwanxanê,
Sed cara bi eniya Mîrê xwe kim,
Şîvdesta Şêxiko Malo xweş bû,
Li neqeba sing û bera, li paxilê, lo, Sitîxanê
Wey wey, wey wey,wey wey,wey wey kewgîrvano”.

Mîr got: “Te rast got, taze were ser rêka rast”.
Şêxiko Malo got:
“Wey wey, Mîrê mino, şevkên çiriya dirêj bûn
Se’et li me bû şeş e,
Çibkim, şêvdesta Keçelê Şemê bûrî



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Bi taqê qesrê ve xwend û kir laleş e,
Sed cara bi eniya Mîrê xwe kim,
Şêvdesta Şêxiko Malo xweş bû
Li neqeba sing û bera, li ber çav û birê reş e,
Wey wey, wey wey,wey wey,wey wey kewgîrvano”.

Mîr got: ”Te rast got”.
Belê xelkên civatê jî, teva zanîn, ku çi qewimiye.
Şêxiko Malo got:
“Wey wey, Mîrê mino, van kewgîra kew vedayî
Wey Mîrê mino
Minê ji te divê, destek davkê lo, hûr badayî
Wey, minê ji te divê ribatkî ji vayê, ne vedayî
Wey, minê ji te divê sing û ber û cotek memkê tevnedayî.
Wey wey, wey wey,wey wey,wey wey kewgîrvano.

Dibê, gava Mîr ev xeber bihîst, gelek ‘aciz bû û ji xulaman re got: ” Rabin, vî nekesî, divê latê de bavêjin”.
Şêxiko Malo got:
“Wey wey, Mîrê mino, li me derket û sitirka
Sibhê, lo, gêjûmêj e,
Mane ew jî qedera Xudê bû, şêvdesta
Keçelê Şemê bûrî, bi taqê qesrê ve
Xwend û bi qeb û qij e,
Herê, Mîrê mino, keskî dewrê heft
Zemana, ne dîtiye, Mîr û hakim rabin
Kewgîrvanê xwe bikuje!
Wey wey, wey wey,wey wey,wey wey kewgîrvano”.

Mîr got: ”Wî bavêjin”.
Şêxiko Malo got:
“Herê Mîrê mino, çûm Gabarê bi ripin e
Herê Mîrê mino, her ripinkê hêlîn li bin e



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Herê Mîrê mino,
Ew hemî, cî şêvdesta Şêxiko malo,
Kewgîrvanê Mîrê min e..
Wey wey, wey wey,wey wey,wey wey kewgîrvano".

Mîr got:

"Feyde nakê, wî bavêjin".

Dibê, gava Mîr weha ferman kir.

Dibê, hemen çend xulam rabûn, ew bi çengê Şêxiko Malo girtin, û di wê lata serî kelha Finik de avêtin xwarê.

Dibê, her ji qudreta Xudê, Şêxiko Malo li ser piyê xwe ket û tiştek bi Şêxiko Malo nehat.

Belê carek dî, Mîr gote xulaman: "Herin Şêxiko Malo carek dî bînin ve.

Dibê, çend xulam çûn, carek dî Şêxiko Malo ji binê latê anîne ve.

Dibê, Mîr bi melayî re xeber da, û got:

" Seyda, tu dibê ji bo çi me Şêxiko Malo di vê lata bilind de, me avête xwarê û tiştek pê nehat?!.

Di bersivê de, melayî got:

"Mîrê min, ‘ebayê wî, ber bê ket".

Mîr got: "Da nexwe em dê ‘ebayê wî li te bikin, û em dê baş li te meyze bikin, bêma ka çawe ‘ebayê te wê ber bê bikevê".

Di bersivê de, melayî got: "Na, Mîrê min qey qedera Xudê bû, tiştek pê nehat".

Mîr got: "Hemen bi wê Qur'ana ku te xwendî, em dê wî ‘ebayî li te jî bikin".

Dibê, hemen xulam rabûn ‘eba ji Şêxiko Malo kirin û ew ‘eba li melayî kirin, û tehfek li melayî xistin. Pa ne bilindiya latê sêsed meter heye. Belê, ba ber ‘ebayî melayî ket. Hê li hewa, mela bi derekê ve çû û ‘ebayê wî bi dera dî ve çû.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, dibê xulam rabûn Şêxiko Malo teftîş kirin û cilkê wî ji ber wî kirin meyze kirin ku bazbendek wa bi milê wî ve girêdayî ye.

Dibê, rabûn ew bazbend ji milê wî vekirin û carek dî Şêxiko Malo di wê latê de avêtin xwarê.

Belê dê çi bêjin, mela û Şêxiko Malo ew herdû pepûk çûne rehmetê.

Rehmet li dê û bavê Cema'etê...

Em nizanin Mîr çi bi Sitîxanê kir,

Bi vê çendê em hatin dawiya hikayetê.

Ji gotinên pêşiyan:

(‘Aqlê Sivik barê giran)



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Bangerê Hotê

Bo cara diwê, em dê hikayeta Bangerê Hotê ji bo xwende-vanên delal, bikin diyarî. Her wekî çawe dibêjin.

Her di dewra Mîrê Botan de, rojekê, her di nava civatê de, axayê gundê Hotê gote xulamê xwe:

“Filankes, Wellahî ji wextî zû ve, em ne çûne Cizîrê, were me serek li Mîr ne xistiye. Belê, qewîtêke me jî linik Mîr heye”.

Di bersivê de, xulamî got:

“Axayê min, de nexwe ez dê rabim biçim Cizîrê nik Mîr ”.

Di bersivê de, axayî got:

“Gelek baş e, de nexwe here malê taştê bixwe, û were min bibîne, paşê here Cizîrê, da ku tu qewîtiya me, bi cih bîne”.

Di bersivê de, xulamî got:  Belê.

Dibê, xulam ji nava civatê rabû û çû mala xwe taştê xwar û ji mal bi derket. Di derê malê, belê, meyze kir ku axa, wê li serbanê qesra xwe ye.

Dibê, hemen xulamî ji bo xwe got: ”Ma ez dê ji bo çi, biçim nik axayî. Ne her ev e min axa dît. Hemen her ji vir ez dê bi rêka xwe biçim”.

Dibê, her ji derê mala xwe, xulam bi rê ket, û berê xwe da Cizîrê û hate Cizîrê. Dibê, çawe xulam gehişte Cizîrê û çû dîwana Mîrê Bota, û destê Mîrê Bota maçû kir, û di cihê edebê de rûnişt.

Belê, piştî ku Mîr bi xêrhatin da xulamî û jê re got: ”Lawê delal, tu ji ku ve tê û daxwaza te çiye”?.

Di bersivê de, xulamî got: ”Mîrê min, ez ji gundê Hotê hatime û ez bi xwe xulamê axayê Hotê me. Axayê min , ez rêkirime nik te, ji bo ku qewêtîke wî linik te heye”.

Di bersivê de, Mîr got:  “Ew çi qewîtî ye?”.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Di bersivê de, xulamî got: “Mîrê min, Wellahî ez nizanim”.

Mîr got: ”De nexwe ez dizanim ku ew çi qewîtî ye”.

Dibê, hemen Mîr gazî çend xulamên xwe kir û ji wan re got:

”Ev e axayê me yê Hotê xulamê xwe rêkiriye nik me, da ku em bangerekê jê re bi rêkin.

Vêce, herin ewî bangerê li serbanê me bidin pişta xulamê axê, da ku ji bo axayê xwe, bibê”.

Dibê, gava Mîr weha ferman kir. Hemen çend xulam rabûn çûn ew bangerê li serbanê mala Mîr dane pişta xulamê axayê Hotê û baş bi werîsekî li pişta wî girêdan. Û xulam xatir ji Mîr xwest û ji Cizîrê bi derket.

Dibê, wextê ku bi rê ve xulam diwestiya, hemen xulam wê bangerî ji pişta xwe deynê xwarê û wê ji bo xwe bibêjê: ”Ma xudêkî niha ev çi banger e Mîr dayî pişta min!!. Hemen Wellahî ez dê evî bangerî bavêjim, ne heta ez ewî bibim Hotê, ez dê di bin de bimirim ma qey bangerê weha li Hotê tune ne!!?”.

Dibê, piştî ku xulam wê weha ji bo xwe bibêjê, û heta wisan, wê bihna xwe jî vekê û paşî, carek dî xulam wê hizir û bîrên xwe bikê û wê ji bo xwe bibêjê: ”Wellahî eger ez evî bangerî bavêjim û her wisan destevale ez biçim Hotê axayê min wê bibêjê tu çûwî Cizîrê ma, kanî qewîtiya min. Hingî ez dê çi bibêjim. Hemen Wellahî paşê Mîr û axa wê min ‘idam bikin. Vêce, qet çênabê ku ez bangerî bavêjim, û her weha xulam wê ji bo xwe bibêjê: De, hemen hesêb ke, min ji nû ve banger daye pişta xwe û her ji vê re ez dê bi rê bikevim.

Dibê, her wisan carek dî xulam wê bangerî bidê pişta xwe û wê dibin de bimeşê, û her wisan qûnax bi qûnax xulam meşî, heta ku gehişte gundê Hotê.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, xulamî banger li derê mala axayî danî. Belê, axayî gote xulamî: ”Ev çiye?”.Di bersivê de, xulamî got: ”Axayê min, ev qewîtiya te ye. Mîrê Bota ji bo te rêkiriye”.

Di bersivê de, axayî got: ”De, Xudê xêra Mîrê Bota binivîse û Xudê ji Mîr razî bê, ji ber ku Mîr zaniye ku bangerê te tune ye, ev banger ji bo te bi rê kiriye”.

Dibê, gava axayî weha got, di bersivê de, xulamî got:

”Axayê min, ne bangerê me heye”.

Di bersivê de, axayî got:

”De, here bangerê Mîr bibe serbanê xwe, pê bigerîne, eger yek carê bitinê tu serbanê xwe bi bangerê Mîrê Bota bigerînê êdî tu cara xaniyê te dilop nakê”.

Belê, hikayeta (‘*Agil sivikê, bargiran*) bi dawî hat.

Her çendî hindek ji xelkên gundê Hotê dibêjin ew bangerê Mîrê Bota heta niha jî li gundê Hotê dimînê, û ew bi xwe jî bangerekî sipî ye, û tiştek pê nehatiye.

Belê, em dibêjin wisa nîne wekî xelkên Hotê dibêjin. Belkî em dibêjin ew bangerê ku Mîrê Bota bixêra xwe rêkirî ji xelkên Hotê re, ew xêra Mîrê Bota weqfekî ‘am bû, her çendî berya her kesî xelkên Hotê serbanê xwe bi ewî bangerî gerandin. Belê, paşê her ji gundê Hotê ew banger Mîrê Bota teslîmî gelê (xelkên) welatî bû, û gelek feqîr û mihtacan serbanî xwe pê gerandine. Ev e îro ew bangerê Hotê ber destê me jî ket, û me jî serbanê xwe pê gerand. Inşaellah, êdî serbanê me jî dilop nakê, û her bi xêra Mîrê Bota ev e me ew bangerê Hotê ji bo gelî xwendevanên delal kire diyarî.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Mihemed Şah Mîrê Botan
# û
# ‘Eyşa Bêzar Begê

Em dê hikayeta Mihemed şah Mîrê Bota ji bo xwendevanên delal bikin diyarî. Her wekî çawe birader Yûsif Remezan her weha ji bo me dest bi hikayetê dikê û dibêjê:

Hindîke Mihemed şah bû, Mîrê Bota bû, û biraziyê Bêzar Begê bû. Belê, navê babê Mihemed şah ji kesekî ve ne diyar e. Ji ber ku, her ji wî wextî, heta wekî îro roj, navê babê Mihemed şah bi devê hikayetbêjan ne hatiye gotin, û me jî ne bihîstiye.

Dibê, her çendî Mihemed şah, Mîrê Bota bû, û hakimtiya xwe, di Cizîra Bota de dikir. Belê, ew bi xwe, hêj ne zewicî bû, û ji bo xwe teklîfa jinanînê li kesekî ne kiribû.

Dibê, keçmamek ya Mihemed şah hebû. Jê re digotin ‘Eyşa Bêzar begê. Belê, keçên wekî ‘Eyşa Bêzar Begê rind û ciwan û hêja û berketî, her di ciyê Bota de peyda ne dibûn.

Dibê, mamê Mihemed şah yanî Bêzar begê, keça xwe ‘Eyşa Bêzar Begê her ji bo kurmamê wê Mihemed şah radigirt, û ne dida kesekî; ji ber ku Bêzar Begê hêviya wî ya pir ew bû, ku wextê Mihemed şah teklîfa jinanînê, ji bo xwe bikê wê keçmama xwe, ‘Eyşa Bêzar Begê ji bo xwe bixwazê.. Lê, çi bikin, Mihemed şah hêj daxwaza jinanînê, ji bo xwe, nekiri bû, û dotmama wî ‘Eyşa Bêzar Begê her di mala babê xwe de xame bûbû.

Belê, her weha em dê Mihemed şah Mîrê Bota û digel dotmama wî ‘Eyşa Bêzar Begê bihêlin li Cizîra



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Bota li ser halê wan.. û her ji nû ve, em dê dest bi serhatiya Mihemed şah Mîrê Bota bikin, û em dê, dihnê xwe bidin bi serhatiyê bê ma, ka, bi serhatiya Mihemed şah her ji aliyê hikayetbêjan de çawe hatiye gotin, û çawe tête gotin.

Belê, her çendî.. wî wextî em ne hazir bûn..Lê, belê, her li gora ku me ji devê camêr û hikayetbêjan bihîstî. Dibê, her ji aliyê herêma Hekariya di gundekî de, zelamek hebû. Navê wî 'Elo bû. Belê, 'Elo bixwe, lawekî bi degel û pêlewan û çeleng û nêçîrvanekî bi nav û deng bû.

Belê, mixabin, ku yarekî jina 'Elo hebû. 'Elo bixwe pê nizanî bû. Dibê, rojekê jina 'Elo her bi qestî xwe nexweş kir, û xwe xiste di nava ciyan de, û nivîn girte serê xwe. Belê, meqseda jina 'Elo, her ji wî nexweşiyê ew bû ku mêrê xwe 'Elo her ji malê bi derekê ve, rê bikê, û yarê wê jî werê cem wê.

Dibê, piştî ku jina 'Elo xwe bi qestî nexweş kir, û xwe xiste di nava ciyan de.

Dibê, 'Elo hate ber serê jina xwe, rûnişt û gote jina xwe:

"Xudê xêr bikê, hirmet, ev çi hewala te ye, tu nexweş ketî"?!.

Di bersivê de, jina wî got:

"'Elo, Inşaellah, xêre, nexweşiya min ne hind giran e, hemen ez dibêjim, her ji berya mehikê ve tu ne çûwî nêçîrê, û em ji goştê pezkoviyan xerîb bûne, her ji ber wê yekê, êşê avêtiye serê min, û serê min têşihê. Vêce , eger tu, îro herê nêçîrê, belkî tu pezkoviyekî ji me re bênî, û em goştê wê bixwin. Belkî ev êş ji serê min bi derkevê".

Dibê, gava jina 'Elo weha got, hemen 'Elo got: "Bela hirmet".



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, hemen ‘Elo rabû çek û têzatên xwe, xistine diber xwe de, û tifinga xwe, da milê xwe, û ji mal bi derket, û qista çiyayî kir, û çû nêçîrê.

Dibê, ‘Elo çû, nav sera çiyayî li nêzîkî Geliyê ‘Evdal Begê li hewalekî bilind ‘Elo pezkoviyek kuşt, û serjêkir, û ‘Elo pezkoviya xwe, baş kevel kir û da milê xwe û bi şûn de zivirî, da ku werê malê.

Dibê, her li nav sera çiyayî li ‘Elo bû, şev û berf û bagerê lê kir. Dinya tarî bû. Belê, ‘Elo gelek şepreze bû, heta ku ‘Elo her ber piyê xwe ne dît.

Dibê, her li nav sera ewî çiyayî ‘Elo rastî şikeftekî hat. Belê, ‘Elo ji bo xwe got: ”Hemen Wellahî şev li min tarî bû, êdî ez hew ber piyê xwe dibînim, û berf û bager jî dibarê. Hemen, ya qenc ew e, îşev ezê her di evê şikeftê de, razim, heta sibehî. Sibehê xêr vêre... her weha.

Dibê, ‘Elo rabû, çû di hindir wê şikeftê de, û pezkoviya xwe bi taqê şikeftî ve daleqand. Û ‘Elo derkete ji der ve, li dor ma dorê şikeftê, her bi destpelênkê hindek dar û mar ber hev kirin. Belê, ‘Elo agirekî xweş di şikeftî de hilkir, û rûnişte ber agirî, û tifinga xwe, danî ser çoga xwe, û hindek goştê pezkoviyê, danî ber xwe, û xwê kir, û parçe parçe ‘Elo goşt bi bista tifinga xwe ve kir, û avête ser agirî.

Belê, dê, çi bêjin, bihna kizeviza goştî bi wan dol û newalan ket. Belê, ‘Elo dest bi goşt xwarinê kir û goştê xwe xwar.

Belê, her ji nişkê ve ‘Elo meyza kir ku pîreka hovşîna, lêv dûmbelanî mîna hirçeka çav beloq, da ji derê şikeftê ve, û hat hat hat, ber agirê ‘Elo, û bisteke hesin di destê wê de bû. Hemen ewê pîrê dûvikê bista xwe, di ‘erdê de kire xwar û ewê pîrê her dû destê xwe, daniye ser serê bista xwe, û herdû çogên xwe dane ‘erdê, û her li pêşberî ‘Elo ve ket, û zîq li ‘Elo meyza kir.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, qet'iyen ti tirs û xewf ji 'Elo re çênebû. Hemen 'Elo jî her wisan zîq li ewê pîrê meyza kir, û awira xwe, jê ne şikand.

Belê, bê pirs û suwal, herdû mane di wî halî de.Yanî, ne 'Elo bi ewê pîrê re xeber da, û ne ewê pîrê bi 'Elo re xeber da.

Dibê, her wisan heta muxdarekê li hev meyza kirin.

Belê, 'Elo hizir û bîrên xwe kirin, û ji bo xwe got: Wellahî hebê nebê ev pîrhevoweke birsî bûye, her li bihna goşt hatiye vê derê. Hemen ez dê hindek goşt bidimê bila ji xwe re bixwê, lê guneh e.

Dibê, hemen 'Elo rahişte parçek goşt û avête ji ewê pîrê re. Belê, hemen pîrê rahişte ewê parça goştî, bi yek carê avête devê xwe. Belê, 'Elo parçak dî jî jê re avêt. Pîrê ew parçe jî bi yek carê avête devê xwe û xwar. Her weha.. Dibê, heta 'Elo piçek goşt dixwar, ewê pîrê dû parçe xilas dikirin. Belê, 'Elo dihnê xwe dayê, ku pîrê wa goştî pezkoviya wî xilas bikê. Dibê, 'Elo êdî hew goşt da pîrê. Belê, 'Elo awira xwe ji pîrê ne quliband, heta qederek di wê ve çû. 'Elo dihnê xwe dayê ku serê pîrê li ser bista wê ponijî û çavê wê ketin ser hev.

Dibê, 'Elo ji bo xwe got: "Hemen Wellahî, dibê ku ev pîrhevo hatibê da ku zererekê bigehînê min ma ji bo çi, ez xwe nadim alîkî".

Dibê, qurmekî dara di ber agirî re dirêjkirî bû, her ji bo tecrûbekirinê. Hemen 'Elo hêdî rabû kepenekê xwe bi wî qurmê dara de kir û rahişte tifinga xwe û hêdî 'Elo xwe da dawiya şikeftê û çavê wî ma li wê pîrê.

Dibê, xew li pîrê giran bû, û bista wê ya hesin, di bin serê wê de tewiya. Hemen serê pîrê li 'erdê ket û pîrê ji xwe hil bî, û li dora xwe meyza kir. Belê, 'Elo li ber agirî ne dît, lê çavê pîrê bi kepenekê 'Elo ket. Ji pîrê ve weye, ku ew 'Elo we xwe, di ber agirî re dirêjkirî.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, hemen pîrê destê xwe bilind kir û heta karî her wisan bi şûrikê zenda xwe weşande kepenekê ‘Elo. Belê zenda wê li darî ket. Dibê, qerpên ji zenda wê hat, û zenda wê şikest, û qîrên bi pîrê ket û hemen her di hindir wê şikeftî de vir ve wê ve, pîrê li ‘Elo geriya.

Dibê, ‘Elo dihnê xwe da pîrê ku eger destê pîrê bigehê wî, pîrê wa, wî parçe bikê.

Dibê, hemen ‘Elo berê tifingê da pîrê go: ring, û tifeng ber da pîrê. Belê her di dengî tifingê re pîrê qîrek da û dengê qîra pîrê çû ber felek û pîrê her bi şûnde li derê şikeftê da û pîrê ji hindir wê şikeftî bi derket û çû..

Dibê, hêj ji nû ve ‘Elo hate ber agirê xwe, rûnişt, û bi xwarina goştî meşxûl bû. Dibê, heta ku se’etek kete wê navê. ‘Elo meyza kir, ku her ji nişkê ve, du xortan mîna du zabitan dane ji derê şikeftê ve, û li ber ‘Elo sekinîn. Belê, ewan herdû xortan bi ‘Elo re xeber dan û jê re gotin: ’Elo te diya me kuştî ye”.

Di bersiva wan de, ‘Elo got: ”Belê, qey qedera xudê bû, diya we bi destê min hate kuştin”.

Ewan herdû xortan gotin: “’Elo, divê tu werê huzûra babê me, bê ma ka babê me wê çi(emr)bikê. Divê tu emrê babê me qebûl bikê”.

Di bersiva wan de, ‘Elo got: ”Belê”.

Dibê, hemen ‘Elo rahişte tifinga xwe, û rabû ser xwe û li ber ewan herdû xortan sekinî.Dibê, ewan herdû xortan ji ‘Elo re gotin: ”De, bide pêşiya me, da, ku em biçin nik babê me”.

Di bersiva wan de, ‘Elo got: ”Ez hêvî dikim hûn li min negirin Wellahî, ji biçûkatiya xwe ve heta wekî îro jî, min nedaye pêşiya kesekî, ne ji dostê xwe, û ne ji dijminê xwe, ez tu cara li pêşiya kesekî nemeşîme. Vêce, îro hûn dijmin in min in, çênabê ku ez bidim pêşiya we, û ez piştê bidim we”.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, min soz bê, ez dê li pê we werim, dera ku hûn biçinê. Ez dê bi were werim wê derê. Dibê, gava ‘Elo weha got. Hemen ewan herdû xortan ne merdî nekirin û dane pêşiya ‘Elo, û ‘Elo jî da pê wan û ji ewê şikeftê biderketin, û bi nav sera ewî çiyayî de meşîn, de, ka, heta biçe qederê çûn. Belê, serejêr xwe berdane binê geliyê ‘Evdal Begê û her li derê şikeftekê sekinîn, ku ji ewê şikeftê re dibêjin şikefta Muxleciyan. Belê, ew herdû xort digel ‘Elo çûne di hindirwê ewê şikeftî de. Belê, ‘Elo di hindirwê şikeftî de meyza kir, ku her li dawiya şikeftê padîşahek, wê li ser textê xwe rûniştî ye.

Belê, her sê, çar kenarê şikeftê ji girgirek û pêlewanan tijî ye. Her wisan bê deng civata ewî padişahî digerihê.

Dibê, ‘Elo baş meyza kir ku termê Ewê pîrhevowa pûv hişîn, jî her di ber textê ewî padişehî re dirêjkirî ye.

Dibê, hemen sehwê ‘Elo girt, her wisan, di cih de, ‘Elo mîna şêrekî li pêşberî ewî padişehî rawestiya, û qet xeber ne da.

Belê, ew herdû xortên bi ‘Elo re xwe dane nava civatê, ji xwe re rûniştin.

Dibê, ewî padşehî bi ‘Elo re xeber da û jê re got: ‘Elo kerem bike, tu ji bo çi narûnê?”.

Di bersivê de, ‘Elo got: ”Mîrê min, ma, ez dê çawe rûnim. Ez, te, nasnakim, û ez nizanim ku ev der ku dere?!!”.

Di bersivê de, ewî padişehî got: ” ‘Elo, ez Teyfûr Begê me, ez Mîrê (Eciniya) me, û ev der jî, koçk û dîwanxana min e”.

Di bersivê de, ‘Elo got: ”Bila Mîrê min, xweş bê... çênabê ku ez rûnim. Lê, ev e serê min, û ev e şûrê te, tişta ku Mîrê min emir bikî, ez li ber emrê Mîrê xwe sekinî me”.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Di bersivê de, Teyfûr Begê got: ” ‘Elo ev, te jina min kuştî ye”.

Di bersivê de, ‘Elo got:

”Belê, Mîrê min, qey qedera Xudê bû”.

Di bersivê de, Teyfûr Begê got:

‘Elo, te, ji bo çi jina min kuşt”.

Di bersivê de, ‘Elo got:

”Mîrê min, tu ji min çêtir dizanê ku jina te ji bo çi û çawe bi destî min hate kuştin”.

Dibê, gava ‘Elo weha bersiva Teyfûr Begê da, Teyfûr Begê got:

”Elo, Wellahî tu mêrekî biheyfî, em dil nadin te bikujin. Lê, belê, divê tu xûna me bidê. Vêce, xûna me jî her ev e ye, hindîke jina te ye bi dost û yar e, û tu jî pê nizanî. Duhî jina te her bi qestî, xwe nexweş kiribû, da ku tu ji malê bi derkevê çiyayî nêçîrê û yarê wê jî werê nik wê. Vêce, duhî piştî ku tu ji mal bi derket, vêre vêre, yarê jina te hatiye nik jina te û niha jî her di xênî de yarê jina te wê di berê wê de ye. Vêce, eger îşev tu bi çi malê yarê jina xwe û digel jina xwe herdiwan di xênî de bikujê, xwe, me jî, xûna jina te û yarî wê her di bedelê xûna jina xwe de me jî qebûle, û em dê te ‘efû jî bikin, û tucaran em nahêlin kesek zererê bigehînine te. Belê, eger tu îşev ne çê mal jina xwe û digel yarê wê di mal de, nekujê, xwe bi tu aweyî tu ji destê me xelas nabê.

Dibê, gava Teyfûr Begê weha gote ‘Elo, hemen ‘Elo bersiva Teyfûr Begê weha da û jê re got:

”Mîrê min, her linik min ev xûna ku tu ji min dixwazê gelek sivik e. Lê, ez mame heyirî, ez dê çawe îşev xwe bigehînim malê. Ji ber ku ez nizanim ez niha li ku me”.

Di bersivê de, Teyfûr Begê got:

” ‘Elo, ew yek li nik me gelek hêsaniye. Em dê wusan bikin ku qasê tu bêjî bîst, tu wê li derê xaniyê xwe hazir bibê. Hemen xwe hazir bike”.

Dibê, ‘Elo baş bi qevda tifengê xwe girt û got:

”Mîrê min ev e ez hazirim”.

Dibê, hemen Teyfûr Begê dengê xwe li du ferhîtên, mîna (min) kir. Vêre vêre, du ferhît ji nava civatê rabûne ser xwe û li ber emrê Teyfûr Begê rawestiyan. Belê, Teyfûr Begê gote ewan herdû ferhîtan: “Her vê se’etê min ji we divê ku hûn ‘Elo bibin li derê mala wî deynin”.

Dibê, hemen ewan herdû ‘ifrîtan rahiştine ‘Elo û bi tifenga wî ve qasê tu bêjê bîst li derê mala wî danîn.

Dibê, vêre vêre, ‘Elo di kilîla derî re meyza kir, ku zîpzîpekî mêra wê di berê jina wî de ye.

Dibê, hemen ‘Elo destê xwe li derî xist. Jina wî got:

”Ew kî ye”.

‘Elo got: ”Ez im. Sivik derî veke”.

Dibê, her di hindirwê xênî de, jina ‘Elo ma heyirî, nizanîbû yarê xwe bêxê di ku de û ji ber ‘Elo veşêrî.

Dibê, ya jina ‘Elo bîr pê birî, hemen perda kulînê hilda û yarê xwe xiste dibin kulînê de û perda kulînê bi ser de berda, û bi şûn de zivirî ber derî û derî ji ‘Elo re vekir û ‘Elo hate hindirû.

Dibê, ‘Elo di hindirû de, vir ve wê ve, meyza kir yarê jina xwe ne dît.

Dibê, hemen ‘Elo perda kulînê hilda meyza kir ku yarê jina wî wê di kulînê de ye.

Dibê, hemen ‘Elo dizê xwe di kulînê de girt, û da ber xencera, zîvar zîvar kir û kelexê wî avête wê ‘erdê.

Dibê, jina ‘Elo bi alê derî de revî. Dibê, hemen ‘Elo tifingek li ser wê jî danî û çend xencer weşandin kelexê wê jî, û ‘Elo ji xanî bi derket û gote herdû ferhîtan :

”De vêçe min xelas bikin”.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, hemen ewan herdû ‘ifrîtan carek dî rahiştine ‘Elo anîn di hindirwê koçka Teyfûr Begê de, danîn.

Dibê, hemen Teyfûr Begê ji ser textê xwe rabû û nava herdû çavên ‘Elo maçû kir, û Teyfûr Begê ‘Elo li tenişta xwe rûnand, û jê re got:

"'Elo em pir minetkarin ku te serê me di herêma Bota de bilind kir, û me jî ji alê xwe de tu ‘Efû kirî. Emîn be, ku heta tu saxî tu wê ji destê me paristî bê. Lê, belê divê tu biçê Cizîra Bota xwe bi şah Mihemed Begê Mîrê Bota bigirê. Ji ber ku Şah Mihemed Begê Mîrê Bota zavayê min e. Xezala keça min jina wî ye, û heta niha jî kesek ji xelkê Cizîra Bota nizanên ku şah Mihemed Begê ne zewicî ye ji ber ku Xezala keça min ecnî ye, kes wê nabînin. Vêce eger tu neçî Cizîra Bota xwe bi Şah Mihemed Begê negirê û tu ji destê Xezala keça min xilas nabê, ji ber ku hindek jin hene gelek mejî hişkin hindî mirov rêka baş nîşa wan bidê xwe bi ser ve nadê û bi rêka rast ve nameşin.

Her ji ber vê yekê em ditirsin ku Xezala keça min derbekê li te bidê ji ber ku em dizanin ku hindî em ji Xezala keça min re bibêjin û em qewîtiyên te li wê bikin jî miheqiq Xezala keça min guhdariyê li me nakê û ew bibêjê nabê ‘Elo qatilê diya min e.

Vêce, eger tu biçê Cizîra Bota xwe, bi Şah Mihemed Begê bigirê, û tu bibê xulamê wî, xwe tu wê, ji destê Xezala keça min jî werê paraztin. Ji ber ku hingî tu dibê xulamê Xezala keça min jî, we hingî rehim jî wê bikevê di qelbê Xezalê de, û ew bixwe wa rehmê li te jî bikê, ne xasim her ji ber Şah Mihemed Begê Xezal neşê tiştekî bi te bikê”.

Dibê, gava Teyfûr Begê weha nesîhet li ‘Elo kir. Di bersivê de, ‘Elo gote Teyfûr begê: ” Mîrê min. Ne her çendî, min navê Şah Mihemed Begê Mîrê Bota bihîstiye. Lê, ne min Cizîra Bota ne dîtiye. Ma ez dê îşev çawe xwe bigehînim Cizîrê!.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Di bersivê de, Teyfûr Begê got:

” ’Elo ew yeka jî linik me hêsanî ye”.

Dibê, hemen Teyfûr Begê emir kir ewan herdû ‘ifrîtan rahiştine ‘Elo qasê tu bibêjê bîst, ewan herdû ‘ifrîtan her ji gelê ‘Evdal Begê ‘Elo anîn û li banê xanê li pêşberî bajarê Cizîra Bota danîn. Belê, ewan herdû ‘ifrîtan gotine ‘Elo:

”Ewa he birca belek e. koçk û sera Şah Mihemed Begê Mîrê Bota ye. De vêce here oxir bê ji te re”.

Dibê, ji xwe ew herdû ‘ifrît ji Banê Xanê bi şûnde zivirîne gelyê ‘Evdal begê. Belê, ‘Elo jî hêdî hêdî hate ber sera Birca Belek û da derinca û bi hewayî sera Birca Belek ket. Dibê, ‘Elo destê xwe li derê dîwanxana Şah Mihemed Begê xist. Hemen xulam û xizmetkaran deriyê dîwanê li ‘Elo vekirin. Dibê, her wisan ‘Elo mîna gurekî zend û bend bi xûn da ji deriyê dîwanê ve. Belê, Şah Mihemed Begê weha çav bi ‘Elo ket. Hemen Şah Mihemed Begê bi civata xwe ya hazir ve, di ber ‘Elo de, rabûne ser piya û xulam û xizmetkaran çek û silahê ‘Elo ji milê wî vekirin û bi çekdana de kirin. Belê, ‘Elo jî her wisan zend û bend bi xûn çû destê Şah Mihemed Begê maçû kir, û ‘Elo paşde hate ber derî û mîna şêrekî çog da ‘erdê.

Belê, Şah Mihemed Begê jî, bi civata hazir ve, rûniştin û şah Mihemed Beg bi ‘Elo re xeber da û jê re got:

” Tu gelek bi xêr hatî lawê delal, tu çi kesî?, û vê nîv şevê, tu ji ku ve tê?!, û hewala te çiye?, ji bo me hewala xwe bêje?”.

Di bersivê de, ‘Elo got: ”Mîrê min, navê min ‘Elo ye, ez ji filan derê me, îşev min jina xwe digel yarê wê min herdû di xênî de kuştine, û ez hatime min xwe avêtiye ber perda te, da ku tu min bisitirînî û tu min ji destê dijmin û neyaran biparêzê. Û heta ku ez jî saxim, ez dê xulamtiya te bikim”.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, gava ‘Elo her weha bersiva Şah Mihemed Begê da. Hemen Şah Mihemed Begê rabû ser xwe çû nava herdû çavên ‘Elo maçû kir û gote ‘Elo: ”Îşev em gelek ji bo te minetkarin, ji ber ku her îşev te serê me di memleketê Bota de bilind kiriye. Nexasma ku em jî li xweş mêrekî mîna te digeriyan.

Ev e, îşev tu li ber destê me ketî. Hemen min soz bê, min we’de bê, serê min di bedelê serê te de ye, heta ko ez saxim ez nahêlim kesek bi awira xwe her li te meyza bikê. Hemen qet mereq neke, û ji îro pêde, tu wê berdevkê min bê, her wextî şêwir û mişêwretê min wê bi te bin.

Dibê, gava Şah Mihemed Begê her weha gote ‘Elo, hemen bihna ‘Elo fereh bû, û her bi emrê Şah Mihemed Begê xulam û xizmetkar rabûn ‘Elo birin hemamê, ji xûnê şûştin. Hêj ji nûve ‘Elo ji xwe re bi yek xem razeha, û her ji nû ve, koçk û dîwanxana Şah Mihemed Begê belav bû. Her kesek çûne malên xwe.

Dibê, piştî ku ‘Elo xwe bi Şah Mihemed Begê girt. Dibê, jina Şah Mihemed Begê yanî Xezala keça Teyfûr Begê ev yeka qebûl nekir, û Xezalê gote Şah Mihemed begê: Ez vê yekê qebûl nakim, hindîke ‘Elo ye qatilê diya min e. Ez li xûna diya xwe nabihurim.

Dibê, gava Xezala keça Teyfûr Begê weha gote Şah Mihemed begê. Di bersivê de, Şah Mihemed Begê gote Xezalê: Tu neheqî... Ji ber ku her çendî diya te, bi destê ‘Elo hatiye kuştin. Belê, suncê diya te bû.. û belkî ‘Elo nefsa xwe parast û bi xeletî diya te bi derba wî hate kuştin, û babê te Teyfûr Begê ew digel birayê te ‘Ezîz Begê herdiwan bi qewm û qebîla xwe ve li xûna diya te bihurîne, û her ji ber ku ‘Elo serê babê te û birakê te û serê me hemiyan di memleketê Bota de, bilind kiriye, û me hemiyan jî ‘Elo ‘efû kiriye, û her zêdeyî vê yekê jî, eger tu jî bi çavê xiyanetê li



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

xulamê min ‘Elo meyza bikê, xwe, baş bizane, ku tiştî min, û te, bi hev re, tuneye, û serê min, di bedelê serê xulamê min ‘Elo de ye.

Dibê, gava Şah Mihemed Begê her weha gote Xezala keça Teyfûr begê. Hemen, Xezala keça Teyfûr Begê ji Şah Mihemed Begê tirsiya. Êdî hew dengê xwe kir.

Her wisan Şah Mihemed Begê ew digel xulamê xwe ‘Elo û digel jina xwe Xezala keça Teyfûr Begê mane li ser keyf û halên xwe, heta çend heyvek bi ser wan de bihurîn.

Dibê, her wekî çawe me di pêşiya hikayetê de gotî ku heta vî gavê jî kesek ji xelkê Cizîra Bota nizanîbûn ku Şah Mihemed Begê ji (cin)a zewicî ye, û Xezala keça Teyfûr Begê Mîrê (ecniyan) jina wî ye. Belkî xelkên Cizîrê hemiyan her wusan dizanên ku Şah Mihemed Begê hêj nezewicî ye. Her ji ber vê yekê. Dibê, rojekê girgirekên xelkê Cizîrê li hev rûniştin û ji hev re gotin: Êdî ji îro pêde, çênabê ku Mîrê me ne zewicî bê.

Dibê, hemen girgirekên Cizîrê bi hev re çûne dîwanxana Şah Mihemed Begê û jê re gotin Mîrê me êdî ji îro pêde çênabê ku tu bê mal û hal bê. Vêce, daxwaza me ji te her ev e ye, ku tu bizewicê û tu bibê xudan mal û hal. Da ku her wextî serê me di nava ‘alemê de bilind bê û kesek ji bo Mîrê me qusûran çê nekê.

Dibê, gava girgirekên Cizîrî weha gotin. Di bersiva wan de, Şah Mihemed Begê got: ”Hêvî dikim ku hûn li qusûra min meyze nekin, ji ber ku heta wekî îro min jinekî bi dilê xwe ji bo xwe nedîtiye. Vêce, eger we keça camêrekî laiqê min dîtiye, xwe herin ji bo min bixwazin”.

Dibê, gava Şah Mihemed Begê her weha gote xelkê civatê. Di bersivê de, xelkên civatê gotin: Mîrê min



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

hindîke mamê te Bêzar Begê ye. Îsal heft sale keça xwe ‘Eyşa Bêzar Begê ji bo te di mala xwe de ragirtî ye. Her çendî dotmama te ‘Eyşa Bêzar Begê Îsal heft sale di mala babê xwe de xame bûye. Belê, babê wê her ji ber te keça xwe ‘Eyşa Bêzar Begê ne daye Mêr.. û em jî pê dizanin, ku keçên wekê Dotmama te ‘Eyşa Bêzar Begê rind û ciwan û hêja û berketî her di bajarê Cizîra Bota de peyda nabin. Vêce, eger tu bi ya me bikê em dê biçin dotmama te ‘Eyşa Bêzar Begê ji bo te ji babê wê bixwazin.

Dibê, gava xelkên civatê weha gotin. Di bersiva wan de, şah Mihemed Begê got: Madem ku we dotmama min ‘Eyşa Bêzar Begê laiq û babetê min dîtiye, min jî dotmama xwe ‘Eyşa Bêzar Begê qebûle. Weha min izna we jî da ye, ku hûn biçin dotmama min ‘Eyşa Bêzar Begê ji bo min ji babê wê bixwazin.

Dibê, gava Şah Mihemed Begê weha got. Hemen girgirek û rîsipî û mu’teberên Şah Mihemed Begê bi hev re ji dîwanê rabûn û qista mala Bêzar Begê kirin û çûn ‘Eyşa Bêzar Begê ji bo Şah Mihemed Begê ji babê wê xwestin û herêkirin û her di bajarê Cizîra Bota de, ji înê heta înê daweta Şah Mihemed Begê û dotmama wî ‘Eyşa Bêzar Begê li dar danên.

Dibê, her çendî Xezala keça Teyfûr Begê agahdarê bi van reyî û mişîwreta ye, û her li dor madorê Cizîrê hewedarê li daweta Şah Mihemed Begê û dotmama wî ‘Eyşa Bêzar Begê ye. Dibê, Xezala keça Teyfûr Begê qet bi Şah Mihemed Begê re nadî û nasitînê û ewî heftiyê Xezala keça Teyfûr Begê qet’iyen bi ser Şah Mehemed Begê de nehat.

Belê, her çendî ji vir pêde, heta bidawî ev hikayet me bi sitiranî tête gotin. Lê em dê evê hikayeta xwe her bi hikayetî em dê bidawî bînin.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, dibê piştî ku daweta Şah Mihemed Begê û dotmama wî ‘Eyşa Bêzar Begê her di Cizîra Bota de, ji înê heta înê hate li dar danîn. Şeva heştê ‘Eyşa Bêzar Begê kirin bûk û ji mala babê wê guhestine oda Şah Mihemed begê.

Belê, dibê, çawe bû şev xulam û xizmetkar û birazava ketin tenişta Şah Mihemed Begê û hêdî hêdî Şah Mihemed Begê birin oda ‘Eyşa Bêzar begê. Dibê, piştî ku zava birin ber derê oda wî. Hemen xulam û xizmetkar û birazava bi şûnde zivirîn û Şah Mihemed Begê çû di hindirwê odê de, û vêre vêre, Xezala keça Teyfûr Begê bi sinka wî girt û jê re got: Mîro, bi ku de, ez vê yekê qebûl nakim, ku tu biçê ser ciyê ‘Eyşa Bêzar Begê ev yek ne bûye û nabê.

Dibê, gava Xezala keça Teyfûr Begê her weha gote Şah Mihemed begê. Di bersivê de, Şah Mihemed Begê gote Xezalê: Tu neheqî. Belê, xirek ji wê cirek ji wî. Na, ‘Eyşa Bêzar Begê dihnê xwe dayê ku Xezala keça Teyfûr begê, wa derbekê li Şah Mihemed Begê bixê.

Dibê, hemen ‘Eyşa Bêzar Begê xwe avête di mabeyna Şah Mihemed Begê û Xezala keça Teyfûr Begê de û ‘Eyşa Bêzar Begê ji Xezalê re got:

”Ez hêvî dikim Xezalê, tu wa neke, çira mala bavê min kor neke, tu wê destê Şah Mihemed Begê ji destê min û xwe qut neke..

Dibê, gava ‘Eyşa Bêzar Begê weha gote Xezalê, hemen Xezal sekinî û êdî dengê xwe nekir.

Belê, ‘Eyşa Bêzar Begê gote Xezala keça Teyfûr begê:

Ez hêvî dikim bila bi rojê, pismamê min Şah Mihemed Begê linik min bê, da ku sebra min pê bê, û her daku kesek gazind û loma li me nekin û ti qusûra ji mala bavê min û te re çênekin.

Belê, bi şevê bela Şah Mihemed Begê li nik te bê, û her tişta ku te bivê bila wekî te bê, û min soz bê,min



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

we'id bê, ez nahêlim ku pismamê min mudaxelê bi min bikê.

Dibê, gava 'Eyşa Bêzar Begê weha got. Hemen keyfa Xezala keça Teyfûr Begê xweş bû, û reya 'Eyşa Bêzar Begê qebûl kir.

Belê, Şah Mihemed Begê jî dengê xwe nekir. Belê.

Dibê, her wekî reya 'Eyşa Bêzar Begê hal û wextê Şah Mihemed Begê berdewam kir. Heta çarde salê wan temam bûn. Bi rojê Şah Mihemed Begê wê di mala xwe de bi hakimtiya xwe meşxûl bê, û heta êvaran wê suhbetê digel dotmama xwe 'Eyşa Bêzar Begê bikê, û ji êvaran pêde, wê digel Xezala keça Teyfûr Begê derkevê çol û çiyan, heta ku dibêjin Xudê du kur ji Xezala keça Teyfûr Begê dane Şah Mihemed Begê û ew herdû kurên wî (ecnî) bûn li geliyê 'Evdal Begê diya wan di nava Ecniyan de xwedî dikirin. Heta ku ew herdû kur jî mezin bûbûn.

Belê, xelkên Cizîra Bota hemî bi vê yekê agehdar bûn û hemiyan bi hev re zanîn ku hal û wextê Şah Mihemed Begê û dotmama wî 'Eyşa Bêzar Begê bûye çi, û heta ku derbara Şah Mihemed Begê de ev kelîma weha req ji alê hindek cahil û nezanan ve hate gotin: Li yekê ra dikî, û li ya dî da dikê.

Dibê, rojekê Şah Mihemed Begê ev gotina weha req her biguhê xwe ji devî cahil û nezanan bihîst.

Dibê, dilê Şah Mihemed Begê gelek bi halê wî şewitî.

Dibê, Şah Mihemed Begê rabû gote Xezala keça Teyfûr begê:

-"Hirmet tu dizanî ku heta wekî îro jî her li gora reya dotmama min 'Eyşa Bêzar Begê em bi hev re rabûne û rûniştine, heta ku em her sê biwîne pêkeniyê 'alemê, ji îro pêde ev hal û wez'et bi kêrî me nayê. Vêce ez hêvî dikim ji îro pêde em dê bi çavekî merhemetê li dotmama min 'Eyşa Bêzar Begê jî



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

meyza bikin. Da ku gunhê wê jî bes bikevê situwê me û em jî bes pêkeniyê ‘alemê bin”.

Dibê, gava Şah Mihemed Begê weha gote Xezala keça Teyfûr begê. Hemen Xezala keça Teyfûr Begê mîna agirê sor li Şah Mihemed Begê meyza kir û jê re got:

“Ew yeke nebûye, û nabê. Belê, eger tu kêm zêde bikê, xwe divê, tu serê xulamê xwe ‘Elo qatilê diya min ji bo min hazir bikê”.

Dibê, gava Xezalê weha got. Dibê, Şah Mihemed Begê her weha bersiv da û got:

“Serê min di bedelê serê xulamê min ‘Elo de ye”.

Dibê, gava Şah Mihemed Begê weha got. Belê xirek ji wê xirek ji wî. Na, dilê Şah Mihemed Begê û jina wî Xezala keça Teyfûr Begê baş ji hev ma û bi rastî dijminayî kete di mabeyna Şah Mihemed Begê û Xezala keça Teyfûr Begê de.

Dibê, her bi şev Şah Mihemed Begê ji çolê ve hat, û çû, destê xwe li derê oda dotmama xwe ‘Eyşa Bêzar Begê xist û ji dotmama xwe re got:

“Dotmamê derê oda xwe li min veke”. Di bersivê de, ‘Eyşa Bêzar Begê got:

“Pismamo hêvî dikim tu we neke çira mala bavê min bi destê Xezala keça Teyfûr Begê ti kor neke”.

Di bersivê de, Şah Mihemed Begê got:

“Dotmamê, bi Xudê piştî dotmama xwe, ‘Eyşa Bêzar Begê ji îşev pêde min heyata dinê navê”.

Dibê, gava Şah Mihemed Begê weha gote dotmama xwe ‘Eyşa Bêzar begê, hemen dotmama wî mecbûr bû, rabû, derê oda xwe ji pismamê xwe re vekir.

Belê êdî çi bêjin. Hêj ji nû ve ‘Eyşa Bêzar Begê qufla sing û bera wê raberî pismamê xwe vekir, û her hê ji nû ve Şah Mihemed Begê wê şevê rûkê dotmama xwe ‘Eyşa Bêzar Begê sitand. Mast û sed carî mast.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, çawe fecrê veda, vêre vêre xezala keça Teyfûr Begê li ber derê odê hazir bû û got:

“Mîro, te kir, way Bego te kir,
Te ya xwe bi keyfa dilê xwe kir,
Sed cara bi eniya Mîrê xwe kim,
Te serê wî (‘Elo)kê xulamê xwe,
Bi qurbana rih û canê ‘Eyşa Bêzar begê,
Wê dotmama xwe kir..,
Lolo Mîro way lolo Bego”.

Dibê, her weha Xezala keça Teyfûr Begê gote Şah Mihemed Begê: “Divê tu ji bû min derkevê ser banê Kilyasê, yanî ser banê Birca Belek, da ku em çend gal gal û gotinan ji hev re bêjin û em ser û hesabên xwe li hev bikin”.

Dibê, piştî ku Xezala keça Teyfûr Begê weha gote Şah Mihemed begê. Hemen Şah Mihemed Begê cilê xwe li ber xwe kirin û derkete ser banê Kilyasê. Belê ewê û Xezalê çend gotin ji hev re gotin, ne gotin. Hemen ji nişkê ve her bi şûn ve Xezala keça Teyfûr Begê tehfek li Şah Mihemed Begê da û ji bilindayiya Birca Belek avête xwarê. Belê, vêre vêre, Xezala keça Teyfûr Begê li vê gunhê xwe peşîman bû. Belê peşîmaniyê feyde nekir.

Dibê, hemen Xezala keça Teyfûr Begê û digel ‘Eyşa Bêzar Begê herdû bi hev re bezîne ser termê Şah Mihemed begê. Belê Meyza kirin ku Şah Mihemed Begê ‘umur wî dayî hazir û guhdêra.

Dibê, hemen Xezala keça Teyfûr Begê li ber piyê Şah Mihemed Begê rûnişt û ‘Eyşa Bêzar Begê li ber serê wî, û herdiwan li ser termê Şah Mihemed Begê şîna wî şîn danîn.

Belê, êdî çi bêjin xelkên Cizîra Bota hemî bi hev re hatin termê Şah Mihemed Begê ji ‘erdê hilanîn rehmeta Xudê lê anîn.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, piştî ku Şah Mihemed Begê Botanî çû rehmetê. Xezala keça Teyfûr Begê êdî terka ‘Eyşa Bêzar Begê nekir û her li dewsa Şah Mihemed Begê Xezala keça Teyfûr Begê gelek qedr û me’rifetekî zêde, ji bo ‘Eyşa Bêzar Begê da diyar kirin.

Dibê, piştî ku şeş mehên wan temam bûn her ji ber wê şeva ku Şah Mihemed Begê rokê ‘Eyşa Bêzar Begê sitandî, ji qudreta Xudê, ‘Eyşa Bêzar Begê li halekî derket. Dibê, piştî ku neh mehên wê temam bûn. Xudê kurek da ‘Eyşa Bêzar begê. Belê navê wî danîn Mihemem Begê Botanî. Yanî navê babê wî lê kirin, û jê re hate gotin: Mihemed Beg kurê Şah Mihemed Begê Botanî.

Belê, dibê, Xezala keça Teyfûr Begê û ‘Eyşa Bêzar Begê gelek bi delalî Mihemed Begê xwedî kirin, heta ku Mihemed Beg du salî bû û ji şîr vebû.

Belê, dibê piştî ku Mihemed Begê sê salî bû, ber bi sala çar û pêncê bû, Xezala keça Teyfûr Begê rabû, izin ji ‘eyşa Bêzar Begê xwest û kurê wê Mihemed Begê her li çol û çiyan, gihande herdû kurên xwe yên (Ecinî). Yanî Xezalê Mihemed Begê gihande herdû birayên wî yên ecinî.

Dibê, ewan herdû birayên Mihemed Begê her li çol û çiyan Mihemed Begê di’elimandin ref û nêçîrê, û siwariyo, pêlewa-niyo, û nîşangeh û Mîr aniyê heta ku ‘umrê Mihemed Begê kete çardehê, berû pazdehê bû . Hêj ji nû ve xelkên Cizîra Bota rabûn Mihemed Begê her li dewsa babê wî kirin, Mîrê Bota.

Her bi vê çendê em hatin dawiya hikayet û bi serhatiya Şah Mihemed Begê Botanî û dotmama wî ‘Eyşa Bêzar begê.

Belê, ji vê hikayetê hate zanîn ku hindîke Mihemed Begê Botanî ye, kurê Şah Mihemed Begê û ‘Eyşa Bêzar Begê ye.

10-8-1982



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Sitirana Mihemed Şah, Mîrê Botan
# û
# 'Eyşa Bêzar Begê

Evê sitirana Folklorî, her bi hevpişkiya sitiranbêj Mirad 'Elî merhûmê Bafî û sitiranbêj Suleyman Mehmûd lawê Cinbirî, em dê ji bo xwendevanan bikin diyarî. Her weha....

Way, de, şehrê Cizîra Bota, şehrekî bi min ger e,
Lo lo Mîro, lo lo Bego
Lo lo Mîro, lo lo Bego
De, çiqanê li min xweş tê, dengê dimbilka,
Dimbilbaz, dahol û zirna,
De, daweta Mehemed şah, Mîrê Bota, çira beledê Kurda û,
'Eyşa Bêzar Begê dotmama wî ye wa digere,
Lo lo Mîro, lo lo Bego
Way, de, şehrê Cizîra Bota şehrekî bilind cî ye,
Lo lo Mîro, lo lo Bego

De, wê, bi rex Mehemed şah Begê Bota diketin,
Birra zavan û mixirgî* ye,
De, wê, dibirin sera Birca Belek,
Oda 'Eyşa Bêzar begê, dotmam wî ye,
De, xezala keça Teyfûr begê, xuhka 'Ezîz begê,
Hat û li wê dê sekinî ye,
Lo lo Mîro, lo lo Bego

De, wê digo: Mîro, bi ku de?!. Way Bego, bi ku de?!
De, ma qey nayê bîra te,
Wextê diya te, dikete li ser destê pîrika,
Li şikeftê zêreka,

* Mixirgî: Xizmetkar.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

De, hingî ezê dibûme pêrka te,
De, ma qey nayê bîra te, wextê tu û wê,
Diketî heft saliyê, berû deh saliyê,
De, gava tu û wê diketî çardehiyê,
Berû pazdehiyê,
De, tu û wê di çûwî gelyê ‘Evdal Begê,
Nêçîra heywanî pezkoviya, ezê bi te re bûm,
De, ma qey minê ti ji sing û ber û,
Cotî Memkê ‘Eyşa Bêzar Begê re, dihefdandî,
De, ya ne minê te hefdandî ji sing û ber û cotî memkê xwe re,

Lo lo Mîro, lo lo Bego

De, xezala keça Teyfûr begê, xuhka ‘ezîz Begê,
Bi destê Mehmed şah, Begê Bota,
Çira beledê Kurda, girt û revandî ye,
De, biriye gelyê ‘Evdal begê, şikefta muxlacî ye,
De, çardeh sala, herdû bi hev re wê mayî ye,
De, sala pazdehê Xezala keça Teyfûr begê, xuhka ‘ezîz Begê,
Hê ji nû ve destûra Mehemd şah, Begê Bota wê dayî ye,
De, Mehemd şah Begê Bota, ji gelyê ‘Evdal Begê
Li şehrê Cizîra Bota vegerî ye,
De, Mehemed şah Begê Bota, meyze kirî,
De, pişt çît û perdê bûkaniyê rûniştî ye,

Lo lo Mîro, lo lo Bego

Wey, de, ezê bi şehrê Cizîra Bota diketim,
Şehrekî li min belav e,
De, şah Mehemd Begê li xwe dikê destek cilê paşatî yê,
De, bi destê xwe digirê Kopalekî ji dar be nav e,
Bi hewayî Birca Belek dikevê, gazî dikê ‘Eyşa Bêzar
Dibê dotmamê,
De, tu wê derê oda qelemê ji pismamê xwe re veke,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

De, şeva nîvê di şevê li ser sing û berê,
Dotmama xwe silav e,
Lo lo Mîro, lo lo Bego

Wey, de, 'Eyşa Bêzarî, digo pismamo, ti we neke,
Hêvî dikim ti we neke,
De, tu wê mala xwe bi destê Xezala,
Keça Teyfûr Begê xuhka 'Ezîz Begê xirab neke,
De, wextê tu wê, diketî li ser destê pîrika,
Li şikeftê zêreka,
De, ji hingî, heta wekî îro,
Xezala keça Teyfûr Begê xuhka 'Ezîz Begê,
Ti hefdandî, ji sing û ber û cotê
Memkê xwe re.. Lo lo Mîro,
De, pismamo ezê gelkî ditirsim,
Xezala keça Teyfûr begê, xuhka 'Ezîz Begê,
De, îro, evê yekê, ji pismamê min re qebûl neke,
Lo lo Mîro, lo lo Bego

Wê, de, ezê bi şehrê Cizîra Bota diketim,
Şehrekî li wê navê,
De, şah Mehemed Begê li xwe dikê destek cilê paşatiyê,
De, bi destê xwe digirê Kopalekî ji dar be navê,
De, bi hewarî Birca Belek dikevê,
Gazî dikê 'Eyşa Bêzarî, dibê, dotmamê,
De, tu wê derê oda qelemê ji pismamê xwe re veke,
Wellah piştî dotmama xwe 'Eyşa Bêzar Begê,
Ji îro pê de, minê heyata dinê navê,
Lo lo Mîro, lo lo Bego

De, 'Eyşa Bêzar Begê, rabû derê odê qelemê,
Ji pismamê xwe re vekir,
De, şeva nîvê di şevê bû, qefl û miftê,
Sing û bera, cotê zer memika,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Wê, raberî pismamê xwe kir,
Lo lo Mîro, lo lo Bego
De, Xezala keça Teyfûr begê, xuhka 'ezîz Begê,
Digo, way Mîro te kir, way Bego te kir,
De, şeva nîvê di şevê bû,
Te wê, ya xwe bi keyfa dilê xwe kir,
De, sed cara bi eniya Mîrê xwe kim,
Te wê serê wî 'Elokê xulamê xwe,
Qatilê diya min rebenê,
Bi qurbana rih û canê 'Eyşa Bêzar Begê,
Wê dotmama xwe kir,
Lo lo Mîro, lo lo Bego

De, şah Mehemed şah , Begê Bota,
Digote 'Eyşa Bêzarî, yarî dotmamê,
De, ezê îro dihn û bala xwe didimê,
Xezala keça Teyfûr Begê çiqanê bê mirwet e,
De, serê 'Elo wê xulamê min dixwazê,
Bi Xudê îro gelkî ji min bê minet e,
De, dotmamê tu wê rabe, cilê minê,
Paşatiyê ji min re bêne,
Lê, Xezala keça Teyfûr Begê xuhka 'Ezîz Begê,
Ji îro pê de ji me re nadê qet muhlet e,
De, yarê Dotmamê, tu wê rabe heqê xwe ,
Li gerdena min aza ke,
Lê bi xudê, dîtina min û te, ev gav e, ev se'et e,
Lo lo Mîro, lo lo Bego

De, ezê rabim, cilê xwe ê paşatiyê
Li ber xwe kim,
De, ezê îro serê xwe bi qurbana,
Rih û canê wî 'Elokê xulamê xwe kim,
De, ezê bi hewayî Kilyasê Serbanê,
Birca Belek bi kevim,
De, ezê ji keyfa dilê xwe re ,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Li hewabayê Kurdistanê, li şehrê Cizîra Bota,
De ezê duhmekê ji xwe re seyr û temaşe kim,
Lo lo Mîro, lo lo Bego

De, Mehemd şah Begê Bota rabû,
Cilê xwe ê paşatiyê, li ber bejn û bala xwe kir,
De, bi hewayî Kilyasê Serbanê Berca Belek, wê diketo
De, li hewa bayê Kurdistanê, li şehrê ,
Cizîra Bota ji keyfa dilê xwe re,
Duhmekê Seyr û temaşe kir,
Lo lo Mîro, lo lo Bego

Wey, de, Xezala keça Teyfûr Begê,
Xuhka 'Ezîz Begê wa di hat û ji wê de,
De, bi şûn ve milê Mehemed şah Begê Bota
Çira beledê Kurda, wê digirt û,
Bê pirwekê tehfek lê da,
De, çiqanê Xezala keça Teyfûr Begê,
Xuhka 'ezîz begê, peşîman e di heyfê de,
De, 'Eyşa Bêzar Begê û Xezala keça Teyfûr Begê,
Xuhka 'Ezîz Begê, bi hev re, wê dihatin,
Li ber termê Mehemed şah Begê Bota, dirûniştin,
De, yekê şîna wî şîn danî
Ya dî, ji kul û xemê dilê xwe re, pîroz bê reş girêda
Lo lo Mîro, lo lo Bego

Hoy hoy hoy, hî î î î î î .....

Bi vê çendê em hatin dawiya sitirana Mehemed şah û 'Eyşa bêzar Begê. Ev sitiran bi giranî tê xwendin, yanî wextê sitiranbêj evê sitiranê dixwînin her kelîmekê, medeke tebî'î dixê, û bi dengekî melûl dibêjin. Yanî weha dest bi ewilê sitiranê dikin û dibêjin:



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Şehrê Cizîra Bota şehrekî bi min ger e
Şehrê Cizîra Bota şehrekî bi min ger e

Lo lo Mîro, lo lo Bego
Lo lo Mîro, lo lo Bego
Hoy, hî î î î î î î ....

Her weha heta bi dawiya sitiranê.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Peyzok

Ay, felek,... sed carî li min felek,
Wey, de, xelk û ‘alema Xudê li darê dinê,
‘Aşiq û me’şûqê zêr û zeynet malê dinê bûn,
Ez pepûk û goyînê Xudê bûme
‘Aşiq û me’şûqê bejna bilind,
Dêmanî sorgulî, herdû çavên reş û belek,

Wey, de, awirê vê gulmalê, kulmal,
Bê bavê, di mîna bûn,
Tifing û top û cebilxanê dewleta Osmanlî,
De, çawe, jî êvarî pê de deynin,
Li xopana Banê Xanê,
Di sehera sibhê re, bavêjine
Dîwan û taqê Birca Belek
Wey mala min

Wey, de, bi Xudê, serxatirî,
Bejnika bilind, dêmanî sorgulî,
Herdû çavên reş û belek,
De, ji êvarî pê de, emê çengilê,
Bejnika bilind bigrin, ji Berwarê Mîra birevînin,
De, emê, deling û tîlikê xwe hilbikin,
Emê berê xwe bidin,
Birokê Mele ‘Eliyê Civane, de, bilezînin,
Emê dê, biçin, xwe bavêjin, xopana,
Gundê Civane mala şêxê xwe Şêx Melek,
Ey de, rabe, keziyo sorî, mala minê.

*Ev her sê kertik jî ji sitirana Peyzokê ne, ji devê sitiranbêjekî mechûl, me wergirtine, her weha dibê:*



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Ey, lê, de peyze, ‘ewra li ‘esmana,
Li min ‘evdalê Xudê, kiribûn hewar û gazî,
Ey, lê, xumîn û nalênek ketibû ser rêlê xirab,
Li min ‘evdalê Xudê, weşiya bûn,
Pelkê darê mazî,
Wellah yeqîna dilê min ‘evdalê Xudê ew e,
Dilê bejnika bilind ji me mabû,
Ji lomanê bejnika bilind, neqeba çilê,
Herdû kanûnê zivistanê,
Destikê nêrgiz û sosin û beybûna ji min dixwazî,
Ey lê, de, rabe xizêm şûrê mala minê,

Ey, lê, de, peyze, çiqanê li min ‘evdalê Xudê,
Der wextê teng e,
Ey, lê, xumîn û nalênek ketibû ser rêlê xirab,
De, çiqanê li ser delavê mala xweyî şewitî,
Nayê ti pêjin û deng e,
Wellah ezê terka bejnika bilind nakim,
Heta hastîkê min ‘evdalê Xudê,
Di binê ‘erdika giran de bigirin zincar û zeng e,
Ey, lê, de rabe xizêm şûrê mala minê,

Ey, lê, de, peyze, ez ‘evdalê Xudê,
Îro ketime ser rêka zozanê jorî,
Ezê bi Herekola Mîr a ve çûme,
Heta nîvî,
Ey, lê, de, çiqanê li min xweşî,
Dengê qebqeba kewî qeng e,
De, na, Wellah, pîrke pîrka heywanê pezê kovî.

## Xizêmoka Bota



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Hikayet û sitiranekî bi nav û den e. Ji devê sitiranbêj ‘Elî-Xanê Sulhanê Saroxan lawê Suhrî re’êla koçerên Suhran, ji koçerên Botan me bihîst. Em dê dest bi nivîsandina çîrokê bikin.

‘Elî-Xan got:

Mîr Şeref û Mîr Mehima birayê hev bûn, û ew herdû Bira Mîrên Cizîra Bota bûn. Belê, hindîke Mîr Şeref bû, birayê mezin bû, û Mîr Mehima birayê biçûk bû.

Ji bo Mîr Şeref bikî, linik şêxekî, melekî, tuxtorekî, hekîmekî hemen belkî, ji niviştekî, ji tilismekî, ji dermanekî, ji ‘ilacekî, ji bo Mîr Şeref peyda bikî.

Dibê, gava wê, weha got, ya dî got: Hayê, xukê, de, em bêjin, dibê, yekê weha got:

Way, li min, way li min, way li min, way li min,
Way, li min, way li min, way li min, way li minooo,

Wey de, şekir û nebat ji Hindê ne,
Xizêm û qerenfil cîranê lêvê ne,
Ewir dikê li binê gula melûlîn,
Xezelê li binê di berê ne,
Nêçîrvanê wan li pê ne,
Kesekî ti dewir û ti zemana ne dîtî ye,
De, çawe dibinê Behra de, masî binalin ji tihn e,

Wey, li minooooo
Dibê, ya dî, jî lê vegerand, û got:
Way li min,

Dibê, şekir û nebat ji Hindê Herdû hevalên
Ordekê li binê gola melûl in,
Xezalê li binê beriyê,
Nêçîrvanê wan li bal in,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Kesekî ti dewir û ti zemana ne dîtî ye,
De, çawe, dibinê behra de, masî ji tihna binalin,
Way li min, way li min, way li min, way li minooo.

Dibê, gava herdû jinên Mîr Şeref, yanî (Şekir û Nebat)ê Weha gotin, Mîr Mehima dengî wan kir, û me'na xeberdana herdiwan, fehem kir, û ji bo xwe got:

"Wellah, hebê ne bê, birayê min Mîr Şeref ne mêr e".

Dibê, çawe bû êvar, dîwana Mîr Mehima geriya, heta wextê razanê, civat belav bû, her kesekî çûne malên xwe.

Dibê, Mîr mehima û xulamên xwe bi tenê, mane li hind riwê dîwanê.

Dibê, Mîr Mehima gote xulamê xwe:

"Here bêje Mîr Şeref bila werê dîwanê".

Dibê, xulam rabû, çû, gote Mîr Şeref:

"Duhmekê, were dîwanî, pirsek ya Mîr Mehima bi te heye".

Dibê, hemen Mîr Şeref rabû, hate dîwanê. Dibê, hêj Mîr Şeref ne rûniştî, her wisan, hê ji piya. Mîr Mehima wisan bi hêrs gote Mîr Şeref: "Kuro, Şero, bi rast tu ne mêrî?!".

Di bersivê de Mîr Şeref got: "Belê Mîrê min".

Dibê, çawe Mîr Şeref weha bersiv da, hemen Mîr Mehima serê xwe xiste di nav 'ebayê xwe de, û hizir û bîrên xwe kirin, û hiş û 'aqilê xwe, li cî û memleketan, û li şehr û bajaran, gerand, û her weha ji bo xwe got: " 'Eceba ez dermanekî ji bo derdê birayê xwe ji ku peyda bikim, û ez birayê xwe bibim ku derê, wê sax bibê, û ne mêriya wî ya , jê biçî!!".

Belê, her weha Mîr Mehima bi hizir û bîrên xwe ve meşxûl bû, û her wisa Mîr Şeref jî, ji pê ve ma rawestehayî.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, heta qederê se'etekê kete wê navê . Mîr Mehima serê xwe, ji nav 'ebayê xwe bilind nekir.

Dibê, her ji Mîr Şeref ve ew bû ku Mîr Mehima bi xwe ve çûye.

Dibê, hemen Mîr Şeref her wisan bê pêjin bi şûn de zivirî mala xwe.

Dibê, çawe Mîr Şeref ji dîwanê zivirî mala xwe. Dibê, xulamekî Mîr Şeref hebû. Navê wî Remezan bû, û ew bixwe Finikî bû, û jê re digotin (Remo)wê Finikî.

Dibê, Mîr Şeref gote jinên xwe: "Rabin, haziriya min bikin. Îşev ez di Cizîra Bota de namînim. Ji îşev pê de, ax û avên Cizîra Bota li min heram bin. Ciyê min di Cizîra Bota de nema.

Dibê, çawe Mîr Şeref weha gote jinên xwe, hemen herdû jinên wî, sivik rabûn, bi bez haziriya sefera Mîr Şeref kirin.

Belê, xulamê wî Remowê Finikî got:

"Mîrê min, hemen Wellahî, ez jî dê bi te re werim".

Dibê, Remowê Finikî rabû hespê Mîr Şeref ji tewilxanê biderxist, û zînê hespî, avête ser pişta wî, û Mîr Şeref bi xêra Xudê, siwar bû, û Remowê Finikî jî li hespekî siwar bû, û ew jî kete tenişta Mîr Şeref, û ji nîvê şevê pê de, ji bajarê Cizîra Bota biderketin.

Belê, her bi dilkî şikestî, Mîr Şeref Mîrê Bota pişta xwe da felekê, û berê xwe da oxirê û qista bajarê Sitenbûlê kir.

Dibê, Mîr Şeref û digel xulamê xwe Remowê Finikî her qunax bi qunax, bi sefera dûr û dirêj, meşîn, û çûn heta ku gihiştin bajarê Sitenbûlê.

Dibê, Mîr Şeref û xulamê xwe Remo, herdû ketine nava kolanê Sitenbûlê û meşîn, heta ku li derê xanekê peya bûn, û herdû hespên xwe, xistine di xanê de. We her li ber wê xanê odekek ji bo xwe kirê kirin. We her li ber eywana wê odê Mîr Şeref û digel xulamê xwe, ji xwe re rûniştîn.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, dibê, her li pêşberî oda wan qesrekî sê tabiq hebû, û qesir ya xwîşka Sultanê dewletê bû.

Dibê, navê xwîşka Sultanê dewletê (Şehperîxan) bû, û di wê hînê de, Şehperîxan di hindirwê qesra xwe de li ber pencerê rûniştî bû.

Belê, çavê Mîr Şeref weha bi riwê Şehperîxanê ket. Bayê evîna Şehperîxanê li dilê Mîr Şeref xist, û kul û xemên wî zêdetir bûn.

Dibê, Mîr Şeref gote Remowê Finikî:

"De, ka, ji bo me, Peyzokê bibêje".

Dibê, hindîke Remowê Finikî bû, dengbêjê wekî wî her di ciyê Bota de, peyda ne dibûn.

Dibê, her di bersiva Mîrê xwe de, Remowê Finikî destê xwe xiste dibin guhê xwe de, bi dengekî melûl û got:

Way li min dibê,
Wey de, ezê dînê Muhemed dihebînim,
'Elî siwar e li dundilê,
De, ezê li quba Ûnis pêxeber(pêxember)difikirim,
Miqabilî dergehê vê Mûsilê,
De, ezê li şetyanî Bota difikirim,
Li dora Cizîra Bota difitilê,
De, ezê, hindî 'aşiq û me'şûqê dînê Muhemmed im,
Heç wekî şalûl û bilbil, 'aşiq û me'şûqê tayê vê sorgulê,

Way li min, way li min, way li min, way li min,
Way li min, way li mino o o o o o o o

*   *   *

<u>*Li vê dê bû sitiran*</u>

Way, li min dibê,
Ew hicroka li derê xanê,
Li te qufle ji dirrê, mifte ji mircanê ,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

‘Alem dixwînin vê quranê,
Sebeb xatirê vê îmanê,
Rabûne sed û bîst û çar hezar pêxember,
Muhemmed pêxember e, pêxemberê êxir zemanê

Way li min, way li min, way li min, way li min,
Way li min, way li min,way li min, way li mino o o

Way li min dibê,
Way li te serkanî û ‘esilî ne,
Li te avşûka ji ber xwe berdane, av û cûbar herikîne,
Li me birîndara, birên kul in her şîn e,
Em çibikin, hekîm û tebîbê me tinîne,
Hekîm û tebîbê me keçkokê bi kezî ne,
Îro sê roje van tereza,
Qûtiyî û melhemê xwe hilanîne,
Ji ser birînê me birîndara wê çûwîne.

Way li min, way li min,way li min, way li mino o o

Way li min dibê,
Keçkûkê, weyla, li te xweş kokê,
Weyla, li te ser bizêrê, enî bi ribê(çerxê),
Sitû bi zirhokê,
De, hindî min diviya, ezê kelamekê bêjim
Ji Peyzokê,
De, çiqa ‘aqilê min şewişî, dengê min xirabû,
Meqamê min qulibî ser meqamê Xizêmokê,

Way li min, way li min, way li min, way li min,
Way li min, way li min,way li min, way li mino o o

Way li min, dibê,
Wey li te hostawo hostakaro,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Wey li te sed carî malik ne bi xana xudê bê,
De, tuwê rabe xizêmokê ji dostika min çêke,
Ne ji hemî zêra, belkî ji zêrê Hindistanê,
Tuwê navêje di korê, di xêrgemanê,
Tuwê, ne deyne li ser sindanê,
Tuwê, lênede bi çakûç û mezrebanê,
Tuwê, ne rahêjê bi gaz û bi kêlbetanê,
De negirê tenyok û her xuhdanê,

De, tuwê bigire bi dinanî,
Bimije bi lêvanî,
Paqij bike bi zimanî,
Bihingêve bi taykê rihanê,
De, tuwê deyne nav guhê vê dikanê,
Belkî rojekê bigehê te, destikê xudanê,
Hêdî hêdî, rojekê bibite heqî ramûsanê,

Way li min, way li min,way li min, way li mino o o

Wey, de, xwezika min zanîba neqeba xizêmo,
Qerenfilê çi qeder e,
Wey, di sere pira xundkarê dinê Islamê ye,
Di bin re merqeda Ûnis pêxember e,
Wey de, hecî kesê dostika wî ya baş,
Di vî bajarî tune bê,
De, wekî filehekî Ermenî ye, ji her çar,
Dîn û mezheba bi dere

Way li min, way li min,way li min, way li mino o o

*<u>Li vê dê dibe hikayet</u>*

Dibê, gava Remowê Finikî weha bi dengê xwe yî melûl, ev sitiran ji bo Mîr Şeref got, û Şehperîxanê jî, zêrevanî li dengî wî kir, û her wê hînê çavê



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Şehperîxanê bi bejn û bala Mîr Şeref ket. Belê ne bi dilekî, belkî bi sed dilî, Şehperîxanê dil kete Mîr Şeref û Şehperîxanê zanî ku Mîr Şeref û xulamê wî Remo herdû ji memleketê şerqê ne. Ji ber ku Şehperîxanê bi zimanê Kurmancî dizanî.

Dibê, Şehperîxanê gote xadima xwe:

”Sivik rabe , da ku em xwarinkî paqij çêbikin, û em dê îşev, evan herdû zelamên xerîb, ziyafet bikin”.

Dibê, hemen xadim bi lez û bez bi xizmetê rabûn, û Şehperîxanê xwarinkî faxire hazir kir, û danî di sêniyê de. Belê, hindek zêr xistin di binê tepsikê de û hindek xwarin valekire ser ewan zêra û sêniya xwarinê da destî xadima xwe, û ji xadima xwe re got:

”Evê xwarinê bibe bide destê evan herdû mihvanên delal, û ji ber min ve silavan li wan bike, û pirsa hal û ehwalên wan bike, bê ma ka ew çi kesin?, û ew ji ku hatîne?, û ji wan re bibêje, hindî ku ew li bajarê Sitenbûlê ne, ew misafirê me ne. Çênabe ku ew ji cîrantiya me biçin, hindek mehelên dî”.

Dibê, xadimê, sêniya xwarinê bir, û da destê Remowê Finikî û bi xêrhatin da wan, û pirsa hal û hewalên wan kir. Belê Remo-wê Finikî bersiva xadima Şehperîxanê da û got:

” Em pir minetkarin ji bo hurmeta Şehperîxanê û heta ku nesîbê me li bajarê Sitenbûlê ye em ji cîrantiya we, bi derek dî ve naçin. Û Remowê Finikî gote xadimê hindîke mezinê min e Mîr Şeref Mîrê Cizîra Botan ye, û ez bixwe jî xizmetçiyê wî me”. Her weha...

Dibê, xadim zivirî nik Şehperîxanê û hal û ehwalê Mîr Şeref û xulamê wî ji bo Şehperîxanê got.

Belê, xadimê ji bo Şehperîxanê pir pesnê lawîniya Mîr Şeref kir, û jê re got:

”Lawên wekî Mîr Şeref her di bajarê Sitenbûlê de peyda nabin”.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, piştî ku xadim zivirî nik Şehperîxanê, Remowê Finikî rabû, li ewan tepsiyê xwarinê meyze kir, da ku bizanê bê ma ka, çi xwarin di ewan tepsiya de ye.

Dibê, Remo rahişte tepsîkê meyze kir tuqla tepsiyê pir giran e.

Dibê, Remo rabû, ew tepsî vala kir. Belê, meyze kir, ku bi qederê kulmek zêr wê dibinê wê tepsiyê de ne. Dibê, Remo re bû, ew zêr berdane di binê berîka xwe de, bê ku Mîr Şeref pê zanibê.

Dibê, hêj ji nû ve, Remo ew tepsîniya xwarinê anî danî ber xwe û Mîrê xwe. Dibê, piştî ku xwarina xwe, xwarin, û xadim carek dî hat ew sîniya (firaxa) bir. Dibê, Remo digel Mîr Şeref xeber da û jê re got: ”Mîrê min ji ev rû pê de, feleka me, wê rast bizivirê. Vêce, ez hêvî dikim, ku tu izna min bidê, her sibê ez dê derkevim nava bajarê Sitenbûlê siyahetê, û êvara ez dê bizivirim nik te”.

Di bersivê de, Mîr Şeref got: ”Remezano, ji ev rû pê de, çerxa feleka me bi destê te ye, tu serbestî”.

Dibê, çawe ew şev çû, û bû sibe, xadimê taştiya wan anî.

Belê, piştî ku xwarina xwe xwarin. Remo rabû şal û şapikê Botanî ji ber xwe kirin, û li şûna şal û şapikê Botanî bala xwe kir, û derkete nava bajarê Sitenbûlê. Belê, hindîke Remowê Finikî bû, Lawekî kinî guloverî li hev hatî bû, û ‘aqilmendekî temam bû.

Dibê, piştî ku Remo derkete nava bajarê Sitenbûlê. Dibê Remo çavê xwe li nava bajarê Sitenbûlê gerand. Çiqas lawekî xelqên şerqê ber çavê Remo ket, Remo keyfxweşî dayê, û xwe bi wî re da nas kirin. Me’lûme di nava bajarê Sitenbûlê de lawên Kurda pir bûn. Hemî karkir û ‘îşçî bûn. Dibê, her sibê Remowê Finikî, wê derkevê nava bajarî û wê lawên Kurdan li dora xwe berhev bikê, û wê ewan lawan her di



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

luqenta û met'eman de, xudan bikê, û wê mi'aşê wan jî, her roj wê bidê wan. Bê ku Mîr Şeref pê zanibê.

Belê, em ewqas hikayetê dirêj nakin. Dibê, heta sal qulibî sala dawî Remowê Finikî her di bajarê Sitenbûlê de sê sed lawên Kurdan kirin dibin hukmê xwe de. Belê, her ji bo evan lawan, Remowê Finikî sê sed hesp û sê sed taximên çek û silah kirîn, û her ji bo paşerojê, lawî Finikî kar û barekî giran hazir kir.

Her weha.....

Dibê, rojekê ji rojan deng bi nava bajarê Sitenbûlê ket, û gaziya herbê hate hildêran, û hate gotin, ku quweta 'eskerê Yûnan dorayî bajarê Sitenbûlê girt, û Sultanê dewletê bi heyeta xwe ve derketin ser sûra Sitenbûlê û temaşe li meydana herbê kirin.

Belê, Şehperîxanê jî, bi vê yekê hesiya û 'eskerê Yûnan hatiye ser Sitenbûlê, û 'eskerî islamê jî ber singa 'eskerê Yûnan girtiye, û herba giran, daketiye meydanê.

Dibê, Mîr Şeref jî, bi tiştekî hesiya bû. Belê, baş nizanî bû, ku çi qewimî ye.

Dibê, Mîr Şeref gazî Şehperîxanê kir û jê re got:

" Ev çi qewimî ye?!".

Di bersivê de, Şehperîxanê got:

" Mîrê min, 'eskerê Yûnan hatiye ser bajarê Sitenbûlê, û herba giran ketiye di mabeyna 'eskerî Yûnan û 'eskerê Islamê de...û birayê min Sultanê dewletê bi heyeta xwe ve, derketine ser sûra Sitenbûlê temaşeyî meydana herbê dikin".

Dibê, gava Şehperîxanê weha got. Hemen Mîr Şeref gote Remowê Finikî :

"De, ka, rabe, da em jî biçin ser sûra bajarî ji bo xwe, em jî temaşeyî meydana herbê bikin".

Dibê, Mîr Şeref û Remowê Finikî herdû jî rabûn çûne ser sûra bajarî, rûniştin û wan jî ji xwe re temaşeyî meydana herbê kirin.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, çawe çavê Mîr Şeref bi meydana herbê ket, dibê, rayên Kurdayetî li eniya Mîr Şeref li hev duta bûn, û her ji nava dilê wî keserek hatiyê, û rondikan di çavê wî re avêt.

Dibê, Remowê Finikî got:

”Mîrê min, ev ji bo çi tu weha xemgîr bûwî?!”.

Di bersivê de, Mîr Şeref got: ”Remezano, ez Mîr Şeref Mîrê Bota me, ev ro, ez kesekî ji lawên Kurdan, li dora xwe nabînim, ma çawe, ez xemgîr nebim”.

Di bersivê de, Remo got:

”Mîrê min, eger ez îro firqek ‘eskerê pêk hatî, ji lawên Kurdan, ji bo te hazir bikim, tu çi bi min didê?”.

Di bersivê de, Mîr Şeref got:

”Remezano, eger tu firqek ‘esker ji lawên Kurda tu ji bo min hazir bikî, ez dê taca xwe ya Mîrîtiyê, li ser serê te deynim”.

Dibê, gava Mîr Şeref weha got, hemen Remowê Finikî rabû qista nav lawên Kurda kir.

Dibê, lawên Kurda li dora Remowê Finikî berhev bûn. Belê, sê sed lawên Kurda, bi hev re çek û silah girêdan, û li hespan siwarbûn û bi hev re li ber emrê Remowê Finikî rawestiyan. Dibê, Remowê Finikî kete pêşiya selefa siwara anî li ber Mîr Şeref hazir kir.

Dibê, Remo çû hespê Mîr Şeref jî anî û Mîr Şeref jî, cilên herbê li xwe kirin û li hespê xwe siwar bû, û kete pêşiya selefa siwara. Belê, Mîr Şeref Mîrê Bota bi selefa xwe ve dakete meydana herbê, û Sultanê dewletê bi heyeta xwe ve temaşeyî selefa Mîr Şeref kirin. Belê, kesek evê selefî nasnakê, ku ev selefa siwara selefa kê ye?!.

Belê, dibê, Mîr Şeref selefa xwe ya siwara ber pêşiya taximên ‘eskerê Islamê hemiyan û di cebhê pêşîn de selefa xwe sekinand.

Belê, piştî ku defa herbê hate lêxistin.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, Mîr Şeref bi selefa xwe ve hucûmat birin ser quweta ‘eskerê Yûnan û quweta ‘eskerê Yûnan şikandin.

Belê, heta ku bû êvar, her bi çend (k.m) metra ‘eskerê Yûnan ji bajarê Sitenbûlê bi dûr xistin. Belê, dibê heta sê roj û sê şeva Mîr Şeref bi selefa xwe ve li quweta ‘eskerê Yûnan xist. Belê ‘eskerê Yûnan ji mentiqa Sitenbûlê bi temamî derxistin, û lawên Kurda, qiralê Yûnan di binê çadirê de êsîr kirin, û serê wî jêkirin. Belê, li sera dewleta Osmanlî, hediye kirin.

Belê, piştî ku Mîr Şeref divê herbê de bi serket. Dibê, her di sera dewletê de, Sultanê dewletê bi heyeta xwe re mişaweret kir, û got: ” Emê çi ikramiyê li Mîr Şeref bikin”. Di bersivê de, heyeta Sultan qirar dan ku Sultanê dewletê xwîşka xwe Şehperîxan bidê Mîr Şeref.

Dibê, gava heyeta Sultan weha qerar dan. Dibê, Sultanî dewletê rabû, rê kire pê Mîr Şeref.

Dibê, Mîr Şeref ew digel xulamê xwe hatine sera dewletê, huzûra Sultan.

Dibê, Sultan gote Mîr Şeref: ” Em pir minetkarin ji bo te, ku tu, di vê herbê de bi serketî. Belê, em dê hîvîdarin ku tu jî hedyekê ji me qebûl bikî. Vêce bi serbestî daxwaza xwe, ji bo me, diyar bike. Bê ma , ka te ji zik yan te ji pişt??”.

Belê, her ji ber Mîr Şeref ve, Remowê Finikî bersiva Sultan da, û got: ”Sultanê min, me, ji zik”. Û vêre vêre Remowê Finikî çû destî Sultan û xwîşka wî Şehperîxan ji bo Mîr Şeref qebûl kir, û daweta wan li dardanî. Belê, piştî ku Sultanê dewletê xwîşka xwe Şehperîxan li Mîr Şeref da mehirkirin.

Dibê, Şehperîxan kirin bûk û guhestine oda Mîr Şeref. Dibê, çawe bû êvar Mîr Şeref çû hindirwê oda xwe, û bi xêrhatin û pîrozbahî da Şehperîxanê. Belê,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Mîr Şeref her wekî berê li ser cê xwe raza û Şehperîxan jî li cîkî dî raza.

Heta ku heftiya wan temam bû. Dibê, Mîr Şeref têkilayî bi Şehperîxanê ne kir. Dibê, rojekî Şehperîxanê gote Mîr Şeref: ”Mîrê min, derdê te çiye ku tu tîkilayî bi min nakî?!”.

Di bersivê de, Mîr Şeref got:

”Keça qenc, ez çi bêjim, rûwê min ji te girtî ye. Belê, ez çibikim qey qedera xudê ye. Ez nexweş im, û derdê ne mêriyê bi min re heye, û her ji ber vî derdê xwe min terka memleketê şerqê kiriye, û ez hatime bajarê Sitenbûlê û heta ev ro jî min tu hekîm û tebîb ji bo derdê xwe peyda ne kirine”.

Dibê, gava Mîr Şeref weha gote Şehperîxanê. Dibê, hemen Şehperîxanê gazî Remo kir. Belê Remowê Finikî li ber emrê Şehperîxanê hazir bû. Gelê Şehperîxanê gote Remowê Finikî: “Divê tu izna me bidî, da ku em hekîmekî bênin ji bo derdê Mîr Şeref”.

Di bersivê de, Remo got: ’Xatûna min, her çendî ez xulamê Mîr Şeref im, belê îro tu ji min lêzimtirî ji bo Mîr Şeref. Her ji ber vê yekê tişta ku tu emir bikî, em dê wusan bikin”.

Belê, dibê, xulamekî Şehperîxanê hebû jê re digotin Cuhûwê Belek. Dibê, hekîmên wekî Cuhûwê Belek di nava bajarê Sitenbûlê de, peyda ne dibûn.

Dibê, Şehperîxanê gote Cuhûwê Belek:

’Divê tu hekîmiya xwe li Mîr Şeref serif bikî”.

Dibê, Cuhûwê Belek rabû emir kir laşê Mîr Şeref baş bi ava germ û sabûnê şuşt û hindek xûn ji rayeka nav milê wî berda, û baş derman kir. Bi emrê Xudê, Mîr Şeref şifa bû, û derdê wî yê nemêriyê jê çû.

Hêj ji nû ve Mîr Şeref û Şehperîxan herdû bi miradê xwe şabûn.

Dibê, ku mudetek kete wê navê û çend heyv bi ser wan de bihurîn. Dibê, rojekê Remowê Finikî rabû hêj



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

ji nû ve taxima cilên romanî ji ber xwe kir, û şal û şapkên Botanî li ber bejn û bala xwe kir, û kum û kolos bi ser eniya xwe de xwar kir.

Belê, her bi vê heyetî ve Remowê Finikî qista oda Mîr Şeref û Şehperîxanê kir.

Dibê, çawe Remowê Finikî çû di hindirwê oda Mîr Şeref de û her li pêşberî Mîr Şeref li ser kursî rûnişt û destê xwe xiste di bin guhê xwe de û her bi dengê xwe yê melûl dest bi sitirana Xizêmokê kir û got:

*Li vê dê dibê sitiran*

Hey, li min,
Dibê, kul û xeman ez pîr kirim,
Wey, de, hêstirê çavan ez kor kirin,
De, gava, lawkî min rebenê çû welatê,
Xerîbiyan û xurbeta, ez ji bîr kirim,
Way li min, way li min, way li min, way li minooo

Wey li min, dibê,
Ew qere Sitenbûlê bi şehr û mil in,
Sûk û dikanê van berbera miqabil in,
Xudîkî hûnê bê dilya me xerîba nekin,
Emê ji welatê bav û kalê xwe hatine,
Dil bi xem in, dil bi nazin, dil kul in,
Way li min, way li min, way li min, way li minooo

Wey li min dibê,
Ew qere Sitenbûlê bi dar û ber e,
Wey hezar millet lê digere,
Xudîkî hûnê bê diliya me xerîba nekin,
Emê ji welatê bav û kalê xwe hatine,
Dil bi kul e, dil bi xem e, dil bi naz e, bi keder e,
Way li min, way li min, way li min, way li minooo



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Wey li min dibê,
Ew qere Sitenbûlê bi şehr û saz in,
Li ser datîne quling û qaz in,
Xudîkî, hûnî bê diliya me xerîba nekin,
Emê ji welatê bav û kalê xwe hatîne,
Ji wê dil bi kul in, dil bi xem in, dil bi naz in,
Way li min, way li min, way li min, way li minooo

Her weha.....

Remowê Finikî sitirana Xizêmokê berdewam kir heta bi dawiya sitiranê. Belê, rondik ji çavê Mîr Şeref hatin xwarê. Mîna çipikê baranê.

Dibê gava Şehperîxanê ev yeka li ber çavê xwe dît. Dilê Şehperîxanê gelekî bi Mîr Şeref sot.

Dibê, Şehperîxanê gote Mîr Şeref:

"Madem ku dilê te li ser ciyî û memleketê te heye, ti ji bo çi, xundakarê dînê islamê bi halê xwe nahesînî?!".

Di bersivê de, Mîr Şeref got: "Emrê me di destê te de ye".

Dibê, gava Mîr Şeref weha got. Hemen Şehperîxanê rabû, çû, nik birayê xwe Sultanê dewletê, û destûra Mîr Şeref ji birayê xwe xwest.

Dibê, Sultan destûra Mîr Şeref da ku ew bizivirê Cizîra Bota.

Dibê, Şehperîxan ji nik Sultan zivirî û hate nik Mîr Şeref û mizgînî da Mîr Şeref ku Sultanê dewletî destûra wî daye, ku ew bizîvirê Cizîra Bota. Me'lûme keyfa Mîr Şeref gelek hat. Ji ber ku ew pênc sal bû Mîr Şeref ji Cizîra Bota bi derketî welatê xerîbiyê.

Dibê, Sultanê dewletê heyeta xwe li sera dewletê berhev kirin, û gazî Mîr Şeref û xulamê wî Remowê Finikî, û xwîşka xwe Şehperîxanê kir.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, Mîr Şeref digel xulamê xwe, ew digel Şehperîxanê hatine sera dewletê û di huzûra Sultanê dewletê de hazir bûn.

Belê, Sultan digel xwîşka xwe Şehperîxan xeber da û jê re got: ”Xwîşka min, ji îro pê de tu wê biçê Cizîra Bota welatê xerîbiyê, vêce, ji bo min, daxwaza xwe diyar bike, da ku ez her bi dilê te, daxwaza te, bi cih bînim, û her tu jî, min helal bikî”.

Di bersivê de, Şehperîxanê got: ”Sultanê min, her di rêya Xudê de min heqê xwe li gerdena te aza ye, û ji malê dunyayê, min tiştek ji te navê .Belê, min di vê ku tu xulamê min Cuhûwê Belek, û Hosta Hena evan herdû şexsan tu bidî min”.

Dibê, Sultanê dewletê, (Cuhûwê Belek) û (Hosta Hina) yê Ermenî, teslîmî xwîşka xwe Şehperîxanê kirin.

Belê, dibê, hindîke Cuhûwê Belek bû her çendî xulamê Şehperîxanê keça dewletê bû, belê, hekîmên wekî wî, û zengîn û maldarên wekî wî, ne li bajarê Sitenbûlê û ne li tuwî memleke-tan peyda ne dibûn.

Belê, dibê, rabûn malê Cuhûwê Belek anîne ber mezatê, û malê wî bi temamî firotin.

Belê, Mîr Şeref û Remowê Finikî kar û bara xwe kirin, û ‘eskerê Mîr Şeref, yanî lawên Kurda, hemî bi hev re li dora Mîr Şeref ber hev bûn, û bar û barxanê mala Şehperîxanê barkirin, û xatir ji Sultanê dewletê xwestin, û ji bajarê Sitenbûlê heraket kirin û berê xwe dane memleketê şerqê û qûnax bi qûnax hatin, heya ku nêzîkî li Cizîra Bota kirin.

Dibê, xeber gehişte Cizîrê ku Mîr Şeref Mîrê Bota bi xêra Xudê ji xurbetê zivirî, û hate nêzîkî Cizîrê.

Dibê, xelkê Cizîra Bota bi hûr û giran ve def û zirne hate lêxistin û çûne pêşiya Mîr Şeref.

Dibê, Mîr Mehima di nava xelkên Cizîrê de gelek ber xwe ket. Ji ber ku wextê Mîr Şeref ji Cizîra Bota



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

biderketî, heta wekî wê rojê, Mîr Mehima her li şûna Mîr Şeref Mîrîtiya  Bota dikir, û rojekî bi tinê jî Mîr Mehima pirsiyarî li birayê xwe Mîr Şeref nekiri bû.

Belê, dê çi bêjin Mîr Mehima mecbûr bû ew jî çû pêşiya birayê xwe Mîr Şeref û destê birayê xwe Mîr Şeref maçîkir.

Belê, Xelkên Cizîrê rabûn çadira Şehperîxanî her li ber ava Şetî vedan û axa û maqûlên ‘eşîretên Bota hatine serdana Mîrê xwe Mîr Şeref û hêj ji nû ve Mîr Şeref bi miradê xwe gehişt û bi herdû heremên(jinên) xwe yî dî jî şabûn.

Belê, dibê piştî ku maqûlên ‘eşîretan hemî hatine serdana Mîr Şeref ji xeyrî (Eblehid) file, kefxuwê gundê (Misûrî)yê . Belê, Remowê Finikî û nehatina (Eblehid) file, xiste di dilê xwe de, û ji xwe re got: “ Heta ku roja wî bê”.

Dibê, Şehperîxanê emir kir ku her bi malê Cuhûwê Belek Birca Belek ava bikin.

Dibê, her bi emrê Şehperîxanê rabûn bi hezaran şagirtî ber hev kirin û (Hosta Hena) yê ermenî, esasê Birca Belek danî, heta sal qulibî sala dawî (Hosta Hena) Birca Belek temam kir, û her bi minasebeta şerefa navê Cuhûwê Belek Hosta Hina dîwarek bircî, belek çêkir. Weher ji ber ku malê Cihûwê Belek li Birca belek hate serf kirin, heta ku Birca Belek hate çê kirin. Ji ber wê yekê Hosta Hina dîwarê Birca Belek rêzik ji kevrê reş û rêzek ji kevrê sipî çêkir.

Belê, piştî ku Mîr Şeref li ser textê Mîrîtiya xwe rûnişt û dest bi hukumdariya xwe kir.

Dibê, Remowê Finikî gote Mîr Şeref: ”Mîrê min, ez hêvî dikim ku tu izna min bidî, da ku ez her bi destê xwe cezayê Eblehidê file, bidimê, ji ber ku temamê Maqûlên ‘eşîretan hatine serdana te, ji xeyrî Eblehidê file, kevxûwê gundê (Misûrî)ê”.

Di bersivê de, Mîr Şeref got:



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

”Remezanê min, ji îro pê de girtin û berdan û kuştin û hiştin, tev bi destê te ye”.

Dibê, gava Mîr Şeref weha gote Remo, hemen Remowê Finikî rabû, çû nik Mîr Mehima û her di derheqê Eblehidê file de, Remowê Finikî pirsa xwe bi Mîr Mehima kir. Belê, Mîr Mehima mudafe’a Eblehidê file kir. her ji ber vê yekê sitiranbêj ‘Elî-Xan dibêjiê:

Way li min,
Dibê, hanê, sed cara bi min hanê,
Ji Qesir Dela heta Bafê Banê Xanê,
Remowê Finikî û Mîr Mehima,
Dileyzin, zal û papaz û her fincanê,
Mîr Şeref dibêjê, ezê bibim bi xulama,
Her sê biskî Şehperîxanê,
Belê, siba vî çaxî me silav e,
Li ser bûka (Keşiyê) Misûranê,
Way li min, way li min, way li min, way li minooo

Dibê, ew roj çû, qulibî roja dî. Remowê Finikî rabû, çend xulam rêkirin gundê Misûriyê da ku Eblehidê file ji bo wî bînin Cizîrê.

Dibê, ew çend xulam çûne gundê Misûriyê û bi çengê Eblehidê file girtin û anîne Cizîrê.

Dibê, Remowê Finikî rabû, her bi destê xwe, çend xencer weşandine bejn û bala Eblehidê file, û kelexê wî avêtine ava Şetê.

Dibê, piştî ku Remowê Finikî Eblehid kuşt. Dibê, Mîr Mehima ev yeka xiste di dilê xwe de, ji ber ku Eblehidê file, hevalbendê Mîr Mehima bû.

Dibê, Mîr Mehima jî diviya ku Mîrîtiya Bota ji bo wî bê. Belê, piştî ku Eblehidê file her bi destê Remowê Finikî hate kuştin. Bayê Mîr Mehima li Mîr Şeref hat. Dibê, Mîr Mehima rabû kaxezek ji bo



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Sultanê dewletê nivîsî û da destê peyayê xwe û rê kire bajarê Sitenbûlê.

Belê, piştî ku peyayê Mîr Mehima gihişte bajarê Sitenbûlê ew kaxeza Mîr Mehima da destê Sultanê dewletê. Belê, piştî ku Sultanê dewletê, kaxeza Mîr Mehima xwend, meyza kir ku Mîr Mehima wê di kaxeza xwe de gotî:

“Sultanê min, piştî ku te ew qenciya pak û hêja, li Mîr Şeref kir, û qedir û me’rifetekî zêde, te digel wî kir, û her bi ser bilindî te ew rêkire memleketê şerqê, da ku ew bi ‘edaletî hukumdariyê di memleketê şerqî de bikê. Belê mixabin, ku piştî Mîr Şeref ji bajarê Sitenbûlê zivirî bajarê Cizîra Bota, dest avêtiye zulm û neheqiyê û dest bi kuştina me’sûm û bê gunehan kiriye, û hindêke xwîşka te Şehperîxan e , her di Cizîra Bota de, qesr û qunaxek ava kiriye, belê qesra wê bi çar gaza bi ser ya Sultanê dewletê dikevê, û hindîke Mîr Şeref e dibêjê: êdî ji vir pê de me minet bi Sultanê dewletê nîne, û nema ku em êdî bindestiya Sultanê dewletê qebûl bikin”. Her weha....

Dibê, gava Sultan weha ji xwendina kaxezê xilas bû. Hemen Sultan rabû, heyetek zilamên mu’teber, ji bajarê Sitenbûlê rêkire bajarê Cizîra Bota; da ku kefşa hal bikin. Bê ma ka weye, wekî Mîr Mehima gotî yan na.

Belê, dibê, ew heyeta Sultan hat, heta ku gehişte Cizîrê, û li Mîr Şeref bûne mihvan.

Belê, Dîwana Mîr Şeref geriya, û girgirên Cizîra Bota li dîwana Mîr Şeref ber hev bûn.

Dibê, her ji nişkê ve, ewê heyeta Sultan pirs ji xelkên Cizîrê kirin û ji wan re gotin ‘eceba piştî ku Mîr Şeref ji bajarê Sitenbûlê zivirî bajarê Cizîrê ‘edaleta wî çawe ye, Mîr Şeref girtin û kuştinê, pir didê kirin yan ne.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Di bersiva ewê heyetê de, xelkên Cizîrê gotin: ”Haşa ku Mîrê me girtin û kuştin û dabê kirin, belkî piştî ku Mîrê me ji bajarê Sitenbûlê zivirî, zulm û neheqî ji memleketê şerqê bi dor ketiye, û li şûna zulm û neheqiyê ‘edalet û xêr û xweşî belav bûye. Û ji wextê ku Mîrê me ji bajarê Sitenbûlê zivirî, heta wekî niha kesek ne hatiye girtin û kesek nehatiye kuştin, ji xeyrî kefxûwê gundê Misûriyê yanî Eblehidê file, ew jî bi destê Remowê Finikî hate kuştin, û bi kuştina Eblehidê file, kesek pê ne êşiya.

Dibê, gava xelkên Cizîrê weha bersiva heyeta Sultan dan. Dibê, heyeta Sultan pir keyfxweş bûn.

Belê, heyeta Sultan bi gelî xelkên civatê ve hemî bi hev re ji dîwanxanê bi derketin û çûn temaşeyî Birca Belek kirin, û bilindiya Bircê pîvan. Belê, meyze kirin ku bilindayiya Birca belek bi çar gaza kêmtirîn ji bilindayiya sera Sultanê dewletê ye. Belê, dê çi bêjin kefşa heyeta Sultanê dewletê û gotina Mîr Mehima hev negirtin.

Dibê, hêj ji nû ve heyeta Sultan ew kaxeza Mîr Mehima dane destê Mîr Şeref .

Belê, heyeta Sultan ji Mîr Şeref û ji gelî xelkên Cizîrê xatir xwestin û bi şûn de zivirîne bajarê Sitenbûlê.

Belê, paşê Mîr Şeref nûbedarî li Mîr Mehima kir heta ku bû şev. Dibê, Mîr Mehima di wê re bihurî da ku biçî mal. Hemen Mîr Şeref çû pêşiyê û bi bersinga Mîr Mehima girt û çend xincer weşandin bejn û bala Mîr Mehima û kelexê wî avête di wî gera ava Şetî de, a ku li pêşiya Birca Belek. Belê, rojê rojê heta wekî ev rojî xelkên Cizîra Bota ji ewê (Gera avî) re dibêjin gera Mîr Mehima.

Belê, paşê Xudê Mîr Zeydîn û Zeyno û Sitî dane Şehperîxanê.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, bi vê çendê hikayetbêjê delal dawiya hikayetê da destê me. Rehmet li dê û babê me û seydayê me, ê ku ev xizmeta pîroz daye pêşiya me.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, ev e jî kirtîkek ji sitirana
Xizêmoka Bota ye:

Way li min dibê,
Mîrê min sibe ye, banga Xudê Ellahûekber e,
Ezê li Birca Belek dinêrim, sê teyrikan danî ser e,
Belê, yek sipî ye, yek hişîn e, yek jê zer e,
De, rabe Mîrê min, emê biçin ser Şetiyanê mezin,
Emê du rek'et nimêj sibehê bikin,
De, emê destê xwe raberî rehma Xudê kin,
Xudê paşakî mezin e,
De, belkî kedera li ser dilê Mîrê min bê der e,
Wey mala min.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Xizêmoka Bota

Belê, li gora rîwayetek dîtir, ku ew rîwayet her ji devê sitiranbêjê bi nav û deng Silo Koro me hikayeta (Xizêmoka Bota) dibêjê me neqil kirî. Hindek ferq û cudayî dikevê di mabeyna herdû rîwayetan de, ew jî di pêşgotina hikayetê de, ew jî her ev e. Hindîke hikayetbêj Silo Koro ye, her weha dest bi hikayetê dikê û dibêje:

Di Cizîra Bota de Mîrek hebû. Navê wî Mîr Mendelî bû. û ew bixwe Mîrê Bota bû. Hukumdariya Mîrîtiyê bi destê wî bû, û ew bixwe hêj ne zewicî bû, yanî jin ji bo xwe ne anîbû.

Belê, Eblehidê file, yanî kefxwê gundê Misûriyê, berdevkê Mîr Mendelî bû. Her wextê Mîr Mendelî mişêwretên xwe bi Eblehidê file dikirin. Dibê, kurmamekî Mîr Mendelî hebû. Jê re digotin Mîr Mehima. Dibê, hindîke Mîr Mehima bû, her wextî ji bin ve bend li Mîr Mendelî girêdida, da ku Mîrîtiyê ji Mîr Mendelî bistînê. Dibê, piştî ku ji bin ve Eblehidê file li Mîr Mendelî xayin bû, û bû hevalbendê Mîr Mehima û xelkên Cizîrê jî bi temamî bûne hevalbendê Mîr Mehima û Mîr Mendelî digel xulamê xwe Remowê Finikî mane bi tinê. Her ji ber vê yekî Mîr Mendelî ew digel xulamê xwe Remowê Finikî ji bajarê Cizîra Bota dilmayî bûn, û çûne bajarê Sitenbûlê û her li bajarê Sitenbûlê evîndarî kete dimabeyna Mîr Mendelî û xwîşka Sultanê dewletê de.

Belê, hikayetbêj Silo Koro dibêjê navê xwîşka Sultan Gulistan* bû. Her weha hikayetbêj Silo Koro ji vir pê de hikayetê ber-dewam dikî, heta bi dawiya hikayetê ‘eyn wekî rîwayeta Botanî bê ferq û cudayî.

* Hindek sitiranbêj dibêjin navê wê Qencan bû.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, pirsyarî ji Silo Koro hatiye kirin ku Mîr Mendelî kîjan Mîr bûye, ji Mîrên Cizîrê?. Di bersivê de, Silo Koro gotiye: Mîr Mendelî Mîr Afdelî= (Avdelî= ’Evdela=’Ebdullah) bixwe bûye.

Belê, wextî ku hikayetbêjê me (‘Elî-xan Selhan Saruxan)jî, hikayeta (Xizêmokê) ji bo me gotî, her di dawiya hikayetê de (‘Elî-xan) got: Mîr Zeydîn û Sitî û Zîn. Ev her sê xwîşk û bira xudê dane Şehperîxanê.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Dunya bi çerx û felek e

## (Xizêmoka Botan)*

Dunya bi çerx û felek e, bi lewleb û bi dem, û bi dewran e,
Dunya namînê ji bo tu şah û tu Mîr û tu Sultan e,
Mîrek di Cizîra Bota de hebû, navê wî Mîr Mendelî ye,
Heta bi derê Bedlîsê, Mûsilê,û Zaxoyê di ber hukmê wî ye,

Sêsed xulam ji malê derdiketin di çûne geşt û seyranê ji xeyr, dest û piya, xulamekî wî hebû navê wî Remowê Finikî ye. Remo bixwe lawekî kinî girover bû. Ew bi tenê mabû li ber destê wî ye. De, ka guhê xwe bidinê kurmamekî wî hebû, jêr digotin Mîr Mehima, destê xwe dirêjkire textê Mîrîtiyê ji kurmamê xwe Mîr Mendelî sitandiye.

Şehrê Cizîra Bota şehrekî wê li wê ye,
Bejin û bala Mîr Mendelî mîna tak rihana li mêrgê ye,
De çawe heyfa min nayê li wî text û sultenetê,
Lê heyfa min tê bi Mîr Mendelî Mîrê Bota,
Sê şev û sê roj mabû bê şîv û bê taştê ye,

Mîr Mendelî digo: Remo rabe lez ke bilezîne,
Xwe bi koçik û dîwanxana Mîr Mehima bigehîne,
Ji milkekî ji aşekî ji me re jê bixwaze,

---

* Têbînî: Mele Xelef Remezanê Bafelî hikayeta (Xezêmoka Botan) weha bi vê texlîtê bi şi'rek nêzîkî sitiranê hûnandiye bi navê (Dunya bi çerx û felek e), ango ewî bixwe çêkiriye, û ne ya Folklorî ye. (Ebdilreqîb Yûsif).



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belkî milkekî bi me bidê dibara me pê bîne,

Wextê Mîr Mendelî wilo gotiye,
Remo rabû lezkir lezandiye,
Xwe bi dîwanxana Mîr Mehima gihandiye,
Ji ber Mîrê xwe Mîr Mendelî ve,
Çend silav û kilam li Mîr Mehima kiriye
Mîr Mehima digo: Remo daxwaza te çiye?!,
Remo bersiva Mîr Mehima weha dayî ye,
Remo digo Hecîke kurmamê te Mîr Mendelî,
Ev ro sê roja di malê de li hezînîye,
Îro ez rêkir me vî dîwan û dîwanxanê,
Da ku tu wî ji milkekî ji aşekî jê re bikî diyarî ye,

Mîr Mehima digo: Remo dilê min bi gêre vêre,
Bi Xwedê ezê nadim Mîr Mendelî zîv û zêr e,
Belkî ji milka, min dayê zeviya Serciwêr e,

Gava Mîr Mehima we gotî ye,
Remo bi şûn de zivirî ye,
Bi herdû çava li halê xwe girî ye,
Hêdî hêdî hate nik Mîr Mendelî,

Mîr Mendelî digo: Remo Mîr Mehima çi gotî ye,
Remo digo Mîrê mino, Mîr Mehima silav li te kirî ye,
Bi Xudê diviya Serciwêr e ji te re kiriye diyarî ye,

Gava Remo we gotî ye,
Mîr Mendelî bi halê xwe girî ye,

*Dewranî*

Mendelî digo: Remo rabe lez ke bilezîne,
Xwe bi xopana Misûrê bigehîne,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Ji kerbê min Eblehid bêje Mîrê min silav li te kirî ye,
Û gelek qencî li te kirî ye,
Jê re bêje Mîrê min wextekî, Banê Xanê bi Medrebê
Rûsor ve, bi çemê Zeytûnê bi Qesirka gelî ve, min didanê,
Bila tûrek nan û sed çerxiya ji min re bişîne, bi xudayî
Welatê Kurdistanê bi kêrî me nayê, jî,
Remo lez kir dilezandî, xwe xopana Misûrê digihandî,

Xopana Misûrê wa li ban e, Remo temaşekir bi çavan e,
Di hewşa Eblihed de qêrîna xulam û cariyan e,
Eblihed li ser textê xwe rûniştiye,
Bi herdû lêva dimijê berdevka kehreban e,

Remo xulamekî cindiye, silav li Eblihed dîye,
Eblihed digo xudê xêr ke çi qewimî ye ?!,
Remo bêje daxwaza te çiye?!,

Wey li min û li vê yekê, mala bavê Felekê,
Xudê hefza xwe li Eblihed nekê,
Çawe serê xwe xuhr dikire ber kevya doşekê,
Digo: wa Remo, eger Mîrê te wî milkî, li ser min mor nekê,
Yek çerxî hûn ji min nastînin bi kotekê,

Eblihed digo: Remo nabê,
Min soz bî min qerar bî,
Heta tuwê Banê Xanê bi Merdebê Rûsor ve,
Bi çemê Zeytûn, bi Sitûwê Qesrikê ve,
Mîrê te li ser navê min mor nekê,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Bi sed çerxa duwîr e, bine ew Mîrê te nabê,

Remo tu delalî, tu kinî giroverî ‘aqil kemalî,
De çawe tuwê li ‘aqilê xwe difikirî
Tuwî digo êdî emê çibikin ji vî milkî ji vî malî,

Remo rabû, Banî Xanê bi medrebê Rûsor ve,
Çemê bi Zeytûn, bi Qesirka gelî ve,
Li ser navê Eblihed dinivîsî
Muhr û senedê Mîr û xundekara lê danî
Xelata vî senedî Remo sed çerxî û tûrek kutilk,
Ji Mîrê xwe re tanî,

*Dewranî*

Bejna gela li bexçê ye, tûrê kutilka anî danî ber Mîrê xwe ye,
Mîr Mendelî digo: Remo, Eblihed filehê me ye, gelkî taze ye,
Remo digo kutilkê xwe bixwe, da ku hişê te bê serê te ye,
Bi Xudê, Banê Xanê bi Medrebê Rûsor ve, Çemê bi Zeytûn,
Bi Qesir gêlî ve, hemî me daye kirîvê te ye,
Min sened jê re girêdaye, min lê daye muhra te ye,
Ev sed çerxî û tûrê kutilka xelata milkê te ye.

Gava Remo we gotiye,
Mîr Mendelî hêdî hêdî bihalê xwe girî ye,
Digo Remo rabe here ji me re bîne,
Herdû bozê sayî ye,
Li wan bike zîn û me’rikê ‘entabî ye,
Li teniştî wan dîne qerpênî ingilîzî ye,
Ji me re bîne du topizê Hiwêsî ye,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Mîr Mendelî û Remo suwarbûn li herdû bozê sayî ye,
Pê xwe têxistin rikêba, rûniştibûn li ser zîn û ‘Entabî ye,
Berê xwe dane oxirê, pişta xwe dane felekê,
Ji bajarê Cizîra Bota herdû bûne xwînî ye,

*Dewranî*

Ey dewranê bakî xerbî têt û dilîlînî,
‘Ebayê Besrayê Li ser milê Mîrê Bota dihejînî,
Begê Bota ketiye kerb û kînî,

Ey dewranê bayê vî felekê, li Mîrê Bota têt û dilîlînê,
‘Ebayê reşî ser me kirî, li ser milê Mîrê Bota dibê û nînê,
Gulik û rîşê xircezîna bi ser zîn û merik û entabiyan dihejînê

Mîrê Bota ketiye kerb û kînê,
Şînboza sayî bi meşab û reka ditirsînê,
De çawe bi şev û rojê di ajoyî,
Qûnax bire xopana Nisêbînê,
Heta qûnax bire qûna zinadê Keleha vê Mêrdînê,

Şev çû sibê Mîrê Bota kara xwe kir,
Lingê xwe di rikiba bozê kir,
Ew û Remo ajotin ji xwe re cirîd qûşmekir,
Ne sekinî heta qûnax bire xopana bajarê Diyarbekir,

Ey li min û li vê felekê li vê dewranê,
Bejna Mîrê Bota mîna bû şiva hêzeranê,
Sibê rabû lingê xwe êxiste rikiba bozê ciwanê,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Kerba wî çêbûye ji Cizîra Bota bajarê Kurdistanê,
Ajot û nesekinî heta qûnax bire bajarê Adîmanê,

Ey Mîro li te û vê qezayê, te pişta xwe daye felekê,
Berê xwe daye vê dinyayê,
Tuwî boza sayî taj û wê wekî bayê,
Kerba te çibûye tuwê bûyî ji bajarê Cizîra Bota vê qizayê
Mîrê Bota kete hidûdê Tirka, qûnax bire bajarê vê Qonyayê,

Bejna Mîrê Bota mîna bû tak rihana li Dergûlê,
Boza sayî dibin Mîrê Bota de dikojê li xabê dikê pîkolê,
Mîrê Bota ji wê nasekinê, paytextê dewletê,
Heta qûnax bire bajarê xopana Sitenbûlê,

Bejna Mîrê Bota kela Mehemedî ye,
Ew û Remo hevsar berdane ji ser serê boza sayî ye,
Li bajarê Sitenbûlê kolan kolan digeriyan,
Heta êvar bi ser wan de hat û li kalekî rih sipî dihatiyan,
Rih sipî dihnê xwe didayê cilê Milûka li wan dîtî ye,
Rih sipî digo: çima piya nabin ?,
Remo digo: em xerîbin kes nenas in,
Me avaniyek divê bi kirêdarî ye,

Rih sipî digo: Ev qesra sê tabiq ya min e,
Heta qismetê we li vire bê pere min selîmê we kirî ye,
Ez dibêjin si'ûda Mîrê Bota vegeriya,

*Dewranî*

Ey dewranê



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Bejna Begê Bota mîna bû şitla reş rihanê,
êvarê şev xwar bû li ser wê qesrê li eywanê,
Doşek û lihêf di danîn pala xwe didanê,
Begê Bota digo: Remo çiqa li min xweş tê,
Bihna bayê çira têlî Begê gelyê ‘Evdal begê,
Cî û memleketê Bota hewa Kurdistanê,
De ka tuwî bêje çend peyzokê zozanê Kurdistan,

Remo dengbêjekî kinî giroverî cindî ye,
Kum û kolosê Botanî xwarkirî ye,
Dest bi xizêmok û peyzokê zozanê jorî dikirî ye,
Dengê Remo dengekî zîz keçikanî ye,
Qesra Gulistana keça xundekarê dewletê,
nêzîke li pêşberî wî ye,
Gulistana keça xundekarê dewletê,
guhdarî li dengê Remo kirî ye,
De ka meyze bikin si’ûd û iqbal ji terefê Rebê banî
ye,
Dengê Remo esera mehebetê li dilê Gulistana
keça xundekarê dewletê kirî ye,

Gulistanê hêdî bi dilê xwe girt û zemt kirî ye,
Ji tîra mihebetê ‘aqil û sewda di serê Gulistanê nemayî ye,
Gulistanê nazik e nazenîn e, qîzika dewleta ‘alî ye,
Kevoka di birc û şehneşîn e,
Xwediya bi text û bi tac û bedena zêrîn e,
Ji mehebetê ‘aqil heye sewda tu nîne,
Derdê evînê derdekî rehmet e ji derdê evînê,
Gulistanê hêstira ji herdû çava dibarîne,

Gulistanê li ber şibakê rûniştî ye,
Heta şev çû sibe hatî ye,
Meyza kirî li ser banê qesrayê li pêşberî ye,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Lawkê wî tê dimeşiye,
Xulamkê kinî giroverî li pê wî ye,
Herdû bi nava Sitenbûlê ve çûwî ye,

Gulistan li ber şibakê rûniştî ye,
Heta roj çû, şev hetî ye,
Meyze kirî Mîr Mendelî digel xulamê xwe hatî ye,
Li eywana qesra pêşberî rûniştî ye,
Keyfa Gulistanê ji dil hatî ye,
Gulistanê gazî cêrî kirî ye,
Digo: cêrî lez ke bilezîn e,
Qazekî ji min re bîne,

Cêriyê lez kir lezandiye,
Qazek li ber Gulistanê danî ye,
Gulistanê birincek kelandiye,
Çend zêrikê Reşadî di sîniyê daniye,
Li ser tijî birinca Qerejdaxî kiriye,
Li ser destê cariya daniye,
Ji bo Mîr Mendelî û xulamê wî rêkirî ye,

Cariyê sênî li ser destê xwe danî ye,
Qista qesra Mîr mendelî kirî ye,

Remo di ber cariyê de rabû ye,
Gote cariyê ma ev çiye?!,
Cariyê digo: Gulistana dewletê bixêra xwe ji we re şandiye,
Remo zêrê sîniyê diberîka xwe de vala kiriye,
Birinc li ber xwe û Mîrê xwe daniye,
Sersala Mîr Mendelî û Remo di Sitenbûlê de mane,
Her şev sîniya zêra ji Mîrê Bota tê û,
Mîrê Bota pê ne ‘elame,

Remo ‘aqilmend bû ‘aqil temame,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Ji sala 'ewilî heta sala dawî,
Heft sed law di nava Sitenbûlê neqandibû,
Ji lawê Kurdan e,
Hind file û hinek ji misilman e,
Digel heft sed hespê kab reş kirîne,
Kirine xan û tewlexana,
Ji Mîrê xwe re kirî bû bozka sayî,
Dabû destê lawan e,
Ev heft sed xulam Remo xweyî dikir,
Bi şîr û şekir û bi hiba û qehwa, bi kibabê met'man e,
Mîrê Bota pê ne 'elame,

Ey felek li min dewran e,
Bajarê Sitenbûlê bajarekî giran e,
Li ser heft sed mizgeft û minaran e,
Her minarek heft sed mal diber hikmê wan e,
Heft sal e Mîrê Bota di Sitenbûlê qediya ne,
Sal qulibî sala heştan e,
Hatibû ser Sitenbûlê qeralê Yûnan e,

Bajarê Sitenbûlê bajarekî bê meded e,
'Eskerê Yûnan bajarê Sitenbûlê kire mihasere,

Şarê Sitenbûlê şehrekî bilind cî ye,
Sibe li min xweş tê tête van bûriye,
Li ser behrê li min xweş tê zîqe zîqa qibkan û gemiya,
'Eskerê Yûnan wekî pelê dara,
Li dora bajarê Sitenbûlê helweşiya,
Sibehê xundekarê dînê Islamê pê hesiya,
Amir, emir dane tabûr û alayîya,
Sibehê dibû zîqe zîqa mizrîqan û tîte tîte boriya,
Hûrte hûrta çawîşan û onbaşiya,
Belê dibû gire gira top û teng û metelyoza,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Kişandine istehkam û tabî ye,
Herba giran dakete meydanê,
Dê li weledê xwe nabê xweyî,
Xûn ji cendika diherikê wekî cobar û kaniya,
Mocê xwînê avêtine sol û qêseriya,
Gulistanê bi herba ‘umûmî hesiya,
Rabû kaxezek ji bo Mîr Mendelî nivîsiye,
Di kaxezê çend galgal xwe kiriye,
Ji bo Mîr Mendelî rêkirî ye,
Ez bi sera Sitenbûlê diketim hemî qesrê sor û sipî ne,
Bejna min ji gula gula şîn e,
Li sing û berê min sih û sê kanî ne,
Dêmek ev sala hefta ye,
Mîr Mendelî bi min qayil nîne,
Remo kaxez xwendiye,
Kum û kolosê Botanî xwahir kiriye,
Dest peyzok û helîmokê Botanî kiriye,

Remo digo: nazikê Gulistanê,
De ka were ber pencerê li eywanê
Da ez me’ne bikim vê gotinê vê sitiranê,

Remo digo: Nazikê Sera Sitenbûlê li min rengîn e,
Bejna te ji gula gula şîn e,
Li sîng û berê te sih û sê kanî ne,
Têde dixwînin Şam û Mesr û Mekeh û Medîne,
Bi Xudê ev heft sal e tuwê zêra ji me re dişîne,
Bi Xudê Mîrê min bi te razî ye, ne ku qayil nîne,

Ey li min û li vê yekê, li te xizêmşorê, bejin bilindê,
Meş ordekê tu keça dewletê,
Te binê zêra berdane ser kêlekê,
Eger Xudê ji bo min û te hes bikê,
Ezê te ji babê te bistînim bi kotekê,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Remo digo: Mîrê mino Begê Azîzî ye,
Ji roja ji Cizîrê em biwî xwîniye,
Heta îro li te naxwê mêranî ye,
Ma tu nabînî Sitenbûl ji xwînê bûwe behra bê binî ye,

Mîr Mendelî digo: Remo ma qey li bîra te nayê,
Li Çêra têlî Begê li Beta Belek li geliyê ‘Evdal begê,
Li nêçîra pezê kovî ma te mêraniya min ne dî ye,
Destê bi tenê bê deng jê nayê,
Eger ez rabim bitenê Herim herba vî dijminî,
Kes nizanê ez im milûkê Azîzîya,

Remo digo: Mîrê mino ezê bêjim nebî ne weye,
Şûrê Xalid li pişta te ye,
Ji neha û heta sibê heft sed siwarê,
Kurda bi gerdanî li pişta te ye,

Mîr Mendelî digo: Remo agir û pê ji xwe ye,
Eger ne weye, bi xudê fermana serê te ye,
Bejin û bala Mîr Mendelî ji gula gula zer e,
Bejna Remo kulîlka li hember e,

Mîr Mendelî digo: Remo ji Mîrê xwe re nebêje van xebera,
Remo bi Xudê eger tuwî heft sed siwarî ji min re hazir nekî
Ezê destê te bigrim hêdî hêdî bidim ber xencera,

Erê dunya dem û dewran e,
Fecrê lêda Remo çûye nav lawê Kurdan e,

Remo digo: rabin bavê Mino hespa bikêşin,
Ji xan û tewlxana,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Li wan bikin bişidînin teng û bertengan e,
Li xwe bikin cilê Romanî şûra bikşînin ji kalan e,
Emê hicûmê bibin ser quwetê Yûnan e,
Ez îro meyz bikim li ‘egîd û pehlewan e,
Da ku ez zanibim îro bê ma kî berx e, kî beran e,

Bejna Remo ji gula gula zer e,
Gava Remo dikirin ev galgal û ev xebera,
Lawê Kurda kum û kolos li ‘erdê dane,
Digotin: Eger serê te li ber celadiye,
Ev e serê me jî bi yê te re,
Remo rabû çêkir û çêkiriye,
Xwe berda bû nava sûk û qeyseriya,
Çûbû ser dikanê van ciqsiya,
Kirîbûn heft sed şûrê germaniya,
Heft sed topizê Hiwêsiya,
Heft sed qerpînê ingilîziya,
Dîsa xwe berda bû ser dikanê va seraca,
Anîbû heft sed zînê ‘Entabiya,
Belê çûbû ser dikanê van terziya,
Ji Mîrê xwe re çêkiribû çoxê sor,
Kirasekî hevirmêşî, gulgulî ye,
Qapûtekî sorî sermelî ye,
Xêleke sor e Hemawî ye,
Potîneke sor e firincî ye,
Taxima cilê Begê Bota sor e,
Taxima lawê Kurda tev sipî ye,
Belê anîbû heft sed rimê şivtazî ye,

Ev tekûber li ber lawên Kurda daniye,
Lawên Kurda bi tewilxana ve çûn û çikir,
Seklawê ji tewlxana deranîn,
Ji dilê xwe re mehs û tîmar kirin,
Zînê ‘Entabî li şînboza dikirin,
Teng û berê wan şidandin,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Şûr ji kalan zahir kirin,
Ji keyfê re li dora qesra Begê Bota cirîd qoşme kirin,
Remo boza sayî li ber Mîrê xwe hazir kiriye,
Mîr Mendelî siwar bû ye,
Kete pêşiya ordê,
Bi nava sûk û qeyserya ve çûye,
Xelqê Sitenbûl derketin firca wî ye,

Remo digo: çûme çetiyana Sitenbûlê bi dar mazî,
De babê mino şûra ji kalana bikin tazî,
Me şer e li ser Yûnanê,
Em bimrin em şehîd in,
Em nemrin em xazî,
Sera dewletê li ser behrê ye,
Dewlet û heyet li ser banê bircê ye,
Dorbînê li ber bir çavê xwe danî ye,
Meyze dikê li hidûdê herbê ye,
Çavê dewletê bi Mendelî û selefa wî dikevî ye,
Digo: Bi tac û textê xwe kim,
Ev selefa he ji terefê Xudê ye,
Siwarê pîtê ricalê xerîbî ye,

Remo: digo: Lawên Kurda bilivin bilivînin,
Çetiyana ji kalana bikişînin,
Hemdaniya bi şabûrka bitirsînin,
Cot bi cot û ket bi ket û,
Xwe bi ordê Yûnan ve bigehînin,

Belê, lawê Kurda lez dikirin dilezandin,
Hemdaniya li meydanê dibezandin,
Di şevandin, kit litê qurpîn e,
Cot bi cot e, kit bi kit e hevdû dineqandin,
Çetiyan ji kalana dikişandin,
Û şînboz bi şarbûka ditirsandin,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Sivik xwe bi ordiyê Yûnan ve gihandin,

Dunya dem û dewran e,
De ka meyza bikin lawê Kurdan e,
Çetiyan kişandin e ji kalana,
Dunya dem û dewran e,
Lawên Kurda hemî siwarê şînboza ne,
Îro wekî Kurdê bêhane,
Wekî şehîdê latan e,
Hemiya ji xwe re mire xar berdan e,
Li meydanê dibû toz û dûman e,
Nalîn dikete ‘erd û ‘ezman e,
Hindika digo:  Axir zeman e,
Wê rojê dunya dibû taristan e,
Ji ordiya Yûnan kirine qesebxan e,
Li alîkî sing û dewran e,
Xûn li golana di herikî,
Tavête sûk û dikane,
Şînboz derbas nabin li kolan e,
Ji kelaxê insan e,

Ezê dimirim îro ez namirim,
Lawên Kurda li dora ‘eskerê Yûnan dizivirîn,
Wekî bazih û başoka li meydanê hildifirîn,
Ordiya Yûnan ji binî rakirin,
Qeralê Yûnan dibin çadirê zemt dikirin,
Dibin çadirê serê wî jêkirin,
Li sera dewleta Osmanlî hediye kirin,
Şehrê Sitenbûlê şehrekî di wê de,
Wê rojê si’ûd û iqbal ketiye kinarê Xudê de,
Lawên Kurda û Turka bihev re lêda,
Herba giran kete kinarê di behrê de,

Lawan çi kirin û çi kiriye?!,
Çetiyan ji kalana kişandiye,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Şînboz ji xwêdanê xemlandiye,
Me'nek li meydanê bizandiye,
Wekî gurê dicûrî ye,
'Eskerê Yûnan bê bin waniye,
Ordê li ordê qulibandiye,
Xûnê avête sûk û qeyserî ye,
Si'ûda lawa lêdaye,
Bûne qesabê serî ye,
Pazde şev û pazde roja,
'Eskerê Yûnan ji hev belav kiriye,

Mîr Mendelî digel selefa xwe zivirî,
Li ser sûrê rûniştiye,
Çavê Sultan bi Mîr Mendelî ketiye,
Gote xizmetkara: Herin Mîr Mendelî,
Bînin digel selefa wî ye,
Xizmetkara digo: tu û xulamê te xwesî ye,
Mendelî û Remo çûne hizûra delewtê bi'înî ye,
Sê cara dewletê destê xwe li pişta wî xistiye,
Dewletê digo: Gelî xelkê meclisê bêjin ka hediya vî siwarî çiye

Ehlê Meclisê digotin ewê ku,
Heft sed siwarî xwedî bikê,
Bi şîr û şekir û bi kibabê di met'eman e,
Ew ne mihtacî malê dinî ye,
Belkî laiqê qîzika te Gulistan e,

Remo Gulistanê ji Mîrê xwe re qebûl kirye,
Remo rabû daweta Mîrê xwe daniye,
Def û zirne lêxistine,
Law hatin govendê bi kurdaniye,
Gulistane keça dewletê bûka ser bixêlê,
Ji bo Mîrê xwe guhestiye,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Piştî heft şev û heft roja,
Remo çi kir û çi kiriye,
Rabû çû ser dikanê van terziya,
Kirî bû destek cilê Lerdanî ye,
Destek şal û şapikê Şernexî ye,
Pê de berda bû gulik û rîşî ye,
Li bejna xwe danî bû çareke Terebzonî ye,
Û berde berda bû xencerka Salih Begî ye,
Li ser serê xwe danî bû şe'reka Amûdî ye,
Xemlandî ji gulik û rîşiya,
Kum û kolos xwarkiriye,
Çûbû hizûra Mîr Mendelî,
Destî maçkir û şemka Gulistanî,
Li ser serê xwe danî ye,
Ber devka gerebanî dimihtî ye,
Mîr Mendelî digirî wekî cobar û kanî ye,

Dewranê xwezî min ne bi te bî,
Di çawe tewî çoga xwedanî ye,
Li ber çoga Gulistanê,
Xwezî bi Çêra Têlî Begê li geliyê 'Evdal Begê,
Li cî û memleketê Kurdistanê,
Şehrê Sitenbûlê bi rez û tirî,
Mîrê Bota bihalê Xwe digirî,
Cilê Begê Bota şil dikirin,
Sinbêlê sor î meqes kirî,
Gulistanê digo: Remo tu îro,
Êxiste di mala babê min de,
Agirekî pêt û gurî,

Şehrê Sitenbûlê şehrekî bi rû ba ye,
Gulistan qîzika paşa ye,
Dewlet li serê wî,
Tuwî car dî bistînî
Xeraca Kurda ye,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Şehrê Cizîrê şehrekî li hilma,
Bejna Gulistanê mîna bû tak rihan e li ber çem e,
Çavê Gulistanê çêkirine bi misqal û bi derhema,

Mendelî digo: Remo 'îşê te ne bê,
Ji kurmamê min î Mîr Mehima,
Îro tu Mîrê min î ez xulamê te me,

Remo digo: Mîr tu Mîrê min î,
Ez xulamê te me.
Heta saxim ez dest û piyê te me,
'Îşê te jî nebê min Eblehid,
Ez besî filehê xwe me,
'Îşê min jê nîne ji kurmamê te,
Mîr Mehima,
Gava Remo wilo gotîye,
Mîr Mendelî fehim kirî ye,
Digo: Remo destûra te,
Li filehê te min dayî ye,

Şev çû ro hatiye,
Remo dengê xwe li 'alema kiriye,

Remo digo: Gelî xulama lez bikin bilezînin,
Xwe bi xopana Misûrê bigehînin,
Çeplê Eblehid bigrin ji min re bûnin,
Xulama lez kirin di lezandin,
Sibê zû bû çeplê Eblehid digirtin,
Ji Remo re di aynandin,

Şehrê Cizîrê şehrekî li mitike,
Bejna Gulistanê tak rihan e bi gulgul e,
Eniya Gulistanê wek zêrekî çar niçik e,
Remo digo: ji mi re bînin kilbetanê van qewneka,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Li vê demê li vê dewranê,
Bejna Gulîstan mîna şeva hêzeranê,
Lawî Kurd, Eblehid anîne meydanê,

Şehrê Cizîrê şehrekî wî li wê ye,
Cêriya Gulistanê li ber avê ye,
Remo digo Eblehid bînin serbanê qesrê ye,
Ez wî bi'elimînim mirina vê firê ye,

Bejna Remo ji gula gula zer e,
Destê Eblehid girt û hêdî hêdî,
Dabû ber xincera,

Bejna Remo tak rihana di mêrgê de,
Remo bîst û çar xencer li wê bejnê li wê balê da,
Çengê Eblehid girt û avêt avê pêlê lêda,

Remo digo: Ey ji derdê gerden zer e,
Min divê xezîmokê ji Gulistanê re çêkin,
Lê bidin muhra xitma sed û bîst û çar hezar pêxember e,
Ji vir pê de kesê digel hev xayin bî,
Ji her çar dîn û mezheba bi dere,

Bejna Gulistanê zirav e wekî rim e,
Mîr Mendelî xencer kêşa çûbû Mîr Mehima,
Bîst û pênc xencer lêdane li bejna Mîr Mehima,
Avêtin gerayê avê heta îro jê re dibêjin : Gera Mîr Mehima.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Binyata sitirana Kêre

Her wekî çawe me ji devê birader Beşîr Silêman lawê Cinbirî, sitirana Kêre wergirtî, em ji bo xwendevanan dikin diyarî:

Dibê, hindîke Mîr Mehima bû. Mîrê Bota bû. Rojekê dinanê Mîr Mehima areha û heta çend rojan ji ber êşa dinanê wî tebatî vê neket, û xew jî bi çavê wî neket. Dibê, Mîr Mehima rabû pirsa xwe bi wezîrê xwe re kir, û ji wezîrê xwe re got: ” Dinanê min pir têşiyê, û roj bi roj êşa dinanê min zêde dibê. Vêce ez çawe bikim êşa dinanê min wê bihedinê. Di bersivê de, wezîr got: ”Mîrê min, eger tu du evîndaran ji ‘eşîreta Batwan bînê û tu bi ewan herdiwan şa bibê her bi şabûna ewan herdiwan tu wê xwe jibîr vekê û êşa dinanê te wê hêdî bibê”.

Dibê, gava wezîr weha got.Hemen Mîr Mehima rabû pirsiyarî ji hindek xelkên Batwan kir, Bêma ka, du keçik û kurkên his ji hev bikin. Li nav ‘eşîreta Batwan li kîjan gundî pêda dibin.

Dibê, ewan hindekan ji bo Mîr gotin: Wellahî keçka Gurdilî û lawkê Gurdilî herdû pir his ji hev dikin. Du evîndarên mîna herdiwan di nava ‘eşîreta Batwan de pêda nabin.

Dibê, gava weha ji bo Mîr gotin. Hemen Mîr Mehima rabû du peya rê kirine gundê Gurdila.

Dibê, çawe herdû peyayên Mîr gehiştine gundî. Hemen lawkê Gurdilî girtin û herdû destên wî girêdan û anîne Cizîrê nik Mîr . Belê, Mîr Mehima rabû lawkê Gurdilî xiste di hebsê de. Dibê, paşê Keçka Gurdilî pê hesiya ku Mîr Mehima li Cizîrê lawkê wê hebis kiriye. Dibê, hemen keçka Gurdilî daw û delingê xwe hil kirin û her ji gundê Gurdila qista Cizîrê kir û hate Cizîrê. Dibê, çawe keçka



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Gurdilî gehişte Cizîrê vêre vêre çû dîwana Mîr Mehima û digel Mîr Mehima xeber da, û jê re got: ”Mîrê min, te ji bo çi lawkê min hebis kiriye?!”.

Di bersivê de, Mîr Mehima Got: ”Keça delal Wellahî ji wextekî zû ve dilê min ketiye te û min divê ku ez te ji bo xwe bînim. Vêce, min bihîstîye ku evî lawkî jî dilketiye te her ji ber vê yekê, min lawkê te hebis kiriye, û ez ewî bernadim heta ku ew berê xwe ji te neguherê”.

Dibê, gava Mîr Mehima weha got, di bersivê de. Keçkê digo:

“Mîrê mino, hey jariko li min jaro.
Xelk û ‘alemê girtibûn ji bo xwe,
Dostik û yaro,
Tali’ û bextê min sêwî ‘evdala Xudê bitinê,
Çiqa linik Mîrê Bota bûye bango bû hawaro”.

Dibê, çawe keçkê weha ev çîrok ji bo Mîr got. Dibê, hemen Mîr ferman kir ku lawkê wê ji hebsxanê bênine dîwanê.

Dibê, du peya çûn lawkê keçkê ji hebsxanê anîne dîwanê û Mîr bi lawik re xeber da û jê re got: ”Lawkê delal, her ji wextekî zû ve, dilê min li ser evê keçkê heye û ez dixwazim ku ez ewê ji bo xwe bînim. Vêce min bihîstî ye ku te jî dilketiye evê keçkê her ji ber vê yekê min tu hebs kirî.Belê, eger tu berê xwe ji evê keçkê neguherî Wellahî ez dê te hebis bikim û ez dê zêde cizayî bidim te”.

Dibê, çawe Mîr Mehima weha bi lawkê Gurdilî re xeber da. Di bersivê de, kurkî digo:

”Hey jariko, Mîrê mino,
Heft xwezika,
Ezê bûbame livayek ji van livayê berxika,
Ezê biketame li ser zend û bendê van keçika,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Ezê birbame ber avê, danîbame li ser tehtika,
Hêdî li min bixistane bi kulman û bi şûnika,
Ji nû paşê ezê bidame destikê sin'etkara,
Ezê bêxistame derbend û şûtikek ji şûtika,
Ezê bêxistame devê van çeltikan û tûrika,
Gava sibha keçkokê malê me çûbane bêriyê,
Qene ezê biketame li ser quflê zer memika,

Dibê, çawe lawkê Gurdilî her weha ev çîrok ji bo Mîr Mehima got. Hemen Mîr Mehima rabû, carek dî lawkê Gurdilî xiste di hebsê de. Belê, Mîr Mehima gote keçka Gurdilî:

"Wellahî, ez evî lawkî ji hebsê bernadim, heta ku tu berê xwe ji ewî neguherê".

Dibê, gava Mîr Mehima her weha gote keçkê. Di bersivê de, keçkê got:

"Mîrê mino ezê herim Banê Xanê,
xwe bixemlînim,
Ezê teşyûka xwe rêsim, ji Mîr ê,
Xwe re bilîlînim,
Ezê benê zêrê sitûwê,
Xwe 'evdalê biqetînim,
Ezê li cam û camxanê 'ulya,
Mîrê xwe bireşînim,
Ezê bi çeplê kere şivanê mala bavê,
Xwe bigirim,
Ji binê hebsxan û zêndanê
Mîrê xwe bi derînim,..".

Belê, dibê, çawe keçka Gurdilî, her weha ev çîrok ji bo Mîr Mehima got. Dibê, Mîr Mehima munaqeşe digel keçka Gurdilî zêde kir. Belê, keçka Gurdilî jî mucadele digel Mîr Mehima zêdetir kir, û keçka Gurdilî bela xwe ji Mîr Mehima ve nekir. Heta ku Mîr



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Mehima hetkandina xwe di destê keçka Gurdilî de dît. Belê, Mîr Mehima mecbûr bû, lawkê wê ji hebsxanê berda, û bela keçka Gurdilî ji xwe, vekir... Belê, her çendî, em dibêjin Mîr Mehima di destê keçka Gurdilî de, hetikî. Lê em nizanin bêma ka paşê êşa dinanê Mîr Mehima hêdî bû yan ne.

---

-Belê, em siyadeta xwendevanan agehdar dikin ku hindîke gundê Gurdila ye, dikevî roavayî bajarê Şernexê û bi mesaheta 10 k.m aliyê şimalî gundê Dêrgulê li herêma 'eşîreta Batwan.

-Çiyayê Kêre bi mesaheta 10 k.m dikevê aliyê şimalî bajarê Cizîrê.

-Derêncoka Kêre rêka 'amê ye, dikevî nîvê çiyayê Kêre, li hindava gundê Seravê, li aliyê rohelatî Qesirka Gêlî.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Ev çend kertik ji Sitirana Kêre ne

Me ji devê sitiranbêj Mihemed Şîrîn lawê Mêrgî wergirtine.

Serê Kêre wa bi dar e,
Hêstiroka mala babê min cehşîn e,
Nakişîne bare,
Eger ezê qistê bikim, xelkê bêjin:
Xweyî dost û yar e,
Eger ezê qistê nekim,
Dilkê min ‘evdala Xudê nagirê
Tu qirara..

Bihare, bihara vê Pîvokê,
Te wê bejin ziravê kofî kokê,
Ti bi xudêkî Mîrê mino,
De, tuwê lawkê min berde,
Emê serbêr û bin bêra bêxin pala,
Vê balokê..

Ey lê bihar e, kela vê gilûrê,
Te wê bejin ziravê kofî sorê,
Ti bi Xudêkî Mîrê mino,
De, tuwê lawkê min berde,
Emê biçin zozana, serbîr û,
Binbêra bêxin deşta Sorê,

Ey lê bihare, binê vê beriyê,
Malxwê ban dikire kebaniyê,
Ji min re bêne kodikê Dûşaniyê,
Kopalokê minê şivaniyê,
Wey Mîrê mino,
Ketime bextê Xudê û yê te de,
Tuwê lawkê min berde,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Emê serbêr û binbêra bêxin,
Pala vê keviyê,

Ey lê, dilê min dehêze,
Pezê Xêrka û yê Mûsa Reşa û,
Yê Didêra,
Ser pira Cizîra Bota re,
Bûne rêz bi rêz e,
De, çawe keskî nedîtiye,
Girtîkê Mîr û hakima, bibin,
Kere şivanê ber pêz e..,

Erê, Mîrê mino,
Perê, pera jorî,
De, xwêdanka lawkê mala bavê minê,
Temam bi kespik û mircan û morî,
Belê, îro serê sê şevan û,
Sê rojan e,
Çawe, xwêdana berxvanê mala,
Bavê minê borî..



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Mûsa Kovexî

Bû cara êkê em dê hindek bi serhatiyên Mûsa Kovexî binivîsin, ji ber ku hindek nuktên rind û ciwan di serhatiyên wî de peyda dibin.

Belê, hindek kes dibêjin Mûsa Kovexî û hindek kes dibêjin Mûsa Meleka, her ji ber vê çendê. Em jî dibêjin hindîke Mûsa kovexî bû, ji gundê Kovexê bû-di rojavayî Cizîrê-, û navê babê wî Melek bû. Belê, babê Mûsa yanî Melek bi eslê xwe ji ‘eşîreta Hesina bû, û ji gundê Mirkefşînê bû. Belê, gundê Mirkefşînê bi mesaheta sî(30)k.m dikevê aliyê rojavayî Hezexê.

Belê, her ji ber hindek egeran babê Mûso, yanî Melek mala xwe ji gundê Mirkefşînê anîbû gundê Kovexê.

Belê, her li gundê Kovexê Xudê, Mûso dabû Melek. Dibê, piştî ku Mûso mezin bû. Bû maqûlê gundê Kovexê û(Mûso Meleka).

Belê, Mûso Kovexî dem û dewrana xwe her di dewra Mihemed Begê Mîrê Bota de, buhurand.

Dibê, Mûso kovexî maqûlekî pir zana û ‘aqilmend û bi xîret û cesûr û xweş mêrekî nuktegîr û bi nav û deng bû. Belê, her li Cizîrê di koçka Mihemed Begê de kursiyê Mûsa Kovexî di mabeyna kursiyên maqûlan de xuya bû, û heta ku em dişên bibêjin temamên maqûlên herêma Bota ji Mûso kovexî di pelikandin. Ne xasma Mihemed Begê bi xweşî ne diwêra hind serê xwe li ber Mûso Kovexî bilind bikê. Her ji ber vê yekê çendê her wextî di mabeyna Mihemed Begê û Mûso Kovexî de munaqeşe û mucadele berdewam bû.

Belê, tucara Mûso Kovexî xerc û bêşên gundiyên xwe jî ne didane Mihemed Begê Mîrê Bota. Her ji ber vê çendê Mihemed Begê pir ji Mûso Kovexî ‘aciz bû.

Dibê, Rojekê Mihemed Begê rabû, xulamê xwe bi rêkire gundê Kovexê da ku xerc û bêşê gundê Kovexê



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

ji Mûso Kovexî bistînê. Belê, çawe xulam çû gundê Kovexê û gote Mûso: ” Ez hatime xerc û bêşê Mihemed begê”. Di bersivê de Mûso gote xulamî: ”Ez xerc û bêşê Mihemed Begê nadim û ji ev ro pêde ez nayim koçka Mihemed begê, û tu şuxlê min li koçka Mihemed Begê tune ye”.

Dibê, çawe Mûso weha got. Hemen xulam destevale ji gundê Kovexê zivirî û hate Cizîrê. Belê, xulamî gote Mihemed begê: “Mîrê min, Mûso kovexî xerc û bêşên te nedan”. Dibê, hemen Mihemed Begê rabû çend peyayên xwe bi rêkirin gundê Kovexê û ji wan re got: ”De herin Mûso bigirin û ber destê me bêxin”.

Dibê, hemen peyayên Mihemed Begê sivik rabûn çûne Kovexê û her ji nişkê ve Mûso di mal de girtin û anîne ber destê Mîr . Dibê, Mihemed Begê gote Mûso : ”Ev ji bo çi min xulamê xwe bi rêkire nik te, û te xerc û bêşên me , nedanê ?!”.

Di bersivê de, Mûso got: ”Mîrê min xulamê te zelamekî derewîn e, pa ma çawe xulamê te werê û xerc û bêşê te ji min bixwazê û ez xercê Mîrê xwe nedimê!”.

Mîr Mihemed Begê got: ”De nexwe Mûsa, em dê evê carê te ‘efû bikin. Belê, eger carek dî xulamê min hat, de tu xerc û bêşên me bidiyê”. Mûso got: ”Bila, Mîrê min”.

Dibê, Mihemed Begê ewê carê dev ji Mûso berda û Mûso ji Cizîrê zivirî Kovexê û hate mala xwe. Heta ku çend roj tê ve çûn. dibê, her carek dî Mihemed Begê rabû xulamê xwe bi rê kire Kovexê nik Mûso. Belê, çawe xulam gehişte Kovexê û ji Mûso re got: ”Ez hatime xercê Mîrê xwe”.

Di bersivê de, Mûso got: ”Kuro xulam, her ji Mîrê xwe re bibêje qîmetê Mîrê te û qîmetê kûçkê min wekî hev e. Ma ez dê çawe xercê Mîrê te bidim”.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, çawe Mûso her weha digel xulamî axivt û xeber da. Xulam qenc dilmayî bû, û ji nik Mûso rabû, û hate Cizîrê û giliyê Mûso linik Mihemed Begê kir. Yanî xulamî gote Mihemed begê: ”Mûso xerc û bêşên te nedan û hindek gotinên ne di cihê xwe de ji te re gotin”.

Dibê, çawe xulamî her weha giliyê Mûso linik Mihemed Begê kir. Hemen Mihemed Beg pir ‘aciz bû.

Belê, Mihemed Begê rabû, bi lez û bez di hindirwê koçka xwe de civatek ji axaler û maqûlan gerand. Belê, her di nava civatê de Mihemed Begê xeber da, û got ey gelî axaleran, ev e bû du car min xulamê xwe bi rêkire nik Mûso Kovexî her car dî Mûso xercê me neda wextî ku Mûso hindek gotinên ne di cihê xwe de jî ji bo me bi rêkirin. Belê, wextê ku Mûso tê koçkê bi xebera xweş di nava civatê de ji min re dibêjê ez dê xercê te bidim. Belê, wextê ku Mûso ji nik me diçê Kovexê li ber xercê me asê dibê. ‘Eceb ev ji bo çi Mûso serê xwe li ber me bilind dikê û xerc û bêşên me nadê, ma qey me çi neheqî li Mûso kiriye?!!”.

Di bersivê de, wezîrê wî got: ”Mîrê min tebî’et ji axê ye. Vêce hindîke axa gundê Kovexê ye…nêr e .. û hindîke axa Cizîrê ye mê ye. Her ji ber vê çendê ye, wextê ku tu xulamê xwe bi rê dikê Kovexê û her li ser axa Kovexê xercê te ji Mûso dixwazê me’lûme Mûso li ber xercê te asê dibê. Ji ber ko axa Kovexê nêr e, û her wê se’etê Mûso jî mêr e, bin destiyê qebûl nakê…”.

Belê, wextê ku tu Mûso tênê Cizîrê, û tu xercê xwe ji wî dixwazê hemen ew jî vêre vêre dibêjê: ”Mîrê min ez deynê Xercê te bidim û emrê te qebûl dikê, ew jî ji ber ku axa Cizîrê mê ye, û bindestiyê qebûl dikê, û her wê se’etê Mûso jî mê dibê.. û bindestiya te qebûl dikê…”.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, çawe wezîrî weha got, hemen Mihemed Begê rabû du xulamên xwe bi rêkirine Kovexê û ji wan re got: ” De herin evê carê jî xercê me ji Mûso bixwazin, eger Mûso evî carê jî xercê me neda hemen Mûso digel xwe bênin Cizîrê û çeltikek axa kovexê jî bixwe re bînin û werin”.

Belê, dibê, herdû xulam rabûn û çûne Kovexê û her carek dî xercê Mihemed Begê ji Mûso xwestin. Belê, her carek dî Mûso xercî Mihemed Begê neda herdû Xulaman, û ji herdû xulaman re got:

”Hindîke Mîrê we Mihemed Begê ye zelamekî ehmeq e û zalim e . Belê, bab û kalên me jî tucara bindestiya ehmeqan nekiriye û xerc û bêşên tu zaliman nedane. Vêce, ji bab û kalên me re ‘eyb û şerme ku em bindestiya ehmeqan qebûl bikin û em xerc û bêşên zaliman bidin”.

Dibê, çawe Mûso weha got. Hemen herdû xulaman gotin: “Mûsa axa divê tu digel me werê Cizîrê, da ku tu rû li rû digel Mihemed Begê xeber bidê”.

Mûso got: ” Belê”.

Dibê, hemen ewan herdû xulaman ew çeltikê destê xwe tijî axa Kovexê kirin û digel Mûso tevde meşîn û hatin Cizîrê.

Dibê, çawe gehiştin Cizîrê hemen xulamekî ji herdiwan ew çeltikê axê bir da destê Mihemed Begê û ji Mihemed Begê re got: ”Ev e me Mûso jî bixwe re anîne Cizîrê”.

Dibê, hemen Mihemed Begê gote xulamî: ” De here koçkê ewê axê birêje bin kursiyê Mûso de û kursiyê Mûso deyne ser ewê axê”.

Dibê, hemen xulam rabû, bilez û bez çû ew çeltikê axê di hindirwê koçkê de li ber taqê dîwarê bi rû kir û merşek bi ser wê axê de rastkir, û kursiyê Mûso danî ser wê axê.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, hêj ji nû ve Mihemed Begê hate koçkê, û koçk û dîwanxana Mihemed Begê ji axaler û maqûlan geriya û her kesekê li ser kursiyê xwe rûniştin.

Belê, Mihemed Begê Mûso jî xweste koçkê. Dibê, Mûso jî hate koçkê û her mîna şêrekî li ser kursiyê xwe rûnişt, û lingekî xwe li ser lingekî re avêt. Belê, her wisan bi hêrs Mihemed Begê digel Mûso xeber da û jêre got: ”Kuro Mûso tu ne bixêr hatî”. Di bersivê de Mûso got: ” Xudê ji te ne razî be, Mîrê min”.

Mîr got: ”Kuro Mûso, ev e bû du sê car em xulamê xwe bi rê dikine nik te, ev ji bo çi, tu li ber xerc û bêşên me asê bûwî, û tu xerc û bêşên me nadê”. Di bersivê de, Mûso got: ”Ma tu çi kesî, û qîmetê te çiye heta ku ez xerc û bêşê te bidim”.

Mîr got : ”Kuro Mûso ma qey ez ne Mîrê Bota me?!'.

Mûso got: Na, tu ne Mîrê Bota yî, belkî tu zalimê Bota yî*”.

Mîr got: ”Kuro Mûso ma qey me çi zulm û neheqî li te kiriye?”.

Mûso got: ” Ma êdî tuwê çibikê, pa ne şîva şevê di mala min û gundiyên min de peyda nabê, û her gav tu jî çetên xwe bi rêdikê Kovexê û tu dibêjê bila Mûso xerc û bêşên min bidê, pa ma ez dê xerc û bêşên te ji ku derê bînim. Dibê, çawe Mûso weha got Hemen Mihemed Begê serê xwe xiste diber xwe de û ji koçkê bi derket. Belê, dîwanxane tev belav bû û kesek di hindirwê koçkê de nema. Dibê, her carek dî Mihemed Begê çav li xulamê xwe kir û jê re got:

”De here ewê axê ji bin kursiyê Mûso bide alîkî”.

Dibê, hemen xulam rabû, bi lez û bez çû di hindirwê koçkê ve ew ax ji bin kursiyê Mûso da alîkî. Belê, heta qederek têve çû, her carek dî Mihemed Begê hat di hindirwê koçkê de rûnişt û her carek dî

* Raste Mihemed Beg zalim bû wek mêjûvanan gotine.
(‘Ebdilreqîb Yûsif).

koçk û dîwanxane geriya, û her kesek li ser kursiyên xwe rûniştin. Belê, Mûso jî hat û mîna şêrekî li ser kursiyê xwe rûnişt û qehweçiyan qehwe gerandin.

Belê, her carek dî Mihemed Begê gelek bi nermayî digel Mûso xeber da û jê re got:

”Mûso axa, ez hêvî dikim tu li qusûra min meyza nekê, min gelek bihêrs digel te xeber da, ji ber ku tu xweş mêr û mêrxasê min î, ez gelek hes ji te dikim.Vêce, daxwaza min ji te her ev e ye, ku tu ji rêza axaler û maqûlan paşde ne mînê. Her çendî ez bi halê gundiyên te dizanim, û ez dizanim ku gundiyên te feqîr in. Belê, em dişin bibêjin ku temamên gundiyên ‘eşîreta Bota hemî jî feqîr in, û hal û wextî hemiyan jî bi tengavî dibihuwê . Vêce ez hêvî dikim ku tu jî ji rêza axaler û maqûlan bi dernekevê û wextê ku xulamên min têne Kovexê ji pir û hindikî tu jî xercê me bide”.

Dibê, çawe Mihemed Begê her weha bi nermayî digel Mûso xeber da, di bersivê de Mûso jî got:

’Belê, Mîrê min, ji bo Mîr (xuya bû ku tebî’et ji axê ye). Dibê, ewê carê jî Mihemed Begê dev ji Mûso berda, û her bi şehnazî Mûso ji Cizîrê zivirî kovexê û hate mala xwe. Belê, heta ku wext tê ve çû her carek dê xulamê Mihemed Begê çû Kovexê, û xerc û bêşên Mihemed Begê ji Mûso xwest di bersivê de, Mûso gote xulamî:

” Kuro hey seyê Kurê wî seyî. Ma tu nizanî ez xerc û bêşê Mîrê te nadim. Here eger carek dî tu werê xercê Mîrê xwe ji min bixwazê ez dê bihvila te jêbikim, û ez dê te bi ser Mîrê te de birê bikim”.

Dibê, çawe Mûso her weha gote xulamî. Hemen xulam deste vale bi ser Mîrê xwe de zivirî Cizîrê û ji Mihemed Begê re got:

”Mîrê min, Wellahî evê carê bitemamî Mûso li ber xercê te asê bû”.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, çawe her weha xulamî giliyê Mûso linik Mîrê xwe kir. Hemen çav li serê Mihemed Begê sor bûn. Hind ji Mûso ‘aciz bû. Dibê, hemen Mihemed Begê dengê xwe li du-sê xulaman kir û ji wan re got:

”De, rabin herin Kovexê Mûso bigirin, û ji bo min bînin, da ku ez wî ‘idam bikim”.

Dibê, çawe Mihemed Begê her weha ferman kir. Hemen ew her du sê xulam sivik rabûn çûne kovexê, û her ji nişkê ve Mûso di hindirwê malê de girtin û jê re gotin divê tu werê koçkê Mihemed Begê wê te ‘idam bikê. Mûso got: ’Belê”.

Dibê, hemen her du sê xulaman Mûso dane pêşiya xwe, û ji xênî bi derxistin, û berê wî dane Cizîrê.

Belê, jina Mûso gote Mûso:

”Kuro Mûsa, tuwê bi ku ve biçê?”.

Di bersivê de, Mûso got:

”Hermet ez dê biçim Cizîrê. Mihemed Beg wê min I’dam bikê”.

Jina wî got:

”Kuro Mûsa wextê ku tu ji Cizîrê hatî, hindek kil û neynik ji min re bîne”.

Mûso got: ”Bila hermet..”.

Belê, dibê, çawe her du sê xulam digel Mûso gehiştin Cizîrê û çûne koçka Mîr her wisan ji piyan hêj ne rûniştî Mîr Mihemed Begê dengê xwe li celladan kir, û ji wan re got: ”Sivik rabin, sifra xwînê hazir bikin û Mûso i’dam bikin”.

Dibê, hemen cellad rabûn sifra xwînê hazir kirin û herdû destî Mûso bişûn ve girêdan, û serê wî bi ser sifra xwînê de tewandin û şûr hazir kirin da ku Mûso serjêbikin.

Dibê, her di wî halî de vêre vêre Mûso keniya. Belê, hemen Mihemed Begê dengê xwe li celladan kir û ji wan re got:

”Hêde Mûso serjênekin”.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, hemen her wisan cellad mane rawestiyayî. Belê, Mihemed Begê gote Mûso:

”Kuro Mûso ji min re bêje bêma ka tu bi çi keniyayî”.

Di bersivê de, Mûso got:

”Mîrê min ez bi ‘eqlê jina xwe, û Mîrê xwe, û kîrê xwe keniyam”.

Mîr got: ”Çawe Mûso ?!“.

Mûso got:

Mîrê min, ‘eqlê jina min û Mîrê min û kîrê min wekî hev e”.

Mîr got: ”Çawe Mûso?!”.

Mûso got:

”Mîrê min, wextê ku çetê te hatî Kovexê ez di hindirwê malê de girtim û ez dame pêşiya xwe, û ez ji xênî biderxistim. Belê, her hingî jina min, gote min: Mûso, tuwê biçê ku derê ?. Min got: Hermet, ez dê biçim Cizîrê, Mihemed Beg wê min i’dam bikê. Belê, jina min got: Mûso, wextê ku tu ji Cizîrê hatî hindek kil û neynik ji min re bîne. Belê, min jî got: Bila hermet. Belê, em ji Kovexê bi rê ketin çawe em gehiştin Cizîrê û em hatin koçkê, her wisan bê sûal û bê cewab, te dengê xwe li celladan kir û te got: Hemen Mûso ‘idam bikin!. Belê, cellad rabûn herdû destên min girêdan û serê min tewandine ser sifra xwînê. Belê, her di evî halî de kîrê min rabû. Belê, ev çend hate xiyala min û min ji bo xwe got: Wellahî ‘eqlê jina min û Mîrê min û kîrê min wekî hev e. Her ji ber vê çendê kenê min hat û ez keniyam”.

Dibê, gava Mûso weha got. Her di nava civatê de Mihemed Beg pir şermîn bû û serê xwe xiste diber xwe de. Belê, piştî ku Mihemed Begê hizir û bîrên xwe kirin. Her carek dî Mihemed Begê gote celladan:

“Dev ji Mûso berdin. Evê carê jî me Mûso ‘efû kiriye”.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, çawe Mihemed Begê weha got. Hemen celladan destên Mûso vekirin, û her carek dî Mûso bi şehnazî ji Cizîrê zivirî Kovexê û hate mala xwe. Belê, piştî hingî ev hevrikiya Mûsowê Kovexî û Mihemed Begê bû dengînî û li herêma Botan belav bû.

Belê, Mihemed Begê pir kîn ji Mûso hilanî heta ku wextek tê ve çû. Mihemed Begê êdî ne wêra bi bext û bawerî Mûso serwenda bikê. Belê, Mihemed Begê lêgeriya ku her bi bê bextî Mûsowê kovexî serwenda bikê.

Belê, her ji vir pêde heta bi dawiya serhatiya Mûsowê Kovexî. Her ji devê sitiranbêjekî Botanî em dê nivîsîna serhatiyî berdewam bikin.

Belê, her wekî sitiranbêjê delal Emîn dibêje:

Belê, hey lo babo Mihemed begê,
Li Cizîrê dîwaneka lolo daniye,
Ey lo, dibêjitin, de bînin bînin,
De bînin…
Belê, ‘Îsa axayê Cizîrê,
Ji min re bînin…
Li pey wî Huseyn Axayê Şernexî,
Lolo bo min bînin..
Bawkê Sanuhî, lolo, ji min re bînin…
Cangîr axayê Germikî, lolo bo me bînin…
Hesamê Lodî, lolo her de bînin..
Cangîr axayê Bêspinî, lolo bo me bînin..
Tahir axayê Gurdelokî, lolo bo me bînin..
Rustem axa maqûlê Garisa, lolo ji min re bînin..
Qoçî Begê Şilidî lolo bome bînin..
Maqûlê Xersê Isma’îl Begê Millî, lolo her de bînin..
Hacî axayê Zaxo, wî lolo ji min re bînin..

De, belê, Mihemed begê.
Çiqa mezin û girgirekî Botan û



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Behdîna, ay lo, babo eynandiye...
Hemî li pişt taqê qesrê xef kiriye..
Hemiyan yeko yek jêre bi sûnda mezin
Lolo, sûndxwarî ye..
Hemiyan yeko yek kuştina Mûsowê,
Kovexî, bi destê xwe, her girtî ye,
Ey lê, dayê rebenê, min go Mihemed Begê rabûwî ye,
Wellah gazî melekê dozde ‘ilmî,
Lolo, her kiriye..
Ewî kaxezek bi hibrê reş û şîn kiriye..
Da destê Hesamê Lodî, û
Bawkê Sanuhî ye,
Go wê kaxezê bibin Kovexê,
Bo Mûso lolo, bi temamî ye..
Belê, Hesamê Lodî, û Bawkê Sanuhî,
Ji koçkê bi derketî ne,
Li benda rezî lolo, qulbîne..
Li Gemya Cizîrê derbas biwîne..
Li rêka Banê Xanê her çuwîne..
Li Gemya Bafê Derbas biwîne..
Bi rêka Kovexê de, lolo her meşîne..
Hesamê Lodî, û Bawkê Sanuhî,
Nêzîkî li Kovexê lolo her kirîne..
Belê, Mûso kovexî, li serbanê xanî,
Lolo, rûniştî ye..
Ewî dûrbîn li ber çavê xwe,
Lolo, her danî ye..
Bi rêka Kovexê de meyzand û,
Lolo, her fikirî ye..
Got berê xwe bidine evan herdû,
Siwarê hanê,
Yek jî Hesamê Lodî ye,
Ew destebirakê min ê axretî ye..
Ewê dîtir, lolo Bawkê Sanuhî ye,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Ez nizanim ewan herdû siwaran,
Şer e, lolo, yan şahî ye..
Belê, Mûso rabû hêdî hêdî,
Ber bi wan, lolo, her çûwî ye..
Belê, hê ji dûr ve li wan kire
Hawar û lolo, her gazî ye..
Go bira hewe xêr e, yan ne şer e,
Yan ne şahî ye..
Belê, ji min re bêjin, lolo, her we kî ye,
Hesamê Lodî, û Bawkê Sanuhî,
Ji bo Mûso gotin ho birastî ye..
Jê re gotin Mihemed Begê li Cizîrê,
Dîwaneka lolo, her danî ye..
Çiqas mezin û girgirkên Botan û Behdîna
Lolo, eynandî ye..
Hemî, yek û yek li piştaqê Qesrê,
Xef kirî ye..
Hemiyan jê re bi sûnda mezin, lolo,
Sûnd xwarî ye..
Hemiyan yek û yek jê re kuştina te
Bi destê xwe, lolo, her girtî ye..
De, belê, bira tu neçe koçkê,
Ew dê te bikujê bêbextî ye..

Ey lê, dayê rebenê,
Gava evan herdû destebiran,
Ev qiset û gotin ji Mûso re,
Lolo, her gotî ye..
Belê, Mûso bersiva evan herdû,
Destebiran, lolo, ho, dayî ye..
Got, eger ez neçim koçkê,
Rojkê, Mihemed Beg dê zirtê xwe bidê,
Wê bêjê, Mûso newêra,
Bê koçkê lolo, bi temamî ye..
Belê, Mûso li nava kovexê hat û,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Lolo, her çûwî ye..
Xatirê xwe ji gundî û cîrana,
Lolo, her xwestî ye..
Go min fi’il bikin, lolo bihelalî ye..
Go ezê biçim koçkê,
Mihemed Begê wê min bikujê, lolo,
bêbextî ye..
Belê, li nava Kovexê bo Mûso
Bûye şîn û lolo her girî ye..
Hêj ji nû Mûso çû aliyê malê,
Lolo zivirî ye..
Li ber xwe kirin şal û şapkê,
Lolo, Botanî ye..
Li serê xwe danî kumkî ji vanê,
Lolo, fêrisî ye..
Li piyê xwe kêşa cezmeke ji vanê
Lolo, şiftelî ye..
Şilfa zêrîn dibin ew çek û lewendîyê xwe de,
Veşartî ye..
Zilfa karî li ber singa xwe de,
Çikandî ye..
De, belê, Mûso gel Hesamê Lodî û,
Bawkê Sanuhî, siwar bûwî ye..
Belê, ev hersê siwar bi şûn de,
Lolo zivirîne,
Li gemya Bafê, lolo, derbas biwîne..
Li quntara çiya, di ber avê re
Lolo, ew meşî ne..
Li Banê Xanê lolo, her çûwîne,
Li ber gemya Cizîrê, peya bûwîne..
Belê, gemîvanî bû Mûso got û,
Lolo, ho, birastî ye..
Gotî axa, tu biçê koçkê,
Mihemed Beg,  wê te bikujê,
Lolo, bêbextî ye..



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Mûso go, gemîvano, lolo, way,
Gemîvano..
Wey lo, seyê Kurê, lolo, heftî,
Sano..
Tu bes bike van galgal û gotin û
Lolo, xeber dano..

Wey gemîvano dilê minê, lolo,
Li ber felekê..
De, tu rabe, me derbas bike,
Li vê gemîyê, lolo, li vê kelekê..
Eger ez sax bim, vê êvarê,
Ezê silav kim dîwanxana, lolo,
Mihemed begê..

Wey gemîvano,
Gemiya Cizîrê, lolo, çend rengîn e,
Tu berê xwe bide xencera di destê,
Min de, lolo, cewher şîn e,
De, belê, ez ne mirim sax bim,
Vê êvarê, ezê di koçka,
Mihemed begê, de, bikim lolo, qetl û xwîn e..

Ey lê, dayê rebenê,
Mûsowê kovexî, li gemiya Cizîrê,
Derbas bûwîye,
Li benda rezê Mîra, lolo, qulbî ye..
Ey lo, qista koçkê lolo,
Her kirî ye..
Mehtervanî celewa hespê Mûso girt û,
Mûso peya bûwîye..
Mûso qista aliyê koçkê lolo,
Her kirî ye..
Silav li xelkê civata hazir, wî kirî ye,
Keskî silava Mûso venegirtî ye,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Mûso bixwe silava xwe zivirandî ye,
Berê xwe di koçkê de, lolo,
Gerandî ye,
Çû rex Hisên axayê Şernexî û,
'Îsa axayê Cizîrî de, rûniştî ye..
Belê, Mihemed Begê gazî wî se bavê
Qehweçî lolo, her kirî ye,
Go, qehwekê ji bo Mûso bîne,
Ji rêya dûr hatî ye, lolo
Westayî ye,
Wellah qehweçî qehwe ji Mûso re
Lolo, her anî ye,
Fincana qehwî bi destê Mûso,
Lolo, her danî ye,
Belê, Mihemed Begê gazî Mûso,
Lolo, her kirî ye,
Go me seh kirî ye, te xencerek,
Heye, lolo, ew zêrîn e,
Emsalê wê qet di darê,
Dinyayê de lolo, her tu nîne,
Xwezî min xencera te bidîta,
Lolo, her bi çava ne,
Paşê Kuştin rêya lolo,
Her mêran e,
Gava Mihemed Begê bo Mûso lolo,
Ho gotî ye,
Mûso rabû nekir û lolo,
Nemerdî ye..
Zilfa karî bi destê Mihemed begê
Lolo, her danî ye
Mihemed Begê li xencera Mûso lolo,
Fikirî ye,
Paşê da destê Qoçî Begê Şilidî ye,
Qoçî Begê li wê xencerê Lolo,
Fikirî ye,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Paşê da destê wî axayê li tenişta,
Lolo, xwe jî ye,
Paşê Li nava dîwanxanê,
Ew xencer li destî girgirek û maqûlan de,
Zivirî ye,
Heta carek dî kete destê Mihemed begê,
Lolo, bi temamî ye,
Kes nekarî xwe li wê xencerê,
Bikê, lolo, her xwedî ye,
De belê, carek dî Mihemed Begê çavê xwe,
Li dîwanxanê, lolo gerandî ye,
Wellah dîse Mihemed Begê gazî,
Wî se bavê qehweçî lolo,
Her kirî ye,
Go qehwekî ji bo Mûso bêne,
Lê, Mûso ji rêya dûr hatî ye
Lolo, westayî ye,
Se bavê qehweçî qehwek dî,
Lolo her anî ye,
Da destê Mûso lolo, bitemamî ye,
Belê, her carek dî Mihemed begê,
Ew xencera Mûso da destê,
Wî axayê li tenişta xwe jî ye,
Belê, carek dî, ew xencer
Li destê axaler û maqûlan de zivirî ye,
Heta kete destê ‘Îsa axayê lolo,
Cizîrî ye,
Belê, Mihemed Begê çavê xwe,
Li ‘Îsa axa lolo, neqandî ye,
‘Îsa axa li tenişta Mûso lolo,
Rabû ser pêya,
Jor da ew xencer danî,
Nava rayê Qolinca Mûso lolo,
Bi temamî ye,
Belê, şilfa xencerê di pişta Mûso de,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Asê bûwîye,
Hêj ji nû Mûso da xwe rabû,
Lolo, ser piya,
Dest avête zilfa zêrîn
Ji ber lewandî ye xwe, lolo,
Derxistî ye,
Belê, zilfa zêrîn ji kalanî, lolo
Kişandî ye,
Çarde xencer li pey hev weşandin,
Derfê zikê ‘Îsa axayê Cizîrî ye,
Li nava dîwanxanê, zikê ‘Îsa axa,
Lolo, dirandî ye,
Hêj ji nûkanê, gurîn bi nava koçkê,
Lolo, ketî ye,
Keskî xwe li keskî nekir lolo,
Her xwedî ye,
Belê, Mûso qista derê koçkê,
Kir û lolo, bi temamî ye,
Derê koçkê girt û mifte bi xwe re,
Hilanî ye,
Hêj ji nû Mûso got gelî axano,
Ma hûn nizanin,

Ez Mûso me bavê Xelef im,
Ez xudanê xencera destî lolo,
Bi sedef im,
Li dîwanxana Mihemed Begê çendî bi gur im
Lolo, çendî bi gef im,

Belê, ma, hûn nizanin, ez Mûso me,
Bavê Miho me,
Ez xudanê xencera destî qapo me,
Li dîwanxana Mihemed Begê hatim û çûme,

Belê, ma hûn nizanin ez Mûso me,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Lolo, bavê Şiplî me,
Ez xudanê xencera destî zêrî me,
Li dîwanxana Mihemed Begê çendî,
Bi gur im, çendî bi keyfî me,

De, belê, Mûso çarde axa,
Li koçka Mihemed Begê her kuştî ye,
Hêj nûka xûnê çavê Mûso
Lolo, her girtî ye,
Hêj ji nû Mûso jor de hilweşiya,
Belê, heyfa vî xweş mêrê hêja,
Lolo, li 'erdê ketî ye,
'Umur da hazir û guhdêra, lolo
Bi temamî ye,
De, sêsed heyf û mixabin,
Termê Vî xweş mêrî avêtin,
Binya koçkê lolo, bê xweyî ye,
Belê, keça Mûso kuştina bavê xwe,
Bihîstî ye,
Sivik rabû, ji Kovexê,
Ber bi Cizîrê lolo, hatî ye,
Li binya koçka Mihemed begê,
Li ber termê bavê xwe lolo,
Rawestî ye.
Belê, ewê pehînek li termê,
Bavê xwe lolo, her xistî ye,
Go rabe ser xwe,
"Şêrê, roviya kuştî"
Bê îşê te li vê dê çiye?.

Belê, her bi vê çendê sitiranbêj û dengbêjê Botanî birader (Emîn) her bi vî awayî, bi serhatiya



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

(nuktegîrê) welatî, Mûso Kovexî, ji bo me bi dawî anî. zor sipas.

Belê, em siyadeta xwendevanan agehdar dikin, ku her di dem û dewrana Mihemed Begê Mîrê Botan de, her di mabeyna axaler û maqûlan de nuktegîrên mîna Mûso Kovexî peyda ne dibûn. Û her wusan keça Mûso jî mîna bavê xwe çeleng û bikêrhatî bû, nuktegîr bû..

Belê, em dişin ji bo xwendevanan bibêjin ku nuktên Mûso Kovexî gelek hene, û her bi devê hikayetbêj û sitiranbêjin têne gotin û belav kirin. Ew jî bi navê Mûso kovexî û Mûso Meleka.

## Hoy çem e



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Hoy çem e, çem e, Mihemed beg
Çemê Cizîrê, wey,
Hoy çem e, çem e,Têlî beg
Çemê Cizîrê, way,

Keçkê gundê me, Mihemed beg
Çûne ser bîrê, wey,
Zeryê gundê me, Têlî beg
Çûne ser bîrê, way,

Min yeke di nav de, Mihemed beg
Memik hêjîrî, wey,
Te yek di nav de, Têlî beg
Memik hêjîrî,way,

Hoy çem e, çem e, Mihemed beg
Çemê Mûsilê, wey,
Hoy çem e, çem e, Têlî beg
Çemê Mûsilê, way

Keçkê gundê me, Mihemed beg
Çûn serê milê, wey
Zeryê gundê me, Têlî beg
Çûn serê milê, way

Min yek di nav de, Mihemed beg
Memik filfilê, wey,
Min yek di nav de, Têlî beg
Memik filfilê, way



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Hoy çem e, çem e, Mihemed beg
Çemê Zaxowê, wey,
Hoy çem e, çem e, Têlî beg
Çemê Zaxowê, way

Keçkê gundê me, Mihemed beg
Çûne ser çowê, wey
Zeryê gundê me, Têlî begê
Çûne ser cowê, way

Min yek di nav de, Mihemed beg
Memik pîvowê wey,
Min yek di nav de, Têlî beg
Memik pîvowê, way



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# ‘Elo Dîno (kelha Bafê)

Belê, ji heyamê berê ve, ji kelha Bafê re tê gotin kelha ‘Elo Dîno, ew jî ji ber ku her di heyamê berê hukumdarek di kelha Bafê de rabû navê wî (‘Eledîn) bû.

Belê, her ji ber ku hukumdariya wî zêde bû, û ew bixwe, xweş mêrekî cesûr û bikêrhatî û bi nav û deng bû. Xelkên herêma Bota jê re digotin (‘Elo dîno), û meşhûr bû bi navê (‘Elo Dîno=’Elodîno), ew (‘Eledîno), û her wê çaxê, (‘Elodîno) li binê girê Kelha Bafê li aliyî şimal û li ser wê texta raserî ava şetî qesra xwe çê kiri bû, û her li pêşberî qesra xwe li aliyê çemê avê tehtekî mezin kun kiribû, û zencîrek bi ewî tehtê kun kirî ve girêdabû, û her ji wî aliyê Şetî serê ewê zincîrê tavête evî milî Şetî, û bi ewê tehta dibinî qesra xwe ve girêdabû.

Belê, her wextî ew zencîr li raserî rû wê ava Şetî dirêj kirî bû, û nûbedar jî li ber bûn.

Û her bi vî awayî, ‘Elodîno rêka Şetî li pêşiya kelekvanan asê kiri bû.

Belê, wextê ku kelek bi avê de dihatin heta ku kelekvanan ji bo baca rê xerc û bêşên xwe nedabana ‘Elodîno belê, ‘Elodîno destûra kelekvanan nedida, û li pêşiya wan ew zencîr li ser rûwê avê, bilind ne dikir û kelekan ne dişiyan bibhurin.

Belê, her bi vî awayî, ‘Elodîno di kelha Bafê de li ber Mîrê Bota asê bûbû û bin destiya Mîrê Bota qebûl nedikir û minet bi kesekî jî tune bû. Her weha.

Dibê, rojekî li Cizîrê kelekvan li hev rûniştin û ji hev re gotin: ’Weha nabê, ‘Elodîno, zêde baca rê, ji me distînê, û zulmê li me dikê. Vêce divê em vê yekê qebûl nekin”.

Belê, dibê kelekvanan soz û peyman dane hev, û bi hev re çûne nik Mîrê Bota û şikayeta halê xwe û



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

‘Elodîno linik Mîr kirin. Belê, di bersiva kelekvanan de, Mîr got:

”Ey gelî kelekvanên delal hûn dizanin ku ‘Elodîno bin-destiya me qebûl nekiriye, û qebûl nakî. Belê, me jî destûra we daye ku her bi çi awayî bê, hûn ‘Elodîno ji bo me ber dest bikin. Em dê tola we li ‘Elodîno hilînin”.

Dibê, gava Mîr weha got.Hemen kelekvan rabûn, kar û bara xwe kirin, û her ji Cizîrê çûne Diyarbekir û her li Diyarbekir kelekvanan kelek girêdan, û çadirek li ser kelekê vedan û keçkê rind û ciwan baş xemilandin û danîn di binê wî çadirê de li ser kelekî û mitrib û dahol û zirne jî danîn ser wî kelekê û kelek bi avê de berdan.

Belê, kelek bi avî de hat, heta ku pêşberî kelha Bafê ket. Belê, li ser kelehê mitriban li dahol û zirnê Xistin û dengê dahol û zirnê bi ewan lat û zinaran ket.

Belê, gelî xelkên serê kelhê Hemiyan bi hev re dibin xwe re temaşeyî dahol û zirnê kirin. Belê, kesek nizanî bû ew daweta kê ye li ser kelekê li dardanî. Heta ku kelek li ber qesra ‘Elodîno di wextê mexribê re hate qefê. Belê, ‘Elo ji qesra xwe bi derket û meşî, çû ber kelekê. Belê, ‘Elo gote Kelekvanan: ” Ev daweta kê ye?. Di bersivê de, kelekvanan gotin:

”Ev dawet ya te ye?”.

‘Elo got : ”Çawe”!.

Kelekvanan gotin: ”Mîrê me yê Bota evan rojan li Cizîrê di Birca Belek de, suhbetek digel me kir û pirsa hal û ehwalê te ji me kir. Belê, di huzûra Mîr de, û di derheqê te de, me jî gelek bi başîtî xeber da, û Mîr jî gelek ji bo te keyf xweş bû. Û her ji ber vê çendê Mîrê Bota ev cariya xwe ya Diyarbekirî ji bo te kirîye xelat. divê tu jî xelata Mîrê Bota ji bo xwe qebûl bikê.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, gava kelekvanan weha gotine ‘Elo hemen ‘Elo gelek keyf xweş bû, û ‘Elo dengê xwe li xulaman kir belê sivik xulam rabûn. Her di qesra ‘Elo de çi ji bo kelekvanan danîn û kelekvanan ji ber kelekê hatin û di qesra ‘Elo de rûniştin. Belê, zêde ji bo kelekvanan da nîşandan, heta ku bû wextê razanê.

Belê, hindîke xulam û kelekvan bûn di hindirwê qesrê de razehan, û hindîke ‘Elo bû, qista ber kelekê kir û çû ser kelekê binê çadira bûkê. Belê, em pir zêde xeber nadin. Her li ser kelekê û di bin çadirê de ‘Elo û bûkê herdû bi hev re lîstin, heta ku herdû li ser kelekê bi xew ve çûn.

Belê, hêj ji nû, hêdî kelekvan ji hindirwê qesrê bi derketin û hatin ber kelekê û şelîta kelekê vekirin û her wusan bê pêjin kelekvanan zencîra ‘Elo bilind kirin û kelek berdane avê.

Belê, di beyana sibhê re kelek gehijte Cizîrê û li ber Birca Belek kelekvanan kelek anîne qefê.

Belê, hêj ji nû ‘Elo ji xwe hişyar bû û meyze kir ku kelek wa li ber Birca Belek û destê wî jî di gerdena bûkê de ye. Belê, çibkî feyde nakî. Hemen kelekvanan bi çengê ‘Elo girtin û birin dîwana Mîrê Bota. Belê, dîwana Mîr gerya û di hindirwê dîwanê de Mîr muhakema ‘Elo li dar danî. Û her weha Mîr gote ‘Elo:

”Ew çi kar bû ku tu pê radibûwê, û di rûniştî û te kelekvan û rêwingî dişelandin”.

Di bersivê de, ‘Elo got:

’Mîrê min, ew kar karê mêra bû”.

Belê, Mîr got:

”Kuro baş xeber bide ev dîwana kê ye tu tê de”.

‘Elo got: ”Mîrê min, ev dîwana mêra ye ez tê de”.

Mîr got:

’Elo, ma dem ku tu dibêjê şelandin karê mêra ye, û ev dîwan jî dîwana mêra ye xwe, ez dê îro mêraniyê nîşa te bidim. Da ku tu zanibê mêranî çawe ye”.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, hemen Mîr ferman kir, xulam rabûn dest û pêyê 'Elo girêdan, û nava herdû milên 'Elo qelaştin, û mûm di nava milên 'Elo de danîn û agir jî bi serê mûma ve danîn, û mûm li ser milên 'Elo şuxulîn.

Belê, Mîr got: " 'Elo, ev hal çi hal e".

Di bersivê de, 'Elo got: "Mîrê min ev hal halê mêra ye".

Mîr got:

"Kuro 'Elo ma qey hindek hal ji evî halî nexweştir hene?!".

'Elo got: "Belê, Mîrê min hal ji evî halî ne xweştir jî hene".

Mîr got: 'Elo, ji bo me bêje, ew hal ji evî halî nexweştir ew çi hal e"?!.

Di bersivê de, 'Elo got:

" Mîrê min , her di çilê zivistanê de, wextê mirov û jina xwe di mala xwe de rûniştî bin. Belê, mihvanek ji bo mirov werê. Belê, di mala mirov de cilek tunebê ku mirov ji bo mihvanê xwe deynê da ku li ser rûnê û tiştek xwarin jî di malê de peyda nebê, ku mirov deynê ber mihvanê xwe. Belê, her wisan di huzûra mihvanî de jin li mêrî meyza bikê û mêr jî li jinê meyza bikê. A ha ew hal ji evî halî nexweştir e".

Belê, gava 'Elo weha got. Hemen sehmê serê Mîr girt û Mîr dengê xwe li xulaman kir û ji xulaman re got:

"sivik rabin ewan mûman li ser milên 'Elo, vemrînin, lê, 'Elo mêrekî baş e".

Di bersivê de, 'Elo got:

"Yaşe, Mîrê min , yaşe
Mûma xwe berdaye nava laş e
Hêj ji nû, Mîrê min dibêjê
'Elo mêrekî baş e".

Belê, heta ku xulaman ew mûm li ser milên 'Elo vemirandin, 'Elo emrê Xudê kir û çû rehmetê.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Rehmet li xweşmêrê Kurdê nemir û li dê û babê cema'etê.

Bi vê çendê me jî dawî da bi serhatiyê û hikayetê.

Belê,

Her li gora hizir û bîrên me 'Elodîno her wî çaxî li hindava qesra xwe pirekî zorek girêda bû, û her bi ewê zincîrê, pira zorek ser avî dihate ragirtin, û her li alîkî 'Elo baca rêka pira zorek distand, û li alîkî baca rêka kelekvana ji kelekvanan distend. Û li serê girê Kelhê, li qewmê xwe serf dikir û her wisan bûye... Her wekû çawe zana û rihsipiyê Bafî Mihemed Remowê Berho jî her li gora hizir û bîrên me qirar dikî û dibêjê:

Her wî wextê ku 'Elodîno hukumdarî li keleha Bafê dikir. Her wî çaxî 'Elodîno li binê girê kelhê û li ser ewê tehta raserî ava Şetî qesra xwe çêkiri bû. Û li hindava qesra xwe li ser ava Şetî 'Elodîno pirekî Zorek jî girêda bû, û bi karîna bû, û her li wî alî Şetî zincîr bi wê xirama tehtê mezin ve girêda bû. Û serê zincîrê bi wê xirama binê qesra xwe ve, girêda bû, û her li ser ava Şetî, û pira Zorek bi wê zincîrê dihate ragirtin.Û Her ji vî alî Şetî, û ji wî alî Şetî, gelî xelkên herêmê û misafir û rêwingiyên welatî li ser ewê pira Zorek re derbasî vî alî, wî alî Şetî dibûn.

Belê, her wekî me gotî 'Elodîno li dû vê pirê di qesra xwe de, li alîkî xerc û xeracê pira Zorek ji misafir û rêwingiyan distand, û li alîkî baca rêka Şetî ji kelekvanan disitand, û zêdeyî evê çendê jî gelek gundên ewê herêmê dibinê Hukumdariya 'Elodîno de bûn. Û her di herêma Botan, û di herêma Torê de 'Elodîno gelek gund ji axaler û maqûlan deman dikirin. Û hasila ewan gundan jî disitend û her di kelha Bafê de xweş mêr li ber destê 'Elodîno pir bûn. Û ew bixwe mîna şêrekî di kelha Bafê de, li ber Mîrê



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Bota asê bûbû, û minet bi Mîrê Bota tune bû, û tu wextan bindestiya Mîrê Bota qebûl nedikir, û her wextî di mabeyna ‘Elodîno û Mîrê Bota de nexweşî berdewam bû. Heta ku hindek wextan di mabeyna herdiwan de, nexweşî pir zêde dibû, û nijde li pê hev digerandin. Û hindek wextan tenahî jî dikete di mabeyna herdiwan de, û heta ku di wextekî de xweş mêrên ‘Elodîno, Mîrê Bota talan kirin, û talanê wî, di kelha Bafê de bicih kirin.

Belê, her ji ber ku Mîrê Bota neşiya bi zordarî talanê xwe ji ‘Elodîno bistînê, û bizîvîrînê belkî Mîrê Bota rabû çend peyayên meslehetê bi rêkirin kelha Bafê nik ‘Elodîno, û her bi rêka mirovatiyê û camêriyê Mîrê Bota daxwaza talanê xwe li ‘Elodîno kir.

Belê, ‘Elodîno her bi camêrî talanê Mîrê Bota, lê zivirand..

Belê, ji evê hereketa ‘Elodîno hate zanîn ku ‘Elodîno maqûlekî berketî bû. Hem xweş mêr bû. Hem camêr bû.

Û her derbara evê hereketa ‘Elodîno de her wî çaxî helbestebêjan helbesteyek pê gotine, û ev e jî ew helbeste ye. Her wekû çawe biraderê me yê rewşenbîr û zana û berketî Mela ‘Ebdulrehman Sipîvanî, ewê helbestê her weha dibêjê:

Çav hişîno, çav hişîno
Mihemed Bego çav hişîno
Ji golê pir dan du qumrîno
Li Mîr heram bê rext û zîno

Çav beleko, çav beleko
Mihemed Bego çav beleko
Ji golê pir dan du ordeko
Li Mîr heram bit rext û çeko



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Li du vê deştê, li du vê deştê
Qesra 'Elo li du vê deştê
Li çar nekara sûrih li piştê
'Elodîno bi şûr rahiştê

Li pala girî, li pala girî
Qesra 'Elo li pala girî
Li çar nekara sûrih kirî
'Elodîno talan birî

li zozanî, li zozanî
Qesra 'Elo li zozanî
Li çar nekara sûrih danî
'Elodîno talan anî

Li ber avê, li ber avê
Qesra 'Elo li ber avê
Li çar nekara sûrih tavê
'Elodîno talan navê.

Xuyaye, ku her ji evê helbestê hate zanîn, ku her wî çaxê ku 'Elodîno hukumdarî li kelha Bafê dikir. Her hingî Mîrê Bota, Mihemed Begê Botanî bixwe bû.

Belê, rihsipiyê delal Mihemed Remowê Birho zanayê Bafî her weha dibêjê: Sêsed heyf û mixabin, piştî ku her bi xiyanet û hîlekariya kelekvanan xweş mêrê delal 'Elodîno li Cizîrê ber destê Mihemed Begê Mîrê Bota ket, û her bi zulî û zordariya Mîrê Bota li Cizîrê hate i'damkirin. Her wî çaxî û her hingî keça 'Elodîno (Seyran)a delal, derbara i'damkirina babê xwe de sitiran pê gotî ye, û ev e jî ew sitirane:

Wey lê..,
Kelha Bafê li belevanê,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Kelha Bafê ya rengîn yadê li belevanê,
Van ticar û kelekvana ji Diyarbekirê,
Kelekê xwe berdanê,
Wellah, qefa van kelehkan li ber,
Qesra bavê mi Seyranê,
Yadê, tuwê xêrê bikê,
Xêrê bi çavê xwe nebînê,
Çawe te nehêla ez bi bavê xwe re,
Têr bigerim ser hasilan û demanê,

Yadê, weyla li min rebenê,
Li min êsîrê,
Xudê xirab bikê mala,
Qaymeqamê Mûsil û zapitê,
Mihemed Begê Cizîrê,
Çawe xeniqandin bavê min rebenê,
Xweyê şebekan û zincîrê.
Her weha.....

Belê, me'na rêzika ewilî ji sitiranê her weha ye:

Kelha Bafê li belevanê. Yanî, kelha Bafê di serê pozkî bel de hatiye çêkirin û çêkiriye, û ew pozê bel, van e. Yanî xwehr e û berkûve, mîna serê heba nokê, belevan e.

Belê, rêzika dawî ji sitiranî me'na wê her weha ye:

Xweyê **ş**ebekan û zincîrê. Yanî, xweyê wê pira zorek a ku bi hev ve şebikandî, li ser avê û ragirtî bi zincîrê.

Belê, dawî, ji serhatiya 'Elodîno hate zanîn ku hindîke Mîrê Bota Mihemed Begê bû. Mirovekî pir zalim bû. Ji ber ku me ne bihîstî ye ku hindek hukumdar mirovan bi saxîtî û bi agirî 'idam bikin. Her wekî Mihemed Begê zalimê Botanî.

Wa li tile, wa li tile, wa li tile,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Qesra bavê mi Seyranê wa li tile,
Xudê xirab bikê mala zapitê Cizîrê û,
Qaymeqamê Mûsil e,
Çawe kuştin bavê min rebenê,
Mûm berdane nava herdû mila (mile)

Belê, ‘Elodîno, ew ‘Eledîno bi eslê xwe ji ‘eşîreta Sînikan bû û xelkên gundê Bafê hemî raya ‘Eledîn ne, û her weha jî ji ‘Elaedîn re tê gotin: ‘Elî Sînika û ‘Elî ‘Emer.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

## Mîr Sêvdîn babê Şêr Begê (Kekê Bedir-Xan Begê)

Belê, berya ku em dest bi vê teqrîra xwe bikin. Em siyadeta xwendevanan agehdar dikin ku hindîke Mîr Sêvdîn (birayê Bedir-Xan begê) Mîrê Bota bû.

Belê, Mîr Sêvdîn û Bedir-Xan ew herdû (bira) kurên Mîr Bedir-Xan Begê bûn. Yanî, navê babê herdûwan jî Mîr Bedir-Xan bû.

Belê, Mîr Sêvdîn birayê mezin bû û Mîr Bedir-Xan birayê biçûk bû.

Dibê, piştî ku babê wan çû rehmetê Mîrîtî ma ji bo Mîr Sêvdîn babê Êzdînşêr.

Belê, piştî ku birayê Mîr Sêvdîn yanî Bedir-Xan Beg mezin bû. Ew bi kêrî Mîrîtiyê hat û hemen Bedir-Xan Begê li pêşberî birayê xwe Mîr Sêvdîn rabû, û hevrikiya Mîrîtiyê digel birayê xwe Mîr Sêvdîn kir.

Belê, her li gora reya maqûlên ‘eşîretên Bota Mîrîtî dane Bedir-Xan begê, û Bedir-Xan Begê bû Mîrê Bota.

Belê, mixabin ku her bi vê çendê di mabeyna herdû biran de hevrikiya li ser Mîrîtiyê bi dawî nehat.

Belê, her li gora ku me ji devê zana û rîsipiyên xwe bihîstî.

Dibê, her ji heyamê berê ve, heta wî çaxê Bedir-Xan Begî yan jî Mîrên Bota, ‘urf û ‘adetên wan her weha bû. Di mewsimê peyîz û zivistan û biharan de her di hindirwê bajarê Cizîrê de û di Birca Belek de, hukumdarî ya xwe dikirin. Belê, di mewsimê havînê de her ji ber germa zêde, Mîrekên Bota, bi ‘eyalên xwe ve ji hindirwê Cizîrê bi derdiketin û her ji bo hênkayê, diçûne Qesirka Gelî, û her di mewsimê havînê de hukumdariya xwe di Qesirka Gelî de dikirin. Heta ku ew hersê mehên havînê bi ser wan de, dibihurîn û dibû peyîz, dinya hênik dibû her carek dî, Mîrên Bota



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

malên xwe ji Qesirka Gelî tanîne Cizîrê, û her weha hukumdariya xwe berdewam dikirin.

Belê, ji vir pêde, em dê dest bi serhatiya Bedir-Xan Begê û birayê wî Mîr Sêvdîn bikin.

Belê, her wekî me gotî, Bedir-Xan Begê Mîrê Bota bû, û hevrikiya Mîrîtiyê di mabeyna wî û birayê wî Mîr Sêvdîn de, berdewam bû.

Dibê, her carek dî, di herêma Bota de, benda Mîr Sêvdîn serdestî li benda Bedir-Xan Begê kir û Mîrîtî ji Bedir-Xan Begê sitandin, dane Mîr Sêvdîn û her carek dî Mîr Sêvdîn bû Mîrê Bota.

Belê, evê carê Bedir-Xan Begê ji birayê xwe Mîr Sêvdîn dilmayî bû, û bindestiya Mîr Sêvdîn qebûl nekir, û her ji ber vê çendê Bedir-Xan Begê rabû ji Qesirka Gelî mala xwe barkir, û çû gundê Dêrgulê xwe bi maqûlê ‘eşîreta Batwan girt.

Belê, heta çi pir û muxdarê Bedir-Xan Begê bi ‘erz û ‘eyalê xwe ve ma li gundê Dêrgulê, û her di Qesirka Gelî de, Mîr Sêvdîn Mîrîtiya xwe berdewam kir.

Dibê, şevekê li gundê Dêrgulê koçka maqûlê Batwan geriya, û her ji nişkê ve di nava civatê de maqûlê Batwan gote Îsvê Xulam: “Sivik rabe here mala Bedir-Xan Begê jê re bêje, bila werê koçkê”.

Di bersivê de, Îsivê xulam got: Belê, axayê min.

Dibê, hemen Îsivê Xulam rabû çû mala Bedir-Xan Begê û jê re got: Mîrê min, axayî gotiye bila werê koçkê.

Dibê, hemen Bedir-Xan Begê rabû kete pêşiya Îsivê Xulam û hate koçkê.

Dibê, her di koçkê de, axayî gote:

“Gelî xelkên civatê, ev e Bedir-Xan Begê hat. Gava silav da kesek bersiva silava wî nedin”.

Belê, dibê çawe Bedir-Xan Begê hate di hindirwê koçkê ve û sola xwe ji lingî xwe xist û silav li xelkên



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

civata hazir kir. Belê, mixabin, kesekî ji xelkên civatê bersiva silava Bedir-Xan Begê nedan. Her ji ber vê çendê hemen her wusan li ser piya Bedir-Xan Begê di cih de ma rawestyayî.

Belê, bişûn ve hindek cahilan sola Bedir-Xan Begê ji ber veşartin û her li serê civatê axayî her wusan bi hêrs bi Bedir-Xan Begê re, xeber da û jê re got:

"Kuro Bedro, tu hatî".!

Di bersivê de, her wusan li ser piyan Bedir-Xan Begê got:

"Belê, axayê Min".

Axayî got: 'Kanî kefenê Te'?!.

Bedir-Xan Begê got: 'Axayê min, kefenê min wê li male, min jibîr kir. Min bi xwe re ne anî'.

Axayî got: 'Haydê sivik bi şûn de bizivire, here malê kefenê xwe bi xwe re bêne. Hêj ji nû were kuçkê'.

Di bersivê de, Bedir-Xan Begê got: ' Belê'.

Dibê, hemen Bedir-Xan Begê bi şûn de zivirî. Belê, Bedir-Xan Begê sola lingê xwe li ber pêyê xwe nedît. Dibê, hemen Îsvê xulam ji dizî ve sola xwe danî ber pêyê Bedir-Xan begê.

Belê, Bedir-Xan Begê sola Îsvê xulam xiste lingê xwe de, û ji kuçkê bi derket û ber bi mal hat.

Dibê, çawe Bedir-Xan Begê gihişte malê hemen gote xulamên xwe: 'Divê hûn her îşev mala me bar bikin û hûn mala me bênin Qesirka Gelî. Her ji îşev pê de, gundê Dêrgulê ji bo me nabê'.

Divê, çawe Bedir-Xan Begê weha ferman kir. Hemen xulam û xizmetkaran dest bi barkirina malê kirin.

Belê, Bedir-Xan Begê wê şevê her bi tinê ji gundê Dêrgulê her wusan piya rêgirt û qista Qesirka Gelî kir. Belê, sibehî di rojhilat re Bedir-Xan Begê bi pêşberî Qesirka Gelî ket.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, her di hindirwê Qesrikê de Mîr Sêvdîn di pencerê re meyza kir ku ev e Bedir-Xan Begê wê ji rêriya Dêrgulê ve her wusan piya û bitinê tê.

Dibê, her ji şewqa biratiyê agir derbû dil û hinavê Mîr Sêfdîn. Belê, Mîr Sêvdîn zanî ku tiştek bi serê Bedir-Xan Beg hatiye.

Dibê, hemen her wusan bi lez û bez û serrût û pêxwas Mîr Sêvdîn ji Qesrikê biderket û çû pêşiya birayê xwe Bedir-Xan begê.

Dibê, çawe herdû birayên delal gehiştin hev, hemen Mîr Sêvdîn herdû destên xwe li sitûwê birayê xwe Bedir-Xan Begê weranîn û rûwê birayê xwe maçûkir, û destê birayê xwe Bedir-Xan Begê girt û herdû Mîrên delal tev de meşîn hatine Qesrikê û tev de rûniştin.

Belê, Mîr Sêvdîn gote Bedir-Xan begê:

"De ka keko ji bo min bibêje bêma ka çi hatiye serê te!?".

Di bersivê de, Bedir-Xan Begê got: "Bira, ev salek bû min bindestiya (Şêra) qebûl nekir, ez çûm ketim bindestê (Roviya), tişta ku hatî serê min hindike ne gelek e. Hal û keyfetê me û maqûlê Batwan ev e ye.

Belê, Bedir-Xan Begê ser û binê bi serhatiya xwe, ji bo birayê xwe Mîr Sêvdîn got.

Dibê, hemen Mîr Sêvdîn ber dilê Bedir-Xan Begê ve çû û jê re got:

"Bira xemgîr nebe, çi ('Ehd) li min ketibê ji îro heta du roj dî ez dê dersa Axayê Batwan bidimê. Hemen qet mereq neke".

Belê, dibê her di wê rojê de, mala Bedir-Xan Begê xulam û xizmetkaran ji gundê Dêrgulê anîne Qesirka Gelî.

Belê, hemen Mîr Sêvdîn qasid rêkirin nik axaler û maqûlên temamên 'eşîretên Botan. Belê, temamên axaler û maqûlên 'eşîretên Botan di Qesirka Gelî de



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

ber hev bûn, û qasidek birê-kirin gundê Dêrgulê pey axayê Batwan û Îsvê xulam.

Belê, axayê Batwan bi Îsvê xulam ve anîn di huzûra axaler û maqûlên ‘eşîreta de û di Qesirka Gelî de, hazirkirin.

Belê, Mîr Sêvdîn bi axayê Batwan re xeber da û jê re got:

“Kuro filankes, her di koçka Dêrgulê de ji bo çi tu bê huzûrî nîşa Bedir-Xan Begê de”.

Belê, axayê Batwan bersiva Mîr Sêvdîn bi tu awayan neda. Her wusan mîna pûtekî axayê Batwan di huzûra axaler û maqûlan de bi ser nivzî ma rawestiyayî. Belê, Mîr Sêvdîn nemerdî nekir hemen her bi destê xwe şûr weşande serê axayê Batwan û serê wî jêkir.

Belê, Mîr Sêvdîn gote Îsvê xulam: Her ji ev ro pêde tuwê xulamê birayê min Bedir-Xan Begê bê.

Belê, her di huzûra axaler û maqûlan de Bedir-Xan Begê jî, çû herdû destên birayê xwe Mîr Sêvdîn maçûkirin. Belê, her di huzûra axaler û maqûlan de Bedir-Xan Begê got:

“Ey gelî axaler û maqûlên delal qenc bizanin ku her ji ev ro pêde hevrikiya me digel birayê me Mîr Sêvdîn bi dawî hat. Her ji ev ro pêde, ez xulam û xizmetkarê birayê xwe Mîr Sêvdîn im, û her ji ev ro pêde Mîrîtiya Botan pîroz û bimbarek bê ji bo birayê min Mîr Sêvdîn.

Dibê, gava Bedir-Xan Begê weha got. Hemen di bersivê de, Mîr Sêvdîn got:

”Bira, her ji ev ro pêda , ez Mîrîtiyê bi vî awayî qebûl nakim, û her bi vî awayî Mîrîtî bikêrî me nayê; ew jî ji ber ku her ji wextê ku bavê me Mîr Bedir-Xan çûwî rehmetê heta wekî ev ro, her ji aliyê Sultan ve me Mîrîtiya Botan nûvejen nekiriye, û navê me di nava rêza Mîrên Azîzan de tune ye. Her ji



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

ber vî yekî, sibehê ez û tu em herdû wê bi hev re em dê ji Qesirka Gelî bi rêkevin. Her bi tinê tu here Sitenbûlê û her bi tinê ez jî ê biçim Bexdayê. Kîjanî ji me herdû biran berî Mîratî ji bo xwe anî û berî gehişte Qesirka Gelî xwe Mîrîtî ji bo wî ye'.

Dibê, gava Mîr Sêvdîn weha got hemen xeberdan ji bo Bedir-Xan Begê nema. Belê, Bedir-Xan Begê got: 'Belê, Mîrê min'.

Dibê, çawe ew roj qulipî roj dawî û li herdû biran bû sibeh. Belê, herdû Mîrên delal bi hev re her yek li hespê xwe siwar bû û bi hev re ji Qesirka Gelî birê ketin.

Belê, hindîke Bedir-Xan Begê bû berê xwe da Sitenbûlê û hindîke Mîr Sêvdîn bû berê xwe da Bexdayê. Belê, em pir zêde xeber nadin hindîke Bedir-Xan Begê bû her ji Sitenbûlê û ji aliyê Sultanê dewletê ve, destûra Mîrîtiyê ji bo xwe anî, û her berî Mîr Sêvdîn ji Sitenbûlê zivirî, û gehişte Qesirka Gelî.

Belê, hindîke Mîr Sêvdîn bû, her ji aliyê Walî yê Bexdayê ve ewî jî Mîrîtî ji bo xwe anî û ji Bexdayê zivirî û hat. Heta ku gehişte hindava 'eşîreta Gergeriyan û di ber êla Se'dûnê Gergerî re bihurî.

Belê, her ji nava êlê kurê Nihê Gergerî yanî Se'dûnê Gergerî, çavê wî bi siwarekî ket, ku ev e ew siwar wê ji binê beriyê ve tê û tacekî zêra wa li ser serê ewî siwarî ye. Pa ne her wî çaxî nav û dengî se'dûnê Gergerî bi dinê ketiye ku hindîke Se'dûnê Gergerî ye muxlaciyê binê beriya jêrî ye.

Belê, dibê gava Mîr Sêvdîn nêzîkî li êla Se'dûnê Gergerî kir. Hemen Se'dûnê Gergerî dengê xwe li koma xulaman kir. Belê, koma xulamên Se'dûnê Gergerî tev de li hespan siwar bûn û bi hev re xar berdane pêşiya Mîr Sêvdîn û rê li pêşiya Mîr Sêvdîn girtin û dengê xwe li Mîr Sêvdîn kirin û jê re gotin:



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

”Kuro, Siwaro hespê xwe û rihal û pirgala xwe ji bo me bihêle û bi silametî birêka xwe here, yan ne, tu rihê şêrîn ji destê me xilas nakê”.

Dibê, gava xulamên Se’dûnê Gergerî her weha dengê xwe li Mîr Sêvdîn kirin. Di bersivê de, Mîr Sêvdîn got:

“Gelî nijdevanan, tuwî heqê we li min tune ye, rêka min berdin û xwe ji pêşiya min bidin alîkî lê rêka min dûr re”.

Dibê, çawe Mîr Sêvdîn weha got hemen ewan her sed û bîst û pênc xulamên Se’dûnê Gergerî bi hev re hucûmat birin ser Mîr Sêvdîn û li dûra Mîr Sêvdîn werhatin.

Belê, hindîke Mîr Sêvdîn bû, rim hejand, û mîna gurê dev bi xwîn kete di nava koma xulamên Se’dûnê Gergerî de. Ê kuştin, ji xwe kuştin, ê hiştin do- do, sê- sê, bi çolê de raterqandin.

Belê, Mîr Sêvdîn meydan li Se’dûnê Gergerî fereh kir. Hêj ji nû Se’dûnê Gergerî ji bo şerê Mîr Sêvdîn dakete meydanê û her weha Se’dûnê Gergerî nav li xwe da û her weha got:

”Ez Se’dûnê Gergerî kurê Nihê Gergerî me. ‘Ehda xudê li min ketîbê ev ro tu ji destê min xilas nabê’.

Dibê, gava weha Se’dûnê Gergerî nav li xwe da, hemen Mîr Sêvdîn Se’dûn naskir û Mîr Sêvdîn di bin lêvê xwe de keniya.

Belê, Mîr Sêvdîn mîna şêrekî rim hilanî û heta şiya qûna rimê li nava milê Se’dûnê Gergerî xist. Belê, Se’dûnê Gergerî ji ser pişta hespî hilweşiya û qûnikî li ‘erdê ket.

Hêj ji nû Mîr Sêvdîn nav li xwe da go: ” Ez Mîr Sêvdîn babê Şêr Begê Mîrê Bota me. Kuro Se’do, bi xudê îro tu ji destê min xilas nabê”.

Dibê, gava Mîr Sêvdîn her weha nav li xwe da. Hemen hêj ji nû Se’dûnê Gergerî Mîr Sêvdîn nas kir.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, Se'dûn pir ber xwe ket û gote Mîr Sêfdîn: "Mîrê min, çi hemen bi Xudê min tu nas nekirî. Ez hêvî dikim ku tu li min negrê".

Dibê, hemen Se'dûn rikêba Mîr Sêvdîn maçûkir, û hêj ji nû Mîr Sêvdîn jî li Se'dûnê Gergerî bihurî û Se'dûn jî xwe ji rêka Mîr Sêvdîn da alîkî. Belê, her bi serbilindî Mîr Sêvdîn hat heta ku gehişte Cizîra Bota û qunaxa dawî bire Qesirka Gelî.

Belê, çawe Mîr Sêvdîn gehişte Qesirkê meyzakir ku ev e birayê wî Bedir-Xan Begê wê ji Sitenbûlê zivirî û Mîrîtiya ji bo xwe anî.

Dibê, hemen Mîr Sêvdîn çû destê birayê xwe Bedir-Xan Begê maçûkir û her bi munasebata Mîrîtiyê Mîr Sêvdîn pîrozbayî da birayê xwe Bedir-Xan Begê û jê re got:

"Bira, her ji ev ro pêde, sed carî pîroz û bimbarek bê, Mîrîtiya Bota ji bo te, û heta em jî sax in em piştevan in, ji bo Mîrê xwe".

Belê her bi fermana Mîr Sêvdîn ji bo teşrîfa Mîrîtiyê ji bo Bedir-Xan Begê di Qesirka Gelî de def û zirne hate lêxistin, û axaler û maqûlên 'eşîretan ber hev bûn.

Belê, her li binê berya jêrî Se'dûnê Gergerî jî birekî siwara da pey xwe û qista Cizîra Bota kir.

Belê, çawe Bedir-Xan Begê bihîst, gelek ji bo Se'dûn kêfa wî hat ew jî ji bo xweş mêriya wî.

Belê, dibê piştî ku dîwana Bedir-Xan Begê ji axaler û maqûl û xweş mêran geriya û di nava civatê de Bedir-Xan Begê berê xwe da Se'dûnê Gergerî û jê re got:

" Se'dûn 'eceba ev ro di herêma Bota de xweş mêrên mîna te hene".

Di bersivê de Se'dûnê Gergerî got:

"Belê, Mîrê min, ê ku ji min xweş mêrtir her di nava evê civatê de hene".



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Bedir-Xan Begê got: Ew çi kes e”.

Se’dûn got: ”Mîrê min, hal û keyfîteyê bi serhatiya min û Mîr Sêvdîn her ev e ye. Bi Xudê heta wekî îro kesekî pişta min li ‘erdê nexistibû. Belê, Mîr Sêvdîn pişta min li ‘erdê xist”.

Dibê, gava Se’dûn weha got. Bedir-Xan Begê keniya û gote Se’dûnê Gergerî: ”De bila Xudê ewî ji ser serê me kêm nekê”.

Belê, her bivê çendê ev bi serhatiya Mîr Sêvdîn û Bedir-Xan Begê ji bo me bi dawî hat.

Ewî ji kerema hikayetbêjê delal Mihemed Teyib zanayî Bermirî.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Sitirana Mîr Sêvdîn

*Belê, her wî çaxî derbara ewî şerî ku qewimî di mabeyna Mîr Sêvdîn û Se'dûnê Gergerî de sitiranbêjên welatî sitiran pê gotine û her ji ewê sitiranê ev çend kertikên jêrîn her ji devê sitiranbêjê delal Mehmûdê Alê hunermendê Bermirî me, wergirtine her wekî çawe birader Mehmûdê Alê ewî sitiranê her weha dibêjê:*

Wey lo, wêlî, wêlî, wêlî,
Wîlî, wêlî, lo, siwaro wêlî,
Wellah ezê bibim xulamê Mîr Sêvdîn,
Babê Şêr Begê taca zêra
Lo, wa, li sêrî,

Wellah şade şuhûdê Mîr Sêvdîn,
Babê Şêr begê, lo, gelkî hene,
Çawe berdabû sed û bîst û pênc,
Xulamê Se'dûnê Gergerî,
Wey lo, siwarê ser bi xêlî,

Wellah nayê, nayê, lo Se'do nayê,
Wellah şerê Mîr Sêvdîn babê Şêr begê,
Lo, ji te nayê,
Ne mi go neçe pêşiya Mîr Sêvdîn,
Babê Şêr begê,
Wey lo, wê tê ji Mîrîtiyê,
Lo, ji Bexdayê,

Were lêlê, were, lêlê,
Baran barî, lo li nav garisa,
Wey lo, Mîro, xunav barî,
Lo, li nav garisa,
Ezê bim xulamê Mîr Sêvdîn,
Babê Şêr begê,
Rim giran e lo nav mil dewsa,
Wellah şade û şuhûdê Mîr Sêvdîn,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Babê Şêr Begê lo gelkî hine,
Çawe berda bû sed û bîst û pênc,
Xulamê Se’dûnê Gergerî,
Siwarê van ‘ereban û ‘Inisa,

Wey lo, nayê, nayê, lo, Se’do nayê,
Wellah şerê Mîr Sêvdîn babê Şêr begê,
Lo, ji te nayê,
Ne mi go neçe pêşiya Mîr Sêvdîn,
Babê Şêr begê,
Wey lo, çawe, wê tê ji Mîrîtiyê,
Lo ji Bexdayê,

Were lêlê, were lêlê,
Baran barî lo bi dilop e,
Wey lo, Mîro, xunav barî,
Lo, bi dilop e,
Bila bibim xulamê babê Şêr begê,
Rim giran e, lê ji darê top e,
Wellah şade şuhûdê Mîr Sêvdîn
Babê Şêr begê, lo, gelkî hene,
Çawe, berdabû sed û bîst û pênc
Xulamê Se’dûnê Gergerî
Wellah nav li xwe da, digo:
“Mîr Sêvdîn im, Mîrê Bota”.,

Were nayê, nayê, nayê, lo, Se’do nayê,
Wellah şerê Mîr Sêvdîn babê Şêr begê
Lo, ji te nayê,
Ne mi go neçe pêşiya Mîr Sêvdîn
Babê Şêr begê,
Wey lo, çawe, têt û ji Mîrîtiyê,
Lo, ji Bexdayê.

---

## Xulamê Bedir-Xan begê



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

(nukte=pêkenok)

Dibê, jineka xulamê Bedir-Xan Begê hebû, yeke reşa por ‘ujûl û lêv şotir û teşk bi rêx û mîna pîr hevokî bû.

Belê, hind bê merîs bû, dilê sa vêre ne diçû xwarinê.

Dibê, rojekê çavê Bedir-Xan Begê bi jina xulamê wî ket. Dilê wî jê xeliya. Dibê, hemen Bedir-Xan Begê gote xulamê xwe: ” Kuro xulam ev tu çawe di berê evê jinikê de di razî!?”.

Di bersivê de, xulamî got:

”Wî Mîrê min, her kes dikarê diberî xatûna Mîrê min de razê, lê Mîrê qenc ew e, ê ku karibê di berê xatûnên mîna xatûna min de razê”.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Êzdînşêr Begê Botan

Bo cara dowê em dest bi evê serhatiyê dikin. Ew jî ji ber ku cara êkê me ev bi serhatî nivîsî. Belê, mixabin ewê carê ji ber destê me windabû, her ji ber wê yekê me daxwaz kir ku em carek dî evê bi serhatiyê binivîsin û em bikin xelat ji bo gelî xwendevanên delal, li gora hizir û bîrên me pişkekî temsîlî ji evê serhatiyê tê girêdan. Her weha.....

Dibê, hindîke Êzdînşêr bû kurê Mîr Sêvdîn biraziyê Bedir-Xan Begê bû. Belê, piştî ku babê wî Mîr Sêvdîn emrê Xudê kir, û çû rehmetê hingî Êzdînşêr biçûk bû qey umrê wî heft- heşt salî tê hebû.

Dibê, mamê wî Bedir-Xan Begê pir jê hes dikir û pir xudîtî lê dikir.

Belê, dibê tebî’etê Êzdînşêr di biçûkatiya wî de, gelekxerîb bû, yanî di herêma Bota de, tu lawikî mîna Êzdînşêr bîrewer û zana û jîr û çeleng peyda nedibûn.

Em dişin bibêjin her di Cizîra Bota de Êzdînşêr serekvanê temamê zarokên binemala Mîrekan û binemalên ‘amiyan bû.

Belê, xuyîkê wî her weha bû. Her sibeh û êvara Êzdînşêr li Qesirka Gelî zarokên binemala Mîran û xelk û cîranan li dora xwe kom dikirin û tanîne çemê bi Zeytûn û her texlîtê lîstûkan nîşa zarokan di da, û bi hev re dilîstin heta ku di westiyan û keyfa xwe li çolî dibihurandin.

Belê, her ji ber ewî keyfa zêde û ewî hevaltiya şêrîn û rind û ciwan go ya mirov digotin her wextî rih û canê Ewan zarokên delal linik Êzdînşêr bû. Tucara ji wî mixalefet ne dikirin û her wextî bi gotina wî radibûn û di rûniştin.

Belê, dibê rojekê li Qesirka Gelî Êzdînşêr zarokên xelk û cîranan li nava malan berhev kirin, û hemî



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

anîne çemî bi Zeytûn. Belê, berya ku ji bo xwe dest bi lîstûkan bikin.

'Ezdînşêr got: "Gelî zarokên delal ev ro, em dê ji bo xwe bi lîstûka 'eskerî bilîzin".

Di bersivê de, zarokan gotin: "Gelek baş e".

Êzdînşêr got: "De, nexwe her kesek ji we li ber çemî belav bibin û her yekî ji we, çîtekê ji bo xwe bênin, û her yek ji we şûrekî darî jî ji bo xwe çêbikin.

Dibê, gava Êzdînşêr weha got. Hemen zarok rabûn li ewan ber çeman belav bûn, û her yekê ji bo xwe çîtek peyda kirin û her yekî ji çiqlê daran şûrek jî ji bo xwe çêkirin, û her yekî li çîta xwe siwar bûn, û şûrên xwe yên darî bi destê xwe girtin, û hemî bi hev re hatin li dora Êzdînşêr rawestiyan.

Belê, Êzdînşêr jî li çîtekê siwar bû, û ewî jî şûrekî darî bi destê xwe girt û da pêşiya zarokan mîna baş qumandanekî romanî. Berî berê ordiya 'eskerê xwe da qûntara çiyayê Dêra.

Li kaş û pesara, û li newal û mesîla ordiya 'eskerê xwe da gerandin. Belê, piştî ku her ji sibehî heta nîvro Êzdînşêr tedrîbekî 'eskerî bi zarokan da nîşan dan.

Belê, her ji nîvro pêde Êzdînşêr berê ordiya 'eskerê xwe da Qesirka Gelî.

Belê, ewê rojê di Qesirka Gelî de dîwanxana Bedir-Xan Begê digeriya. Milê axaler û maqûl û xweşmêran li hev diket.

Belê, Êzdînşêr bi ordiya 'eskerê xwe ve da ji derê dîwanxanê ve. Belê, ji nişkê ve Bedir-Xan Begê meyzakir ku dîwanxana wî tijî zarok bû. Belê, ewan zarokan çîtên xwe bi taqîn dîwanxanê ve, hilpesartin û her yek ji bo xwe li pêşberî xelkên civatê li ser çûçkan rûniştin, û şûrên xwe li ser çogên xwe danîn, û xelkên civatê her yek di hindava xwe de bi wan zarokan şabûn û keniyan.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, Bedir-Xan Begê jî her li serê civatê bi Êzdînşêr re xeber da, û jê re got:

”Birazê, tu bi ‘eskerê xwe ve, li ser çavê min hatî, bêje, daxwaza te çiye?”. Di bersivê de, Êzdînşêr got:

”Bila Mîrê me xweş bê. Belê, xuyaye ku ev ‘eskerê me ye û ez bixwe jî baş qumandanê ‘esker im. Her ji sibehî ve heta wekî niha min ordiya ‘eskerê me biribû te’lîmê. Vêce ‘eskerê me pir birçî bûye divê xwarin ji bo ‘esker werê”.

Dibê, gava Êzdînşêr weha got. Hemen Bedir-Xan Begê dengê xwe li xulam û xizmetkaran kir. Belê, xulam û xizmetkar rabûn çûne aliyê malê sivrek goşt û birinc anîn li ber zarokan danîn. Belê, her bi dilxweşî zarokan binçeng bi goşt û birincê rastkirin.

Belê, piştî ku zarokan têr xwarin xwarin û sifre ji ber wan hate hilanîn. Bedir-Xan Begê bi Êzdînşêr re xeber da û jê re got: ”Birazî de ka ji bo me bêje bê ma ka te ev ordiya ‘esker ji bo çi te girêda ye?!”.

Di bersivê de, Êzdînşêr got:

”Mîrê min, ji axaler û maqûlên temamê ‘eşîretên Botan ve û ji her kesî ve diyar e, ku tu wî kêmayî li Mîrîtiya Bedir-Xan Begiyan tune ye, ji bil yek kêmasiyê bi tenê ew jî ev e çend rojan min hizir û bîrên xwe kirin û min dihnê xwe dayê ku her di nava ‘eşîretên me de qûwetkî ‘eskerî peyda nabê, da ku di rojên qewmandinê de ew quweta ‘eskerî ber singa dijmin û neyaran bigirê.

Her ji ber vê çendê, îro ez rabûm min ev ordiya ‘esker teşkîl kir, da ku di rojê qewmandinê de ev ordiya ‘eskerê me ber singa dijmin û neyaran bigrî û ‘eşîretên me bi parêzê ji destê dijmin û neyaran”.

Dibê, gava Êzdînşêr weha bersiva hemen Bedir-Xan Begê bi civata hazir ve bi gotina Êzdînşêr gelek şad û bextiyar bûn.

Belê, Bedir-Xan Begê gote ‘Ezdîn Şêr:



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

”Birazê, de bila pîroz bê ev ordiya ku te teşkîl kirî”.

Belê, Êzdînşêr got:

”Mîrê min, pa ne hûn dizanin ku divê ev ordiya ‘esker werê xudîkirin. Vêce, divê îro di huzûra axaler û maqûlan de tu ‘eşîretekê ji ‘eşîretên Botan teslîmî min bikê, da ku em xerc û bêşên ewê ‘eşîretê bistînin û em ordiya xwe ya ‘esker her wextê bi xerc û bêşên ewê ‘eşîretê xudî bikin”.

Dibê, gava Êzdînşêr weha got. Di bersivê de, Bedir-Xan Begê got:

”Birazî, daxwaza te gelek rind û ciwan e, û gotina te di cihê xwe de ye. Vêce, her di huzûra evê civata hazir de û bi şehdebûna temamên evan axaler û maqûlan, her ji ‘eşîretên Botan min ‘eşîreta Suhran teslîmî te kiriye. Belê, ‘eşîretên wekî ‘eşîreta Suhran qenc û delal peyda nabin, û hindîke Birahîmê Kore maqûlê ‘eşîreta Suhra ye. Belê, maqûlên mîna Birahîmê Kore camêr û sexî û merdemêr her di nava temamên evan axaler û maqûlan de peyda nabin. Vêce, birazî, hemen here nik Birahîmê Kore bila xerc û bêşên ‘eşîretê bistînê û teslîmê te bikê, û tu jî li ordiya xwe serf bike”.

Dibê, gava Bedir-Xan Begê weha got keyfa Êzdînşêr gelek hat. Belê, hemen Êzdînşêr dengê xwe li ‘eskerê xwe kir. Zarokan bi hev re dest avêtin çîtên xwe û ji dîwanxanê biderketin û bi hev re li çîtên xwe siwar bûn û dane pê Êzdînşêr. Belê, Êzdînşêr berê zarokan da nav malên Suhran. Belê, her hingî malên Suhra li nêzîkî Qesirka Gelî bûn, û her wê se’etê maqûlê ‘eşîretê Birahîmê Kore li binê konê xwe rûniştî bû.

Belê, her ji nişkê ve Birahîmê Kore meyza kir ku ev e Êzdînşêr bi ‘eskerê xwe ve li derê kon sekinîn. Belê, Hemen Birahîmê Kore bezî çû destê Êzdînşêr maçûkir û jê re got: ”Mîrê min, tu bi ‘eskerê xwe ve li ser çavê min hatî”.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Belê, Birahîmê Kore dengê xwe li jinika xwe kir û jê re got:

‘Hermet ciyan ji bo mihvanê me deyne”. Dibê, hemen jinika Birahîm hinek cilk û milk ji bo zarokan danîn. Belê, zarokan çîtên xwe bi heşê kon hilpesartin.

Belê, Êzdînşêr bi zarokan ve li binê konê Birahîm rûniştin û Êzdînşêr dihnê xwe da ser û berê Birahîm axa pa ne feqîr û zelamekî bi çavekî xwe kor e. Hindek cilk û milkî qetiyayî lêne. Mirov dest bavêjê pînekî ji cilkê wî bikê, deh pîne bi hev re, wê jê bikevin xwarê.

Belê, Êzdînşêr dihnê xwe da ser û berê mala Birahîm axa, pa ne hêj kembaxtir e. Belê, Birahîm axa gote ‘Ezdînşêr:

” Vêce, Mîrê min, te xêre îro weha bi ‘eskerê xwe ve tu bi ser me de hatî!?”.

Di bersivê de, Êzdînşêr got:

’Mamê Birahîm pa ne tu dibînî ev ordiya ‘esker min teşkîl kiriye û mamê min Bedir-Xan Begê jî ’eşîreta Suhran sipartiye min da ku em xerc û bêşên wê bistînin û em li ‘eskerê xwe serf bikin. Vêce, mamê min Bedir-Xan Begê ez şandime nik te da ku tu xerc û bêşên ‘eşîretê bistînê û tu teslîmî min bikê”.

Dibê, gava Êzdînşêr weha got. Di bersivê de, Birahîm axa got: ”Mîrê min pa ne tu halê min dibînê, çi bi xudê halê ‘eşîretê ji halê min kembaxtir e. Vêve ma ezî çawe xerc û bêşên ‘eşîretê bistînim Wellah Mîrê min tiştek tu ne ye”.

Dibê, gava Birahîm axa weha got. Hemen Êzdînşêr hizir û bîrên xwe kirin û zanî ku tiştek tune ye.

Belê, Êzdînşêr got: ”Mamê Birahîm ma qey hindek xwarin jî tu ne ye, ku hûn deynin ber zarokan”. Di bersivê de, Birahîm axa got: ”Belê, Mîrê min”.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dibê, hemen Birahîm axa dengê xwe li jinka xwe kir, go: “De, hermet xwarinkê ji bo zarokan bêne”.

Dibê, hemen jina Birahîm axa rabû dest avête binê wan hebanok û mebanoka hindek qet û metên nanê hişk anî danî ber zarokan. Belê, zarokan parî ji destê hev revandin û bi hev keniyan.

Belê, dibê, piştî ku zarokan nanê xwe xwarin. Êzdînşêr got:

”Mamê Birahîm ma qey hûn evê dîkilê li derê malê jî nadine min?”.

Birahîm axa got: ”Belê, wellah Mîrê min”.

Dibê, hemen jina Birahîm axa dîkil girt û da destê Êzdînşêr. Belê, Êzdînşêr dîkil xiste di bin çengê xwe de û dengê xwe li zarokan kir.

Belê, zarokan hemî bi hev re ji binê konî bi derketin û dest avêtin çîtên xwe û li çîtên xwe siwar bûn.

Belê, Êzdînşêr xatir ji Birahîm axa xwestin û kete pêşiya zarokan û her ji nav malên Suhran bi şûn de berê zarokan da Qesirka Gelî. Belê, her bi rê ve Êzdînşêr gote zarokan:

” De, ka evî dîkilî baş biperitînin”.

Dibê, zarokan her wisan sax dîkil pertikandin, û dane destê Êzdînşêr. Belê, Êzdînşêr teliya xwe da bin çavekî dîkil derxist û meşîn heta ku gehiştin derê Qesirkê. Belê, Êzdînşêr bi zarokan ve çûn di hindirwê dîwanxanê ve.

Dibê, her carek dî Bedir-Xan Begê bi xêrhatin da Êzdînşêr û jê re got: ”Birazî tu bixêr hatî”. Êzdînşêr got: ”Belê”.

Bedir-Xan Begê got: ”Te xerc û bêşên ‘eşîretî sitandin?”.

Êzdînşêr got: ”Na, Mîrê min”.

Bedir-Xan Begê got: ”Ji bo çi?!”.

Êzdînşêr got: ”Mîrê min Birahîm axa li ber xerc û bêşên me asê bû, û ji me re got: tiştek tu ne ye.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Bedir-Xan Begê got: ”Birazî ez bawer nakim”.

Dibê, çawe Bedir-Xan Begê got ez bawer nakim, hemen Êzdînşêr dest avête dîkilî ji bin çengê xwe derxist û dîkil berda nava dîwanê û gote Bedir-Xan Begê:

”Mîrê min, de, hemen ev e Birahîmê Kore, de ka xerc û bêşên me jê bixwaze bêma ka wê çi bersiva te bidê”.

Dibê, gava Êzdînşêr her weha dîkil berda nava dîwanê û her weha bi Bedir-Xan Begê re xeber da, gelî xelkên civatê tev de keniyan û her ji kena piştde ketin. Belê, Bedir-Xan Begê bixwe ber xwe ket. Belê, Bedir-Xan Begê gote Êzdînşêr :

”Birazî ji ev ro pêde ‘eşîreta Suhra mi’afe, min soz bê, heta ez sax im ji îro pêde ez ti xerc û bêşan ji ‘eşîreta Suhran nasitînim”.

Belê, gava Bedir-Xan Begê weha got hemen Êzdînşêr rabû çû destê mamê xwe Bedir-Xan Begê maçûkir.

Belê, Êzdînşêr bi zarokan ve her bi şehnazî ji dîwanxanê bi derketin û her yekî çûne malên xwe.

---

Belê, her bi vê çendê hikayetbêjê delal Mihemed Teyib Bermirî ev lîstûka Mîran ji bo me bi dawî anî, û em jî evê lîstoka Mîran dikin xelat ji bo gelî xwendevanên delal. Bimînin bi xêr û xweşî.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Şîna Mîr Sêvdîn

Şîna Mîr Sêvdîn ji aliyê (Şamperîxana Goveyî) ve, yê ku di sala 1263 koçî=1847z, de wefat bûye.

Herê dewletê, herê dewletxanê,
Hespa hîre hîre li ber derê tewilxanê,
Jengê avêtibû tefsî û tirarêt şîlanê*,
Xêrik keti bû berr û mehfûrê dîwanxanê,
Mîr Sêvdîn Begê minê Bota wê girtiye, wê li hebis û zindanê,
Kî dibêjê Mîr Sêvdîn Begê min ê xirab e,
Yê diditin xulama tifengê qûte şeşxane,
Yê diditin xidama guharokên bi şerab e**,
Roj li Mîr Sêvdîn Mîrê Bota hilketî, sernedest hilîna,
Çi ‘egîd û çi xweş Mîr û çi pismama,
Sê teyr û sê wehşa li ser ziyareta Mîr Sêvdîn Begê minê Mîra
Kiribû sêber e, yek bazî ye, yek qurxû ye, yê dî seqer e,
Sê hingostîr yê tiliya Şamperîxana delal,
Yek zêr e, yek zîv e, ya dî cewher e,
Ez a bi mal im, ez a bi mêr im,
Xûşka heft birayê, dayê û bavê me
Pazde pismamê wekî şêr in,
Ez hemiyan bi lîfkekî bişom bi darbestekê veşêrim,
Ez ya Mîr Sêvdîn Begê Mîrê Bota her nahêlim.

---

Ez nizanim Şamperîxan jina Mîr Sêvdîn bûye yan diya wî bûye. (xirvekirina Ebdilreqîb Yûsif).

* Şîlan: Cihê xwarin lê çêdikin.
** Di rîwayetek de : (Yê diditin xidama guharokên tî û şerabe).



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

*Ev reşpelek ji hêla dîrokzanê Kurd seyda Ebdilreqîb Yûsif diyarî min bûye. Ez vê diyariyê cihê rêzgirtin û spasiyê dibînim (Dilawerê Zengî).

## Sitirana Bedir-Xan Begê

1-Belê hespê Mîrê min ê,
Boz e, çendî bez e,
Êzdînşêr Beg bi sê denga,
Ba diketê Bedir-Xan Beg keko bira,
Temaşeyî lawkêd Bota bike,
Xwe hilkêşa kozik û ,
Çepera dubarî miterze,
Nebîm Xudê ji can û bextê min,
Ne ênît ezê li bêreqdara bixwirim,
Berê bêreqê bideme,
Ser deşta Sinceqê,*
Dubarî Mîrêd Xerz e,*

2-Ji Gelê virda bi tirnic,
Cûniyê qehwê li qehweçaxê,
Rinc e rinc e,
Êzdînşêr Beg bi sê denga,
Ba diketê keko Bedir-Xan Begê,
Lawkêd Hacî Beyrema* yêt xayin bûwîn yêt,
Tifenga dihavên berkêd tivengêd wan,
Bate ye dubarî kinc e,

3-Ji Gelî virda bi dehl û derê,
Ji derê Şînika û Sarima û Berweca,*

---

* Deşta Sinceqê: Deşta başûrê bajarê Cizîra Bota ye.
* Xerze: Ew mîrên ewêd dijî Bedir-Xan Begê rawestiyan û hevalbend bûn digel Osmaniyan.
* Hacî Beyrem: Hozeka Kurdî ye, akincî ye li başûra rojava Cizîra Bota.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Diçît pêt û kûrrê,
Şemsa bi sê denga,
Ba diketê Mudîrê ,
Midyatê* topa mezin ji bo me bêt,
Digel sê tabûrêd,
‘Eskerî lawkêd Hacî Beyrema,
Yêt xayin bûwîn naken şerî

4-dilê mino li vê muxanê ,
Şemsa bi sê denga,
Ba dikete Mudîrê,
Midyatê topa mezin ji bo me bê,
Ser ‘erebanê,
Êzdînşêr Beg yê asê bûwî,
Li Birca Belek,*
Dubarî barxanê,

5-Dilê mino yê dikelî,
Şemsa bi sê denga,
Ba diketê Mudîrê
Midyatê topa mezin ji bo me bê,
Digel sê tabûrêd ‘eskerî,
Êzdînşêr begê,
Birca Belek berda,
Ji êvar da helkuşte
Qesirka Gelî

6-Hey lo Mîro,
Dilê mino gutegute,

---

* Şînik, Sarim, Berwec: Tuxmên tifengan in.
* Midyat: Bajarekî Kurdî ye li Kurdistana bakur e (Turkiya).
* Birca Belek: Qesra Mîr Bedir-Xan Begê ye.(Ya rastir qesra mîrekên Cizîra Bota bû; ji ber ku Birca Belek ne di dema Mîr Bedir-Xan de hatiye ava kirin. Belê, li gorî dîrokê ev keleh berî Mîr Bedir-Xan bi qelekî hatiye avakirin) D.Zengî.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Şemsa bi sê denga,
Ba diketê Mudîrê,
Midyatê topa mezin digel sê,
Tabûrêd ‘eskerî,
Ji bo me bête,
Êzdînşêr Beg bi sê denga,
Badiketê keko,
Bedir-Xan Beg tilxirafekê,
Bi Husên begê* Mîrê Şêxa ra,
Bigehîne, Xudê pê dizanî ew,
Li nav sey babêt Qumsora*,
Melkemot e.

---

*Ev sitirane ji zarê Islam Qarqaravayî bo min hatiye gotin. Çende hindek benda Xelîl Bakûzî jî dibêt belê ne bi dirustî.

*(Ev sitirana Bedir-Xan Begê jî mîna sitiranên vê pertûkê bi tevayî ji hêla Seydayê hêja Ebdilreqîb Yûsif gihane destê min. Diyar e ev sitiran bi destê mamoste Ebdilkerîm Findî Doskî hatiye civandin û belavkirin. Birastî navê vê kovarê li ser riwê rûpela (fotokopî) ne xuyaye. Tenê ev çend gotin hatine nivîsandin:
{Bizav-Rûpel(5)-26-12-1989 (Ebdilkerîm Findî Doskî).}

---

* Husên beg: Kurê ‘Elî Beg mîrê Êzdiya ye, hevalbend bû digel Bedir-Xan paşa. Her wisa gelek hevalê Layard bû.
* Qumsor: Merim jê peyva (qunsil) ya ‘erebî ye.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

(Dilawerê Zengî)



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

"Berê Xanê li tila:
Eskerê Osman Paşa li binya mala xula xula; xila xila,
Tavekî baranê Hato li hiçka ‘ebaya Bedir-Xan Begê, kekê Tîlî Begî,
Ter kiro şil û mila...
Şevoka der şevî, weyla malikwêrano,
Tu çima şerî nekî ji eşq û dila,
De rabe , rabe, fermaniyo, de rabe,
Fermana Bedir-Xan Begê, kekê Tîlî Begî rabû ji Stembolê,
Berê Xanê li rêwo,
Deriya dêrê li rêwo;
Osman Paşa şand Heleba xopan Topa-qalê, Topa mezin ji min re bêwo;
Xaîn nebû li dewletê,
Xaîn bû li hikûmetê,
Dengê topan û tifinga xweş tê li pê me,
Şevoka der şevî, weyla malikwêrano,
Romîkê di kumsor ketine Cezîra Bota,
Xirab kirin sençaq ‘eşîreta,
Berê Xanê bi lalîka;
Eskerê Osman Paşa li binya mala hîka hîka:
Heyfa min têt wê heyfê; hate girtin Esefê Lotî Teherê Meymo
Digel girgirê ,eşîra Cezîra Bota,
Şevoka der şevî, weyla malikwêrano,
Romîkê di kumsorî ketine Cezîra Bota.
Xirab kirin ciyê zavan û bûka".

*     *     *     *



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

“Mala bar kir ji beriyê
Danîn çemê Zihêriyê,
Derbas kirine kelek û gemiyê Ribehiyê,
Bedirê Xezalê cûavkê dide Cizîra Bota,
Dibêje “Eva koçerê Mîra hatin,
Dibêjin em nadin xerc û xeracê Mîrîtiyê”.
Bedir-Xan Begê Ban dike Mîr Zêydîne,
Dibêjit”Çi dinyake mi dewran bi kên e,
Hespa derxin, lê bikin merek û zîn e”.
Xudê ava bikit mala Bedir-Xan Begê delal,
Zêde bike dewleta Mîr Zêydîn e.

Me şerekî giran danîbûy li qesra Kalê li qûna çiyê
Bedir-Xan Begê cûavkê rêdikit pey qewm û ‘eşîrê çiya,
De rabin eskerê Botaniyê bînin,
Emê bêne meydana Geliyê Hesena,
De emê herne pêşiyê.

Me şerekî giran danî, binya mala rikinî,
Dengê va şeşxana li hevdu disekinî,
Minê heyf û sêsid mixabinat e,
Ji şerê ewilî kuştine Melekê Divinê,

Me şerekî giran danîbû di pêşî mala
Dyûyê şeşxana xwe dabûy ber kendala,
Heyf û sêsid mixabinat e,
Derba dî kuştine Hacîkê ‘Evdala.

Bestê Beleka wa bi şov e,
Li milkê şov e, yek batov e,
Minê heyfik û mixabinat e,
Kuştine Bedirê Xezalê, ew baranê tov e,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Bestê Beleka wê bi av e,
Sûar û peya dane nave,
Şer xoş kirin mêrkê bi kulav e.

Exmîr Axa derket meşî bi rêyo,
Koma xulam giran e, xwe dane li pêyo,
Mîrê min, şêwr û tekbîr destê xwedêyo,

Exmîr Axa meşî berê xwe da Cizîrê,
Girgir, mezinên cihê Bota dikin vê şêwrê, vê tekbîrê.

Exmîr axa dibê "cûavkî rêkin mala mino,
Xudê kî, kes girê nedin hizna mino,
Heger ez bême kuştin, Wefat Beg rakin şûna mino",

Cûavkî rêkin nav stûyka,
Xudê kî, girê nedin beznên hoka,
Exmîr axa kuştin li ser tehtûka".

*    *    *    *

"Yêl yêl,
Şûrkêşê deşta Rihayê Kinê Mûsê,
Serê Şarê û Tirkê bûyî bi heyrano,
Yêl, yêl, yêl, yêl,
Girê Sirûcê girkî wê li wêo,
Nifûsçiyê dewletê hate bin konê Hemêo,
Dibê: Hemo, were ser qurêo
Bikşêne çitikêo,
Bide baş gumrikê salan û salêo,
Xwe bike taba axa û axelerên di dinêo,
Li xwe nerake fermaneke dewletêo
Heçî barê hukûmatê himlê risês e, barê xwêo,
Du xortê Gêtika û Berêz bide eskeriyêo,
Dema nifûsçiyê dewletê wulo dibêje,
Kinê Mûsê rabû ser kabekêo



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Kefka kopêl kire çavê nifûsçiyê dewletêo,
Teres, ez nayême ser qurêo,
Û nadim baş gumikê salan û salêo,
Ez xwe nakim taban axa û axelerê li dinêo,
Ez destê du xortê Gêtika û Berêz nagirim nadime eskeriyêo,
Ezê li xwe rakim fermana dewletêo,
De qena keçikê Gêtika û Berêz ne derkevine derê konê reşê ‘Erebî,
Rojê sê cara nebêjin waweylê li mala Hemêo,
Lê Kinê Mûsê li aliyê odê diştexilî bi nifûsçiyê dewletê ra bi kefka kopêl,
Dibêje: Ez pênc pere nadim xizna Xundkêre,
Lê Îzer û Meto û Birhoyê Mele Hesen,
Ew in girgirê Gêtik û Berazan,
Lê ku ez zanim xayin in vê ra,
(.....)

Yal, yêl, yal, yêl,
Hemo dibêje: Şarê, xuhê,
Girê Sirûcê girkî wê bi reng e,
Bela xwe ji mi veke, êvar e, dinya li min dereng e,
Ez çi bikim, mi xebera xwe gotiye,
Ez nahêlim xortê Gêtik û Berêz herne ser sînora,
Rahêlne kevçiyê xwe, herne ser qerwqna,
Heta ez sax bim ez nahêlim destê xwe hilkêşênin di cilê nezama tenge.
Bavê Nûrê, ‘emrê min ji te ra bêo,
Yal, yêl, yal, yêl,
Girê Sirûcê girkî li wî banî,
Kinê Mûsê bi çengê nifûsçiyê dewletê girt û bi kotekî ji mala xwe deranî,
Nifûsêçiyê dewletê şûn da vegeriya bi poş û poşmanî,
Mazbata li ser mazbatê dikşandî,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Mohra xwe li mazbatê dadanî,
Mazbata bire bajarê Stenbolê,
Li ber Osman Paşayê mezinê dewletê dadanî,
Wexta Osman Paşayê malikşewitî li mazbatê dimeyzanî,
Osman Paşayê malikwêranî ji Stembolê rabû bi giranî,
Ew pêncî û pênc tabûrê mîzamê bi top û qumbirê giran xwe ra hilanî,
Bi qeza Mêrdîn û Diyarbekirê va bi xwe ra hilanî,
Di Gewda va, Mamxura va, Hecibeyra va, qeza Horhorê va,
Û teva çarde ‘eşîrê zozana xwe ra hilanî,
Bi qeza Aliya û Sincaqê va bi xwe ra hilanî,
Bi Kîka va, bi Mila va, bi Xeleca va,
Bi Mîrsîna va, bi Daqoriya va, bi Timika va,
Bi tevlu Hesena û Heydera xwe ra hilanî,
Hezar û hef(t) sid sûarê Edwan û Gêsa tev û donzde şûxê Ereba yî qedîmî,
Şêxê xudanqahwe bi xwe ‘r hilanî,
Xudê Xirab bike mala Osman paşayê malikşewitî,
Tewlu ‘eşaîrê Kurmanca û eskerê hukumatê,
Şevê di bin şevê da li ser konê Bavê Nûrê didanî,
Xêbet li ser xêbeta danî,
Serê çadira tev hildane banî,
Evana ji pê ra bi terş û talanê Bavê Nûrê kemîn danî,
Xudê Xirab bike mala siwarê Edwan û Gêsa,
Tevû donzde şoxê ‘Ereba,
Ewa ji pa ra bi terş û talanê Bavê Nûrê kemîn danî,
Xudê Xirab bike mala Îzer û Meto û Birhoyê Mele Hesen,
Giregirê Gêtik û Berêz,
Ewa şevê di bin şevê da êla Gêtik û Berêza bar dikirin,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Konê Bavê Nûrê hiştine bi tenê,
Hatin li ser çadirê Osman Paşa didanîn,
Bavê Nûrê ji te ra nemînim.

Yal, yêl, yal, yêl,
Girê Sirûcê girkî li bana,
Hemo, Kino di çîtê xatûna da razane,
Hê sibê zû ye, Şarê û Tirkê li ser zendê xwe danîne,
Kulikek ji hirya hêlika, ne welle, ji ya berana,
Bi fecera sibê ra, bi kebara mellê ra,
Bi hawa ketine serê Girê Sirûcê,
Dûrbîn li ber çavê xwe danîn,
Dimeyzînin, heft cara heram be, tu konê Gêtik û Berêz,
Li ser konê Bavê Nûrê nemane,
Dimeyzînin, sibhan we ti'ala ji Barê Keremê,
Giregira top û tekelikê eskerê Osman Paşa xweş tê weke taviyê Bahara,
Sîngê çadir û xêbeta tev kutane,
Û serê çadira tev hildane,
Giregirê Gêtik û Berêza Îzer û Meto, Birhoyê Melle Hesen,
Şûşê çayê, şerabê divexun li bin çadira Osman Paşa.
(......)

Hemo, Kino hê razayî ne di xewê da,
Şarê û Tirkê Sekinîn ser Bavê Nûrê ra,
Teşiyê xwe diligligînin,
Dibên: Hemo, de rabe,
Te gulkê kesrewanî dihejandin ji tifrê ra,
Terş û talanê te birin,
Em nakevine ber kuştina te da,
Em dikevin ber wê heyfê,
Taliya 'emrê xwe em 'elbê xwe bi destê xwe bigrin,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Em bigerin ber meşkê camêra,
Bavê Nûrê, ji te ra nemînim,

Yal, yêl, yal, yêl,
Deşta me deşteke dîn e,
Kortê Berêz kortekî kemîn e,
Bahara me bahareke rengîn e,
Mi dî du şêr aliyê malê rabûyî ne,
Serê xwe ji qapût û hewrana hilanîne,
Herdu cewrê Mûsikê hatine li aliyê odê rûniştî ne,
Şêwr û mişêwiridê da va ‘eşaîra li ber xwe danîne,
Bû tiq-tiqa va herdu xoşmêra,
Di bin simbêlê xwe da dikenine,
Yek jê Kino ye, yê dîtir Hemoê dîn e,
Hemo dibêje: -Tirkê, bilive, bilezîne,
Du seklawiya ji tewlê bikişîne,
Du zînê ‘Eyntabî ser pişta wan bişidîne,
Derkeve derê Konê reşê ‘Erebî,
Sê denga bi Kurmanciya fesîh ji kilê çavê xwe ra bilîlîne,
Ez Hemê Mûsê me, ricalê xeybê me,
De qene tu derbê Giran ji destê kilê çavê xwe bibîne.
(….)

Hemo, Kino li xwe kirin kirasê kitaniye,
Ser da berdabûn zebûnê Şamiya,
Avêtin ser milê xwe qapûtê surmeliya,
Lingê xwe lêdabin cizmê ‘Eyntabiya,
Avêtine ser serê xwe çefî, ‘egalê Hemawiya
Taştiya xwe xwarin, her(ye)kê sê qahwe li odê, ser xwe da kiriya,
Kirine ber xwe da şûr û mertalê Roşkaniya,
Lingê xwe kirine rikêba seklawiya,
Û heryekî rimekî li ser milê xwe daniya,
Dane pala girê Sirûcê, weke du bazê çengzêriya,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Şarê û Tirkê ji wan re dane ber sewtê tilîliya,
Bi hawayî girê Sirûcê diketiya,
Sibhan we ti'ala ji Barê Keremê,
Giregirê tikelikê topa xweş tê weke taviyê bahariya,
Deve girtin tevî reviyana,
Garan girtin tevî gavana,
Pez girtin tevî şivana,
Sûarê Edwan û Gêsa terş û talan birin ji biniya,
Hemo, Kino qehirîn weke du şêrê xeyidiya,
Weke teştek kefa sabûnê ser devê wa ketiye,
Di aniya wa da hatin weke kebokê deva, rayê hişimiya,
Xwe li pala girê Sirûcê berdan,
Hicûmî nava eskerê nefiyamê kiriya,
Ewilî li nefiyama Kîkan û Mila û Xeleca û Miyûrsîna û Bûbilana û Temika qewimandiya,
Ew nefiyama Kîkan û Mila û Xeleca û Miyûrsîna û Bûbilana û Temika şikandiya,
Li çarde 'eşîrê zozana qewimandibû, ew jî şikandiya,
Li eskerê dewletê nezamiyê qewimandiye,
Hicûmî nav eskerê dewletê kiriye,
Xuşîn dikeve darê rima da,
Çingîn dikeve kole Misiriya,
Xoş tê dengê tîta-tîta mezîqan û boriya,
Hûrte-hûrta çawîş û binbaşiya,
Şerê Bavê Nûrê şerekî Rostemiya,
Dibe qesabê Serê va kûçikbabê Romiya,
Esker rakiribû ji boxaza û ji tabiya,
Esker bi şûn da gêrî kiriya,
Ev esker j'ev bela kiriya,
Ji nav esker xilas bû, bi dûv terş û talanê xwe ketiya,
(.....)

Hemo dibê:-Tirkê, gulîbirê,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Heçî ew in, ew çeqal û beqalê dora Mêrdîn û Nisêbînê ne,
Xudiyê qapanî ne, xudiyê mêzînê ne,
Ew sîr û pîvaz û xiyar û dolme û bacana difroşin,
Ew têra kilê çavê te nîne,
(....)

Hemo dibê:-Tirkê, gulîbirê,
Bi Xudê Ew sûarê mala Dûdê ne,
Ew rîcalê xeybê ne,
Şevgerê şevê ne,
Sûarê mewtê ne,
Heger tirseke kilê çavê te hebe ji destê wan e.
(....)

Li eskerê nezamê qewimandin,
Xuşên kete di darê rimê da,
Esker rakiribûn ji boxaza û ji tabya,
Çima esker hilweşande ser çadira Osman Paşa da,
Heta gehandin çadirê hemû hêwirdarê çadirê zîvirîn,
Şirîtê çadirê dane ber şûra, şirît hemû qetandin,
Çadir dernixûn berdane ser Paşê da,
Osman Paşa ji binê çadirê bazda,
Digo:-Oxlim, va hemû hat donzde ricalê xeybê pê ra,
Şahdê û şûdê Kinê Mûsê gelek hene,
Gihabû derê çadira Osman Paşa, rimek li topçî da,
Ser topçî peya bû, serê topçî jê kir di ber topê da,
Lê çi bikim rima Bavê Nûrê şikestibû di laşê topçî da,
Şahid û şûdê Bavê Nûrê gelek hene,
Dibê:-Heya niha ji tikelikê topê bê xuyî mane di deşta Sirûcê da.
Bavê min ‘emrê min ji te ra be.
(....)



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Şarê dibê:-Tirkê, gulîbirê,
Ez zanim karwanê Îbêda irca tênê,
Li Hilayê û li Besrayê,
Li Kilîsê, li Ma'denê, li qoce Rihayê,
Li derê Xanê gumrika datênê,
Ez zanim irca Bavê Nûrê şikestî ye,
Ez karim herim ircekê ji Bavê Nûrê ra jê bineqênim,
Lê çi bikim, rê rêbwar girtî ne,
Tirsa min ji wê tirsê ye,
Ereboşkek li xêmê beriyê mi rast bê,
Îrca Bavê Nûrê ji mi bistêne,
Wê namûsa Bavê Nûrê bi hezar kîs malê dinyayê bişkênê,
Bavê Nûrê, 'emrê min ji te ra be.
(....)

Girê Sirûcê girkî wê li kaşa,
'Eynterîkek li bejna Kino ya etlasê têr qumaş e,
Şahde, şûdê Kino gelek hene,
Hingê Li pêşiya eskerê dewletê zîvirî,
Hespê Wa ji bin wa girtibûn,
Silehê Wa ji wa standibûn,
Weke garanê dewêr û keriyê pez,
Peya û destvala berê Wa dabûne çadira Osman Paşa,
Bavê Nûrê, 'emrê mi ji te ra be.
(....)

---

Celîlê Celîl, Zargotina Kurdên Sûriyê, Jîna Nû1989,s26-38.(D.Zengî).



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Şerê Bestê Beleka*

Mîro; mala bar kir ji beriyê
Danî li çemê Zihêriyê
Derbas bîn li keleha Rihaniyê
Şahîn axa bi sê denga li Mîr Sêvdîn  dikir gazî
Digo, bi serê te û bavê te kim
Mîra asê bîne li ber xerc û xeracê Mîrîtiyê.

Mîro, dilê mi li ber waswasê
Me dîwan danî li ser banê vê Kinyasê
Şahîn axa bi sê denga li Mîr Sêvdîn dikir gazî
Digo sê cara bi serê te kim
Mîra li ber xerc û xeracê me mane asê.

Mîra siwar bîne li va êrdeka
Mi heyf û sed mixabin
Vê sibê Kuştine Qasim axa dîkê nav ordeka
Me şeriko danî bî li pêşî mala
Lawo! şor bîne li ber kendala
Min heyf û sed mixabin
Vê sibê Kuştine Emerê Silêman, li bin Darên-Xezala

Me şeriko danî li Qesra- Kalê, li qwîna çiyê
Mîr Sêvdîn kaxezek rêkir pey ‘eşîrên Bihta
Bila vê sibê ji geliyê Hesana daxweşbin bêne pêşiyê
Lo lo mino! çi dinyakê li min bi dewran û kîn e
Hespa bînin lê bikin rixtan û zîn e
Xwedê zêde bike dewleta Bedir-Xan begî, ya Mîr Sêvdîn e.

---

*Ev her du stranên ha ji stranên cihê Botan in û ji wextê Hakiman in. Herdu jî îşaret bi hin kirdeyên tarîxî ve didin.
K.Ronahî, sal:1, hejmar: 8-çiriya paşîn 1942. (D.Zengî)



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Lo lo mino! Havîn e, dinya germ e
Tu vê sibê rabe, solê bêxe, gore nerm e
Vê sibê Hacîbêra terş û talan birin
Me ji girgir û Mîrê hakimên cihê Bihta şerm e.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Şerê Kehnîqîrê

Mîr siwar bû çû Cizîrê
Gelî xulamino bikin ra û tekbîrê
Me vê sibê şer e ser Kehnîqîrê.

Mîr siwar bî li rêo
Koma xulama li pêo
Ra û tekbîr bi des Xudêo.

Çi çadira zeng û zincarî
Dûyê tifinga çû 'erşê tarî
Vê sibehê kuştine Qasimê Zêbarî.

Çi çadira li hire rikinî
Dûyê tifinga bi hevdû sekinî
Vê sibekê kuştine melekê Divinê.

Çi çadira li xabûro
Dûyê tifinga bûye tenûro
Vê sibekê kuştine hacî Yexmûro.

Çi çadira raserî mala
Se'îd Begî çeper çêkirin, gûşî mala
Vê sibekê kuştine hacîkî evdala.

Çi çadira li merxê da
Se'îd Begî xwe berda, li avê da
Wey sed carî sihetnexweş be, Elî qalikan tifing lê da.

Wey nayê sed carî nayê
Xwîşkê korê nemayê
Mîra Mîr qelandin ji dinyayê



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Qutikê Mîr Miheme nifsiya
Ma kê digo bi Xwedê kî Mîr Miheme sêwiya
Wey dayê li min dayê
Dayikê korê ne mayê
Se'îd Beg şêr e, lew ne dihat rayê.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Ez Xelef im

Ez Xelef im Xelef im
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!
Ez Xelef im Xelef im
Êzdînşêr Begê Botan e.

Xweyê şûrê sedef im
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!
Xweyê şûrê sedef im
Êzdînşêr Begê Botan e.

Gel eşîra bixwendeme
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!
Gel eşîra bixwendeme
Êzdînşêr Begê Botan e.

Ez Xelefê bi Şîvî me
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!
Ez Xelefê bi Şîvî me
Êzdînşêr Begê Botan e.

Xweyê şûrê bi zîvî me
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!
Xweyê şûrê bi zîvî me
Êzdînşêr Begê Botan e.

Gel eşîra bi hêvîme
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Gel eşîra bi hêvîme
Êzdînşêr Begê Botan e.

Herbolê xweş Herbolê
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!
Herbolê xweş Herbolê
Êzdînşêr Begê Botan e.

Bî gumguma daholê
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!
Bî gumguma daholê
Êzdînşêr Begê Botan e.

Xweş şer e li qeleqolê
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!
Xweş şer e li qeleqolê
Êzdînşêr Begê Botan e.

Hewrexê xweş Hewrexê
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!
Hewrexê xweş Hewrexê
Êzdînşêr Begê Botan e.

Bumba bavên Gemrexê
Hawar e Mîr hawar e Mîr
Hawar e lo!
Bumba bavên Gemrexê
Êzdînşêr Begê Botan e.

Meş em herin ser Şernexê
Hawar e Mîr hawar e Mîr



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Hawar e lo!
Meş em herin ser Şernexê
Êzdînşêr Begê Botan e.*

*Min ev stran ji ber kasêta hunermend Cemal Se'dûn wergirt .(D. Zengî)



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Mîr û Mar*

Mîrek yê Cizîrê gelek xurt û dewlemend bû. Êxiste serê xwe ji xelkê xwe re qencîkê bike.

Zencîrek da avêtin ser pira bajêr, di ser nîvê wê re jî zengilekî fêris da hilavistin.

Mîr banker di nav welêt de gerandin. Ewê ko bikare zengilî bihejîne, Mîr miraza wî dê bîne cih.

Rûjekê xelkê Cizîrê bi rimêna zengilî rabûn, ber bi pirê ve çûn ko bizanin kê zengil hejandiye. Çi dîtin. Şehmarek xwe pêçandiye zengilî bi kerb û qehrê zingilî dihejîne.

Xelk lê kom bûn û dan ber kiran, da ko mar xwe jê veke. Fêde ne kir, mar zengilî bêtir dihêjand.

Xeber gihandine Mîr. Mîr wezîrên xwe hinartin pey ko mar here balê. Mar da dûv wezîran û çû xafa Mîr. Serê xwe dahiland kir erdê û paşê hilda, devê xwe ber bi ezmanî ve vekir.

Mîr ji wezîrên xwe pirsiyar kir, gelo daxwaza mêr çi ye.

Di koma wezîran de wezîrekî karnas û şehraza hebû, got:

-Ezbendî, mar kiriye tiştekî daxwe, nikari bû, nêçîra wî di gewriya wî de ma ye.

Li devê mêr fedkirîn, strowên markî xuya dikir. Xeratek anîn, stro birîn û mar filitandin. Mar da rê û çû.

Sibetir mar di hewşa burcê de xuya kir. Bi devê xwe ve hûşîyekî zêrîn hildigirt. Tukesî nikari bû mana vê ecebê bizane.

Zmanê mêr geriya û ji Mîr re got:

-Mîrê min meheyire, ev hûşîyê zêrîn ji mêwekê tê ko di nav rezên te de şîn dibe. Di wextê pêşîyên te de

*K. Hawar.Sal:1. Hejmar:9. 30 Îlon1932. R:4-5.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

mêw hergav holê hûşîyên zêrîn didan. Ji ber ko pêşîyên te bi xelkê xwe ve adil û mihrivan bûn, zilma xelkî ne dikirin.

Mîr ji mêr pirsî: “Heke ez jî bi xelkê xwe adil bibim ew mêw ji min re jî hûşîyên zêrîn nade”.

Mar serê xwe hêjand û got:

-*No, ezbenî ew edaleta ko ji bona hûşîyên zêrîn tête çêkirin tu hûşîyan nayîne.*

*Koçerê Botan*



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Mîr û Kund*

Di wextê xwe de Mîrek yê Cizîrê hebû. Gelekî zorker û dilhişk bû. Xelk nema dikari bûn zilma wî bikişînin, xwînî bûn û ji welatê Xwe derketin.

Cizîra Mîr Şeref mîna deştekê, bê avahî û şênahî ma. Avahiyên Cizîrê ji torî û bûman re bû bûn sekan.

Mîr rûjkê, ji ker ve, derketi bû gerê. Ji xerabeyê gundekî dadiborî. Du kund li ser dîwarên kavilekî veniştî, diaxaftin. Yekî ji ê din re digot:

-Mamê Kund, keça- xwe nadî kurê min?.

-Ser çavan, lê barê keça min giran e, ditirsim ko nikarî bi hilgirî.

-Heke behsa qelenî dikî hêsanî ye. Kundê paşîn kenî û ji ê pêşîn re got:

-Ma çawan hêsanî ye, hay ji xwe hebe, qelenê keça min beramberê çend gundan e.

-Herê, min hay ji xwe heye, lê dîsan dibêjim hêsanî ye. Ma di welatê me de ji gundan bêtir çi heyeÛ Ma tu nizanî ko welatê Cizîrê ji zordestiya Mîrê me vala bûye, erd û zevî tevda bê xwedî mane. Tu hema ji min gundan bixwaze. Herçend bixwazî, ewçend bidim te.

Wekê Mîr ev xeber bihistin, gelek ber halê xwe ket û jûvan bû. Ji wê rûjê ve xwe ediland û êdin zilm ne dikir, digel xelkê xwe dilovan û mihirvan bû.

Xelk ev bihistin. Vegeriyan hatin cihên xwe û welatê Cizîra Botan ji nû ve ava û sên bû.

*Koçerê Botan*

---

*K. Hawar. Sal:1. Hejmar:10. 23 çiriya –berê1932.R:3.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Lavijên Mîr Mihema*

Li gora bendeka kovara"El mecelet el betrîrqiye el siryaniye" Mîr Miheme heta 1740î jî hikim dikir. Beriya niho bi du sed salî.

Mîr Miheme di nav Mîrên Botan de ji şerên xwe bêtir bi nêçîr û nêçîrvaniya xwe, bi minasebetên xwe bi perî û keçperiya bi nav û deng e. Me beriya niho jî di Hawarê de qala Mîr Miheme kiriye.

Di hejmara Hawarê a 25an û di notên şihra "Bêriya Botan" de bi hênceta Efno û Hejale, me biserhatiya wî bi keçperiyê û mirina wî bi nifirên periya xwe goti bûn. Jû pê ve di wê hejmarê de me Lavija ko Mifiryan Şemûn ji Mîr re goti bû belav kir.

Di hejmara 26an de çîrokek bi navê "Ehmedê Zeydan" heye. Di wê çîrokê de qala yekî dikin ko zavayê Mîrê cinan e. Ew, Mîr Miheme bi xwe ye. Ji xwe Mîr di sawiya çîrokê de mikur dêt û ji Ehmedê Zeydan re dibêjit:"Ya Ehmedê Zeydan, wê rojê li ser text, di rex kurê Mîrê cinan de rûniştî ez bi xwe bûm. Bi eniya Mîr go ne ji min bana wê rojê te bikuştina, bikirana piçk û parî".

Me dil heye di vê bendê de çend lavijên Mîr Miheme belav bikin. Gava em lavijên Mîr Miheme dibêjin; du texlît lavij têne bîrê. Lavija ko Mifiryan ji Mîr re goti bû û lavijên ko li ser Mîr û nêriyên wî hatine gotin.

Me lavija Mifiryan di hejmara Hawarê a 25 an de belav kiri bû.* Emê îro qala lavijên din bikin. Lavijên

---

*K.Hawar. Sal:9. Hejmar:29. 10 Hizêran 1941. R:3,4,5.

*Me hingê wehid da bû xwendevanên xwe ko dîrokiya wê lavijê ji wan re bidin zanîn.

Der heqê vê lavijê riwayet têvel in. Kovara "El mecelet el betrirqiye el siryaniye" di hejmara xwe a şeşan, sala 1939an heyvên kanûna paşîn û Sibatê de dibêje:



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

ko bi ser Mîr bi xwe, bi ser nêçîrvaniya wî û bi ser nêriyên wî, Efno û Hejale de hatine gotin.

Ji xwe ji fesane û çîrçîrokên cihê Botan, gelekê wan bi aliyê Mihemed Begî ve didin.

Di destên me de sê lavijên Mîr Miheme hene. Di didowên pêşîn de qala kuştina Efno û Hejale dikin. Bêdiro, Mîr ev her du nêrî ji bo şûndiyariya Mîrê Amediyê kuşti bûn. Herwekî di hejmara bîst û pêncan de me dûr û dirêj da bû zanîn.

-1-

*Ev lavij Hacî Remezanê Kerî gotiye:*

Dilê min evdala Xwedê li ber kemînê

---

"Basilyos, Şemûnê didowan, Mifiryanê Tora Abdîn gelekî xudan teqwa û diyanetperwer bû. Li Baminminê cem Evdal axa xulamekî siryanî hebû. Wî xulamî dixwest dotmama xwe bike. Ji ber ko di şerîeta Mesîh de jê re cewaz nîne; Mifiryan mehra wan ne dibirî. Xulam xwe avête bextê jinaxa xwe. Ewê jî gote axê. Axê kir ne kir Mifiryan bi ziwaca xulamê Siryan û dotmama wî qaîl ne bû. Evdal axa lê hate xezebê û Mifiryan rêkir cem Mihemed Begê Bextî, Mîrê Cizîrê; da ko Mîr wî ceza bike û bikuje, Mifiryan çû Cizîrê û ket hafa Mîr. Bi emrê Mîr jê re kasek jehr dan. Mifiryan bi destê xwe xaçek li kasê Resimand û jehir vexwar; tu tişt pê ne hat. Mîr lê ecêbmayî ma, banî xulam kir û jê pirsî heke di kasê De jehir hebû. Xulam go, belê . Av di kasikê wer dan û dane xulam. Xulam di roja xwe de emirê Xwedê kir.

Mîr careke din Mifiryan anî cem xwe û ji boyî ceribandinê jê xwest ko jê re bistirîne û bireqise. Mifiryan ne reqisî lê ji Mîr re lavija bi nav û deng bi zmanê kurdmancî sitrand da ko Mîrê kurdziman she bike. Di lavijê de qala roja eresatê û ceza û ezabê Minafiqan dikin. Mîr û herçî berdevkên dora wî ne, Lavij gelek ecebandin û pir kêfa wan ji Mifiryan re hat. Mîr Mifiryan xelat kir û bi qencî û xweşî vegerand gundê wî".

Eve riwayeta kovara siryanî. Li gora riwayeteke din Mîr bi xwe ji Mifiryan xwest ko jê re bistirîne; lê bê şertê ko qala şer û dilan neke.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Devçêra nêrîbelê min zozanê jorî bî.
Avexwarîna wî li ser kehniya Şikîjinê.
Ji yeqîna dilê min ew e, Mihemed beg şêxê nêçîrvana namîne.
Ji lewmanî Efino ma bî li Ferasînê.
Qeyntarê kul û xema bi rê ketin; şahî bi rê va gihayê.
Ez dinêrim hewalê bilind; berfika sipî pala xwe dayê.
Ji yeqîna dilê min ew e, Mihemed beg şêxê nêçîrvana namîrê.
Ji lewmanî elamet radibin dinyayê.
Dinyayê xerabê, ji tu kesî re ne mayê.
Min îro ji hisabdara pirsî bî, çirî çi çûne çi mane?
Çiriya ewil xelas bîne; ya paşî sê şêv û sê ro jê mane.
Ji yeqîna dilê min ew e, Mihemed beg şêxê nêçîrvana namîne.
Ji lewmanî li serê hewalê bilind govenda nêriyan e.
Ezê pîr bîm, dilê xerab qet pîr nabe.
Nêriyo, xerabo, te li vê rêdînê, li vê dimaxê.
Devçêra nêrîbelê mi zozanê jorî bî.
Avexwarina wî li ser kehniya vê Şaxê.
Ji yeqîna dilê min ew e, Mihemed beg şêxê nêçîrvana namînê.
Ji lewmanî Efino li serê zozanê jorî pişta xwe da kendala axê.
Hawarek li geliya qewimî bî, ezê nizanim çi hewar e.
Dengê tifekekê li Mihemed Begî xweş tê.
Ez nizanim, ne şeşxane, ne berwec, ne helqedar e?
Ji yeqîna dilê min ew e, Efino kuştin;
Hejale babê gîska bi çar derba birîndar e.
Ezê li serê bilind difekirim.
Hemî li min bîne sewgurî.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Qeyntarê kul û xema hati bîn; li ser dilikî kul diêwirî.
Ez rebenê Xwedê xizmeta tu Mîr û tu padîşahê mezin nakim.
Ji xêr yê şahik û xûnkar mazûl kirî.

-2-

*Ev lavij Hacî Cindiyê Erihî gotiye:*

Nêriyo te mala xwe ê xirabo, te li vî devî, li vê dimaxê.
Sihrên Hincê Xirab kirine, berê xwe dane geliyê Şaxê.
Xelîtê Mehmed Begê Mîrê Bihta, bi zêr û zîv in;
Şeraba xwe berdane ber kemaxê.
Ezê tu çepera nahebînim; ji xêna Çepera stûnê, raserî Dirba-Şikêr e.
Mehmed beg Mîrê Bihta siwar biye; birekî xulam û {xizmetkar, wey Şeroyê serxanisî Resûl Finikê wên vê ra.
Dibêjinemê Efino bikujî, serê wî rêkî ji xanê Xwê ra.
Postê wî rêkî, ji Mîrê Amediyê ra.
Laşê wî rêkî, şîva qaziyê bajê' ra.
Hemî ji ecêb û hikmetên dinê ra.
Ezê tu çepera nahebînim ji xêna çepera raserî Divinê.
Xelîtê Mehmed Begê Mîrê Bihta bi zêr û zîv in, xal û nîşan dikevin ê.
Mîrê min tifekê bavêjî Efino, kalik dikevê kambaxa bizinê.
Nêriyo te mala xwe xirabo! nêriyê Geliyê Tawî;
Serê stirihên te zirav in, binê stirihên te badayî.
Mîrê min tifekê ji bizinê biguhêze bavêje Evdalê gulîberdayî.
Xwezîka min çi biguhta, bila te ciwab da.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Qentarê nêriya xwe ji kurikê Qaso berda, stûnên gelî li xwe ba da.

Nêçîrvanên me kurîn in, lewma xwe bi têzê ra nav da.

Ez tu çepera nahebînim ji xêna çepera Darkevot e.

Şeşxana Mehmed Begê Mîrê Bihta diteqihên ciht bi ciht e.

Ezê xulamiya tu hakim û tu beglera nakim; ji xêna Mehmed Begê Mîrê Bihta.

-3-

Di lavija jêrîn de behsa tirba Mihemed Begî dikin.Qey ev lavij piştî mirina Mîr hatiye gotin. Ji milê din qala Ebûzêdê- Bilikî jî dikin. Ebûzêd nêçîrvanekî serdeste bû û hergav bi Mîr re digeriya. Di gelek stran û çîrokan de navê wî derbas dibe. Ji xwe dibêjin, di pey Mîr re Ebûzêd gelek nema û emrê Xwedê kir.

*Ev lavij Îsifê Melê ji Hacî-Aliyan gotiye:*

Qentarê kul û xema bi rê bîne; serê şahiyê pê gihayê.

Serê hewalê bilind oxilme bestine.

Keviya mezin pala xwe dayê.

Mihemed beg şêxê nêçîrvana namînê.

Lewma ecêbên giran hatine ser dinyayayê.

Ez tu çepera nahebînim; ji xênî çepera Darkevot e.

Berikên şeşxana jê difirin kit bi kit, cot bi cot.

Ez xizmeta tu Mîr û tu hakima nakim.

Ji xênî Mihemed Begî hakimê Bihta.

Nêriyo! te û vê kokê.....

Xelîtên Mehmed Begî sirme ne, ketine ser zirhokê.

Libika şeşxanê ji eniya Efino û Hejale biguhêre, bide nêriyê pişta bihokê.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Mi îro tifekeke divê dev û binî berwecê destê mezin, yê Mehmed paşayî.

Mi conîkî derman divê du aşiqa bi hev ra lêdayî.

Ezê biçim çeperên Mehmed begî, berdim Efino û Hejale, her du evdalên gulîberdayî.

Şevikên çiriya dirêj in; mi xewik nayê.

Bist bilind bîne, pêr û hatine qayê,

Birînê birîndara kul in, medin ber sir û sermayê.

Şevikên çiriya çi kurt in, çi dirêj in, mi xewik netê.

Te bist bilind bîne pêr û hatine qubletê.

Birînên birîndara kul in, medin ber sir û seqetê.

Ezê serîkî bilind fekirîme; li me bîne gurî.

Qentarê kul û xema li ser dilikê kul de diêwirî.

Piştî Mehmed Begî ez êdî xizmeta tu Mîr û tu hakima nakim.

Ezê bikim xizmeta wî padîşahî, yê Mîr û şeh mazûl kirî.

Ezê li dinya qewrik fekirîm, çiqa li mi damayî.

Efino, Hejale babên kara ne.

Çepera Mehmed begî, şêxê nêçîrvana li xwe badayî.

Heger hûn tirba Mehmed Begî şêxê nêçîrvana nas nekin.

Herin medresa Serê Meydanê li kêla wî binêrin

Tîrkevan û şeşxane li kêla wî kêşayî.

Ezî li dinya gewrik fekirîm, dinya çiqa li min tal e.

Dengê şeşxana li çepera Mehmed Begî şêxê nêçîrvana nalenal e.

Hege hûn tirba Mehmed Begî şêxê nêçîrvana nas nekin;

Herin medresa Serê Meydanê; li kêla binêrin.

Libika şeşxanê daniye ser eniya Hejale.

Nêriyo! te û vê semaxê,

Devçêra Efino û Hejale kursiyê Awal e.

Avdana wî hati bî ser kaniya Şaxê.

Mi heyf û xebînet e, Mehmed beg hakimê Bihta, bimrê pişta xwe bide kendala axê.
Îro nêçîrvanê mala bavê mi derketiye bi tenê.
Xwe kêşaye çepera korê, raserî latên vê Divinê.
Nêrî ba dikir bizinê; rabe em biçî govendê;
Lê Ebûzêdê-Bilikî li ber mirinê.

Nêriyo ! te û vê kemînê,
Devçêra Efino û Hejale kursiyê Awal e.
Avdana wî hati bî Hirçekînê.
Hingê mi zanî Mehmed beg şêxê nêçîrvana namîne;
Lewma qentarê nêriya dixweyin li Feraşînê.

*Emê lavijên Mîr Miheme bi çend dûrikên bijarte biqedînin. Ev dûrik ji me re serekê eşîra Jêliyan, Resûl axa gotine. Ji xwe reng û dirvê maqûliyê bi wan dikeve.*

Ezê li Mihemed Begî fedkirîm, bi vê xemlê bi vê kokê;
Te xelît û sirme ne, rîşî berdan ser zirhokê.
De tu berê şeşxanê, ji bizinê biguhêzîne, ve nêrî wê sekinî; li pêş bihokê.
Heçî me go; te cewab da.
Birê nêriya xwe ji Kortikên- Qaso berda bî; Pilingê-Zêrîn li xwe ba da.
Nêçîrvanên me kurî ne, bi têzê re, xwe bi Beleka-Reş nav da.
Me goti bû ko zehf çîrok der heqê nêçîrên mehmed Begî hene. Emê vê bendê bi çîrokeke nêçîra hirçan bigehînin dawiyê.
Rojekê Mîr bi xulam û mifirdiyan ve çû geliyan. Nêçîrvan li çeperan belav bûn. Ji eşîra keran du brayên aşilmî di çeperekê de bi tenê sekinîn. Mîr gote



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

xulaman: Heta hon dengê tifinga min seh nekin tifingê bermedin.

Dinya zelal bû. Mîr dît; hirçeke fêris berê xwe daye çepera her du brayên aşilmî. Hirç ketibû hikimê tifingê. Aşilmiyan agir ne dikir. Mîr aciz dibû. Hirçê çepera aşilmiyan li xwe ba da û nependî bû.

Mîr bi xulaman ve rabû û çû çepera her du birayên aşilmî. Mîr gelek enirî bû. Di dilê xwe de digot:” Ezê serên wan her du zelaman jêkim; bila sebeb hiştine ko hirç ji ber destên wan xelas bibe”.

Lê gava gehiştin çeperê; Mîr tiştekî welê dît ko lê ecêbmayî ma. Hirç li wê ye, bi pişt û destmalan girêdayî, li erdê veketî ye.

Hirçê gava qesta çepera aşilmiyan kiri bû her du biran pev şêwirî bûn. Gelo çi bikin? tifingê nikari bûn berdin; ji ber ko hêj dengê tifinga Mîr seh ne kiri bûn. Lê nikari bûn hirçê berdin di çepera wan re bibore. Tifingên xwe danîn, bi dest û lepan bi hirçê ketin; zora wî birin û ew bi pişt û destmalên xwe girêdan.

Vêca mesela xwe ji Mîr re gotin. Mîr gelek kêfa xwe ji wan re anî; rabû navê yekî kir “Fîl” û navê ê din “Fengenoz” û gotê wan:

-Min hon kirine maqûlên keran; ji ber ko maqûlî heqê mêrê qenc e.

Herekol Azîzan



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Jêliyan*

Di hejmara Hawarê a 19 an de (rûpel:10) me hin awayên xebatê şanî xortan da û goti bû ko xortên me ji folklorê re bixebitin û herçî stran, çîrok, çîrçîrok, medhelok û mamik in bidin hev û belav bikin. Em dikin îro di vî warî de rêke din jî şanî wan bidin.Eşîrên Kurdistanê û her texlît adet û rêzikên wan. Ma kes heye ko eşîra xwe nas neke. Nemaze heke çend peyayên eşîrekê gihane hev ewê bikarin li ser wê eşîrê tiştekî tekûz çêbikin. Ev nivîsarên ha ko gihane hev ewê bikarin tarîx cexrefye û jîna Kurdistanê a civakî bînin pê.

Ji xwe Osman Sebrî di vê babetê de bendek belav kiriye. Çiyayê Sasonê (Hawar:27, rûpel:8) Osman Sebrî li eşîra xwe bi xwe hûr biwa bivê nevê dikari bû tiştekî jê tekûztir bîne wicûdê.

Ezê îro ji eşîrên Botan qala jêliyan bikim. Ez dizanim ko di vê bendê de gelek kêmahî wê hebin û min dikari bû hinekê wan bidim alî. Lê dema nivîsandina vê bendê de yên ko eşîra jêliyan ji min re gotine ne bi min re ne ko ez ji wan bipirsim. Lê ev bend dikare bi kêrî hinan bêt. Yên ko vê bendê bixwînin heke li ser eşîrine din tiştek nivîsandin, nivîsara wan bivê nevê ji ya min wê tekûztir bibe.

Eşîra Jêliyan, eşîrek ji eşîrên Botan e. Eşîrên Botan sih, sih û pênc eşîr in û bi awayê jêrîn lêk vedibin: Koçer û dêmanî, Koçer jî du bir in: Çoxsor û Şilit.

*K. Hawar. Hejmar:34. Sal:9. 15 çiriya pêşîn 1941.R:4-13.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Çoxsor: Mîran. Alîkan, Dudêran, Dawûdiyan, Soran, Garisan, Gergerî. Şilit: Batûyan. Teyan, Xêrkan, Kiçan, Mûsereşan. Eşîrên deşta Slopî: Hewêrî, Zêwkî, Spêrtî, Reşikan. Dêmanî: di vî milê avê de: Meman, Hesinan, (jêrîn û jorîn) Ebasan, Aliyan. Di wî milê avê de: Berwarî, Erih, Garisan (koçerên wan jî hene) Welat-Kelhok, Welat-Kêver, WelatKilîs, Şûvan, Jêliyan, Dêrşew, Hacî-Aliyan, Keran, Harûnan, Slopiyan. Hacî -Bêra: Şernex, Goyan. Eşîrên Botan tev de silîv in.

Eşîra Jêliyan serekê wan Resûl axa bi xwe ji min re gotiye. Brayê wî Egîd axa û kurmamê wî Sadiq axa jî hazir bûn û arikariya wî dikirin. Gava li ser tiştekî bi hev ne dikirin Resûl axa simbêlên xwe ên têrmû ba dida, berê xwe dida min û digot: ”Ma ezbenî, ev ji kû dizanin” û bi vî awayî zora wan dibir. Te digot qey bira û kurmamê wî ne jêlî, lê berazî an şikakî ne.

Di vê bendê de min zarê Resûl axa, di daîra imkanê de, weke xwe hiştiye û ne guhartiye. Ji hin awayên gotinê pê ve; yên ko xweserî xeberdanê ne û nayin qelemê.

Min notên eşîra jêliyan di sala 1932an de li Hesîçê cem xwe nivîsandi bûn.

Cexrefya tebîhî

Tixûb, çiya, çem, deşt, newal

Tixûb-Min xerîteke cihê jêliyan çêkiri bû û tê de tixûbên wî bi her kitkitên wî şanî da bû. Di dema nivîsandina vê bendê de min xerîta xwe peyda ne kir. Bivê nevê ev kemahîke mezin e. Lê min nikari bû ez wê bi alikî bidim. Digel vê hindê li gora ko ez dizanim eşîra jêliyan bi eşîrên jêrîn dor-girtî ye: Li bakur: Şûvan; li nîvro: Hacî Aliyan, li rohelat: Dêrşew, li rova: Keran.

Çiya- Cihê eşîra jêliyan hin deşt, hin çiya ye; hin zozan, hin ji germiyan e. Cihê germiyan ji cihê zozan



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

zehftir e. Tê de şeş çiyayên bingehîn hene. Çiyayên Kehniyan, Çiyayê Kosiyan, Çiyayê Pehnik, Çiyayê Reş, Banê Azîzan, Çiyayê Findikê.

Çiyayê Kehniyan- Ji Çiravê vediqete, dikeve cihê jêliyan û ber bi rojavê Diçe. Di vî çiyayî de çend deriyên mezin hene. Deriyê Kêloste, Deriyê Beristanê, Deriyê Dizî, di neqeba wan de derîki din heye, jê re Keleha Mîr dibêjin. Li vê derê şawine asê hene ko dewra tê re nikarin herin, ji wan re Şawa Bihok, û Şawa Selpene dibêjin.

Di nîvroyê Keleha Mîr de Kehniya Botê û Deriyê Dehlê hene. Birek ji vî çiyayî heye jê re Başûş dibêjin. Di Başûş de jî Bênîkil, Kehniya Beytik û Ziyareta Geliyê Zêwê û Dola Eynê hene. Di kevera Dêrawotê de jî du derî hene: Deriyê Şkêrê, Deriyê Asê.

Piştî Dêwikê çiya dibe zînî. Zîniyê Basan û di pey wî re Afir e, jorîn û jêrîn. Di van zîniyan de jî çend derî hene: Deriyê Gawal, Kevera Şêx Emer, Deriyê Sûsikê, Keleha Molit.

Çiyayê Kosiyan- Ev çiya jî ji Çiravê têt. Hetanî-Emtê jê re çiyayê filehan dibêjin. Jê wê ve êdî dibe Çiyayê Kosiyan. Deriyê Gozê di birê filehan de ye. Warê vî çiyayî guher û kehnî ne. Çend derî lê hene: Deriyê Kasê, Bîrên Lodiyan, Dola Qirikan, Keleha Dêrdê, Dola kosiyan. Ev dol tejî rez e. Sotek, hewalek li vê derê heye wek, Qernasîsê. Çiyayê Kosiyan di Girikê de xelas dibe û qûna wî dide deşta Mişarê.

Di vî çiyayî de cihek heye dibêjin Mehînan. Ev der erdeke rast e; deviyên wê zehf in. Xelkê Girê Hisênî, Goveşil,Tanzih û Girdaran tê de cot dikin û erdê difetînin. Mehînan ji xwe koz e. Zivistanan koçer ten ê û lê disekirin.

Çiyayê Re**ş**- Ji neqeba jêliyan dest pê dike û diçe miqabilî Çêlikê. Di vî çiyayî de jî hin der û derî hene. Deriyê Meydanê; (li hire sarincek heye dibêjin Serinca



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Qubletê, serinceke kevn û mezin e, heye ko serinceke romanî ye) Deriyê Diholan, Keleha Mela Hacî, Banê Behîvê, Kelehoşik, Deriyê Tilê, Tirba Hesenê Zer, Hewdan, (tê de çend hewd hene) Bîra Gêmê, Bîrika Qubi, Bîra Hirçketiyê, Çêlê Kunmêşê (di çêlê wî yanî zinarê wî de kunên mêşan hene) Deriyê Kêrxwer, Bîra Eyşikê, Kopê Kelihê, Meydana Elî Axa, Bîra Gewr, Bîra Reş, Bihto (cihê rez e) Bîra Çalavê, Bîra Nizarê Hêvin, Beriha Newiyan (bi xwe berih e, yanî şikeft e, sê aliyên wê girtî, alîkî wê berdayî) Kevera Çêlik (di miqabilî Çêlikê de ye. Ev kever cihê pezkovî ye, tê de çend gelî hene, nêçîrvan têne van geliyan) Gewra Kêrte, Geliyê Kehniyan, Gêra Nêwiyan, Geliyê Kûr, Geliyê Sor, Nekorte, Pêpelik (rêke asê ye) Mixalefe, Ziving, Şkêra Babîs (raserî ava Babîs e, û cihê hirçan e).

Gera Xanî- Di qûntara Çiyayê Reş de ye. Xanek li vê derê heye; çend berih jî lê hene. Ava Babîs di vê derê de tête ser ava mezin. Herçî spîndarên cihê jêliya e, ditînin hire, dikin tof û kelek û rêdikin Mûsil û Bexdayê. Sala dexil şîrîn bê, ji Heskîfê û ji Bişêriyê, bi kelekan ceh û genim ditînin hire û difroşin.

Çiyayê Pehnik- Ji Goveşîlê dest pê dike û diçe Kifrê. Çiyakî bidar e, koza wî zehf xweş e. Berojê Mîr Ehmed koz e. berê Mehînan jî, wlê ye.

Banê Azîzan- Banê Azîzan ji riya Dara Stewrê dest pê dike, diçe Goyînan. Banê Azîzan koza dudêran e, tête heta Detenûrê, raserî avê.

Çiyayê Findikê- Ev çiya ji nav Hacî Aliyan têt nîvroyê Banê Azîzan, raserî ava Seyidiyan. Ava Seyidiyan di nav Harûnan de ye. Çiyayê Findikê de jî çend derî hene: Kela Şêx Ozman, Deriyê Gozê û Deriyê Ga.

Deşt- Di cihê jêliyan de deşteke bi tenê heye: Deşta Mişarê. Belê yek e, lê belê herwekî dibêjin beranê



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

çavbelek e. Deşta Mişarê deşteke gelek spehî û bi hatin e. Her du aliyên deştê çiya ne. Qubletê deştê Çiyayê Reş e, paşqubletê wê jî çiyayê Kehniyan e. Drêjahiya deştê bi peyarî heşt saet e; ji neqeba jêliyan heta ava mezin. Frehiya wê, ji saetekê heta du saetan dajo.

Çem- Ava mezin di ber Çiyayê Reş re dibore. Jê pê ve di cihê jêliyan de hêjayî gotinê Sê avên din hene: Royê Babîs, Royê Sor û Cowa Basixirê.

Newal-Di cihê jêliyan de Newala Kehniyê meşhûr e. Newaleke biheybet e, dora wê dar û devî û dehl in.

## Cexrefya siyasî
## teşkîlata eşîra Jêliyan

Eşîra jêliyan li ser erd lêk vedibe. Di vî erdî de neh hevêrke yanî mintiqe hene. Di her hevêrkê de çend gund hene. Ev in hevêrkeyên jêliyan: Deşta Mişarê, Mendekeran, Lêfên Nêwiyan, Royê Jêliyan, Lodê, Navkura Basan, Mala jorîn, Mala jêrîn, Dêrûya Kurêşan.

### -1-
### Deşta Mişarê

Li Deşta Mişarê hevdeh gund hene:

Girê Hesênî- Gundekî bi dar û ber e. 60 mal tê de hene. Ava kehniya wê boş e. Gund di ser kehniyê re ye. Li dora kehniyê seyrangahek heye bi navê Deravê Miemberê. Hezar mêr dikarin di bin siha darên wê de rûnin. Darên wî spîndar, zergoz, çinar, tû, bizo, ben, mazû û berû ne. Hatina wan bi zehfî spîndar e. Çandiniyên wan ên avî penbû, kuncî û maşik in. Ên bejî jî ceh, genim, nok, nîsk û kizin in. Ava kehniya gund di Qadê re dibore û dikeve rowê Babîs.

Li pişta gund xanîk heye jê re dibêjin Olî. Ev der di zemanê Berê de asêgeha gund bû.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Qadê- Qadê dikeve navbera Girê Hesênî û Goveşilê. Di cihê jêliyan de jî erdê wê behatir erd nîne. Lê gund bi xwe îro xirbe ye. Tê de avahiya dêr û medreseke kevin heye. Medrese digel milkê xwe, di wextê Mîr Nasir de guhastine Tanzê. Ava Girê Hesênî, wextê ji Deravê Miemberê xelas dibe dikeve ser milkê Qadê. Di erdê Qadê bi xwe de gelek kanî hene. Ava van kaniyan digehin hev û rowê Qadê ditînin pê; du aş li ber vî rowî digerin. Temamî milkê wê avî ye. Hatina wê, xelkê Goveşîl û Girê Hesêniyê dixwin. Ev der gundê Elî axayê Qadê bû, maqûlekî jêliyan.

Zorava- Ev gund xelkê Goveşîlê ava kirine. Newala Kehniyê di qubletê gund de ye. Royê Babîs, ji gund, 20 deqîqe dûr dibore. Di nav gund de kehnî jî heye. Milkên wan ên avî li Qadê ne. Ên bejî li deştê jî hene. Di çiyayên dorê de jî milk û eqarên gund hene. Xaniyên wan şikeft in. Hin xelk rast bi rast di şikeftan de rûdinin. Hinan jî xaniyên xwe li devê şikeftan çêkirine. Di nav şikeftan de mezelên mezin hene ko tanî* kirine; hinek jî bi kuçan dîwar kirine û ji hev veqetandine.

Rezên gund- Di qubletê gund de ne û jê du saet dûr in. Lê ji gund dixuyin. Du aşên gund hene. Pireke eqid di ser Babîs re ye, dibêjin ê Pira Haçikan.

Eynê- Gundekî şên e. 80 mal tê de hene. Kehnî deh deqîqe di ser gund re ye. Av ji kehniyê tête aşê gund, jê dikeve mala Şêxê kal (Şêxekî neqşibendî û şêxê jêliyan e). Av ji mala şêx dertêt, diçe mizgeftê, û ji mizgeftê belav dibe ser bax û bîstanan. Çiyayê

*Tanî kirin ev e: Ji darên bî, berû, spîndar an mazûyan stûnine zirav ditînin, binên wan didin erdê, serên wan jî didin tehta şikeftê (xanî be girsan) û wan li rex hev disekinînin. Zelamekî hoste bi şivikan wan stûnan bi hev re dihûne û midekî dihêle heta ko hişk bibin. Û paşê tewek herî li rûyê wan didûn. Ev jî dibe texlîtek dîwar.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Kehniyan raserî gund e. Çiya hemîrez e; rezên wî ewçend qenc in ko heçko difis weke kehnîkê jê diherike. Her texlît fêkî lê hene. Gund di nav daran de naxuye. Li pişta gund çiyayekî din heye dibêjin ê Kopê Mikriyan. Xaniyên gund bi zehfî olî* ne. Xanî hemî ji kevir in, ji kevirê Kursî ne. Mizgefteke kevin lê heye, di hewşa wê de quleteynin hene. Mizgeft di zemanê berê de asêgeha gund bû.

Tilmi**ş**ar- Gundê Resûl axa bi xwe ye. 50 mal tê de hene. Di binê Gund de çar kehnî hene. Aşek li ber ava wan digere. Erdê gund erdekî bi nan e, û erd hemî avî ne.

Sê deqîqe nîzingî gund girek heye dibêjin ê Girê Yewnan* . Li serê wî girî qesrek heye, qesreke kevin. Di nîvroyê gund, di Çiyayê reş de kelehek heye dibêjin ê Kelehoşik. Tev de eserên qedîmî ne.

Karitan- Îro xirbe ye. Berê 30 mal lê hebûn. Babîs di ber re dibore. Di nav gund de kehnî jî heye.

Basixir- 20 mal tê de hene. Cowa Basixirê Jê der dibe. Ji gundên jêliyan ji hemiyan bêtir, di vî gundî de birinc, penbû, kuncî û maşik diçînin. Dehlên gund hene. Li pişta gund kelehek heye dibêjin ê Keleha Mela Hacî; asêgeha gund e.

Duav- 20 mal tê de hene. Ji kehniya gund pê ve avek ji Gamêş û Kerkujan têt ê. Ji xwe Babîs tê re dibore. Ji lewre ji vî gundî re gotine Duav.

Gamê**ş**an-Gundekî kiçik e, 10 mal tê de hene. Milkê wî bêjî ye; lê derametê wan heye. Wek bacan, kulind, silk.. h.d. Kehnî di nav gund de ye.

---

*Di cihên Botan de xanî li gora tebeqên xwe bi nav dibin. Navko- yektebeq. Olî- dutebeq. Qesir- Sêtebeq.

*Gelo navê yewnan bi çi awayê lê bûye. Heye ko ji wextê Ksênefon. Li hejmara: 32, rûpel 4 fedkirin. Kardûx û welatê Kardûxan.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Kerkujan- Ev jî gundekî 10 malîn e. Milkê wî bejî ye. Ji ceh û genim pê ve derametên gund hene.

Xalidî- 40 mal tê de hene. Kehniya gund heye. Cowa Girikê di nav gund re diçe. Cowa Basixirê Di binê Gund re diherike. Tirba Şêx Hisênê neqşibendî di vî gundî de ye. Şêx Xalid ev gund ava kiriye û navê wî daniye Xalidî.

Girik- Girik bi xwe xirbe ye. Şêx Xalid di qubletê Girikê de Xalidî ava kiriye. Berê 40 mal tê hebûn. Cowa Girikê di nav gund re dibore- Erdê wî bi zehfî avî ye. Aşek lê heye. Di biniya gund de pireke mezin heye.

Di Girikê de zikakek heye dibêjin ê zikaka fitnê. Carekê Siltan Mîrê Botan xwestiye Stenbolê. Rîspîkî Mîr heye, ew jî pê re çûye. Wekê gihan stenbolê, rîspî gote Mîr:

-Ezbenî, sibehê, ezê cilên te wergirim, bibim Mîr. Tu jî cilên min wergire bibe rîspî. Ma em ji kû zanin siltan çire banî te kiriye. Ezê herim ba dewletê. Heke siltan ez kuştim, tu vegerî mal. Cihê Botan namîne bêserî. Tuê Zarowên min jî bi xwedî bikî. Û heke siltan qencî bi min kir, ji xwe ew qencî ji te re ye.

Mîr tevdîra Rîspiyê xwe eciband. Sibehî rîspî cilên Mîr wergirtin û çû ba dewletê. Mîr çend rojan li hêviyê ma, rîspî venegeriya. Mîr ji hinekan pirsî. Yekî gote Mîr: ”Tu here mal, Mîr hêdî venagere”.

Mîr vegeriya mal û ji bona xizmeta rîspiyê xwe ba kire kurê wî Elî û axatiya jêliyan da yê. Pênc şeş gundên qenc jî bi ax û av ve dan ê.

Elî axa bû axakî gelek zexim. Gundekî jêliyan heye navê wî Basixir e. Milkên gund zehf in. Lê erdê wî bejî bû. Mezinê gund çû ba Elî axa got: “Em bê av in, me divêt em cowekê bînin gundê xwe”. Av di Girikê re diborî. Hingê jî Girik di destên Axayê Dêrşew de bû. Elî axa got, herin avê bînin. Gundî çûn co kolan.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Axayê Dêrşew she kir, hawara xwe hilanî, hat Girikê, Elî axa jî hawara xwe bir û çû. Li Girikê her du eşîran li hev xist. Jêliyan berda dêrşewiyan laşên xwe hiştin û baz dan. Elî axa got, sikira cowa Basixirê bi kelaşên dêrşewiyan çêkin. Ji bona vî qasî navê vê zikakê bûye zikaka fitnê.

Di navbeyna jêliyan û dêrşewiyan de çend salan bû neyarî. Heta Elî axa nexweş ket, mezinên jêliyan hatin dorê. Elî axa gote wan: Wextê ez mirim, min bibin ziyareta Reda Darê û li wê derê veşêrin. Ez mirî bim jî dêrşewî newêrin di ser tirba min re biborîn û bêne hewe.

*Tirba Elî axa îro jî li ber keviya rê kifş e. Ziyereta Reda Darê li ser riya Dêrşew e.*

Meylanan- 20 mal tê de hene. Ava wan ji cowa Mîriyê ye. Di vî gundî de tûyên garisî zehf in.

Balokan- 40 mal tê de hene. Ava wan ji cowa Mîriyê ye. Di vî çiyayê Beytikê de rezên gund hene.

Îsxasan- Ava wan ya vexwarinê ji bîrê ye. Ava aviyan ji cowa Mîriyê ye. Fêkiyên wan kêm in. Xaniyên wan navko ne. 30 mal tê de hene.

Zovaniyan- 40 mal tê de hene. Ava Eynê tête vî gundî û çandiniyên vî gundî de winda dibe. Dehlên gund zehf in û bi merês in. Rezên wan di Çiyayê Başûşê de ne. Xelkên gund bi zehfî şêxzade ne.

-2-

Mendekeran

Gundên Mendekeran jî li deştê ne, dikevin rojavayê deştê. Li Mendekeran neh gund hene:

Gove**ş**îl- Cihê gund teht e. Dora gund gir û bistî ne; cihê gund nivz e; dibe wek gêrekê. Berê 100 mal tê de hebûn. Ji roja ko gund şewitye, xelk venegeryan ê. Hin çûne erdê Qadê; hinên din Zorava ji nû ve ava kirine û ketin ê.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Girxetîb- Cihê gund bilind e, li ser girekî ye, girekî bi devî, deviyên hûr. Royê Babîs di bin gund re dibore. Ev her sê gund yanî Girxetîb, Bêder û Gundikê Elkan hema bi hev ve ne. Avahiyên gund qederê 20 mal in.

Bêdar- Gundekî têr kehnî û têr hatin e. 70 mal tê de hene. Spîndarên wê zehf in. Dehl û rezên wê jî hene.

Gundikê Elkan- Gundikî kiçike, 15 mal tê de hene. Ava Babîs di ber gund re dibore, kehniya gund jî heye.

Diyê- Xirbe ye. Berê 50 mal tê de hebûn. Gundekî bi av û spîndar e.

Gundikê Sêvan- Gundekî xirbe ye. Berê 20 mal tê de hebûn. Cowa Sêvan di gund re diçe. Babîs jî di nîvroyê wî re diherike. Kehniya wî jî heye.

Dibêjin ko zilamek hebû, navê wî Resûlê Qêsim bû. Di wextê xwe de mêrekî qenc bû. Di çiyayê Zovaniyan, di Başûşê de cihek heye, dibêjin ê Bênîkil. Resûlê Qêsim, li wê derê xaniyek çêkiri bû û dehyeka rezên çiyê dixwar. Mendekeran pê nikari bû. Ji ber ko pismamên wî jî zehf bûn. Resûl ji ber timahiyê, rabû û digel brayê xwe berda pismamê xwe. Hejdeh mêr ji wan kuştin. Wextê bi tenê ma mendekeran hatin ê, ew û brayê wî kuştin.

Xirabgewran- 10 mal tê de hene. Ro di ber re dibore. Kehnî jî heye. Milkê wan avî ye, lê dehl û rezên wan nînin.

Gundikê Îso- Xirbe ye. Berê 10 mal tê hebûn. Kehnî heye. Babîs di nîvroyê wî re dibore. Avî û dêm e. Di rojavayê gund de mesîlek heye: Mesîla ava şîrîn. Ev mesîl tête ser Babîs.

Haçikan- Di nîvroyê Geveşîlê de ye. Xirbe ye. Berê 40 mal tê de hebûn. Xanî hemî şikeft in. Mizgefteke zemanî jî tê de heye.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Çîrokiya Mendekeran- Dibêjin ko di nav eşîra Batûyan de qebileyek heye, jê re Mendekeran dibêjin. Zilamek ji wê qebilê xwînî bûye û hatiye nav jêliyan û konê xwe di Çiyayê Reş di guhera Kopê Kelehê de veda.

Wî wextî Elî axayê Bernihî axayê Jêliyan bû. Elî axa derketi bû nêçîrê. Ji taştiya wan re hinek xwê diviya bû. Axê gote xulamekî xwe here wî konî hinek xwê bîne. Xulam çû konî. Sofikî pîr mezinê malê bû, heft kurên wî hebûn, her heft jî çekhilgir. Keşek ya wî jî hebû, gelek spehî. Xulam xwê bir û vegeriya cem axayê xwe û gote wî: “Ezbenî di wî konî de keçek heye zehf spehî, bi kêrî axê têt”.

Wekê xulam holê got, kêfa axê jî hat. Axê got:”Rabin em herin kon”. Wextê nîzingî kon bûn, sofiyê pîr gote kurên xwe: “Cilan bibin binê wê dara mezin, mehvan ji me re hatine”. Cil kişandin binê darê. Axê diviya bête kon, ji bona keçkê bibîne. Ban kire sofî û got:”Mamo! Em mehvanên kon in” Mamo got:”Axa heçî mehvanên kon bin, li binê darê rûdinin”. Li binê Dara mezin rûniştin, xwarin ji wan re anîn. Piştî xwarinê Axê gote sofî:

Bavê kuran, min divêt tu keça xwe bidî min. Ez axayê Jêliyan im, tu çiqasî bixwazî ezê bidim te.

Babê keşikê Got: Axa wekî tu cihê jêliyan hemî bidî min, ez keça xwe nadim te.

Elî axa ji vê gotinê Enirî, rabû, berê xwe da Kêrtê; emrî xulaman kir ko herin talanê sofî bînin.

Xulam çûn li pezê wî dan. Bû hawar. Her heft kurê wî zilamî siwar bûn bi hawara pezê xwe çûn. Li xulamên axê xistin, yek kuştin û pezên xwe vegerandin. Xulam vegeriyan û tiştê ko bi wan re bû gotine axê. Elî axa jûvan bû, hema zilamek rêkir mala wan, û got bêje wan: Bextê Xwedê û yê min ji wan re, bila ji cihê xwe nelebitin, tiştê ko bivên ezê



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

bidim wan. Min neqenc kir, ji ber vî qasî ev fehîtiya ha hate pêşiya me. Ez îro diçim mal, bila sibe bên ba min, ez xulamê xwe jî di wan borîm.

Sibehî ew zilam siwar bû, du kurên wî jî pê re, çûn Bernihê, mala Elî axa. Axê zehf qedrê wî girt û nû got ê: Tu ji ku tê î, û bi kû ve diçî?.

Wî zilamî li axê vegerand û got; “Ez ji nav batûyan xwînî bûme. Min qesta navê te kir. Dih wextê tu hatî mala me, te pirsa îş û halê me ne kir. Te hema got, keça xwe bide min, ev di nav eşîran de eybeke mezin e. Ji bona vî qasî min keça xwe ne daye te. Ez îro jî wê nadim te. Eve ez û zaroyên xwe û mala xwe li ber te ne. Heke min niho jî keça xwe da te ev dibe kêmahîke mezin. Ez vê kêmahiyê li ser xwe danavînim.

Axê go: Keça te, keça min e. Ji cihê jêliyan te kû derê bivê ezê bidim te.

Wî zilamî got: Hin şikeft hene, ji wan re dibêjin Haçikan, min ew divêt.

Axê got, here min ew dane te.

Wî zilamî jî mala xwe anî Haçikan. Piştî midekî kurek yê wî çû Goveşilê, ên din Diyê, Bêdar, Girxetîb û Gundikê û ew der ava kirin. Her neh gundên Mendekeran ji wan heft kuran zêde bûne, ji lewre dibêjine wan Mendekeran. Ew zilamê xwînî pêşiyê Resûl axa bi xwe ye.

-3-

## Lêfên Nêwiyan

Di Lêfên Nêwiyan de 7 gund hene. Gund tev de li qûna nîvroyê Çiyayê Reş in. Ji wî çiyayî re dibêjin kever, çiyakî kêm dar, bi teht û kevir. Di Keverê de pezkovî zehf in. Di van gundan de mirov li ber deriyê xaniyan bisekine te dît hema bû qirçqirça stirihên nêriyan. Pez dikevin heta nava gund. Ji erdê van gundan zehfê wî bejî ye. Hinek ji van gundan ava



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Diclê vedixwin. Hin kehnî jî hene. Hatina wan ceh û genim e. Birinc û penbûyê wan hebe jî hindik in. Tirî û hejîrên wan zehf in; avî jî hene bejî jî. Hatinek ya wan jî êzing û rejû ye. Êzing û rejûyên xwe ditînin ber ava Diclê û ji ticarên Mûsil û Cizîrê re difroşin.

Serkar- Îro xirbe ye. Berê 40 mal tê de hebûn. Ji Diclê vedixwin. Ev gund di seferberligê de xerab bûye.

Çêlikê Hemeliyan- Xirbe ye. Berê 20 mal tê de hebûn. Ji Diclê vedixwin.

Geliyê Osman- Di rojhelatê Serkarê de ye. Ava ye, 10 mal tê de hene. Kehnî lê heye, ji Diclê dûr e.

Nêwiyan- 20 mal tê de hene. Kehnî heye. Ji Diclê saetek û nîv dûr e.

Di nîvroyê gund de xanek heye, dibêjin ê Xana Kewan. Xaneke zehf mezin e. Mezelin jê hêj ava ne.

Geliyê Heftar- Di rojhelatê Nêwiyan de ye. Îro xirbe ye. Beriya serferberligê xerab bûye, 20 mal tê de hebûn.

Kêrte- Kêrte ji Diclê du saet dûr e. Kehniya wê heye, ava wê boş e. Di cihê jêliyan de bi pirahiya hejîrên xwe meşhûr e. Tirî û rezên wê jî zehf in. Di biniya gund de Kêrxwer, Gêrtîn û Gêra Hejîran dehl û seyrangah in. Avahiyên gund 30 mal in.

Mala Şêx Mihemedê Kêrteyî, xelîfeyê Neqşibendî di vî gundî de ye. Mizgefteke kevin jî tê de heye. Ev mizgeft di zemanê Şêx Xalidê Cizerî de hatiye çêkirin. Hezretê Mewlana ji Şêx Xalidê Cizerî re goti bû, di Cizîrê de mesekine, here Kêrtê, midekî li wê derê bimîne, paşê here Basiretê û li wê derê qerar bigire. Basiret gundek yê dêrşewiyan e. Qubên Şêx Xalidê Cizerî, Şêx Salihê Sîbkî û Şêx Xalidê Zîbarî tev de li Basiretê ne.

## -4-
## Royê Jêliyan



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Di royê Jêliyan de çardeh gund hene. Ev gundên ha tev de di bakur û di nîvroyê Royê Sor de ne. Royê Sor ji qwina Çîravê der dibe û di welatê Bikatê re tête neqeba jêliyan, û jê diçe Diclê. Gund hemî nîzingî vê avê ne. Gelekê erdê wan avî ne. Birinc û penbûyê wan zehf e. Fêkiyên wan jî gelek in. Hinek ji van gundan di nav darên fêkiyan de naxuyin. Piraniya xaniyên wan şikeft in. Şikeftên wan gelek spehî û xweşbergeh in. Di nav wan de şikeftên olî, yanî dutebeq hene. Di şikeftan de derî diçin hev. Ji lewre mirov ji serê gund heta biniya gund di şikeftan re dikare here. Wekê li serê gund jinikek dan bikute deng diçe heta taxa jêrîn; şikeft welê deng didin.

Pîrêdel- Yanî Pîrê delal. Ev gund nîvxirbe ye. Îro tê de pênc şeş mal hene. Gund dikeve bakurê Royê Sor. Ji Diclê nîv saet dûr e. Di vî gundî de çinareke kevnare heye; ava aşekî ji nava wê derdikeve. Di hundirê çinarê de quleteynek heye. Çarnikarên quleteynê ferş in. Tê de yanî di qurmê darê de cihê deh zilaman heye. Li ber vê avê aşek digere. Di nîvroyê Pîr de, di ser Royê Sor re pireke darîn heye. Biharan wextê av radibe mirov di ser pirê re diçe. Her du milên avê teht in, pir qederê 50 mêtir bilind e. Li vê derê ziyaretek heye dibêjin ê Pîrê Delal.

Bernih- Gundê Elî axayê Bernihî ye. Elî axa maqûlekî xurt bû. Li Bernihê berê 100 mal hebûn. Îro gund bi xwe xirbe ye. Di nîvroyê gund de, li ser Royê Sor tehtek heye jê re Keleha Bernê dibêjin. Teht hing du minaran bilind e. Keleha Elî axa li ser serê vê tehtê bû. Di nîvê tehtê de nîzingî bîst mezel hene. Ev mezel bi pirahî bi pencere ne. Avdiza tehtê li serê tehtê qul kirine û anîne heta Royê Sor, û di nav avê re derêxistine. Di şerên berê de gava xelk di kelehê de asê dibûn û dijmin li wan dihate wer, xelkê kelehê ji serê kelehê û di avdizê re dihatin heta avê bêî ko



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

dijmin wan bibîne. Ji wan mezelên nava tehtê re dibêjin Mira Bernê.

Milkê Bernihê bê qeder zehf e û ava wê têra milkê wî nîne. Ji lewre di tehtan re co kolane û ji çiyayên dorê av anîne. Cihên cowan bilind e. Di hin cihan de co qul kirine pencere êxistine ê, di hin deran de kulekine kiçik tê vekirine. Serê çend salan carekê xelk diçin dikevin cowê û di kulek û penceran re gelaşan yanî zibilan tavêjin derve û cowê paqij dikin. Di Bernihê de mizgeftine zemanî, mizgeftine eqid jî hene. Ji her tiştê wî xuya ye ko Bernih avahîke kevin e, û merkeza zelamine xurt bû.

**Ş**ikeftiyan- Şikeftiyan gundekî mezin bû. Berê 100 mal lê hebûn, îro ancax 30 mal hene. Royê Sor di ber gund re dibore; kehniya wî jî heye. Xanî di nav şikeftan de ne. Dehlên gund zehf in.

Çemê Gewr- Berê 100 mal tê de hebûn. Îro 20 malek lê hene. Gund di keviya Royê Sor de ye. Kehniya gund jî heye. Xanî di şikeftan de ne.

Marosa Jêrîn- Xirbe ye. Berê 30 mal tê de hebûn. Li ser Royê Sor e.

Marosa Jorîn- Berê 40 mal tê de hebûn. Îro xirbe ye. Li ser Royê Sor e, û kehniya wî jî heye.

Asik- Xirbe ye. Berê 50 mal tê de hebûn. Ava kehniya wê tête ser Royê Sor.

Bilcûnan- 60 mal tê de hene. Di cihê Botan de ev der bi hêjîr, hinar û bi dehlên xwe bi nav û deng e. Cihê wê parîkî bilind e. Ji avê nîv saet dûr e. Di gund de kehnî heye.

Lodik- Xirbe ye. Berê 30 mal lê hebûn. Cihê wê bilind e, xweş e. Ji avê qederê Saetekê dûr e. Kehniya gund heye.

**Ş**ikefta Ûsif- 40 mal tê de hene. Raserî avê ye, lê jê saetekê dûr e. Cihê wî bilind e. Kehniya wê heye.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Dehlên wê di Çemê Şikefta Ûsif de ne,û zehf in.Birinc û direh (garisê sipî) jî diçînin.

Hintaniş- Xirbe ye. berê 30 mal lê hebûn, Royê Basiretê di ber gund re dibore.

Goyînan- Berê gundekî gelekî mezin bû. 300 mal tê de hebûn. Lê îro qederê 70 mal lê hene. Goyînan gundê Elî Hemanê bû. Mala Elî Hemanê Di cihê jêliyan de maleke kevin e. Gund di qwîna rizdekî de ye, cihê wî bilind e, di bin re rokî kûr diherike. Miqabilê gund çiyakî bilind e. Li ser serê wî çiyayî kelehek heye, asêgeha gund e; dibêjin ê keleha Elî Hemanê. Elî axa tê de rûdiniştt. Xaniyên gund di devê şikeftan de ne. Hatina wan avî jî heye, bejî jî. Du aş li ber ava gund digere. Birinc û pênbû jî dajon. Hêjîrên wan jî hene.

Findik- 100 mal tê de hene. Av û hewa wê zehf xweş e. Dibêjin heçî ava Findikê vexwe û bayê wê li wî bide ew mirov zû namire. Kehniyên wê boş in. Gund bi xwe li ser cada Sêrt û Cizîrê ye. Hatina wan avî jî heye, bejî jî.

Dêrik- Îro xirbe ye. Berê 10 mal tê de hebûn. Di vî gundî de kanîne delal hene, gelek spehî û xweşbergeh in. Cihê gund bilind e, di qwîntara Banê Azîzan de ye.

Gundên Lêf û Royê Jêliyan hemî koz in, Zivistanê Berf nagirin. Ji bo vî qasî eşîra Dudêran, Zivistanê bi koçerî têne van deran.

-5-

Gundên Lodê

Gundên Lodê çar in:

Lodê- 60 mal tê de hene. Gundekî gelek spehî ye. Di nav jêliyan xweşiya av û hewa vî gundî bi nav û deng e. Gundekî zehf bi zêdahî ye. Rezên wê bê qeder boş e. Di vî gundî de berê gelek roris “giyayê rengên sor û qirmiz” şîn dibû. Gelek sabûn jî çêdikin.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Lodê gundê Hesam axa bû. Hesam axa maqûlekî têrnan û dewlemend bû. Dibêjin savarê wî ji nav Xerzan, ji Ridwanê Dihat.

**Şîş**il- Ev gund ji Lodê cihê bûye; yanîbirekî xelkê Lodê berî sih salî Şîşil ava kirine û guhastin ê. Şîşil jî wekî Lodê gundekî têr rez e. Kehniyên wê jî boş in. Çiyayê Lodê dikeve neqeba van her du gundan.

Xwaran- Ji xwe gundekî kiçik bû. Vê paşiyê xerab bûye. Xelkê wî jî Lodê bûn. Ji Lodê hati bûn vê derê û 4-5 xanî ava kiri bûn. Lê debar ne kirine.

Şêx Şehwelî- 60 mal tê de hene. Gundekî dêm e. Di binê Gund de hinek spîndar hene. Ehlê Gund qantirçî ne. Zifistanê Gelek berf tête vî gundî, û rê têne girtin. Di biniya gund de tehtek heye, ew text qul kirine û tê ve riyek vekirine. Jê re neqeba jêliyan dibêjin. Şêx şehwelî ziyareteke meşhûr e.

-6-

Navkura Basan

Di Navkurê de çar gund hene:

Basan- Berê 100 mal tê de hebûn. Lê îro 10-15 mal lê mane. Gundekî dêm e. Di dora gund de birkin hene. Li ber van birkan titinê diçînin; titineke xweş lê çêdibe. Di cihê Botan de titina Basan meşhûr e. Rêzen gund zehf û taze ne. Kehniya gund jî heye.

Milan- Gundekî dêm e. 30 mal tê de hene. Ava wan ya vexwarinê ji bîrê ye. Li devê gund hinek dehlên wan hene. Di bin gund re cihek heye dibêjin ê Serê Herexê. Kehniyeke mezin lê heye. Ava kehniyê diçe heta Tanzê. Perên avê hemî spîndar in.

Dêwik- Li ser tixûbê eşîra Kêver e. 20 mal tê de hene. Kehniya gund heye. Avî û bejiyên wî jî hene.

Dêrawid- An Dêra Dawid. Dikeve rojhelatê Basan. Gundekî kiçik e, titin û rezên wî baş û zehf in.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

-7-

## Mala Jorîn

Mala Jorîn heşt gund hene:

Tanzê- Berê bajar bû, digotin ê bajarê Tanzê. Îro gund e, 60 mal tê de hene; gundekî zehf bi av û dar û fêkî ye. Gund dikeve rojavayê Eynê. Spîndarên wê bê qeder zehf in. Di cihê jêliyan ji vî gundî têrspîndartir gund nîne.

Tanzê di Kurdistanê de cihekî bi nav û deng e. Cihê hakim û aliman e. Mîrên Botan tê de sikeh birîne. Nemaze di wextê Mîr Nasir de gelek sikeh hatine birîn. Hetanî îro wextê gundî erdê difetînin sikehên Mîrên Botan peyda dikin.

Medresa Tanzê medreseke meşhûr e. Di wextê berê de 500 feqeh tê de dixwendin. Medrese heta wextê Bedir-Xan Begî ava bû. Bedir-Xan beg cihên wê ên heriftî ji nû ve da bûn ava kirin. Îro jî qederê 40 mezelên ava tê de hene. Quba Mîr Nasir di hewşa Medresê de ye.

Ji mala rîsipiyê wan re dibêjin mala Emer-Reşê.

Dibêjin ko Têmûrleng Tanzê vegirti bû, lê ne gihaşti bû Dêrûya Kurêşan. Eskerên wî li hire şikestin û bi şûn de vegeriyan.

Qawix- Dikeve nîvroyê rojavayê Tanzê. 60 mal tê de hene. Cihê gund rast e. Gundekî bi av û spîndar e. Bakurê gund çiya ye.

Motita Emer- Ev gund nîzingî ava Bihtan e. 20 mal tê de hene. Bakurê gund çiya ye. Li ser çiyê kelehek heye jê re Keleha Motit dibêjin. Ev keleh di wextê berê de asêgeha gund bû. Li pişta gund qubek heye, Ebû- Tihar, ziyareteke êzdiyan e.

Motita Seyid- 40 mal tê de hene. Gundek bi dehl û spîndar e. Kehniya wî boş e. Aşê gund heye.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Sûsik- 40 mal tê de hene. Cihê gund girik, newal û mesîl e. Pişta gund çiyayekî bi rez e. Gund dikeve bakurê Notita Seyid.

Gawat- Cihê gund wek yê Sûsikê ye, lê jê bilindtir e. Di nîvroyê gund de çiyayek heye dibêjin ê Kevera Şêx Emer. 20 mal lê hene.

Çemê Pirê- Gund nizîngî ava Bihtan e. 20 mal tê de hene. Gundekî bi wez e. Cihê gund bilind e. Kaniya wî boş e.

Gêra Wîşiyê- Îro xirbe ye. Berê 50 mal lê hebûn. Cihê nêçîrê ye. Kewvedan û kewgîriya wî zehf xweş e. Gund dikeve rohelatê Gawatê.

-8-

## Mala Jêrîn

Deh gundên Mala Jêrîn hene:

Kifrê- Îro xirbe ye. Berê 50 mal tê de hebûn.

Girdaran- 80 mal tê de hene. Gund dikeve nîvroyê Tanzê. Gundekî avî û dêm e. Biniya gund newal e. Di vî gundî de erdek heye dibêjin ê Qusêr. Di vî erdî de bêrmek heye, bêbinî kûr e. Dora bêrmê hemî penbû û birinc e.

Koxikan- Cihê gund teht e, li ber Royê Babîs e. Newalek heye, jê re dibêjin Newala San. 20 mal tê de hene.

Serderînc- Îro xirbe ye. Berê 30 mal lê hebûn. Xaniyên gund şikeft in. Di pişta gund re rê naşixule, deverine derî ne.

Lepikê Şêr- An Lipikşêr. Îro xirbe ye. Berê 50 mal lê hebûn. Gund li ser devê latekê ye. Xanî şikeft in. Di bin re Royê Babîs diherike. Cihê gund ji avê gelek bilind e. Mirov ji binî dinihêre serê tehtê, kumê mirov dikeve.

Di vî gundî de zilamek hebû, mezinê gund bû. Digotin ê Haciyê Heso. Emrê wî çû bû 115 salan. Lêbelê tu kêmayî ne keti bû eqlê wî. Maqûlên dora



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

jêliyan rêdirin pey, ew dibirin cem xwe, ji bona ko şîretan li wan bike.

Berî şêst salî, Ferhad axa, zabitê jendermê Qeza Dihê hati bû Lepikê Şêr. Ferhad axa bi xwe kurdmanc bû, ji xelkê Bidlîsê. Wî wextî kurê Hacî, Heyro mixtarê gund bû. Hacî jî ji derve, li ber dîwarê xênî rûniştî bû. Ferhad axa bi çend neferan ve gihişti bû raserî gund. Gotin, ve ye hinek esker hat. Hacî got, cihê min bibin mal de.

Kurê wî got ê:" çire tiwê biçî mal de, Ferhad axa ye".

Hacî got:" Kurê min ma ez ditirsim diçim mal, min navê ez kumê ser bibînim". Cihê wî birin mal ve.

Ferhad axa hat, peya bû, û gote Heyro:"Ka xwalê Hacî". Heyro got ê :"Xwe ji ber te veşartiye".

Ferhad axa ban kir ê: Xwalê Hacî, çire tu ji ber min revî? Ez jî wek kurê te me.

Hacî got: Ez ne ji ber te revîme. Ez ji ber kumê te revîme.

Ferhad axa got: Wekî ez vî kumê sor deynim, tiwê bêî ba min?

Hacî got: belê. Ferhad axa kumê sor danî, Hacî jî hat balê û jê re got:

-Ferhad axa, ezê ji te re mesela kumê sor bibêjim. Berî niha wextê ko kumê sor hêj ne hati bûn vî welatî; virkerê vî welatî ez bûm. Ji xêrî min kesekî din nizaniya viran bike. Wekê min jî min dikir ez virekê bikim, êvarê min taxek titina Dêwikê dida hûr kirin, min digote Gozê (jina wî): "Cihê min başqe deyne, şkevika titinê jî deyne ber serê min". Heta sibehê min qelûn vedikişand, min lihêfa xwe jî dikişand ser serê xwe, min mitale dikirin, heta spêdê. Min ew şkevika titinê hemî vedixwarin û ez saetkê jî ranedizam. Min virek pêk dianî, ser û guhên wê didan hev û min ew vir di civata maqûlekî de digot. Heta deh panzdeh



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

rojan kesî nizaniya ko ew vir e. Wextê kumê sor hatin vî welatî ez dibînim di civatekê de zilamek radibe vireke mezin dike; ew jî dizane ko vir e, ehlê civatê jî. Lê ne ew li ber xwe dikeve û ne kes dibêje ev çi vir e, te kiriye. Ji her vî qasî min navê ez kumê sor bibînim.

Bûtehran- Raserî Diclê ye. 10 mal tê de hene. Xaniyên wî şikeft in. Cihê gund bilind e. Milkê wan dêm jîheye, avî ji xwe herçî gundên Mala jêrîn in, di Qusêrê de milkê wan heye.

Wehsid- Gund li ser rastekê ye. 20 mal tê de hene. Milkên gund avî ne. Di nav gund de kehnî heye.

Seyfî- Di ber vî gundî re ava Bihtan digehe ava Diyarbekrê. Kehniya gund jî heye. 40 mal tê de hene.

Balak- Gundekî xirbe ye. Berê 30 mal tê de hebûn.

Bawerneker- Xirbe ye. Gundekî bi spîndar e. Berê 30 mal tê de hebûn.

-9-

## Dêrûya Kurêşan

Di Dêrûyê de neh gund hene. Gund hemî di newalekê de ne. Her du milên newalê çiya ne. Milê bakur Çiyayê Kehniyan, milê nîvro Çiyayê Kosiyan. Babîs di newalê Re dibore û tavêje Diclê. Hatinên van gundan bi pirahî goz, rez, birinc, spîndar û her texlît fêkî ne. Gund di nav daran de winda ne. Heta ko mirov nekeve nava gund xaniyan nabîne. Nemaze gozên wan zehf in. Bi tenê di Reşênê de qederê (10 000) goz hene.

Di çiyayên van gundan de sûmên kevin zehf in. Dewarên van gundan ji ber berfê şeş mehan nikarin berdin.

Reşêne- 100 mal tê de hene. Gundekî têrkehnî ye. Deh deqîqe di ser gund re ji qwîna Çîravê Kehniyek der dibe, navê wê Kehniya Pehn e. Cowa aşekî jê çêdibe. Ava wê hewqas sar e ko mirov bi derbekê de nikere têr vexwe. Ava vê kehniyê di nav gund re



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

derbas dibe. Bi rê ve ava çend kehniyên din tevlî wê dibin, ev av dibe rok. Aş di nav gund de ye.

Emtê- 20 mal tê de hene. Babîs di ber gund re dibore. Kêhniya gund jî heye.

Kehniya Biyê- Kehniya Biyê di cihê jêliyan de kehnîke bi nav û deng e. Didora kehniyê de zehf darên tû û fêkîne din hene. Serê kehniyê dibe sih û seyrangeh e. Avahiyên gund 10 mal in.

Bêngov- Gund îro xirbe ye. Berê 10 mal tê hebûn.

Elezîz- Ev gund di sala 1930î de ava bûye. 10 mal lê hene.

Xaniyê Nizîr- 20 mal tê de hene. Kehniya gund heye.

Basnê- Gundekî bi dar û kehnî ye. 30 mal tê de hene.

Kûşê- Avahiyên gund 40 mal in. Gund kehnîke spehî heye.

Kûşa Kevin- Herwekî kurdmanc dibêjin: Nû hatin, kevin xelat in, piştî ko Kûşeke din ava bû, kûşa Kevin xerab bûye.

* * * *

Piştî ko me tixûb, çiya, çem, deşt, newal û gundên jêliyan gotine emê niho tiştine din wek heywan, dar, giya, kulîlk, pîşe û sinhet, hekîmî, hin adetên vê eşîrê, hatinên axê û malmezinên jêliyan bibêjin.

Heywan- Heywanên wan ên kedî her texlît terş û dewar in: pez, hesp, ker, hêstir, ga, çêlek û gamêş. Hespên kihêl jî peyde dibin.

Herçî heywanên kûvî, di cihê jêliyan de ev heywanên ha peyda dibin: hirç, piling, wişk, qwîz, rovî, kêrvoşî, heftar, sîxur, murîbeşk, beraz, gurî, siorî, jîjo, seyavî, pezkovî, gornebaş, mar (texlîtê maran: koremar, marê-reş, marê-teyar, marê-avê) marmarîşok, kêlgeratik, gumgumok, balîfzerk, şemşemotik, dûpişt, mişk, koremişk, sêvil, xilt, cirt,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

zof, beqmar, mûrî (texlîtê mûriyan: reş, hesinbazik, zer, gêrik, rêviş).

Masî- Cewr, ferxecewr, şebot, mak, marmasî, nagor, sêlexwer, heşînok, zikdêlik. devhesp, birek, hefrî) beq, req, kêvcal, kurkurik, meretest, cobir.

Teyr- Qertal, şahîn, wilih, dubrak, laçîn, kurt, şîsyarik, bazih, başok, bûm, pepok, kund, leyleg, qir, qirereşk, qira-piştkulav, danisorik, qijik, çilêçilê, kew (kewê Gozel, kewê çîr, kewê Sûsik, kewê Kenger) tîvilî, zerêle, şilkak, kurkurînek, gewrêle, darkutik, kevok, dolavrêsk, por, beytik, zerzûr, tîtî, qitik, çûkmaşik, îbêd, kerak, bilbil, şehlûl, şivanmijûlik, teztezînetî, dawidê dunîkil.

Dar, mêw, devî- Di cihê jêliyan de her texlît-darên bi ber û bê ber hene: Hirmê, karçik, xox, hilû (çend texlît in: hilûyê zer, hilûyê reş, havînî) qeysî, mijmijik, hêjîr (çend texlît in: bêhnatî, şingalî, zerik, bêrkevanî, dirbî, bacanî, rijik, tefarî) bihok, hinar (çend texlît in: tirş, şêrîn, rarişok) sêv (çend texlît in: guhîjok, şekirî, xişxişok, emerê reş, xeylî, çermkerî) tû (çend texlît in: reş, ezreqî, garisî, şêmî) tûtirk, kizwan (gir, hûr, bitim, benhûrik) mazû, gilor, gijik, gijol, guhîj, berû, (berûyê berû, berûyê mazî) beranî, gezû, belalûk, simberî, êvrîst, soredar, spîndar, bî beniştok, kevot, benav, gulşîrem, gez, ajik, behîv, sênc, çinar. Texlîtê tîriyên wan ev in: teyifî, gozane, sincêrî, kerkûşî, gencîkî, gewrê Mîr, gewrê mehmo, reşê çê, sorê difsê, berîsane, tortorî, gozanê sor, binê tat, tiliya zeynebê.

Giya- Giyayên xwarbar yanî, yên ko têne xwarin: Quzmaz, tolik, soryaz, sîrmok, sîrik, tirşok, kereng, kengzer, helîş, kidadik, sêvbinerdê, pariyê mihê, benik, gozerebik, spindik, gulmêw, selmik, pûnk, kariyê belek, kariyê-kelehê.

Giyayên nexwarbar û kulîlk- Giyareş, nefel, kelik, ket, çever, zirçik, giyayê-keran, kelemper, karîş, firêz,



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

sorik, nêrgiz, hendekû, bêrzan, hêro (hişk dikin, dikin loz û jin porên xwe pê dişon; por pê nerm dibin) sosin, gemgilok, beybûn, kulîlka Nîsanê, bilîlazik, bûklindêr, rihan, rihana lawan, gul, şîlan.

Pîşe û sinhet- Di nav eşîrên Botan de herçî dêmanî ne di tevnê de kêm in: koçerên wan xurt in. Di nav jêliyan de jin kej, penbû, hirî dirêsin, bi têşiyê goran çêdikin. Hinek jî tevnê çêdikin, lê sivik. Wek têrik û ciwal. Penbû bi dolavê dirêsin dikin rîs û rêdikin Sêrtê. Sinhetkarên Sêrtê heqê destên xwe dibin û pê caw û stenbolî çêdikin.

Di nav jêliyan de qeleçî hene. Ev qeleçî gêsin, bêjing, serad, kêr, milhêb, hestîf, dirêşik û kilpidanan çêdikin. Hin ji van qeleçiyan bi sinheta tifingê jî dizanin.

Bacolî, reşikan çêdikin û xeratiyê dikin. Xelk bi pirahî cenan û cotkar û rezvan in.

Hekîmî- Li Kurdistanê hekîmî bi zehfî wek malmelan pêmayî ye. Ji wan hekîman re, hekîmên kurdmancî dibêjin. Her eşîrê mala hekîmê wê heye. Hekîmên Jêliyan ji eşîra Alikan in; mala Silêmanê hekîm.

Ev hekîm her texlît nexweşî û birînan derman dikin. Birînan bi kewê derman dikin. Rûn û hingivînî tevlî hev dikin û pê dikewînin. Fitîlan jî bi birînan didin. Ji bo kewê dermanekî din jî heye. Wî dermanî ji giyê û ji dermanê spî yê şeşxanê çêdikin. Ev, ji her dermanên din rahetir û çêtir e. Dermanên piştî kewê jî hene, zehfên wan ji giyê çêdikin. Wan giyan hekîm bi xwe ji çiyan didin hev. Heke berik di nav hestî de ma, goşt diqelêşînin û berik derdixînin. Carina hestî dişkê. Hingê wî dicebirînin. Berik bikeve sêvokê û di milê din re tavêje, dermanê Spî datînin her du devên birînê heta ko şewata wî bigehe hev. Hekîm bi goşt û xwarinine din qewet didin birîndarên xwe.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Carina birîndar ji tirsa canê xwe dimirin. Ji lewre birîndaran bi tenê nahîlin. Xelk têne dora wan û nav didin wan.

Xwarina nexweşan bi adetî tiştine tirş in. Hinarê şêrîn, şorbeşîr, hingivî, epraxê Birincî; diklozê bistî jî didin wan.

Nexweşiyên ko di nav jêliyan de peyda dibin an yên ko pê bihîstine ev in: Ta, êşa zirav, zerik (zerika reş, zerika zer) xurî, sorik, êşa giran, zikêş, qolinc, bayê sor, bayê spî, guhêş, serêş, çehvkulbûn, devkulbûn, titme, zam, nav, xilt, mîzavokî, keçelî, gewrik, arsim, sermayî, kuxik, taya sêroje, heftawik (heftûwik) dilêş, xişrûk, neks, beqik, haloq, şîrşimak, argûşketin, mûmar, kulmêrû, bûkik, perde, ewr, ava-reş, sîkutok mêkutok, qofî, bîjî, devxwarî, falinc, hêvketin.

Bi hekîman re bazar e; heke nexweş rahet bû heqê xwe dibe, heke bi birîn an bi nexweşiya xwe ket hekîm bi xwe tu tîştî naxwaze. Herçî nexweşiyên sivik xelk xwe bi xwe derman dikin. Jinên sere bi dermanên wan dizanin.

Li Kurdistanê, nemaze di cerahiyê de hekîmine bi nav û deng peyda dibin. Ev hekîm ji eşîrên din têne xwestin.

Peyayê ko di şeran de birîndar dibin heqê hekîmên wan axa dide.

Hatinên axê- Di zemanê berê de, gava axatî hebû û Kurdistan li ser rêzika xwe a kevin bû eşîran wêrgû dida axayên xwe. Hatinên axayê jêliyan ev bûn:

Doşanî- Li Biharê her gund li gora halê xwe pezek an dido an hêj bêtir dibir axê.

Kêsim- Li Pehîzê, her gund li gora zêdayiha xwe barek dido difs, birinc, genim dida axê.

Êdanî- Di Êdan de êdaniya axê hebû. Pez, dexil an difs.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Deman- Axa xurt biwa ne dihişt ko bajarî deman bikin. Axê deman bikira fêda gundiyan jî tê de hebû.

Spîndarî- Di Gera Xanî de li serê tofa spîndarê axê hefta pênc mecîdiyan dibirin. Di tofekê de (300-500) spîndar hene.

Dûvikê Qemçûrê- Wextê qemçûrê wekê qemçûrçî dihatin û diketin gundan axê pezê gundiyan vedişartin. Gundiyan jî tiştek dida axê.

Ticarî- Wextê ticar dihatin û hin tişt dikirîn, di wê dan û standinê de para axê hebû. Para axê mixtaran ji ticaran distand û didan axê. Li serê pezekî çerxîkî. Li serê hiriya pezekî qemerîkî. Li ser xunkariya tewaş çerxîkî (xunkarî heft heqe ne).

Pêrûya Kozê- Koçerên ko dihatin erdê jêliyan heqê koza xwe didan xwediyan. Jê pê ve xwediyê Kozê Pêrûyê axê ji wan distand û dida axê. Ev koçer di mideta ko di erdê jêliyan de diman, li bin destê axayê jêliyan bûn. Şer biwa digel jêliyan diçûn şer.

Ev hatinên axê ên binavkirî bûn. Ji van pê ve axa biçiwa ba Mîr an ba hikûmetê, teşxeleyek lê biqewimiya ji eşîrê distand. Dîsan axa milkek bikiriya û pereyê wî têr ne kira pereyê mayîn li gundan beş dikirin û mixtaran ew pere didan hev.

Ceza- Axayê jêliyan wek axayên Kurdistanê ên din xelkê eşîra xwe cirm dikir. Ji cezayê ko ji xelkê dihate standin para axê jî hebû.

Dizî- Axa li malê dizî digeriya, heke ew peyda kir vedigerand xweyî û tiştek jê ji xwe re hiltanî.

Kuştî- Axê mala xwînî talan dikir û dida xwediyê kuştî û ji xwe re jî tiştek dibir.

Birîndar- Axê heqê birînê ji carih distand û dida birîndar. Tiştek jî ji xwe re dihişt.

Dawa- Ji dawayên ko axê bi xwe şerîeta wan dikir heqê qazîtiyê ji wan distand.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Malmezinên jêliyan- Herwekî me di teşkîlata eşîra jêliyan de û di rêza gundên wan de gotine, me sheîtiya şeş malmezînên jêliyan kirine.

Elî Axayê Bernihî- Tiştê ko me di heqê wî de zanî di gundê Bernih de gotiye. Îro ji mala Elî axa tukes ne maye. Bernih ji gundên Royê jêliyan e.

Elî Axayê Qadê- Elî axa ji gundê Qadê ye, ji gundên deşta Mişarê. Ji mala wî du zelam hene.

Elî Hemanê- Ev Elî axa ji Goyînan e, gundekî Royê Jêliyan. Ji vê malê jî çend zelam hene.

Hesamê Lodê- Ji xwe herwekî nav li ser e. Hesam axa lodî bû. Çend zelam ji vê malê jî hene.

Mala Elî Bekiran- Mala Resûl axa, axayê jêliyan a îro bi xwe ye. Çîrokiya vê malê me di gundê Mendekeran de gotiye. Şecera Resûl axa jî ev e: Bekir, Elî, Miheme, Resûl, Miheme û kurê wî Resûl axa. Navê kurê Resûl axa ê mezin, yanî welîehdê wî, Evdirehman e. Resûl axa li bin xetê ye, li Deşta Hesinan, di gundê Çem-Şeref de rûdine, û azayê Meclisa mihafeza Hesiçê ye. Xwedê rikêba wî dirêj bikit.

Şam: 18 Îlon 1941

Herekol Azîzan



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Mêşhingivî*

Di Kurdistanê de li cihê Botan, li Qeza Şernex eşîrek heye navê wê eşîra Kendaliya ye. Eşîreke gelek piçûk û hindik e, bi xweyîkirina pezê çûr û bi dihindana wan gelek meşhûr û bi nav û deng e. Lê nemaze û sê behran bi pispûrî û serve-bûna mêşên hingivî hêj meşhûrtir û bi nav û dengtir in.

Herwekî ez bi xwe di sala 1938an de wextê li welêt bûm ez û çend mirov û pismamên xwe li gelî û niwalên çiyayê pişta Şirnex digerayîn. Me dît ko çend zelam ên bi gopal, das, bivir û çelte bi mil ve wê li nav kelebestan de, giya, kuç û ferşan de digerin û tên û diçin.

Wextê min holê dît min ji wan pirs kir; pismam ma çi li hewe qewimiye ko hûn vê spêda hinde sar û cemidî li nav van giyan û vê erda xwîsgirtî û şil digerin tên û diçin.

Gotin: pismam aniha tu dibînî dinya îro Bihar e û erd hemî kesk û heşîn bûye. Vêca wextê mêşên hingivîye; mêş hingivî hingiviyê xwe dikin çêkin. Ji lewre em ho kin, ev li me qewimiye.

Îca min ji wan re got: ka xêra xwe niha ji min re bêjin ka hûn çawan çêdikin û dizanin û serve dibin.

Gotin: Bihar e pismam, mêşên hingivî dê bên li erdê têr av, gul, kulîlk û giya bigerin û danin, têr avê vexwin û ji gul, kulîlk û giyayên bi bihin û bihindar barikên xwe çêkin û bi lingên xwe ve girêbidin û bişidînin, bifirin û paşê biçin mal û cihê xwe û hingiviyê xwe çêkin.

Vêca em jî dê bên li wan bigerîn û hêre bikîn. Wextê me holê dîtin emê xwe li hîviyê bigirîn heta firîn, û çûyîn. Heke me dît nivs fitlek an du fitlan firîn

---

*K.Hawar. Sal:11. Hejmar:56. 15 Tîrmeh 1943. R:5.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

û çûn hingê em dizanîn cihê wan nîzîk e û ne dûr e. Heke me dît sê çar fitlan bilind bûn û xwe dewira da û firî hingê em dizanîn cihê wê dûr e. Dibit ko riya saetkê Hebît emê lê bigerin û pê biçîn, heta em vêdikevin û serve dibin. Vêca emê tîj û hûr lê binêrîn ko berê xwe kû ve da û çû. Emê xwe bi wê hindamê bigirin û herin. Em winda nakîn heta em rast biçîn ber devê qula wan bisekinîn: vêca emê dest birîna mêşa xwe bikîn; mêşa xwe bibirîn, hingiviyê xwe jê derêxin û biçîn mala xwe.

Dibêjin rojekê Mihemed Begê Mîrê Botan li zozanê Herekolê bû; ji civata xwe re got:

Me divêt em vê hefteyê herin seyrana xwe li Kêla-Memê bikin.

Kêla- Memê zozanê Goyan e; gelek bilind û xweş e; pez gelek lê qelew û xurt dibin. Çiya û avên wê gelek bi xêr û bêr in.

Rabûn kar û barê xwe kirin, xwe pêk anîn û çûn li Kêla- Memê danîn û dest bi seyrana xwe kirin.

Mîr Mihemed digel civata xwe li nav mêrg û çîmenekî têr av û giya de li ser kaniyeke sar û cemidî rûniştin. Dîtin ko mêşek ya hingivî ji jor de hat û li ser avê danî.

Di nav civata Mîr de zilamekî geverî hebû. Gever gundek li cihê Botan, li qeza Şernex, li qûntara çiyê û zozanê Çiravê ve ye.

Wî zilamê Geverî got: Mîrê min ev mêşa he ya hingivî mêşa min e û ji gundê min Gever hatiye.

Mîr got: Te çawan zanî ko mêşa te ye?

Zilamê Geverî got, ez dizanim ya min e. Ka em rabin biceri-bînin. Heke mêşa min derneket bila Mîr serê min lêbidit.

Rabîn mêş girtin û piçik ermîşim bi lingê wê ve girêdan û berdan. Mêşa gewir firî, çû.



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Mîr rabû xulamekî xwe î rast û dirist digel mêrikê geverî rêkir.Her du vêk re çûn. Geverê; li ber dinbaşka mêşan rûniştin. Dîtin ko ew mêşa nîşankirî di ser gurbika xwe re difirit.

Vegeriyan nik Mîr û mesele jê re gotin. Mîr ji geverî pirsî: Te bi çi rengî zanî ko mêşa te ye?

Mêrikê geverî got:

Mîrê min gava min dît mêş rabû û bilind bû û xwe dewir da û berê xwe da nişûv û bilind firî; hingê min zanî ew mêşa min e.

Mîr rabû geverî xelat kir.

*M. E. Bot*



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

**Dîroka kelepora mîrnişîniya Botan** ------------------------------------------------------- 247

PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

# Sercem

| | |
|---|---|
| Pêşgotin | 5 |
| Jîna Mele Xelefê Bafî | 7 |
| Serpêhatiya Mele Xelef | 11 |
| Mihemed Begê Mîrê Botan û efno û Hejale | 14 |
| Sitirana Efno û Hejale | 39 |
| Sitirana Efno û Hejale | 44 |
| Sitirana Lavij derbara Mihemed Begê Mîrê Botan de | 48 |
| Şêxiko malo | 51 |
| Şêxiko Malo | 52 |
| Bangerê Hotê | 60 |
| Mihemed Şah Mîrê Botan û Eyşa Bêzar Begê | 63 |
| Sitirana Mihemed Şah, Mîrê Botan û Eyşa Bêzar Begê | 81 |
| Peyzok | 87 |
| Xizêmoka Bota | 89 |
| Xizêmoka Bota | 110 |
| Dunya bi çerx û felek e | 112 |
| Binyata sitirana Kêre | 130 |
| Ev çend kertik ji sitirana Kêre ne | 134 |
| Mûsa Kovexî | 136 |
| Hoy çem e | 154 |
| Elo Dîno (kelha Bafê) | 156 |
| Mîr Sêvdîn babê Şêr Begê (kekê Bedir-Xan Begê) | 165 |
| Sitirana Mîr Sêvdîn | 174 |
| Xulamê Bedir-Xan Begê (nukte=pêkenok) | 176 |
| Êzdînşêr Begê Botan | 177 |
| Şîna Mîr Sêvdîn | 184 |
| Sitirana Bedir-Xan Begê | 185 |
| Bedir-Xan Beg | 188 |
| Şerê Bestê Beleka | 198 |
| Şerê Kehnîqîrê | 200 |
| Ez Xelef im | 202 |
| Mîr û Mar | 205 |
| **Dîroka kelepora mîrnişîniya Botan** ------------------------------------------------------ | 248 |

PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com

Mîr û Kund 207
Lavijên Mîr Mihema 208
Jêliyan 216
Mêşhingivî 243
Sercem 247



PDF created with pdfFactory trial version www.pdffactory.com